

"Herçî bire şûrî destê hîmmet  
Zebtkir ji xwe re bi mîrî dewlet  
Bê ceng û cidal û bê tehewvir  
Qet vê şixulê mekin tesewvir"

-Ehmedê Xanî-

# REWŞEN

Kovara Yekîtiya Rewşenbîrê Welatparêzê Kurdistan

Hejmar


1

Buha: 5.- DM

Havîn 1988

- Civîna Yekîtiya Rewşenbîrê Welatparêzê Kurdistan
- Pêwistiya çandê û karguzariyên li pêşıya me / Nûhat
- Salixa Rewşenbîr û di pêşdeçûna dîrokê de rewşenbîr / A. Dicle
- Çanda netewî, bingehêk ji bingehên rizgariya netewayî ye

- Axîn Welato: Destana serhildana Şêx Seîd / X. Xemgîn
- Kurd kî ne, Kurdî û Kurdistan ci ne? / E. Xemgîn
- Nazdar û hicra mirinê / Cankurd
- Efsana Cimcimê Sultan / Cotkar



**SERECEM**

	Rûpel
— REWŞEN çîma derdikeve? .....	1-2
— Cîvîna Yekîtiya Rewşenbîrê Welatparêzê Kurdistan .....	4-8
— Nûçeyên çalakiyan ji Kurdistana Bakur .....	9
— Nûçeyên girtîgehan ji Kurdistana Bakur .....	10
— Qirkirina netewî li Kurdistana Başur .....	11
— Peymana di navberê PKK û YNK de .....	12-13
— Pêwistiya çandê û karguzariyêni li pêşîya me / Nûhat .....	14-15
— Axîn Welato: Destana serhildana Şêx Seîd / X. Xemgîn .....	16-18
— Hovîtiya mêtîngerêni Tirk diji gelê Kurd .....	19-21
— Destana Mîrê Botan: Bedirxan .....	22-23
— Kurd kî ne, Kurdî û Kurdistan ci ne? / E. Xemgîn .....	16-18
— Çîroka gelê me / Şilan .....	27
— Yek-kirina nivîsa Kurdî / Şahînê B. Soreklî .....	28
— Mîhrebana Xatûna Berwarf .....	28
— Befr û çiya / Salimê Hacî .....	29
— Zaroyêni Kurd / Salimê Hacî .....	29
— Xewna bê wexer / Dr. İbrahîm Salman .....	30
— Metelokêni Kurdî .....	31
— Salixa rewşenbîr û di peşdeçûna dîrokê de rewşenbîr / A. Dîcle .....	32-33
— Simbilê lawik / Azad Bavê Şîhîn .....	34-36
— Axaftina piçûkan / Azad Bawê Şîhîn .....	37-38
— Helbest: Şehîdim / Ismaîl Hakanî .....	38
— Milhim Beg: Xudanê Çiyayê Şengalê / Eliyê Heyder .....	39-40
— Hacî Mamo, Ferzo Çolo / Eliyê Heyder .....	41
— Îl, eşîr û bavikêni Kurdan / M. Aleksander Jaba .....	42-43
— Hozanvanê Kurd: Evdissemed Babek .....	44
— Yekemîn rêzmannivîse Kurd: Elî Termaxî .....	45-47
— Rêdar û dara gûzê .....	48-49
— Li ser taybetiyeka çandî li navça Şîrnexê: Dawet / Mesut Boş .....	50-51
— Qumrî .....	52-53
— Nazdar û hicra mirinê / Cankurd .....	54-55
— Heyranok: Qulingo / Nûriddîn Seîd .....	56
— Efsana Cimcimê Sultan / Cotkar .....	56-58
— Cimcima Sultan / Eugen Prim û Albert Socin .....	59-60
— Çanda netewî, bingehêk ji bingehêni rizgariya netewayî ye .....	61-63
— YRWK, Belavok Hejmar 1 .....	64
— YRWK, Duxuyanî Hejmar 1 .....	65

# Bijî YRWK



## REWŞEN çima derdikeve?

Gelê me rojêن pêwistirîn ên dîroka xwe dije. Ev nêrin ne tenê gotinekî ajîtasyon û bangêsiye. Seranser rastiyê dihêne zimên. Pêşemîn care ku gelê me di dîroka xwe de hevqas pêşveçûnan dibîne û dije. Pêşemîn care ku gelê me di dîroka xwe de bi dîlerî xwedî li hebûna xwe û rastiya xwe derdikeve. Ev bûyer û rastî, rûdaneka wusa ye ku her welatperwerekî Kurd, gîringe bi bal vê yekê bîne pêşîya çavêن xwe. Herweha, di rojêن me de pir pêwiste ku li hemberê vê rastiya dîrokî herkesekî dilsoz cihê xwe rast bistîne û rewşa xwe şîrove bike. Ev divêtiyeke bingehîn û herî nemaze ye.

Dîrok, carcaran vatinî û delametêñ pir pêwist derdixe pêşîya gelan. Vatinî û delametaka vê nolê, niha li pêşîya

gelê Kurdistanê ji hatiye danîn. Gelê Kurd, ne tenha li pêşberê wan pêşveçûnaye ku sernivîsa wî çareser dike û diverisîne. Ji nêzîk ve, sernivîsa gelên herêma Rojhilata Navîn jî, girêdayiyê vê pêşveçûna dîrokiye. Gelê Kurd niha ketiye nava wê lehiya pêşveçûnê, ku posîdeyêñ mezin li gelên erdima me jî dike.

Niha dîrok kargazariyêne gelek gewre daniye pêşıya gelê Kurd, ku ji gelên dinê bêhtir risteka dîrokî pêwiste bileyize. Naveroka vê yekê çiye? Mirov dikare bersiva vê pîrsê wusa bide: Vatinî û delametên mezintirîn ên dîrokê li pêşıya law û keçen vî gelî hatine danîn, ku nekaribin weke xwe bêne hîştin! Xwedîderketina li delametan, bicihanîna daxwaziyêne delametan, wê têkoşîna serxwebûn û azadiya gelên êrdima me bilezîne û di serî de jî wê gelê me çêtir nezikî armanc û daxwazên xwe bibe. Hoy û şêweyêñ ber bi serfirazî û serketinê ve çuyinê, wê he-sanitîr bibin.

Dihê zanîn ku rewşenbîr û ronakbîrê hemû civakan, pêşemîn xwe bi civakê, bi zanyariyê, bi rastiyêne konevanî, çandî, aborî, leşkerî û zanatiya gelemeperî, naskirina hertiştî mijûl dîkin. Rista rewşenbîran ji bo di nava civakê de afirandina bîr û hîzrên rizgariyê, di dîrokê de herdemê gelek mezin bû û rista pêşemîn bû. Ji ber ku di dîrokê de rewşenbîr herdemê pêşemîn van bîr û hîzrân dikişînin û kişandibûn nav refê gelê rizgarîwaz û bindest. Çuqas rewşenbîr xebatê ji bo pêşvebirina civakê bikin, nexusim hevqas jî dikarin rista xwe ya dîrokî bichî bînin.

Gava em li hebûn û rastiya Kurdistan binérin, em wê bibînin ku çîne vatînî û delametên rewşenbîrê me. Gava em van bikolin jî, em wê bibînin ku hejmara van delametan jî ne hindikin. Herçuqasî niha bîr û hîzrên rizgariya netewayî gîhabîn gelê Kurd jî û ev yek rastiyeke karvanî jî be û xwe bi mîsagor danîbe pêşıya me jî, ne wusa ye ku delamet û rista rewşenbîran ê din nemaye, an jî pêwistî ji holê rabuye.

Domana me ne ew domane ku bîr û hîzrên rizgariyê, weke tovê di axê de bêne çinandin, lê dîsa jî rista ku wê ronakbîr bileyizin herî gewreye. Têkoşîna serxwebûn û azadiya gelê Kurdistan, dalemetên mezin dixe ser şaxê (milê) van biran, ku divê bi lez di karvaniyê de pêk-bînin.

Niha pir ronahî bûye ku çîne ev vatînî û delamet. Heya niha ji ber gelek sedeman ev xweş derneketibûn pêşıya çavan. Lê belê, iro rewş seranser hatiye guhartîn. Ci wê bêne kirin? Ev wusa ronî û eşkerene, ku tu xebat û lebat nekaribin van ji çavêñ me veşérin.

Kurdistan yek ji wan welatan e, ku rewşenbîrê wan bi hejmar pir in. Lê bilî vê piritiyê, em nikarin bêjin ku rewşenbîran rista xwe li pêşıya gelê xwe, li Kurdistanê bichî anîne. Ger di dîrokê de û ger jî niha, ne kêm ronakbîr derketin, ku ji bo serxwebûn û azadiya gelê Kurdistan bi hogîrî şerkirin û di vê oxirê de canêñ xwe gorî kirin. Ji ber ku hejmara rewşenbîran gelek pire, em jî dibêjin ên bi mîrxasî derketin hindikin.

Nexwe, em dikarin bêjin, ku dîrokê berpirsiyariyeka

nuh derxistiye pêşıya ronakbîrê Kurd. Tiştên bêne kirin, giringe heya dawiyê alîkarî, hevkarî û piştgiriya têkoşîna serxwebûn û azadiyê, ku li welatê me bilind dibe be. Ji bo hevgirtin û xurttir bûyina vê têkoşînê giringe her derfet û gangeza di destê me de jî dil û can bêne pêşkêş kirin. Riya rewşeniyê, riya rûmîta mirovahiyê jî vir derbas dibe.

Em, komek ji rewşenbîrê Kurdistan yên nîştiman-perwer, li ser bingeha ji ber çavan derbaskirina van rastiyân, me xwe gîhand hev û me yekîtiyek di nava xwe de damezirand, ji ber ku me dît, tiştên giringin ku em bikin ne hindik in. Niha em dixebitin ku yekîtiya xwe di bin navê **Yekîtiya Rewşenbîrê Welatparêzê Kurdistan-YRWK** de, rîkxistin û xurt bikin. Divê em cih de bêjin, sazumana me li ser bingeha kirina xebat û karê jî bo gelê Kurdistan, ji bo hevkariya têkoşîna serxwebûn û azadiya gelê Kurdistanê hatiye damezirandin.

Bi rastî, me pir rast dît, ku riya bi rastî tiştek kirinê, ji riya xebatekî rast rîkxistî derbas dibe. Me di karvanî û têkoşîna xwe de dît, ku ev delamet vatiniyeke mezinê li pêşıya me, û yekîtiyekâ wusa jî me re divêtiyekâ mezin e. Ev rastî, xebatêne me yêñ bo yekîtiyekâ wusa lezand, ji bona ku em bi serkevin, hîm û giyan da me.

Kovara me **REWŞEN**, ku em bi wê derfeta banga li xwendevanan peyda dîkin, covara **Yekîtiya Rewşenbîrê Welatparêzê Kurdistan**, ku bi vê hejmara yekem dihê weşandin. **REWŞEN**, bi rewşeka sazendî (nizamî), wê ji niha pêde bigîhe xwendevanê me yêñ birêz û heja.

Kovara me **REWŞEN** seranser wê bi tipêñ nûjen û zimanê Kurdi, lê derfet hebe bi hemû zaravêñ Kurdi wê bê weşandin. Nivîsên konevanî, ramyarî, civakî, aborî, çandî, hunerî, lêgerî, sernêrî, tendurustî, endizyarî, dad û maftarî, erdnîgarî û şenînasî, dîrokî û her wekî din, wê di **REWŞEN** de hebin. Herweha wê xebatêne hunerî yêñ mîna helbest, hozanî, govendî û çîrok jî bêne weşandin.

Kovara me û xebatêne yekîtiya me **YRWK**, ji bo hemû kesên dilsoz û welatparêz vekiriye. Hemû rewşenbîrê ku serxwebûn û azadiya gelê Kurdistan dixwazin, dikarin bi dilgermî têkilî xebatêne me bikin. Em bang li rewşenbîrê zîver û dîler dîkin ku, hevkariya yekîtiya me û alîkarîya xebatêne me yêñ weşanî û yêñ din bikin.

Divêtiya rewşenbîriya nîştimanwazî, di nav refêñ rizgariya nîştimanî de ye. Ji xwe rûmetiya rewşenbîriyê, dikare xwe di xebata konevanî de deyne holê. Têkilî, pêvendî, hevkarî û piştgiriya bi vê xebatê, derfeta di ber destê me de ye.

Em bang li hemû rewşenbîrê welatparêz yên Kurdistanê dîkin, ku xwe li dora **REWŞEN** û **YRWK** ji bo rizgariya netewayî bikin yek; em wan vexwandiya vê xebatê dîkin.

Dema we bimîne û xweş û heya hejmara nuh...

*Li gel silavêñ rizgarîwaziya netewayî*

**Sernivîsariya REWŞEN**

# Civîna Yekîtiya Rewşenbîrêñ Welatparêzêñ Kurdistan



## Yekîtiya Rewşenbîrêñ Welatparêzêñ Kurdistan damezirandina xwe bi civînekê pîrozbayî kir

*Roja 09. 04. 1988'ê li serekbajarê Almanya Rojava bajarê Boon'ê, Yekîtiya Rewşenbîrêñ Welatparêzêñ Kurdistan-YRWK sazbûna xwe bi civînekê pîrozbayî kir.*

*Ji çar bêşen Kurdistanê dora 100 ronakbîrêñ Kurd besdarî civinê bûn. Li kîleka rewşenbîrêñ Kurd ên welatparêz, hinde derdorêñ pêşveçuyî, demokrat ên Almanî jî vewxwaniyê civinê bibûn.*

*Civîn, bi silava bo şehîdên şoreşen cîhanê û Kurdistanê dest-pêkir. Dure, nîrxandineka ramyari ya fireh li ser "salixa rewşenbîran û rola rewşenbîran di dîrokê" hat pêşkêş kirin. Piştî ku sedema avakirina yekîtiyê duxuyan bû pêde, bi navê rewşenbîrêñ li Swêd, Frense, Hollanda, Almanya Rojava û Berlîna Rojava, mesaj û axaf hatin xwendin. Hinde ronakbîrêñ Kurd û derdorêñ Almanî jî, mesajên xwe yêñ nivîsi hinartin civinê.*

*Di vê hejmara **REWŞEN**ê de, em hinde bawirnameyên (dokûmanên) civinê pêşkêşî xwendevanêñ xwe dikin, daku çêtir ji xebatan haydar bibin:*

Hevalên berêz û dilsoz, ez dixwazim berî ku li ser programa xebata komên Yekîtiya Rewşenbîrêñ Welatparêzêñ Kurdistan birawestim, ramanêñ yekîtiyê û bendêñ xebatê ên ji bo bidest ve anîna van ramanan ji destura Yekîtiya Rewşenbîrêñ Welatparêzêñ Kurdistan bixwînim, daku em çêtir têbîghîjinê ka erk û delametên me çine û em wê bikaribin ci di rîya Têkoşîna Rîzgariya Netewa Kurdistan de bikin. Pir aşkere ye ku, tiştê li ser mil û şaxê me rewşenbîran di vê şerê serxwebûn û azadiya pîroz de dikevin, pir berz û mezin in. Niha ez dixwazim van birêñ des-turê nasî we besdaran bikim.

### "Bend 2:

Ramanêñ yekîtiyê:

1- Li ser bingehêñ mafêñ mirovahî girêdana pêwendiyêñ bi gelêñ gêlî re û xebata bo aşitîyê li gêlî û Kurdistanê,

2- Hevkarî û piştgirî bo têkoşîna serxwebûna Kurdistanê li ser bingeha mafê çarenusa netewan û ji bona vê daxwazê pêşvebirina xebatê,

3- Parastin, nasdan û pêşve-xistina ziman, pîşe, wêje, dîrok û bi gelempîrî çanda Kurdi,

4- Berhevanîna ronakbîrêñ Kurd û mijûlbûna bi pirsgirek û asêtengêñ rewşenbîrêñ ji Kurdistanê.

### Bend 3:

Yekîtiya Rewşenbîrêñ Welatparêzêñ Kurdistan, bo bi-destanîna ramanêñ xwe van xebatêñ jêrîn pêktîne:

1- Ji bona piştgirî û nasdana têkoşîna serxwebûna gelê Kurdistan dirustkirina pêşveçûnan, xwepêşdanan û şevêñ hevkarîyê. Pêkanîna semînar û civînan (konferensan),

2- Nasdana ziman, wêje, dîrok û çanda Kurdi û pêkanîna hurkolînêñ di van babêtan de,

3- Hînkirina ziman, muzîk û govenda (folklorâ) Kurdi û ji bona jiyanhîştin û pêşvebirina vanan, çêkirina komên perwen-debûnê û vekirina kursên hînbûnê,

4- Avakirina komisyonêñ rewşenbîrân di nav refîn yekîtiyê de, li ser daxwaza karê ku her rewşenbîrek dike (wek: komisyonêñ abukatan, doxtoran, mamhostayan, nivîstkaran, wê-neçêkaran ûhw.),

5- Li cihêñ ku hewce be avakirina liq û şaxêñ yekîtiyê,

6- Berhevdana alîkariyêñ diravî bi armancêñ mirovahî (humanîstî),

7- Derxistina kovaran bo pêşxistina ziman û wêjeya Kurdi û nasdana hebûnêñ gelê Kurd bi gelêñ gêlî re."



Biraderên hêja,  
Mêhvanên delal,  
em gişt dizanin ku mêtîngê-  
ren har û dirinde, ên ku welatê  
me ê şêrîn û bedew ji xwe kirine  
mêtîngê, ev bû çende hezar  
sala nîştîmana me ya pîroz di  
hemû alyîn jiyanê de dimijin, ci  
ji destê wan hatiye li ser gelê  
Kurd anîne û dihînen. Ev dijmîn-  
êna çavşor û êrîşbaz, ne tenê  
welatê me dagirkirine; ew di-  
xwazin gelê Kurd tevî jiyanê,  
tevî hebûnên dewlemendî ên  
dîrokî, civakî, çandî û aborî, tevî  
dar, ber, kevir, asman û ax û  
hewa ji dîrokê tunebikin. Ji bona  
vê yekê, ci ji destê wan dihê  
dikin. Her bikaranîna hov, her  
lîva derî-mirovahî ji xwe re xwedî  
destur dibînin. Dewlemendiyê  
me ên ser û binerîn dimîtin,  
mirovêñ me dikujin, gelê Kurd  
diheşîn û gava pêwist dibînin ji,  
narîncokêñ jehrê dîbarînin ser  
gelê me yê kevnar û xwedî maf.

Lê hema ez dixwazim li vir  
yek careka din bênim zimêñ ku,  
ev keftûlaftên neyarêñ xinîz wê  
herdem bêhudabin. Li ser ben-  
davêñ ciyayêñ Kurdistanê, li  
gund û bajarêñ me pêşrevanêñ  
şoresa Kurdistan dijminêñ xwîn-  
xwar, gêj û bê mejjî dikin. Şerê  
serxwebû û azadiya me kuflî-  
kên xwe vedidin, hêviyêñ cil-  
misibûn gedîbin û ava jiyanê di

xakêñ me de xwe dadigerînê.  
Gelê me hişyarbûye û di şerê  
têkoşîna rizgariya netewî de  
pêşve dihere. Pêşengêñ me şer-  
dikin. Gundî, jin û mîr û keç û  
xortêñ me ên civan pêşde dibe-  
zin. Rêya rizgariya me kin dikin û  
xwe bi lez dilivînin.

Lê hevalno, herçî em dizanin  
karguzariyêñ me pir mazin in ji,  
di vê warê de hîn me rastî pirtîş  
nekirine, heyâ hinde ji me ji binî  
tiştek nekirine. Gelek ronakbîrêñ  
me ketîne nav xebatêñ çewt de,  
berhemêñ xwe pêşkêşî hêzên  
dijminêñ gelî me dikin. Heya  
niha me yekîtiya xwe ji çene-  
kiribû ku em bikarîbin pêşve  
herin. Dê em ji xwe bipirsin, ma  
gelo em rewşenbîrêñ Kurd ên ku  
ronaktîrinin di naskirina kêş û  
pergalen nişfîman de, heyâ ken-  
gê dê em çavêñ xwe bîmîçinîñ û  
karêñ xwe nebîne serî. Ez niha  
gelek xwedî bawertîrim ku, niha  
ev keys û delive ketiye destê me  
de. Em dikarin xebatêñ xwe û  
yekîtiya xwe di nav refîn Yekîtiya  
Rewşenbîrêñ Welatparêzêñ Kur-  
distan de bicîbînîñ û berûpêş-  
de bibezin. Berhem û hunerêñ  
xwe bigîhînîñ têkoşîna netewî.

Li kîleka şerê ku li welat  
bilindibe, rastî em ronakbîr ji  
dikarin xebatêñ mazin bikin. Be-  
rî hertişî, divê her amade bin bo  
şerê li welat, em xwe bigîhînîñ  
gelê xwe û di refîn pêşde şerê xwe  
bikin. Ez bawerim erk û delame-  
ta me ya mezintîrîn ev e. Balam ji  
alyî din, hertişî ku dijminêñ me  
êrîşkirînê û dixwazin tunebikin,  
em dikarin bo damezrandîn û pêş-  
vebirina wan xwe amade bikin.  
Dijmin bixwaze çi tunebike, em  
wê tişte biparêzin. Em dîroka  
xwe, çanda xwe, hunerêñ xwe,  
rewşa civata xwe bikolin û ro-  
nakbikin. Lewma gelek tişt ji  
destê me dihîn. Rastî "bêşere-  
fiya mezintîrîn nekirina xebatê  
ye". Em naxwazin bikevin nav  
wan refîn nîzm û erzan de. Niha  
em dikarin bêjin ku, ê din roja  
pêşveçûna me ji me re pir ronî  
buye û em li ser vê reyê pêşde  
diherin.

Xebatêñ ku yekîtiya me da-  
niye pêsiya xwe pir in, lê  
heke em karê xwe rasibikin em  
wê biserkevin.

Niha ji ez wê bernama ko-  
misyonêñ Yekîtiya Rewşenbîrêñ  
Welatparêzêñ Kurdistan pêşkê-  
şî we bikim:

## BERNAMEYA XEBATÊ

### 1- Xebatêñ konevanî ji bo dezgeha ragihandina cîhanê:

- Nasdana Têkoşîna Riz-  
gariya Netewa Kurdistan,
- Pêdakirina derdorêñ dos-  
taniyê,
- Agahdarî bo dezgeha  
ragihandinê,
- Pêkanîna livbaziyêñ hev-  
kariyê (weke civîn, xwepêşdan,  
şev ûhw.)

### 2— Derxistina kovarekî bi navê "REWŞEN" li ser van bin- gehan:

- Lêkolîna civakî, dîrokî,  
torevanî, ramyarî û aborî,
- Nîvîstêñ folklorî û hu-  
nerî,
- Tendurustî (saxî) û bi-  
jîskî,
- Dadmendî û mafdarî,
- Civat, jin û zaro,
- Ziman, wêje û rîzmanan,
- Nûçeyêñ ramyarî, civakî  
ûhw.,
- Hevpeyîn û pêwendiyêñ  
bi xwendevan û rewşenbîran re  
û perwerde kirin.

### 3- Ziman, dîrok û wêje ya Kurdî:

- Derxistina pirtûk û fer-  
hengan,
- Hînkirina zimêñ bo zarok  
û mazinan,
- Wergerandina berhemêñ  
bi tipêñ Erebî û Kirîñ bo tipêñ  
Latîñ,
- Xebata bo bêhtir bikar-  
anîna zimanê Kurdî, di nav refîn  
tevgera netewî de,
- Xebata bo bêhtir dan û  
standina nav zaravêñ Kurdî de,  
bi armanca yekkirina zimanê  
Kurdî û derxistina etnografiya û  
termînolojiya Kurdî,
- Alîkarî bo nîvîskarêñ Kurd,  
bo pêşvebirina xebata wan û  
xwedî derketina li berhemêñ  
wan,
- Hûrkofîn û lêgerîna li ser  
dîroka Kurdistan,
- Xebatêñ bo damezrandî-  
na yekîtiyeke nîvîsevanêñ Kurd  
û bi reya vê yekîtiyê girêdana  
pêwendiyêñ bi sazumanêñ ni-  
vîskarêñ navnetewan re.

### 4- Tendurustî (saxî) û bi- jîskî:

- Komkirina dermanan,
- Dermankirina nexweş û bi-  
rîndaran,
- Birêvebirina xebatêñ ci-  
vandina alîkariyêñ diravî,
- Xebatêñ birabirîn û pî-  
şange kirina qirkirinan û derketi-  
nalî dijî bikaranîna çekêñ kîmye-  
vî,
- Xebatêñ ji bona ku bijî-  
kîn Kurd tevî têkoşîna rizgariya  
netewî bibin,
- Amadekirina alîkariyêñ di-  
cîh de (ambulans).

### 5- Dadmendî û mafdarî:

- Nasdana bikaranînen de-  
rî-mirovahî, hingavtinan û buye-  
rên dagehan di cîhanê de û dij  
derketina wan,
- Ji ber van bikaranînan, se-  
rî dayinali ba saziyêñ navnetewî,  
weke yêñ mafêñ mirovan ên ku  
piştgirtiya mafêñ bendîyan di-  
kin ûhw.,
- Pêwendiyêñ bi saziyêñ  
navnetewî yêñ mafdarî û dad-  
mendî,

- Amadekirina encumenêñ  
payketina rewş û kirinêñ dij  
mafêñ mirovan,
- Hevkarî û piştgirtina ben-  
diyan û malbatêñ wan.

### 6- Xebatêñ wergerandinê:

- Wergerandina nîvîsîn ko-  
vara REWŞEN,
- Wergerandina nîvîsîn ak-  
tuel li ser Kurd û Kurdistanê,
- Wergerandina pirtûk û ko-  
varan,
- Amadekirina derfetên per-  
wendekirinê bo komên werger-  
vanan.

### 7- Perwendekirin û hînkirin:

- Vekirina kursêñ bo xeba-  
têñ yekîtiyê,
- Amadekirina pirtûkên di-  
bistanî,
- Amadekirina pirtûkên za-  
rokan,
- Pêwendiyêñ bi sazuma-  
nêñ perwendekirinê yêñ nav  
netewan.

### 8- Çand û huner:

- Alîkarî bo xebatkarêñ  
çand û hunerê,
- Xebatêñ wênexanî, şano,  
govendî û piştgirtiya perwendeyî  
bo xebatkarêñ di vê warê de,
- Nîvîsandina hunera folk-  
lorî.

Zor spas

Dîsem

**Axaf  
û  
mesajên  
din,  
yê  
di civînê de  
hatin  
xwendin  
ev in:**

**Ji bo çi me vê yekîtiya  
rewşenbîran ava kir?**

Herwekî em dizanin îroj li Kurdistanê têkoşîna serxwebûn û azadiyê hergav pêşde diçe û hîn xurttir dibe. Di vê têkoşînê de gelê me di binê alên pêşengên xwe de, xwe dike yek û bi rengekî bi rûmet li ber xwe dide. Îroj em dibînin û dibihişin, ku pêşmergeyên gelê me yêng qehreman, lêdanên mazin li kedxwariya faşîştixin û bi vî awayî mirina neyarê Kurdistan a ku xuya buye hîn nêziktir dikin. Em baş pê dizanin, ku gelê me êdî bindestî û xwesiparî nema dipejirîne. Bi armancênuh û şorêkî nûjen serî hildide. Bi rastî, ez li vir naxwazim li ser qehremaniya gelê me zêde biaxivim, ji berku di dîroka berxwedana Kurdistanê de qehremaniya gelê me diyare. Gotina min eve, ku di têkoşîna vê dema îroyîn de keyseke nuh û bi rastî ji ya dawî ketiye destê me. Girînge em vê keysê bêhode nekin. Ger vê carê ji em doza xwe wenda bikin, bila em bizanibin, ku wekî hinek gelên cihanê navêne me ji ji nav rûpelên dîroka cihanî dê bê wenda kirin. Ev dê ji gelê Kurdistanê re bibe tofaneke mazin. Baweriya min eve, ku mirovên dirust dê bi vê qederê nerazî bin. Ji ber vê yekê, dibê ku em Kurd tevde bi ruh û can xwedî li mafêñ têko-

şîna serxwebûna Kurdistanê derkevin.

Mafêñ rewşenbîrê Kurdistan jî di nav ên serxwebûna welat de ye. Îroj kîjan mirovê rewşenbîr dikare bibêje, ku hîzr û daxwaziyêne me azad in. Na, di her welatekî de ciyêñ rewşenbîrê pêşverû xuya ye. Ji ber ku rewşenbîr neynîka welatan in. Ev, li welatê me ji wisa ye. Em dikarin bibêjin, ku di têkoşîna serxwebûna Kurdistanê de barêñ giran li ser milêñ rewşenbîrê welatparêzan e. Divêt ku rewşenbîrê me ji bi vê baweriyê bi rê bikevin û van erk û delametên xwe bi cih bînin. Lî belê di vê dema girîng de mirov nikare bibêje, ku rewşenbîrê me erkên xwe bi cih dihînen. Tev hatine belav kirin û yekîtiyek nîne. Bi rastî ev kêmâsiyeka pir mazine.

Hevalino! Îro buye girîng, ku em yekbin û hêzên xwe bo têkoşîna şoreşa Kurdistanê re pêşkêş bikin. Ji ber ku rizgarî û serkeftina rewşenbîran di nav refê şoreşê de ye. Ger rewşenbîr erkên xwe yêng dîrokî bi cih nehînen, di nav navêñ rewşenbîran de dê şermek mazin be û di dawiyê de tu kesek ji wan di bin vî barî de dê nikaribe rabe.

Ya dinê ji, mirov hertim li ser çand, ziman û edebiyata Kurdf radiwestin, dîriyîsin an ji di her babetê de dihînen zîmîn. Ji ber ku ev pirs ji pêwîste. Dîsa hindek kom û komik hene tenê van tiştana kirine karê jîyanâ xwe. Daxwaziyêne wan herdem ev in. Ji wan pêşdetir narin. Ji ber ku nayê hesabêñ berjewendiyêng çînînen wan. Di bîr û baweriya wan de, her tişt di nav pirsên çand, ziman û yêng wekî din de ye. Her wisa rizgarî bi dest dikeve û daxwaziya xwe li ser vê yekê ava dikin. Tu kesek nikare ji bo mafêñ çînî yêng teng dev ji mafêñ neteweşî berde. Rizgarkirina gel ji di serxwebûna Kurdistanê de ye. Bila em baş bizanibin, ku têkoşîna warê çand, ziman û wêjeyî parek ji şerê serxwebûnê ye. Yê girîng di hewla wê de be. Armançêñ din xizmeta reformistî û oportuniştiyê dikin. Ev bîr û baweriyêng pir çewt in û li dijî doza serxwebûna Kurdistanê ne. Mirov dikare bêje, heke Kurdistan neka serbixwe û azad ava nebe, çand, ziman û wêjeyî ji tu caran serfiraz nabin.

Belê me got, ku îroj rewşenbîrê Kurdistan gelek ji hev belav buyîne û yekîtiyekâ welatparêzî di nav xwe de cênekirine.

Kesek nizane, ka kar û xebatêwan ji bo çi ne. Dilxwazîn xebata şoreşerî ne an ne!? Ên ku li Ewrupayê dijin, hinek ji wan xwe berdane nav jiyaneka rihetî de, bîr û baweriyêng netewîji berberjewendêñ çînayetiya xwe wenda kirine. Hinek ji hene dibêjine xwe "welatparêz." Bi vî awayî gelê me dixapînîn û bi navê Kurdistan jîyanâ xwe ya kesanîbi rî ve dibin. Daxwaza wan hertim ewe, ku Kurdistan ji bo sôdêñ xwe bi kar bînin. Ji hêlekê dijmin û ji hêla din ev derdorê, ku dibêjin em rewşenbîr in, welatparêz in, keda gelê me dimijin. Ev derdor kîne? Rastî em gişt vanan baş nas dîkin. Herdemê ew xulamtiya sosial-demokrasiya Ewrupa dikin.

Ji bona berjewendêñ xwe yêng piçûk û erzan, dixwazîn têkoşîna serxwebûnê rawestînîn. Ev kes û derdor ji hêla me ve xweş têñ nas kirin. Hinde rewşenbîrê welatparêz ji hene hewcîyê hin alîkarî û xebatêne. Dixwazîn tiştina bikin û dîkin ji, lî belê ji ber ku bi serê xwe ne, mirov bi asanî dikare bêje, ku kêmâsiyêñ wan ji pir in. Berî her tişt, rind nizanîn, çawa karêñ xwe pêşve bibin û çawa xebata xwe bi xebata gele xwe ve girê bidin. Ji ber ku karêñ xwe bi serê xwe dîkin, hêzên oportuniştî û her wisa wan dixapînîn û hunerên wan ji xwe re bi kar dihînen, bi genîmîn wan bênderêñ xwe radikin. Ji ber vê yekê ji ew karêñ baş ên ku dibin an tar û mar dibin an ji bêdeng û bêxwedî diminîn.

Îro, zor girîng bûye, ku rewşenbîrê welatparêz xwe bigîhînin hev, yekîtiyekâ di navâ xwe de çêkin û xebata xwe pêşve bibin. Ev ji cih girtina di nav refê yekîtiya rewşenbîrê welatparêzê Kurdistan de dibe. Bi vî awayî dikarin hêzên xwe bi têkoşîna rizgariya netewî re girê bidin.

Hevalino! Çand, ziman û tora Kurdf ji me re pir girîng in, lê ji serxwebûn û azadiya Kurdistan bi rûmettir tiştê nîne.

Bijî Yekîtiya Rewşenbîrê Welatparêzê Kurdistan!

Zor sipas

Nazif



Welatparêzê hêja,

li gor merc û nîrêñ ku îro welatê me tê de ye, ne tenê rewşenbîr û ronakbîr, lê hemû mirovên qada Kurdistanê, divê xwe li hember vê rewşa dîrokî i xerab bigirin û jîyanê bi réxistin bikin. Ev roja ku mirovên me yêng xwînfidîkar û canfidîkar, bi lehengî li dijminê herfî mazin dixin û tenê bi vê bîr û baweriya wan ya serxwebûnperestiyê, hêvî didin me hemû mirovên welatê xwe. Yanê bi kurî erk û wezîfeyen me, hemû mirovên welêt ev e, ku xwendî li riya rizgariya herfî rast deren. Yanê serxwebûnperestiyê!

Her wisa li vir, ji bo, di riya têkoşîna serxwebûnperestiyê de, bi şêweyeke xurttir yekgirtina hemû hêz û hebûn û nîrxên welêt, damezrandina Yekîtiya Rewşenbîrê Welatparêzê Kurdistan gaveke gelekî girîng e.

Ji bo gelê me pîroz!

Gelekî spas

Bavê Barzan

tiştekî hindik e,

— Ku nexşa Rojhilata Navîn, a ku li gor berjewendiyê imperyalîstan hatî çê kirin, ji binî de diguhêrîne,

— Ku Tirkîyê, segê NATO ê herî qelew û har, amade ye her gavê pêlangê emperyalîstan pêk bîne û hwd.,

pêk nayê gava ku rewşenbîrê Kurd ji xwe re neke arman-ceke serekîn ku pêwîste gelê Kurdê, ku bi bombên şîmîk tê qirkirin, bi zimanê xwe bixwînin, binivîsin û pê doza rizgariya gel û welêt bikin. Doza me di reya zimanê dagîrkeran re kok (qet) bi ser naakeve. Vêga, divê em avê li ber dilê xwe nereşîn ku ev barekî sivik e. Ne ku em dixwazin tiştan mezin bikin bi qasî ku em dixwazin rastiyê diyar kin.

Min destûra Yekîtiya Rewşenbîrê Welatparêzê Kurdistanê xwend. Ji destpêkekê re, ev gaveka rind e. Gava dudiyê ya rîndir ew e eger rewşenbîrê me hemî dest bidin hev, xamên xwe bikin yek, û bi hev re xebateke rewşenbîr ku dikeve warê serxwebûn û rizgarkirina gelê Kurd, di hemî aliyan de, bikin.

Ji aliye pêşniyarê min derbareyî vê rûniştinê de, herwekî mirov, ku ta kîjan tengê karîna yekîtiyê wê hebe, nizane tenê ez bi çend pêşniyarân bes dikim:

1- Kovareka Kurdî; yeka mehî, bi navê HELEBÇE:

— Bi tîpên Latînî,

— Wê çêtir be eger bi her sê zaravan be; Kurmancî, Soranî û Dimîlî,

— Quncekî zimanzanî tê de hebe ku mirov di wî warî de nêrinê xwe bide; ne ku em bîryaran bistînîn,

— Beşen dinê jî tê de hebin rind e, wekî; çîrok, folklor, birname, belge, helbest, karên hunermendant û hwd...

2- Çapxanek ji bo belavkirina pirtûkan. Ev, bi nêrîna min, tiştekî pir giring e.

3- Hêviya min ji hevalan heye ku karên xwe xweş bikin û berê wan karan yekîtiyê hêja bide.

Dawî serketin û pêşketina xebata we hêvi dikim û silavê xwe yên şérîn ji hemî biraderên besdar re dişînim.

Birayê we

Amed  
Parîs, 5.4.1988

Xuh û birayêن hêja û bi rêz, ez silavên germ ên xwe ji we gişa re pêşkêş dikim û serdestiyê ji we ra dixwazim.

Bi rastî ev maya dilgesî yê gişa ye, ku em gihaştina ev roj, ku kanibin komelekî çêkin bi na-vê Yekîtiya Rewşenbîrê Welatparêzê Kurdistan-YRWK.

Bi rastî rewşenbîrê her geleki paya û bingeha serketina wan gelan bûn.

Erk û barê pêşketina her welatekî pirtir dikeve ser şan û milên rewşenbîran û xwendevanen ev welat.

Di vê gavê de gelê me yê Kurd hîn di bin desten dagîrkarê Tirk û Tat û Faris de ye, pêwîstiyekî pir giran dikeve ser stuyên rewşenbîrê me yên Kurd.

Rewşenbîrê me Kurdan riya pêşa yê nezanen me bikin, çand û dîroka gelê me yê rast ji zar û xorten me re binivîsin. Lî gereke em di vir de bibêjin, ku kesekî xwe rewşenbîr dizane û xebatê bo rizgariya Kurdistan nake ew ne rewşenbire, ew wek karekî ku barê wî pirtûk be.

Em iro naxwazin li ser dîrok û çanda gelê Kurd pir bipeyivin.

Em li vir dibêjin, ku gelê Kurd geleki pir kevne û gelek ji kevin-tirîn gelên Rojhilate.

Gelê Kurd weko hûn dizanîn, xwedîyê dewlet û çandekî pir mezin bû. Dewleta Med dewle-tekî pir gewre bû. Di gava Med de dadgeh hebûn. Yekekî gunehdar, ku biketa pêş dadgehê we dikarî parêzkarek ji xwe re bigirta. Pişti çuyîna dewleta Med, dewleta Fars, wek anha dewleta Tirk çanda gelê Kurd dike yê Tirk.

Em dibînin, ku çand û dîroka Kurd çende şerîne û xweše.

Gava ku hunervanê Kurd dîlanê dikin an distirê an diley-zin, em dibînin ew jî wek yên gelên din pir xweş in.

Bi kurtî gereke em bi gişt hêz û tiwaniyê xwe xebat bikin, ji bo rizgarkirina Kurdistanê û pêşxis-tina çand û zimanê Kurdi.

Em gereke zanibin, ku em te-nê bi riya yekîti kanîn pêwistiyê xwe bi cih tênin.

Hevalên hêja, civîna we ji kûraniya dil pîroz dikim û hêvîdarim civîna we bibe hîmê rêkxistîneke ku sûdê bigi-hîne ziman û çanda netewa me.

Gelê Kurd iroj di koçeke pir dijwar re derbas dibe. Ew erke li ser milên merovê rewşenbîr ku ew di têkoşîna gelê xwe de roleke pêşeng bilîzin. Daxwaza dil ew e ku hûn bi şêweke layiqe dawiya sedsala 20'an biponijin; ku hûn dema xwe di got-û-bêjîn bê kelk de wenda nekin; ku hûn hêz û enerjiya xwe bo avakirina rêxistîneke welatparêz têxîn xebatê, rêxistîneke ku di pratîkê de sûdê bigihîne netewa me.

Bo kar û xebata we serketin û pêşveçûnê daxwaz dikim.

Jiyan bo Kurd û Kurdistanê.

Birayê we

**Şahînê B. Soreklî**  
**Parîs, 8.4.1988**

Xwuşk û birayên xwoşewîst, Mêhvanen hêja û delal,

hun gişt li ser seran û çavan hatin civîna pîrozkirina amadeki-riña Yekîtiya Rewşenbîrê Welatparêzê Kurdistan. Berî niha jî rewşenbîrê Kurdistan xwe bi çend navan tevgerandibû, lê wan xwe bi tenê hiştin û xwe ji gelf xwe bi durxistin; xwe axa, şêx, mela û beg dinasîn û her-yeke ji malbateka xîzan ji xwe re kole dihejmartin.

Lê niha, wek em dibînin, day-kên Kurdistanê bi hezaran wek Kawa anîn dine, bi hezaran rewşenbîrê me pergele bûne li Kurdistanê û dervayî Kurdistanê. Lê bi xêra Eniya Rizgariya Netewa Kurdistan bir û bawerî bû yek, erê bû yek, li kêleka xebata wanana, çandî û torî xebata wan welaflî heye. Heryek ji van rewşenbîran pêşmergeke ji wan pêşmergên serxwebûnê li Kurdistanê. Em nema ê din xebata xwe bi dizî bikin, em bûn milkê şorêşa serxwebûnê, gotarêne me bi karî me re cotê serhîdanê dajû heya nefesa dawî.

Ji bo vî karî pêwîste em rabin Cotkar

*Hinde Helbestênu  
ku di roja civîna  
YRWK de, ji hêla  
beşdaran pêşkêşî  
civînê û  
mêhvanan bûn:*

**Ji bona yekîtiya rewşenbîrê Kurdistan**

Piroz be avahiya komela we  
Xebat bikin ji dil bo gelê me  
Me dil geş kin li pêş bi hunerên xwe  
Hûn gelekan ji me têxin nav refêx xwe  
Rêka we bibe bingeh û hîm  
Alîkarvanê we bin ci ji Efrîn û Mêrdîn  
Li dor we bi civin ci ji Sablax û Hemîn  
  
Kêyfxweş bibin ji we re yên weke Xemgîn  
Kes nekin heywax, nañîn û girîn  
Di dilan de memînin kul û birîn  
Bigihênen daxwaza xwe serxwebûn  
Serbest bijîn em di nava ev jîn  
  
Herin xwendegeh herin dibistan  
Bi me xweş dibe jîn li Kurdistan  
Rêberiya me bî Partiya şehîdan  
Jin û mîr dest bihevdir wek xwuşk û biran  
Biji tevgîra hemî netewan di cihan  
Mîrin ji bo xwînmij û çasañ  
Biji Komela Rewşenbîrê Kurdistan

**Xemgîn Welatî**  
**9.4.1988**

**KURDO RABE !**

Kurdo rabe mîzgîn li te  
Mahmoste, hunermend tev rewşenbîrê te  
Civîne! Reben, perîşan, karker û cotkarê te  
Dane ser milêñ xwe, mercêñ azadiya te  
Hevin lawêd Mîd û Deylem, Zerdeş û Kawa'yê te  
Roj-bî-roj canfidane li çol û deştan, li çiyayê te  
Sotkirina gundê Pîran, qewtandina dused hezar Kurd li  
Cizîrê, panevoka Mihabadê, kuştina mendalan li Zaxo,  
îşkenca zindana Amedê, bûn bizot, dişewtînin  
kezebêñ rewşenbîrê te  
Kurdo! Rabe, ew ewrêñ reş, sitemkariya salan, nezaniya gel,  
hêdî-hêdî tarî dibe li ezmanê te  
Sonda me ya dawî, emê pêñûs û defterin xwe, can û birîn  
xwe, bikne pêşeng ji bo rizgariya te  
Bi hêza artêşa rizgariya gel, emê te cî bikin di mejjî yê  
dost û dijiminê te  
Laşen cehşokan, karin kayan, derewêñ tevgerêñ êl perestan,  
pêwendiyêñ şovaran, li gel zordaran, emê dînîn ber  
lingêñ te  
Piroz be li te, ev bax, baxê nemir Dogan, tijî gîlîk bûye,  
ji bo xweşîya te  
De zû rabe, xwe bilind çeka, lehengêñ têkoşînê li hêviya te.

Cotkar

**Welat nadim**

Welatê min buhaye ew  
Bi misk û enberê nadim  
Wekî dayka min û bave  
Bi zêr û cewheran nadim  
Dema cejnê û şeyhanê  
Bi keçkên nazîn'n nadim  
Ci zore ev... ci talane?  
Piyala kewserê nadim...

Bi ava kewser û zemzem  
Welat hersal ditê şuştîn  
Xwîna lawîk û keçkân  
Ji boyî gel ditîn kuştîn  
Ji dildarî û xembarî  
Bi rext û xencer û piştîn  
Ji boyî Kurd û Kurdistan  
Hemî dinya li şun hêştin...

Welatê min bilindî tu  
Wekî Agî ji zozaña  
Bi eşqa xwe tu namdarî  
Wekî Xanî bi destana  
Gelek mîrxas û dilşêra  
Ji Kurmanca û Sorana  
Ji boyî te dibin gorî  
Li qadêñ şer, li zîndana...

Neyar hatin bi pîlanan  
Bi zêr û mal û davêñ xwe  
Hema Kurdêñ welatê min  
Welat nadîn bi çavêñ xwe  
Neyar hatin bi sedrengî  
Bi rovitî û cîlkîn nuh  
Hema keçkên welatê min  
Welat nadîn bi zavêñ xwe  
Neyar hatin me berdin hev  
Kur û bavan li dij hevdû  
Hema lawêñ welatê min  
Welat nadîn bi bavêñ xwe...

**Cankurd**

Piroz be ev xebat û tevdîr  
Herhebe saziya rewşenbîr  
Pêşketine bi bawerî û birî  
Ji bo welêt pêkhatî

Hezar sale em dilbirîn  
Em guhdarbûn rojek mîzgîn  
Tev besdarbûn roja şêrîn  
Pêñûs bo me bi xebîñî

Mêjjî girt zeng û gemar  
Xwe berdabû çav û damar  
Navê wêye xewa dijwar  
Gelek salan tev raketî

Carek bi xwe nebû bawer  
Ronakbîran xwe nedan ber  
Agir berdan dil û ceger  
Bi şev û rojan dişewtî

Dijmin dîkin fen û deka  
Xweş zanabî tuşî keka  
Qelek kefî şûna çeka  
Ê ku xwendî bi pêşketî

Yekîti, biratî pîr xweş e  
Wek cejna pîroz û geş e  
Ji bo serxwebûn û azadî  
Wek find û çira vêketî

Dibore dema kar û xebat  
Bi xwîna şehîdan roj helat  
Bi nîvisîn li ser welat  
Her tişt wekî rojê derketî

Gel birçî, jar û mest  
Tev tirs û talan û west  
Welat hê nîne serbest  
Bimre kedxwarî û kevnepereşî

**Herbijî**

# Nûçeyên çalakiyan ji Kurdistana Bakur

Gûlan 1988

**Şemzînan:**

Li navça Bênavik bajarê Şemzînan şerekî mezin di navbera pêşmergeyêñ ARGK û hêzên mêtînger ên Tirkan de derket. Dijmin bi balafiran êrîşî pêşmergan kir. Şer bêhtirf 24 seetan doma. Pêşmerge şerîn xwe sing ber sing domandin. Bi bombêñ narîcî hinde pêşmerge şehîd ketin. Weke agahiyêñ gihan me, diyar dibe, ku bêhtirf 100 serbazên dijmin hatin kuştin an jî birîndar ketine.

**Cizîra Botan:**

Pêşmergeyêñ ARGK êrîşek anîn ser bajarê Cizîra Botan. Milîsîn bi navêñ Ahmet Zeyrek, İdrîs, Hadî Zeyrek û Ahmet Gezer, ku serokên "parêzkarêñ" gundêñ Şîrnexê bûn, hatin kuştin.

**Dêrika Çiyayê Mazî:**

Şerek digel hêzên taybetî derket. Dora 50 heya 60 serbazên dagîkaran hatin kuştin. Dijmin balafirêñ xwe bikaranî û narîçok barand. 5 têkoşerên ARGK jî şehîd ketin. Pişti şer, mêtînger dora gundê "Bayraklı" zivirandin û gelek gundiñ girtin.

**Şîrnex:**

Şerek digel hêzên taybetî derket. Komek ji hêzên dijşoreşgerî kete destê pêşmergan. Hinde endamên hêzên taybetî jî hatin kuştin an birîndar kirin. Rojnameyêñ mêtîngeran nivîsandin, ku du (2) dijşoreşger ketine destê hêzên ARGK.

Herweha êrîşek jî çû ser bajarê Şîrnexê. Livbaziyen konevanî hatin birê ve xistin. Pişti bûyerê leşkerên mêtî-

geran dest bi operasyonan kirin.

**Serhed:**

Li ser çiyayê Araratê (Ağrı), dorê kampêñ turîstêñ Frensi ji hêla pêşmergeyêñ ARGK hate zivirandin. Pişti bangeşıya ramyarî, turist ji baniyêñ ciyê xwarê ve hatin daxistin û çûn bajarê Bazidê.

**Misric:**

Di navbera bajarêñ Sêrt û Misricê li navça Serê Pirê, şerek di navbera hêzên ARGK û hêzên taybetî yêñ dijmin de derket. Gelek leşkerên dijmin hatin kuştin an jî birîndar kirin.

**Ararat:**

Pêşmergeyêñ ARGK, li gundê "Dîbelek" navça Tuta-xê bajarê Agrî êrîşek birin ser şantiyeka dijmin û hemû hacetêñ kar sohtin. "Parêzkarî" gundan jî hate kuştin.

**Dep:**

Erîşek çû ser karakola "Çan". Pêşmerge di êrîşa xwe de roket bikaranîn. Avahiya karakolê hate hilweshandin û herifandin. Gelek serbazên dijmin hatin kuştin.

**Dara Hêne:**

Pozberiyek li dora gundê "Bax" çêbû. Ser dora 10 seetan doma. Balafirêñ dijmin jî têkîlî şer bûn. Gelek endamên hêzên taybetî hatin kuştin. Rojnameyêñ mêtîngeran duxuyan kirin, ku 2 leşker û 4 şoreşger hatine kuştin.

**Hezîran 1988**

**Mistbîn:**

Li dora gundê "Kuyulan" navça Mistbîne (Nisêbîn) şe-

rek derket. Hêzên dijmin bi yêkîtiyêñ xwe yên bejî û asmanî êrîş kirin. Têkoşereki ARGK şehîd ket û gelek leşkerên dijmin hatin kuştin.

**Mêrdîn:**

Hêzên dijmin li derdorêñ navçêñ Dêrika Çiyayê Mazî, Kosar, Mehsert, Gercews, Midyad, Cizîra Botan, Hezex û Mistbînê operasyonêñ leşkerî birê ve dibin. Roj bi roj dijmin hêzên xwe têkuz dike. Çiyayê Meval û Nevala Hespistê bi hêzên dijmin tijî bûne.

**Şîrnex:**

Ji ber ku gelek xortêñ Kurd ji bajarê Şîrnexê xwe digihînin şoreşê, mêtînger tedbirêñ nuh bi kar dihînen. Waliyê mêtînger Hayrî Kozakçioxlu li bajarê Şîrnexê hinde civîn çekir, daku keyên gundan alîkariya mêtîngeran bikin. Ji ber ku keyên gundan li ser şopa vê daxwaz û xebatê neçûn, hatin tehdit kirin.

**Dihê:**

Di navbera navçêñ Dihê û Şîrnexê de, li êrdima "Dîren" çar "parêzkarêñ gundan" ji hêla pêşmergeyêñ ARGK bi mirinê hatin ceza kirin.

**Ararat:**

Komek ji turîstêñ Almanî, Frensi û Belçikî, li Çiyayê Araratê ji hêla pêşmergeyêñ ARGK hate zivirandin. Pişti axafêñ digel turîstan, pêşmergeyean wan ji ciyê vegerandin bajarê Bazidê.

**Dara Hêne:**

Pêşmergeyêñ ARGK êrîşek birin ser cihe karê rîl û rîlistan (darîstan). Dewleta Tirk li gundê "Bînekî" bi armanca birrîna darêñ Kurdistanê navendeka dar birrînê avakiriye. Ji bo rawestan-

dina vê daxwaza dijmin, pêşmergeyêñ ARGK xebateka dijwar birê ve dibin.

Hemû hacetêñ dar birrînê hatin sohtin û durê jî li gelek gundan, digel gundiyan û kargerêñ rîlistan civîn hatin çekirin.

**Çewlik:**

Pêşmerge mayinek li ser riya ku diçe bajarê Çewlikê vegirtin. Yekîtiyekâ hêzên dijmin a operasyonan rastî mayinê bû. "Parêzkarêñ gundan" hate kuştin. Gelek parêzkar û serbaz jî birîndar ketin.

**Wan-Elbak:**

Li navça Elbakê şerekî ku 2 rojan doma derket. Balafir û helîkopterêñ dijmin jî têkîlî şer bûn. Dihê gotin, ku gelek leşkerên dijmin hatine kuştin.

**Cizîra Botan:**

Li bajarê Cizîra Botan heft "parêzkarêñ gundan" hatin kuştin. Pêşmergeyêñ ARGK êrîşek birin ser baregeheka leşkerî, ku dersa dijşoreşgerî li wir dihat dayin. Weke nûçeyêñ gihan me, gelek kes ji hêzên dijmin, birîndar ketine.

**Şîrnex:**

Erîşek çû ser bajare Şîrnexê, lê heya niha nûçeyêñ berfireh negihane Kovara me.

Herwusa, di livbaziyêka duwemîn de, komek ji hêzên taybetî hêşîr kete destê pêşmergeyêñ ARGK. Dawiya şerekî giran hêzên dijmin şikesitin û komek jî hêşîr pêşmergan bû.

Roja 18'ê Hezîranê jî mayinek li ser riya bajêr hat danîn. 2 cemsîn leşkerî rastî mayine bûn. Mînîbusek jî rastî mayinê bû, 7 kes hatin kuştin 3 kes jî birîndar ketin.

# 85 dîliyên şer, endamên PKK di girtîgeha Eskîşehîrê de dest bi berxwedanekê kîrin



Berxwedana xwe birçihîştinê roja 19'ê Hezîranê destpêkir. Berxwedan ji hêla 3 koman dihê bilindkirin: Koma yekemîn 38 kes, koma duwemîn 22 kes û koma sêwemîn 25 kes. Dîliyên şer, ên ku li ber xwe didin, armancêن xwe bi reyên dizî gihadîn derveyî girtîgehê. Belavokeka dirêj, a girtîyan giha der ve û bi vî awayî duxuya-niya wan xwe gihad dezgeha ragihandinê. Dîliyên şer, di belavoka xwe de diyarkirine, ku heyâ daxwaz bicih neyin, ew wê berxwedana xwe bidomînin.

● **Armancêن konevanî yên berxwedana xwebirçihîştinê:**

- 1- Pejirandina statûta girtîyan politikî û statûta dîliyên şer.
- 2- Bi gelempêrî li teviya Tirkîyê û Kurdistanê, bi taybetî jî li girtîgehê bajarê Eskîşehîrê rakirina bikaranîna yek-cure cil.
- 3- Guhartina zagona înfazê.
- 4- Rakirina hîquqa heyî bi teviya xwe, ku bireka sistêmê ye.

● **Malbat û merivêñ girtîyan, ku bûne bireka berxwedanêñ zindanan, dest bi livbaziyêñ hevkariyê kîrin.**

- Dîliyên şer, endamên PKK, ên di girtîgehêñ bajarêñ Dîluk, Ruha, Amed û Bursa de jî, ji bo hevkariya girtîyan li Eskîşehîrê, dest bi livbaziyêñ hevkariyê dîkin.

- **Berpirsiyariyêñ ERNK, ên li Tirkîyê û Ewrupa belavok li ser berxwedanê derxistin. Bang li hemû hêzên şoreşer û demokrat û gelê Kurdistan dîkin, ku hevkariya berxwedana dîliyên şer bê kirin.**

Weke di hemû girtîgehêñ mêtîngeran de, li girtîgeha Eskîşehîrê de jî mêtînger dixwazin viyana girtîyan seranser tunebikin. Ev girtîgeh buye navendeka zîlm û zorê ya dijwartîrîn. Dîliyên şer li vira bê mafêñ girtîyan hatine hishtîn. Azînên taybetî dihêñ bikaranîn. Girtîyan dixin hicran de. Peyva di nava girtîyan de hatîye qedexe kîrin, û bi vî awayî dixwazin girtîyan bi dest xwe ve bînîn, ku girtî bêbextiyê li doza welat û li kesaniya xwe bikin.

Politîka û bikaranînen faşîstû mêtînger yên li vê girtîgehê, ji bo demeka dirêj hatine danîn. Zagonêñ dijwartîrîn û hisktîrîn di-xwazin pêsemîn li Eskîşehîrê bikarbînin. Ji ber ku ev girtîgeh ji serî ve ji bo vê daxwazê hatibû avakîrin.

Girtîgeha Eskîşehîrê qulibandine laboratuvarekê, ji bo melûl-kîrin û tunekîrina girtîyan. Ji ber vê yekê hemû dîliyên şer, dest bi berxwedanekê kîrine.

**Navê dîliyên şer,  
yên ku têkilî  
berxwedanê bûne  
ev in:**

**Koma yekemîn:**  
Riza Altun  
Muzaffer Ayata  
Sabri Ok  
Hasan Şerik  
Faruk Ozdemir  
Metin Uluca  
Ahmet Cerenbeli  
Ali Toprak  
Ali Kastalîş  
Celal Salgut  
Kenan Sen  
Hasan Merdan  
Recep Nur Cengiz  
Mahmut Aktaş  
Seferi Yilmaz  
Yusuf Korkmaz  
İbrahim Bubo Aslan  
Mehmet Saït Korkmaz  
Kemal Aktaş  
Dogan Kiliçkaya  
Mustafa Sarıkaya  
Mehmet Akbaş  
Mehmet Şah Sürek  
Ahmet Çapan  
Mehdi Tanrikulu  
Akif Ozdemir  
Muhammed Karabulut  
Gafip Ogût  
Davut Utkun  
Ali Poyraz  
Hüseyin Acar  
Mehmet Toren  
Bedrettin Açıkcâ  
İskan Açıkcâ  
Sabri İşik  
Cemal Agcakaya  
Hamza Bîndal  
Riza Sarıkaya

**Koma duwemîn:**

Şükûr Goktaş  
Mûslûm Sezer  
Hasan Baran  
Mehmet Dîrlîk  
Bahri Tekdemir  
Ahmet Yilmazer  
Basri Çelik  
Mûslûm Erîklî  
Mustafa Isabert  
Hasan Kartal  
Mehmet Ozkan  
Mehmet Yalcinkaya  
Mûmin Agcakaya  
Muhitîn Dolaşir  
Ali Gün  
Mehmet Karabulut  
Süleyman Oner  
Lütfi Lale Yıldırım  
Mihrafi Yilmaz  
Seyfettin Înalkaç  
Yaşar Eroglu  
Yasin Bulut

**Koma sêwemîn:** 25 kes in.

# QIRKIRINA NETEWÎ LI KURDISTANA BAŞUR

Ji ber giringiya erdnîgariya welatê me Kurdistan, ji ber sedemên leşkerî û ramyarî, vebirkar û dagirkarêne Tirk, Ereb û Faris ên regezperest û nîjadperest, di dîrokê de her tim êrîşen xwe yên hov anîne ser gelê me û welatê me Kurdistan.

Hêzên emperyalist û mêtînger, welatê me di nav xwe de debaşkirine û xêr û berên welatê me heyâ dihê gotin dimêtin. Kedxwarî û mejokdarî niha ji her demê bêhtir hatiye kûrkirin û berfirehkirin.

Kedxwar û mêtîngeran hemû daxwaz û mafênetewê Kurd bi kotekê perçiqandin û şikandin. Armancêne dewletêne ku Kurdistan dagirkirine, her demê yek bû û yek maye: Dixwazin ziman, dîrok çand, tore, pîşe û hemû nirxên netewî û niştimanî li Kurdistanê ji holê rakin. Ji bona vê, qirkirinê komî, koçberkirinan ûhw. birêve dibin. Bi hemû rê û azînan dixwazin netewatiya me tunebikin û welatê me bikin ê xwe.

Hovitiya Îraqê li bajarê Helebçe li Kurdistanâ Başur, ji wan daxwazêneñ dijminan bû. Xwînxwar û hovîn Îraqî, çekêne narincî yên jehrê, weke tabun, asît-hidro-siyanîk (asîta hişîn), phosgen û lost (gaza kardiyân-xerdalê) barandin ser bajarêne Kurdistanê. Ev narincî heyâ niha avêtine ser bajarêne Helebçe, Xurmal, Duceyla, Qesrê Şerîn, Zerdeş û Mîrivan. Encamêne hovîtiyeka wusa li cîhanê kêm hatine dîtin. Bêhtirî 6.000 şîrmij, zaro, jin û kalên bê guneh kuştin, bi dehhezaran mirovên me birîndar kirin. Hovîtiyên wusa li Kurdistanâ Başur hîn ji berdewam dîkin.

Yên ku vê dirindetiyê pêkanîn û hîn berdewam dîkin, dijminen gelê Kurd ên dîrokîne. Ne tenê dewleta Îraq gunehbarê vê hovîtiyê ye. Weke ku niha derketiye holê, hinde welatêne welatêne emperyalist û dewleta mêtînger a faşist a Tîrkan jî hevparê vê hovîtiyê ne. Di rojnaman de derkete ronahiyê, ku hinek ji van jehran ji bajarê Mersînê ji Tîrkiyê anîne û dane Saddamê faşist.

Ji ber ku gelê Kurdistan şerê serxwebûn û azadiyê bilind dike û şer li hemû birêne Kurdistanê ges dibe, mêtînger jî bi hevre êrîşî gelê me yê belengaz û hêjar dîkin. Dixwazin gelê me bi pîkolî û gelqirkirinan ji serxwebûn û azadiyê dûrbixin. Lewma jî bilî hemû mafênetewan û gelan, li pêşîya tevayî cîhanê, bi çavşorî û bêhişî hemû mercen navnetewan datînin kîlekê.

Lê bila mêtîngeran har ên Tîrkan, Ereb û Faris baş bizanibin, tu hovîtiya wan wê nekaribe gelê me ji wê doza mafdar vegerîne. Tu hêz li vê cîhanê wê nekaribin serê gelê me yê kevnar biçemîne. Gelê Kurd ê serbilind wê tol û heyfa xwe li erdê nehêle. Bila hêzên kedxwar û destelat rind bizanibin, gelê Kurd wê serê wan biperçiqîne û Kurdistanâ delal ji wan re nehêle.

Em bang li hemû welatparêzan dîkin, ku têkoşîna şoreshî û yekîtiya netewî, li dijî mêtîngeran xurttir bikin û di şerê li dijî dijminan de pêşde herin.



## Gazên kîmyevî ku li Helebçe ji hêla rejîma Îraqê hatin bikaranîn ci bûn?

xwe di hewayê de belavdiye. Lewma navekî vê gazê jî, "gaza êrîşê"ye. Ji ber ku, pişî dihê bikaranîn pêde, leşkerêne ku bikar anîbûn, dikarin bi lez bêne wê érdima ku gaz hatibû bikaranîn.

### Phosgen:

Ciger û mîlakê mirovan rizî dike. Gelek zu mirovan dikuje. Navê vê gazê jî, bi rengê "gaza êrîşê" dihê navdan. Ji çend kîliyan heyâ seetekê posîdeyêne xwe didomîne. Piştre tune dibe.

### Tabun:

Gazekî hêrsê ye. Gava dihê bikaranîn, birekî piçûk ji vê gazê bi lez mirovan dikuje. Ji dev derbasî laşê mirovan dike. Gava ev gaz bikarhat pêde, li gora rewşa hewayê, ji seetekê heyâ 4 mehan posîdeyên xwe berdewam dike.

### Asît-Hidro-Siyanîk

#### Asîta Hişîn:

Gazekî xwînê ye. Di çend kîliyan de mirovan dikuje. Ji dev derbasî laşê mirovan dike. Qedera çend kîliyan de

### Lost/Gaza Kardiyân:

Kîliya bi rewşeka tundeyî dihê bikaranîn, mirovan dikuje. Ji çermê mirovan derbasî laşan dike. Birînê nola sohtinê derdixe holê. Gava mirovan li bin destê bijijikan be, pişî mehan û salan dîsa baş dibe. Ji laşê heywanan jî derbas dibe. Ji ber ku pişî bê bikaranîn pêde, demeka gelek dirêj hikariya xwe berdewam dike, navê vê gazê, "gaza parasînê" hatiye danîn. Ü érdima ku têde ev gaz bê bikaranîn, demeka dirêj ji bo mirovan bi xetere û mirov nikarin biçin wê érdimê.

# PARTIYA KARKERÊN KURDISTAN-PKK Û YEKİTİYA NİŞTIMANÎ KURDISTAN -YNK

## PEYMANEKE SORESGERÎ DI NAV XWE DE ÇEKIRIN

*Bi navê  
Yekîtiya Rewşenbîrên Welatparêzên  
Kurdistan-YRWK,  
em peymana li Kurdistanê  
pirozbayî dikan*

Sekreterê giştîya PKK Abdullah OCALAN û sekreterê giştîya YNK Celal TALABANî di roja 1'ê Gulanê 1988'ê de danezane kirin, ku herdu bîzav peymaneka hevkarî û piştgiriyê di nava xwe de çekirin.

Delegasiyona PKK bi serokatiya sekreterê gelemeriya PKK Abdullah OCALAN û delegasiyona YNK bi serokatiya sekreterê gelemeriya YNK Celal TALABANî, di nîvê meha Nîsanê de digel hevîdu danişin. Li ser gelek pirsên Kurdistanê hevdîtin, hevpeyvîn û axafên fireh çêbûn. Rewşa gêtî û Rojhilata Navîn, pergal û pirsgirekên Têkoşîna Rizgariya Netewiya Kurdistan, rêça veristin û çareser-kirina van kêşan, hatin vekolîn û hurkolîn. Pişti dawîkirina xebatêن vê nolê, demeka dirêj li ser têkîfî û pêvendiyêن di nava herdu bîzavan de axaf çêbûn. Nûner û berpirsiyârên herdu tevgeran dan naskirin, ku peymanek digel hev çekirin û peymanek bi vê nolê ji bo Kurdistanê divêtiyeka gelek gewre bû.

Peymana di navbera PKK û YNK de, di dîroka şerê serxwebûn û azadiya Kurdistan de, karekî gelek mezin û pîroze. Di demekê de ku gelê me dihe qirkirin û dijmin dixwazin yekîtiya gelê Kurd rind belavbikin, ev peyman diyar bû. Ev jî, ji bo gelê me remzeka hêviyê ye. Bê guman ev peyman, wê yekîtiya di navbera Kurdistanâ Başûr û Kurdistanâ Bakur de pêşve bibe. Ji xwe herdu tevger bi hev re bang li hemû kom, hêz, rêkxistin û partiyêن li Kurdistanê kirin, ku ew jî têkîfî vê peymanê bibin û bo yekîtiyê karêن xwe bikin. Herdu tevger dixwazin, ku hêzên Kurdi dubendî nexweşiyêن di nav refên Kurdan de, bi pêvendî, hevdîtin û riyên birayetiye rakin.

Hêvî û baweriya me rewşenbîran ev e, ku ev peyman di Têkoşîna Rizgariya Netewiya Kurdistanê de bigihe armancêن xwe û li seran-serî Kurdistanê yekîtiya gelê me pêşve here, ji ber ku tenha xebatên wusa dikarin ramanên gelê me lezîrîn nêzîk bikin. Bi navê kovara REWŞEN em vê peymanê pîrozbayî dikan û dibêjin jo bo yekîtiya gelê Kurdistanê pêşve! Yekîtiya me YRWK bi hemû derfetên xwe wê piştgirya vê peymanê bike, û bang li hemû mirovîn welatperwer û rewşenbîr dike, ku ci ji destê wan bê, pêşkêşî vê gava pîroz bikin.

Bi vê bawerî û daxwazê em belavoka peymanê jî, ku ji hêla PKK û YNK hatîye belavkirin, ji ber berpirsiyariya xwe li pêşîya netewê Kurd, di kovara xwe de diweşînin:



**Belavoka  
bi hev re  
li ser civîna  
di navbera  
Partiya  
Karkerêن  
Kurdistan  
(PKK) û  
Yekîtiya  
Nîştimanî  
Kurdistan  
(YNK) de**

Heyetek ji Partiya Karkerên Kurdistan (PKK) bi serokatiya Rêheval Abdullah OCALAN, di nîvê meha Nîsanê 1988'an de, li gel heyetek ji Yekîtiya Nîştimanî Kurdistan (YNK) bi serokatiya Rêheval Mam Celal TA-LABANî runişt: Bi hoyeka hevalî û canekî bilind ji berpirsiyariyê û bi agah-dariyeka xurt, ji bo pêşve birina bîzava rizgarî û demokrasiya gelê me, axaf çêbûn. Bi berbalanîna hemû rewşen konevanî, aborî, civakî û rewşenbîrî yên civaka Kurdistanê, pirs danîn ber çavan, ji dema ku dewletên emperialist di şerê cihanê yê yekemîn de biserketin û welatê me debaş û parve kirin û bi kotekê gihadîn hin dewletên Rojhilata Navîn, bêyî viyana gelê me û girsên wî ên fireh. Kolonyalist û dagirkaran herdemê nîr û pîkoliya xwe li ser gelê me domandine û li pêşberê pêşveçûna gel di warêne kone-

vanî, aborî, civakî û rewşenbîrî yê serbest de, herdemê çeper û asteng ava kirine û xwestine hemû hebûn û taybetiyê civakê kavil û hunda bikin, bingeh û nîrxên hebûna me yê netewayî hilweşînin, dîrok û çanda gelê me tim ji hev xistine û arkirine, heyawê gihanekê, ku xwe gihandine ajotina şerekî nîjadperest û faşîst li hemberê gelê me.

Şerekî bi tevayî ji bo tunekirin, qirkirin û rakirina gelê me, bi taybetî li Kurdistana Bakur û li Kurdistana Başur, birêxistine. Herwekî destêne xwe dirêjî hemû metodêni dij-mirovahiyê, mîna koçberkirina bi zorê, wêrankirina gund û bajaran dikan; konevaniyê erdê sohtî û mêtîngerî yê layandkar û reş, Erebkirin û Tirkirina Kurdistanê ji bo guhartina hebûna netewayî ya civaka Kurdistan bikar dihênen. Dagirkaran şerê xwe yê dijminî û nîjadperest gihandine gihanekêن pir bilind, heyawê koçbera bikaranîna çekêni kîmyevî, fosforî û gazên jehrê yêni navnetewan de hatine qedexe kirin. Ev tev, ji bo tunekirina gelê me û rawestandina tevgera rizgari û demokrasiyê dihênen kirin.

Herweha ji ber dijwarî û xedariya vê dema gelê me, ku bîzava wî ya rizgari û demokrasiyê jê derbas dibe, û ji bo li ser çarçiva Kurdistan xwe gihandina hemû rewşen nuh, herdu aliyan bîryarêne xwe dane, ku ji dil û can li hemberê êrîşen çavşor, çeper û kozikêne xwe vedin. Ji bona ku kar û xebatêne raste-rast ji bo tevgera gelê me û pêşveçûna vê tevgerê, bingeh û daxwazêne serkevîti peyda bibin. Ev, tenê bi yekîtiya hemû şaxêne tevgera rizgariya Kurdistan û avakirina eniya Kurdistanê ya fireh û yekbûyi, di her birekî Kurdistanê de, pêk dihênen. Ev, bi pêşvebirina têkoşîna şoreşgerî ya çekdar, bi xebata bi hev re, bi pîlan danîna bi hev re, bi alîkarî û piştgirtinêni navâ eniyê Kurdistanê de û bi birêne tevgera me yê rizgariyê di tevayî Kurdistanê de, bi taybetî ji di Kurdistan Bakur û Kurdistana Başur de, pêk dihênen. Herdu alî, xebateka jîr û jêhaflî, xebateka dirust li hemberê hemû şopêni hilweşandkarî û tarûmarkirinê, ji xwe re bingeh digirin û bi xurtî hevgirtina têkoşîne digel hêzen ku ji dil karvaniya şoreşger û demokrat birêve dibin, dikan.

Ji bona ku hoyêne birayefî û hevkariyê biafirin û bingehêka objektif a lihevhatina gelempêr pêkbê, herdû alî bîryara rakirina herbabet newekhevî û dubendîyen kêlekî dan û duxuyan kirin, ku giringe ev dubendî û nakokî yêndî hundurî nebin aloziyêne hebûn û nebûna gelê me. Pêwiste ku bi danûstandinê berfireh û hevpeyînê dirêjî, li ser bingehêka hevaltiya ji can, disiplin û agahdariyeka bilind û berpirsiyârî, hemû şeweyêne dijminahiyê, birakujiyê û şerê pîrsan, ku dijmin jê sudê dibînin, bîn berdan û li alîkî bîn hîştin

Herdu alî, bang li hemû şaxen tevgera gelê me di tevayî Kurdistanê de ji bo lihevhatineka tevayî dikan. Ji bona ku li dora masê runin, dan û standinê bîrêve bibin, ji bo hemû pîrsigirekan çareserî û rî peyda bikin; bi disiplin û agahiyeka bilind ji berpirsiyârî, hemû şalawêne pevcûnê berdin û birawestîn; bi gotin û nîvîsandinê hemû sixêfan û dubendiyêne kêlekî ji holê rakin. Ev gişt pêwiste, li ser bingehêka baweriya bi têkoşîna şoreşgerî û berxwedana girseyî, ji bo seranser rizgarkirina gelê me pêkbê.

Ji bo bicihanîna armancêne tevgera rizgariya gel û hêviyêne serxwebûn û yekîtiyê, herdu alî û wê baweriyê de ne, ku şerê gelêri yê rizgariyê û têkoşîna şoreşgerî ya çekdarî û ya gîrsêne gel reyast û dirustîrin e. Lewma herdu alî, bîryarêne xwe dane, ku vê şeweyâne xebatêbi aktifî û tundeyî, rastûrast bidomîn û herdemê kar, xebat û lebatê li ser vê reyebikin; tim pêşde herin, hevkari û alîkariyê di nava hemû bêşen Kurdistanê de bilind bikin. Di vir de ji herdu alî, bang li hemû parti, hêz û rîkxistinêne Kurdistanê dikan, ku ji bo vê reya xebatê bigirin destê xwe û hemû şeweyêne xebatê yêndî din, mîna xebatêne girseyî, konevanî, aborî û ramyarî û... hwd. bajon.

Partiya Karkerêne Kurdistan û Yekîtiya Nîştimanî Kurdistan, bi baweriyeke xurt, hevalbendî û hevgirtina hêz û rîkxistinêne tevgera rizgari û demokrasiya gelê Kurdistan giring dibînin. Avakirina têkiliyêne xwerustî di nava wan de, ji bo singvedanalî pêşîya êrîşen hêzen nexêrxwaz, dijmin û dagirkar, pêwist dinasin. Herdu

alî, di wê baweriyê de ne, ku ev têkilî û pêvendî bê bingehêne xurt, eşkere, ronak û xwendî-rayen kur, zînde û xurt nabin; ev pêknayin, heke her aliyeke hirmeta serxwebûna konevanî, ramyarî û rîkxistinîya aliye dinê neke û destêne xwe dirêjî karêne hundurî yêne hêzen dinê bikin; heke hoyêne her birekî Kurdistanê nedin ber çavêne xwe û baweriyê bi têkoşîna çekdarî û berxwedana gelêrîji bo rizgariya gel û welat neynin.

Bi hercure û babet azîne û reyan, herdu rejimêne faşîst ên Îraqê û Tirkîyê, şerê tevgera rizgari û demokrasiya gelê me dikin. Ji bona ku gelê me di bin nîrê zordestî û pîkoliyê de bihêlin, gelê me tunebikin û ji nêzîk ve bîzava dîrokî ya serhîdan û râpişîne gelê me bîhilweşînin û reş xuyabikin, hemû karûbarêne xwe di vê riyê de dihênen serhev û ci rewşen nebaş hene, ji xwe re bi destur dibînin. Geh dixwazin tevgera me hevrexebatkarê vê hêzê û geh ya wê hêzê bidin nîşankirin û geh dixwazin bi şeweyâne bîzaveka terorist bidin xuyakirin. Lî belê hertim armancêne wan ev e, ku bala awira gelempêriya cîhanê ji me biqulibînin, dilê gelêne cîhanê ji me bidin aliyeke û zora mafdariya armancêne me bibin. Lewma herdu alî, hemû şalawêne duxuyankirinêne derewîn ên rejimêne Îraq û Tirkîyê protesto dikan, ji ber ku hemû dagirkar û kolonyalist dixwazin tevgera getîle me ya objektif û girseyî rûres bikin, ji ber ku hemû çîn û birêne Kurdistanê alîkariya tevgerê dikan û beşdar dibin. Herdu alî, bang li hemû xebatkarêne Kurdistanê dikan, ku hisyar, bi bal û guhdar bin; hemû derewîn dijminan û axafêne wan li dijî tevgera gelê me binasîn û wan zanibin, ji ber ku dijmin tim dixwazin tevgera gelê me reş û terorist bidin xuyakirin. Herdu alî, hemû babetêne terorizmê protesto dikan, ew babetêne terorizmêne ku mêtîngerî li ser axa Kurdistanê birêve dibin, ci terorizma kesanî û yekanî, û ci jî girseyî.

Rejimêne serdest ên Tirkîyê û Îraqê, di hemû demen dîrokî de û bi taybetî pişî hilweşandina imparatoriya Osmanî ya kavil û rîzî, alîkarî û pêvendiyêne di nava xwe de xurtkirine, ji bona ku şerê gelê me bikin û tevgera rizgariya gelê me birawestîn. Hemû peyma-

nêne nola Saad-Abad, peymana Bagdad û hevgirtina di navîraq û Tirkîyê de, tev nîşanîne pêvendiyêne pîrozin, di navbera hêzen ku welatê me vegirtine. Ev, di xwazin gelê me û tevgera gelê me ya rizgariyê ji holê rakin. Herdu rejimêne faşîst herdemê alîkariyêne di navbera xwe de xurtkirine û gihandine koçberêne pir bê rûmet û gemar, heyawê ku leşkerêne her dewletekê karibe bikeve nava axa dewleta din û bikeve pey şoreşgerêne gelê me.

Li ser bingeha vê zanînê û dîtinê rewş û hoyêne li pêşberê gelê me û bizava rizgariya gelê me diyar in. Herdu rejimêne faşîst ji, dixwazin hebûna gelê me rakin û di nav tarî û mijâ nezanî û koleldariyê de durî serxwebûn û azadiyê bihêlin. Ji ber vê, giringiya dîrokî di rizgariya netewayî de, singvedana li dijî dijminan dixwaze.

Partiya Karkerêne Kurdistan û Yekîtiya Nîştimanî Kurdistan, ji hemû hêz û rîkxistinêne Tevgera Rizgariya Netewiya Kurdistan dixwazin, ku dev ji newekhevîyen kêlekî berdin û bi hevaltî û ji dil dest bi danûstandinê bikin û herkesek xwe bigihîne koçberêka berpirsiyârî ya bilind, ji bo pêkanîna pêvendî û hevalbendiyêne xurt û damezrandina eniya ku daxwaze, di her birekî ji Kurdistanê de; û di navbera van eniya de pêşvebirina hevkariyê, û pîlan bîn danîn ji bo avakirina eniyeka yekbûyi ya tevayî Kurdistanê.

Herdu alî, doza hevgirtina têkoşîneka xurt di navbera gelê Kurdistanê û hêzêne şoreşgerîyên gelên heremê bi taybetî yêne Ereb û Tirk li dijî faşîzmê û şerê wan, pêwist dibînin. Lewma li darxitina xebateka bi hev re li dijî emperyalîzmê û kevneperestiya herêmê, di pêşî de li dijî kevneperestiya Ereb û Tirkan ji bo mafê gelê me û çarenusa gelê me, ji bo hilbijartina rengê jiyanâ xwe û pêkanîna rizgari û demokrasiyê.

Herweha herdu alî, peymaneke hevkariyê digel hev pêkanîne, ku di dema xwe de wê duxuyan bibe.

**PKK  
(Partiya Karkerêne Kurdistan)**

**YNK  
(Yekîtiya Nîştimanî Kurdistan)**



# Pêwistiya çandê û karguzariyên li pêşıya me

Nûhat

Di domanekê de, ku Têkoşîna Rizgariya Netewiya Kurdistan nola horêsan xwe berfireh dike û gelê me xwe seranser rêkxistin dike, pir giringe ku em cihê çand û hûnerê di têkoşîna netewî de aşkere bikin. Pêwistiya çand û hûnerê ronahî bikin.

Ji bona ku em vê pergalê nas bikin, divê em çavêن xwe her wusa li çand û hunera civakên çînî jî bigerînin. Lêgerîn, vekolîn û duketin bibin kar û barêن me.

Naskirina çand û hunera civakên çînî, rastî karekî dorfireh û bi serê xwe ye. Herçûqasî karekî wusa delametekî me ya rojîn e ji, derfet nîne ku mirov di vî warî de cihde bersiva daxwazan bide. Lewma em wê niha bi kurtî li ser vê pirsê birawestin.

Gava em li dîroka civakên çînî binêrin, em wê bibînin ku, rista çand û hunerê herf gewre bûye. Çand, ku saziyeka avahiya banî ye di civatê de, taybetiyêñ damezrandin û çêbûna gelan di xwe de hildigire. Di civakên çînî de çand, herdemê xizmeta çînêñ serdest kiriye; ji her babet pêwendîyan ta ehlaqê, ji serpêhanînan ta mentalîte, ji wêneçêkirinê heya muzikê, şano û nivîsê timûtim weke daxwaz û berjewendêñ çînêñ serdest avabûye. Di civakên çînî de çand, xwe nola çanda çînêñ bindest û serdest, cuda kiriye. Ü bi vê nolê pêşveketiye. Çanda dîliyan û xwedî-dîliyan, feodalan û gundiyan, burjuvazî û proletarya ji hev cihê ne. Gelek caran li diji hev in, nakokî di nav wan de heye, dijber û dijminêñ hevûdu ne. Ji nêrîna li ser kedê, ta nêrîna li ser namusê, bi her awayî ji hevûdu dûr in. Weke ku em dizanîn, di dema civata dîldariyê de, dîliyan li qadan davêtin pêşîya şêran; çînêñ serdest ji xwe re wusa dîlanan çêdikirin, dikenîn û xwe dîlxwêş dikirin. Di dema feodalî de ji, gundî bi korî xwe li pêşîya serdestan dicemandin. Niha, di dema kapitalizmê de ji karker heya bê gotin dihêñ mijandin. Gelek polîtikayêñ çewt û bê bingeh, weke daxwaz û sûdêñ kapitalîstan dihêñ bikaranîn. Ev giştî ji bo çand û hunerê ji welê ne. Di berbanga kapitalizmê de, gelên ku li ser yek xakê dijin, yek zimanî dipeyivîn û xwedîyê hevkariyeka dîrokî û aburî bûn, van taybetiyêñ xwe bi çandeka hevpar girêdan, karîn jiyana xwe ya netewayî mîsagor bikin; cihêñ xwe bi rûmetî di dîrokê de bigirin. Ën ku nekarîn bi vî awahî xwe serbixwin, ji dîrokê hatin malîstîn. Di zayina netewan de çand posîdeyeka bingehîn e. Gelên ku xwedîyê dîrokeka dewlêmed bûn di warê çandî de, pêşveketin û ris-teka mazin di bajarvaniya mirovayetiye de leyistin.

Gelê Kurd, di dema dîldariyê de, heya tixubekê karî gelbûna xwe pêşve bibe. Herçûqasî her-

demê rastî dagirkarî û êrifşen biyaniyan bû jî, bi ziman, ol û her babet şaxên çandî derbasîcivata feodal bû. Di dema feodalî de, li dijî mêtîngîhêne feodal ên Ereb û Osmaniyan, xwedî li ziman, ol û çanda xwe derketiye. Van dewlemendiyêne xwe jiyan hîştiye. Ereban, bi olê İslâmî, gelek texribatê mazin li ser ziman, ol û çanda Kurdan aferandin e. Xwestine ku çanda netewayî tunebikin. Bilî vê rewşa nebaş, di dema feodalî de, gelek nivîskar û hozanêne Kurdan ên mazin, weke Feqiyê Teyran, Melayê Cizîrî, Huseyinê Bateyî, Abdurrahmanê Aktepe, û Ehmedê Xanî derketine holê. Di vê rojê de jî, "Dîwan'a Melayê Cizîrî bi dilxwesi dihîtin xwendin. "Mewluda Kurdi" ya Huseyinê Bateyî bûye malê gelê Kurd ya bûha. Ehmedê Xanî, li kîleka "Mem û Zîn" a xwe, gelek berhemén hêja ji me re pêşkêş kiriye. Ehmedê Xanî, ferhengaka Kurdi û Erebî bi navê "Nû Bihar" jî çêkiriye. Li gundê Xanî, li navça Çolamerge, ji bo zarokêne Kurdan dibistaneka Kurdi jî avakiriye. Ev gişt şanî me dîkin, ka di wê demê de ziman û wêjeya Kurdi çuqas zexm bû.

Pişî dagirkariya Ereban, Osmaniyan jî 500 salan texribatê gelek mazin li ser ziman, wêje û çanda Kurdi bikaranîn. Dewleta Türk a 60 sañ, ku li ser berma û jêmayêne dewleta Osmani avabûye, xwest û dixwaze çanda Kurdi seranser tunebike. İdeolojiya vê dewleta mêtînger, dibêje ku "herkesê li ser axa peymana netewî dije, Türk e." Dewleta kemañist, ku Kurdistan ji nûh ve dagirkiriye, li kîleka gelkuştinê, herwusa ziman, wêje, huner û çanda Kurdi jî qedexe kiriye. Bi armanca Tirkkirinê, politikayeka şovenist û asîmîlasyonist di warê perwendekirinê de birêvedibe. Gelê me perçê-perçê kiriye. Avahiyeka ku ji bo gelê Kurd herf biyane (xeribe) û gelê Kurd înkâr dike, hatiye avakirin. Mirovan kiriye dijminê hebûna xwe, dewlemendiyêne xwe, çanda xwe ûhw. Rewşa zanan, rewşenbiran jî wusa ye. Wêjewan, nivîsevan, wêne-çeker, muzikvan û her çandnas û hûnermend jî, bi giranî ketiye nava vê rewşa nebaş. Gişt di bin posîdeyêne burjuvaziya Türk de ne; ji navik ve bi wan ve girêdayî ne. Bir û baweriya kemalîzmê, herbabet nexweşiyêne çînî dikiş-

nin Kurdistanê û dîbin berdevkê mêtîngeran ên xas.

Bilî vê çanda asîmîlasyonvan, çewt, biyan û mêtînger, herwusa bilî feodalîzma ku hîn jî hebûna xwe li welatê me berdewam dike, bi destpêka sala 1974'an, tevgeraka şoreşger ya ku li dijî van hemûyan ditêkoşe, hatiye bilindkirin; ev tevgera şoreşger, weke ku reya diçe rizgariya netewayî vekiribe, wele jî reya pêşvebirina çandî vekiriye. Ji bo çanda netewayî, bûye pêşengê xebatê. Gelek kesen ku nedigotin "ez Kurdim", gelek kesen ku şermidîkirin bi zimanê dayika xwe bîpeyivin, bi destpêka vê tevgera şoreşger, ê din xwedî li hebûna xwe ya netewayî derketin. Xebatênu ku li ser ziman, wêje, huner û çanda Kurdi dîbin, pişî vê derketina şoreşger, birêveketin. Ku ev rapirîn, xwe hilimand warêne çand û hunerê jî, di dîroka gelê Kurd de buyereka nemaze û pêwiste. Ne-xasim, ji ber vê yekê ye jî gelê me, alîkariyeka gelek mazin pêşkêşî vê tevgera şoreşger dike. Gelê me; xort, karger, gundî, jîn xwe di nav refîn tevgera şoreşê de rêkxistî dike. Ev bûyer, xewa dewleta Türk revand û direvîne.

Roja 12'ê Elûnê sala 1980'an, darbeka leşkerî ya faşist li dijî tevgera şoreşger bikar hat. Xwestin tevgerê binkeffî bikin; li kîjan heremê tevger pêşketibû, li wir mirovîn me hatin kuştin, hingavtin û girtin birêve ketin. Dewleta Türk a faşist, bikaranîn û azînêne hovtîrin, ku li cihanê kêm bêne dîtinê, birêvest. Lî belê li dijî xwe jî, berxwedana zindanan jîya. Keliya ji ber berxwedana zindanan dewleta Türk ketibû nava xofê û hîn nehatibû serxwe, Hilgavtina 15'ê Tebaxê jî bi destê pêşmergên PKK mîna balyozekê di serê wan de peqîya. Ev rûdan jî bû destpêkeka nuh, ji bo pêşve-xistina çand û hunerê.

Lî belê kesen ku xebatêni di vî warî de pêşvedibin xwediyêne hinde taybetiyan in. Li hêlekê hinde kes hene, dilsoz in, bi bawerî dixebeitin, lî belê xebatêni xwe ji amatoriyê û tengzariyê rizgar nakin. Ev kesen dilsoz, hîn xwe negihandina wê gihanekê ku bikarîbin weke daxwazên gelê me xebat û lebatê bo çand û hunerê bikin. Yanî kîmasiyêne mazin hîn li pêşîya wan hene. Li hêla din jî, hinde kes hene, xeba-

tên xwe ne jî bo berjewendêne gelê me pêşve dîbin. Karûbarêne çewt, ên ku bersiva pirs û keshen gelê me nadîn, ji xwe re kirine karguzarî. Guhêne xwe li ber denge têkoşîna rizgariya netewayî girtine; paçikêne rizî kirine guhêne xwe.

Kesen ji birê yekemîn, di xwazin "hunerê ji bo hunerê" pêşve bibin, lê hîn tênihiştîne hunera xwe ji bo civakê, ji bo gel, ji bo berjewendêne tevayî pêşve bibin. Kesen ji birê duwemîn jî, bin navê karguzariya bo huner û çandê, huner û çand di destêne xwe de dîkin hacetêne kedxwarî û mejokdariyê; ev kes xulamokêne çînîn serdest û biyaniyan in.

Birekî sêwemîn jî heye: Ev jî dîldar û evîndarê xwe bixwe ne. Dibêjin şoreş, lê ji şoreşê direvin. Her kesekî reş dîkin û ji karê tu kesî hesnakin. Her dibêjin, tenha yê me rînd û baş e. Tu dibêjin, xwe bi ava zemzemê şuştine! Hemû têkilî û pêwendiyêne û baş, çewt û rizî bûne karûbarêne wan. Û di ser de jî dixwazin posîdeyêne xwe li mirovîn derdorêne xwe bikin. Ew bawer dîkin, ku her tişteki çetirîn dizanin. Lî hertim dixwazin pesn û forta wan bê kirin; pir qure ne, serhişkin, bê rîç û ramân in.

Birekî çaremin jî heye; kesen vê birê dibêjin em "dibistanan bi zimanê dayika xwe dixwazin", em "otonomiya çandî" dixwazin. Zirar û xusarêne van kesan ne pir mazin e bo gelê me. Lî rastî di nav jiyaneka bê çand û hunerê de difetisin. Çuqas têkoşîna rizgariya netewayî berzîr û xurttir dibe, hebûna van jî hêdî hêdî hunda dibe.

Lî bilî vê rewşa nebaş verastiya gelê Kurdistan li ser rîyeke rizgariya netewayî bi têkoşîneka germ, gav bi gav ber bi serbilîn-diyê ve dileze. Çandekî netew-mend û rizgarîxwaz jî, bi rona-hiya vê pêşveçûnê dihê xwedî kirin û şîn dibe.

Em tev dizanin, ku nivîskar, wêjewan, hûnermend û rewşenbiran din, di civatekê de birêne hişyartîrin in. Lewma jî xwediyêne ristêne (rolêne) gewre ne. Weke em ji karvaniyêne cihanê dîbin, heke ev ronakbîr ristêne xwe xweş bîleyizînin, wê xweş karîbin bersîva sîd û berjewendêne gelê me ji bidin. Divê neyê jîbîrkirin ku xebatêni çand û hunerê di avabûna

civatan de, vatinî û delametêne mazin bikar dihênin.

Niha ji bo me hemuyan diyare, ku yekbûna gelê me hatiye debaşkirin, hemû nirx û bûhatiyêne gelê me hatine hilweşandin û dizîn; dijminen netewê me di xwazin ziman, dîrok, çand, huner û wêjeya gelê me bidin jîbîrkirin. Vegerandina van dewlemendian, fahmkirina taybetî û nirxên wan, pêşvebirin û xurtkirina wan, em dibêjin, tenha bi serxwebûna Kurdistanê ve girêdayî ye. Heke welatê me serbixwe nebe, ne ziman, ne çand, ne huner û ne jî wêje nikarin rast pêşve herin; politikîn asîmîlasyonist û sosyal şovenist û taxribatê wan, nikarin bîn rakirin. Şer û têkoşîna bo çandî, bireke ji têkoşîna rizgariya netewayî!

Vatiniyeka (wezîfe) leztîrîn û bingehîn, di rojêne de, weke daxwazîn xeta rizgariya netewayî, pêşvebirina ziman, çand, wêje û her babet şaxên huner-mendiyê ye. Divê ev xebat di bin fermana şoreşâ niştimanî de bin û bibin hacetêne rizgariya gelê Kurdistan. Ji ber vê yekê ye, ku em dibêjin, xebat gişt giringe li ser vê bingehî bîn kirin. Ji bo rizgariya netewayî nivîs, ji bo rizgariya netewayî huner, ji bo rizgariya netewayî çand, divê bibin dirûşmîn niştimanperwe-rêne Kurdistanê.

Nivîsevan û hûnermendîn Kurdish ên welatparêz, nikarin çavêne xwe li ber vî şerê hebûn û nebûna netewê me, bîmîçin. Nikarin ne alîşîr bin, bê terefbin. Nexwe giringe rêkxistinêne xwe jî çekin. Giringe xwe nekin hûnermendîn bê rêkxistin. Giringe bibin çerxekî hêza şoreşê. Heya ku ev rêkxistin jî nebe, armanc, hêvî û raman jî nakevin destan. Dê nexwe em rêkxistinêne xwe çebîkin, sazbîkin û xurtbîkin, xebatekî bi rêkxistinî zorpêwist û daxwazekî bi rûmet e.

Kîn bê gotin; di nav refîn têkoşîna rizgariya netewayî de cih girtin, ji bo yekîtiya konevanî xebat kirin, xebatêni rewşenbiran ên bingehîn in. Bi pêñus, bi saz, bi gotin, bi xebat em baweriya rizgariya netewayî xurtbîkin! Bi giyaneka wusa xwe bilişîn! Delametêne xwe yên dîrokî bi vê nolê bicîh bîn! Em bibin perçek ji nuh ve jînbûnê, û zîndekirina netewê xwe!

# AXÎN WELATO!..

*(Nivîseka çandî ji serhildan û berxwedana Şêx Seîdê Pîranî)*

## X. Xemgîn

Piştî serhildan û berxwedana Şêx Seîd û bidarvestitina endamên serhildanê yên pêşrevan ji hêla dewleta Tirk a mêtînger û faşist, kedxwarî û pîkolî li tevayî Kurdistanê kete gihaneyeka qirkirin, wêrankirin û arkirineka nuh. Gava ku gel rîberêñ xwe hunda kir, li hemû hêlan dilşewatî û bê hêvîñ xwe zêdekirin. Lî dawiya qirkirinê hov nehatibû, serhildan û berxwedana gelê me jî didoma. Bir bi bir, navçe bi navçe, gelê me bo serxwebûn û azadiyê li dijî zordarî û hovîtiyê li ber xwe dida. Di rewşeka wusa de, her der tiji eş, xwîn û sohtin bibû. Gelê me pergende û koçber bibû, ji welat dihat dûrxistin. Li her hêleyeka nîştimana me, ji ber dirindetiya mêtîngerên Tirk, lehiyên xwînê rûpelên dîroka mirovayetiyê sohr dikirin. Xwîna mirovan mîna rûbaran diherikî. Çerxa zordestan dadigerî, keys û dêlive ketibû destê xwînxwaran. Teviya civaka Kurdan, kete di bin barê axînêñ dijwar û giran de. Hêviyêñ gelê me sist û melûl bibûn, sorgûlêñ xweşrengîñ cilmisî bûn. Piştî bidarvekirina Şêx Seîdê birêz û rîhevalêñ Wî yên mîrxas, rastî gelê me yê li Kurdistanâ Bakur ket nava bê hêvîñ û gumanan.

Herçuqasî gelê me hatibû şikandin û bi destê zordar û zilmkaran hatibû êşandin jî, weke di her dema dîroka Kurdistanê de, gelê me vê carê jî ji destê îxanet û xwespariya kûr, gelek kişandibû.

Sedemên şikandina şoreşê, sitembarî û hovîtiya dagirkañen Tirk, di dîroka me de gelek caran hatine nivîsandin. Di vê nivîsarê de, em naxwazin li ser sedemên hilweşîna şoreşê an jî li ser dîroka şoreşê birawestin. Daxwaza me ji vê nivîsarê ev ve, ku em li ser dilsohtinî û welatperweriyê çende gotinêñ hozanî bibêjin, daku em bizanibin, çawa ev şoreş berhem û hilbirîñen xwe yên dîrokî li ser çanda gelê Kurdistan afirandîye û em van berheman hindekî nas bikin. Di wê demê de çibûn êş, keser û axînêñ gelê Kurd? Bîr û baweriya gel di dermafî nîştiman de çibû? Bi ci şêweyên çandî gelê Kurd daxwaza Kurdistanêka serbixwe û azad dihanî zimîn? Kijan destan, dilok, lawje, kilam û axînok ji devan derbasî devan dibûn? Pêşengên wê demê, çawa bang û hewar li law û keçen Kurdan dikiran? Gelê me ji bo zaroyêñ xwe yên bêñ, ci digot? Kijan lome û rexne li dîroka bi qirêj û gemar hatine kirin? Giringe em, di xebat û karêñ xwe yên ji her alî de li bersiva van pirsan jî, pêwist hertim bigerin. Niha em dixwazin di vê nivîsarê de, heyâ ji destê me dihê, bersiva hinde enîşk û keviyêñ pirsan, bi rengekî helbestvanî û hunermendî bidin. Heke em kin bêjin, daxwaza me ew we, ku em naveroka destana ku gelê me bi awazî û hozanî li ser Şêx Seîdê Pîranî



gotiye, ji nuh ve rêzbikin û dîsa bînin deynin pêşîya gelê xwe û vê xebatê ji bo dema nuh, ji bo gelê xwe bikin malê bavê, malê kakîkî û zîkmakî yê herî zêrînbûha.

Piştî rûxandina rapirîñe dilşewatî, kezebohtînî, benderwîrî stuxwarî li her aliyeka Kurdistan hîkar û posîdeyêñ xwe dagerandin. Weke di hemû serhildanêñ li Kurdistanê de, gelê me vê rabûn û xweragirtinê jî, bi sitran û lawjenêñ xwe, bi lorî û goraniyêñ xwe, ango bi berhemên xwe yên çandî û folklorî xemiland. Aram, hedar, tebat, evîn, hisret û axîna welat, bi hunermendî û hozanvaniya gelêrî û govendiya neteweyî kemiland. Dilop bi dilop, bost bi bost, gav bi gav axîn û hewara dil û evîndariya xwe quliband destanêñ dîrokî bo hatina xwe. Gelê me vê serhildanê jî rîsî, neqş kir û kire bireka çanda malê neteweyî. Şepalî û çêciwaniya nîştiman, delaîî û bedewiya çiyayêñ welatê berxwedanê, cangorî û fidakariya bo Kurdistan, taybetiyêñ rind û nerind yên civaka Kurdan, evîna war, naşîn û kovanêñ gelê bindest û zehmetkêş di destan û hozaniyêñ wusa de komkir û hertiş bi hunerî anî serhev. Banga ji bo neviyêñ şehîdan, bo dem û quşaxêñ pêşîya me, pêwistiya yekbûnê, giringiya destê hevûdu girtinê, divêtiya berxwedan û serhildanê, xebatêñ tolehildanê û her wekî din, naveroka destanan rengîn dikan. Ev destana ku em wê niha pêşkêşî we bikin, bireka neqşîna dîroka me ye...xemîl, rîdan xêzeka gelêrî ye herî şêrîn rinde...

Ji hêla hunervanî, wêjê û toreyî, destana serhildana Şêx Seîd, hunereka bi nirx û dewlemend e. Ji miqamêñ destanêñ kevnare (klasîkî) hatiye avakirin. Her hunermendek, zu bi zu

nikare bi vê miqamê bistêre. Herçuqasî ji şêweya kevnariye jî, bi taybetî û sixletên xwe nûneriya mûzîka Kurdî ya esehî û vêrast dike. Bi terzeka serrast û dirêj dihê gotin, lê xemla xwe ya perwerîn ji naverok û têdayiya xwe, ji pîşeya mûzîka xwe direvîne û distîne. Bi zimanê gel yê ronak û perwerde, hatiye rêz û avakirin. Rûmetî û berzbûna tolehildan û heyf rakirinê ji xwe diweşîne. Ji ber noteyên xwe yên mûzîka klasîkî û neynîka têdayiya xwe ya gelêrî, sîmbolek ji mûzîka Kurdî ya bingehîn baniyan ve radike. Sazendî û nîzama xwe ya mûzîkî, bingehîka mûzîka Kurdî ya kevnere derdixe pêşîya guhdar û didêrvanan. Mixabim, lê niha û serdemî ev bingeh, li gelek derdorêñ Kurdistanê nayê bikaranîn. Tenha li gora êrdiman û li gora zaravayêñ navçeyî û niştecihî, dewlemendiya ziman û xemla peyvan ji hêla şeniyê me bi kêmâsîjî be, dihê bikaranîn. Mirov dikara vê destanê bi gelek şêwyan guhdarî bike û cudatiya zaravan ji wir nas bike û cihêtiyan jê derîne.

Nêzîkî 60 heya 70 salan ji ser buyera vê destanê bîhûrîne. Lê heya niha jî, ev rûdan zînde û jiyane. Lewma destan ji cihekî bi qedr û qiyemet di çanda Kurdî de digire. Li baniyêñ çanda gelê me şun û cihê xwe digire. Di nava gel de, yên ku bizanibin vê destanê bistrêñin, niha gelek kêm in. Tenê dengbêjîn Kurdan ên li gundan û pîremêrd, ên ku kilamên kevnare di civatan de dibêjin, vê destanê heya merhelekî dinasin. Gava ew vê bixwînin, posîdeyêñ mezin û giran li ser mirovîn li dora xwe dihêlin.

Di şevêñ zivistanê de, gundî civatêñ xwe, şevbirkêñ xwe li ber xwendina destanê bi dilşewaî û mîlakperîşanî derbas dikin. Gava helbest destpêdiye, hemû mirovîn li civatê dengê xwe dibirrin û vedihesin. Ji dil û can guhdarî dikin. Bi destpêkirina kilambêj û dengbêjan, derzî bikeve erdê, wê deng jê bêtin. Destpêk bi keser û axîne... dilan dipajîne... hêstir û rondik dibarîne. Gelek kesêñ li civatê dilxemgîn û girîngirt dibin. Gir û hêrs radiperin... nifrîna dilan serî hildidin... dil tiji dibin bi giyana tolehildanê. Mirov dihêñ dagirtin ji gotinê destanê. Li gelek civatan rih û daxwaza heyf hildanê damaran digurgurîne. Girîneka hûrik û zelal, qirikan digire. Pîremêrd û kalejin, weke ku bi dizî bibêjin, her dibêjin; "...erê welato, erê welato...axîn welato!" Gava ku dengbêj hinekî bêhna xwe distêñin, ew dengê hêdî û nerm bi hêrs ji nava dilan dîsa bilind dibe; "...ax... ax... van Tirkan, ma ci bi me nekirin? Ci bi serê me ne anîn? Ma tucaran ji bîran diçe... axîn û axîn welato!..."

Helbest destpêdiye, pişî ku bi kurtî axaftinek li ser çîrok û xeta helbestê dihê gotin. Dure dengbêj çavêñ xwe dadimirîne û bi vî awayî, bi navê welat yê şêrîn û giranbûha, berdewam dike:

*Lo welato... Heylo welato...*

*Çuqas şêrîn û bişewato...*

*Bi derd û kul û keser û jan û hisreto...*

*Bi xêr û ber û kehnî û rûbar, çiya û xelato...*

*Vaye xemî û xêza te dixwîne, sohr xemiliye...*

*Dîsa heskirina te di dilê me de hîn nehato...*

*Şev û rojê em dinalin, tim bê hal in*

*Bo ci em weha stûxwar... bendewar in*

*Li welatêñ xelkê dimeyzêñin*

*Tev xwedî tac û text in, qesir û eywan in*

*Yê me, bo çî weha em pergende û bê xudan in*

*Em ne di warê bav û kalêñ xwe de*

*Ne xudanê malê xwe ne*

*Lo welato... Malê xwarinê...*

*Ma qey çîma ji dinya û alemê bi şûndayı?*

*Heq û hîqoqê dinya alemê hato...*

*Lo welato çîma dora me nehato...*

Zordarî û hovîtiya dewleta Tirkan ya kedxwar, dagirkarî û metingeriya wê û qirkirina gelê Kurd weha dihê zimên:

*Di sala bîst û çaran de*

*Sê serokêñ dewleta Jon-Tirkan li hev rûniştin*

*Mustafa Kemal, Feyzî Çakmak, İsmet Înûnû*

*Qal û müşêwira xwe kirin*

*Fermana milletê Kurdo hato... Lo welato...*

*Ma suc û qebahata me çiye?*

*Em milletê Kurd weke teyrê bê zirar in*

*Ji dewleta Alî Osmaniyan re adete*

*Ger em jî xwedî mal û dewleta xwe bin*

*Bo ci ji me re qebahete...*

*Lo welato... ji me re qebahete*

...

*Lo wey lo... lo wey lo...*

*Erê li serê çiyan û li zozanan serî hildan*

*Ji nav koma pêşmergan Şêx Seîdê bavê kal*

*Amûd û stunê Kurdistanê, şêrekî milletê Kurdan*

*Bi destê xwe kirî darê dûrbînê*

*Li hawîrdora deşt û rûbarê Kurdistanê dimeyzêne*

*Dîrekê toz û xubarê rabuye qata heftan*

*Ho xudayo tu qebul neke*

*Ji Deşta Qerejdxâxê va ye pêşîya tang û topêñ neyar*

*Ordiya Jon-Tirkan bi derhato...*

*Lo welato... bi der hato...*

*Leşkerên Tirkan dane ber xwe êl û eşîrên Kurdan*

*Bajar, gund û zivingan*

*Nabêjin va biçûke, nabêjin va mezine*

*Nabêjin ev jin in, nabêjin ev jî kal in*

*Bajar û gundêñ me dane ber şewato...*

*Lo welato... ber bi şewato...*

Hovîti û zorbaziya mêtîngeran bê sinor û bê dawî bû. Di nav rûpelên dîrokê de jî, ev hovîtiya wan hatiye naskirin. Biryara dewleta mêtînger qirkirina Kurdan, tunekirina neteweyekî bû. Çawa ku li Ermeniyan kirin, dixwestin wusa li Kurdistanê jî bikin. Zarokêñ di zikêñ dayikan de bi serê tifingan, ji zikan derxistin. Fermana hertişî dabûn leşkerên xwe. Di vê barê de destan wusa dibêje:

*Pêşîya hêza dijminan bi derket oy...*

*Lo welato... lo welato...*

*Li ser erdê gurme-gurme tang û topan*

*Leqa-leqa darê şerefNALAN... mitralyozan*

*Di asmanan de xurme-xurme teyaran*

*Wêran kirin mal û malbatêñ Kurdan*

*Ho xudayo tu qebul neko...*

*Bajar û gundêñ me...*

*Leşkerên neyaran bi nav keto...*

*Lo welato... bi nav keto...*

Gelî Kurdan jibîrnekîn, di bextê we de me  
Leşkerên Jon-Tirkan zarokên şeş mehî  
Bi singuyan ji zikê dayîkan derxistin  
Lo welato bi eşareto... va ci eşareto...

Li hemberê vê zordarî û hovîtiyê, herweha gernasî û lehengiya pêşmergan û şervanan, bi helbestî dihê zimên. Hogîrî û fêrisî, xurtî û ciwanî, parastina jiyanê diyar dibe. Şerê li ser çiyayêن Kurdistanê, hêviye ji bo jiyanê û serxwebûna gelê me:

Şêx Seîd, bavê kal, bi dengekî bilind  
Li komên pêşmergan dikir gazî

Got; dê rabin bavê mino.. dê rabin...  
Emê bikin û bîlezînin  
Lat û zinarêñ çiyayêñ Kurdistanê  
Ji me re xweş war û mekan bin  
De em xwe bavêjin ber kevir û zinaran...

Di bextê we de me nîşana xwe baş bigirin  
Çavêñ çepê damîrînin, çavê rastê bi ber xînin  
Pê re navan li xwe bidin  
Bila deng bi ber çiyan bikeve  
Çiya... deng bidin çiyan û bêjin:  
Em leşkerên Kurdan e, em komên pêşmergan e  
Canê me ji me re erzane, namus bi me bûhaye  
Em ji mirinê natirsin  
Ma suc û qebahata me çiye?  
Çi heqê dewleta Jon-Tirkan li me heye?

Ez di bextê we de me li neferan nexin  
Ew jî weke me emirberê Tirkan e  
Çavêñ dayîk û bavêñ wan li riya wan e  
Fermandarêñ Jon-Tirkan bê dîn û bê îman in  
Nîşana xwe bigirin di nav re  
Li teresêñ yûzbaşî û zabitan xînin  
Li textikê nîvê eniyê xînin  
Şepqêñ serê wan bipekînin  
Di bin lingê milletê Kurd de dînin...

Destan xembarî û perweriya Kurdan, ji ber qirkirina û kuştina Kurdan datîne holê. Bê mecalî û derfetî li hêlekê, li hêla din welatperwerî û evîna welat. Di rewşa wusa de, rista jina Kurd, di wê bê caretiyê de çiye? Dîroka reş û tarî çawa diqete? Bo hatina civakê, daxwaza tolehildanê, heyfa Kurd û Kurdistan rakirinê, çawa bi rê dikeve? Li ser jina Kurd hozan vê dibêjin:

Ho Kurdino di bextê we de me jibîr nekin  
Ji berê û paşê ve dewleta Osmaniyan neyarê me ye  
Dijminêñ bav û kalêñ me ne  
Ho xudayo... tu qebul neke...  
Keç û bûkêñ me Kurdan  
Dîsa ketin destê leşkerên Tirkan...  
Kurdino jibîr nekin di bextê we de me  
Barê namusê barekî girane  
Ji ber û paşê de milletê Kurd pê dinale... lo welato...

Bila dîroka bêbext bi hêrsa xwe binivisîne  
Sêsed keç û bûkêñ Kurdan, qal û şêwra xwe danîne  
Li hev gazî kirin... gotin:  
De rabin em jinêñ Kurdan e, emê bikin û bîlezînin  
Canê me ji, bi me erzane, namus bi me bûhaye  
Em herin ser Pira Mala Badê  
Ji ber zîlm û hovîtiyâ Jon-Tirkan  
Em hinek xwe bavêjin ji ser Çemê Amedê  
Em hinek xwe bi darxin  
Em hinek xwe bişewitînin  
Erê xuşkino bal û meyla xwe bidin Deşta Qerejdaxê  
Deşta Harranê, ci Deştiqa Firewînê  
Hê de rabin em bi rondikêñ çavan  
Nameyeka xwe binivisînin  
Emê binivisînin ku em jinêñ Kurdan e  
Parezvanêñ namusa merdane  
Daku can û cesedêñ me  
Namusa me nekeve destê leşkerên Tirkan e  
Vaye em canê xwe dîkin  
Qismeta mar û masiyêñ ava deryan e

Dibe ku hinek bibînin, dibe ku hinek nebînin  
Belku çerxa felekê bizivire, dewranek rabe  
Hinek ji zarêñ Kurdan, ji vê kuştinê xilasbin  
Emê nameya xwe deynin ber serê erdan û zeviyane  
Li bin keviran veşîrin  
Belku sibê lawêñ Kurdan rabin  
Cohtêñ xwe li wê derê bikin  
Pozê haletê li ber keviran keve  
Wê nameya me bibînin  
Daku sibe li cîvatan serêñ xwe nexin ber xwe  
Serê xwe hilînin...  
Em jinêñ Kurdan gaziya xwe bi wan tînin...

Eger bê xîret be, wê cohtê xwe bidomîne  
Eger bi namus û şeref be, lawêñ Rustem û Mediya be  
Yê rondikêñ xwînê ji çavan bi ser rû ve bîbarîne  
Yê destê xwe bavêje nava mawzera xwe  
Xwe bi çek û rextan bixemîne  
Wê berê xwe bide nav mal û malbatêñ Kurdan  
Li hevalêñ wek xwe bîgerîne  
Serê çiya û zozanêñ Kurdistanê  
Wê ji xwe re bike warê şêran  
Heyfî û tola me ji dewleta Jon-Tirkan hilîne  
Lo welato... eman... eman... heyfa te hilîne

Giranbûhabûna vê destanê, her bi vê nolê, qube û rûme-tya wê di çanda gelê me de, xaleyek şepal û hêjaye. Ev destan ne hevqas e. Didome, lê me tenê birek ji naveroka wê rîz kir. Me xebat kir, ku hinde ji helbestê binivisînin. Weke me berî niha ji gotiye, li gelek navçeyêñ welat, renga-reng dihê gotin. Ji zaravan û şêweyêñ peyvan, heye ku bi awakî din derkeve. Lê weke me gotî, gelê me li gora rewşa xwe destanê xwe dibêje û dixemîne.

Me di vê destanê de, ji hemû birêñ welat, birêñ hozaniyan bikaranî. Ji ber ku ya giring hunerî û hozaniya destanê ye û ne gotin û hevok in. Lewma hinde kêmâsi ji tê hene. Heke em kêmasiyan rast nasbikin, kêsên zaravan wê li ber me nabin pirsgirek û dîwar.

# Hovîtiya

## mêtîngerên Tirk dijî gelê Kurd


*Serhildana Şêx Seîdê Pîranî  
ji rojnameyêن Erebî yên sala 1930'an:*

Di havîna 1930'an de, piştî şikestinêne  
leşkerê Tirk ê xwînmij li hember yekbûn û  
berxwedana gelê Kurd, Tirkan dest bi hovîtiye  
yeka bênişê dijî gelê bê çek û bê hêz kirin:

1. 220 gund hilweşandin û 10.000 kesê  
wan gundan civandin ser hev û wan jin, law,  
keç û pîr daxistin binê Geliya Zîlanê û tev di  
wir de kuştin.
2. Bêhtîrî 100 rewşenbîrê Kurd ên welat-  
parêz girêdan û avetin gola Wanê.
3. Li dorhêla Çolamergê (navçeya Hekkarî)  
300 gund arkirin û bêhtîrî 500 jin û zaro bi  
rengekî nemirovî darvekirin.
4. Li nêzîka Çiyayê Ararat û Tendurek 400  
gundêñ Kurdish hilweşandin û teviya gundi-  
yên wan bi agirê sohtin.
5. Hêzên leşkerê Tirk ên bi serokatiya Ce-  
wad Paşa ji wilayeta Hekkarî ber bi nav-  
çeyêñ Elkê (Beytülsebab) û Şemzîhanê ve  
diçûn, di reya xwe de her gundek ardikirin. Li  
ser reya wan 120 gundêñ Kurdish hebûn.
6. Hêzên faşistên Tirk ên bi serokatiya Ke-  
maleddîn Samî Paşa ji wilayeta Wanê ber bi  
herêma Çaldîranê ve diçûn, di reya xwe de  
83 gund arkirin û 590 mirovîn bêguneh  
kuştin.
7. Mufettişa giştî ya wîlayetên rojhilat (ku li  
Stanbolê bû) civînêñ xwe bi serekê komarê  
û serekê wezaretê û wezîrê hundîfî re berde-  
wamkir, ku bi çi awayî nehêlibin çi car din li  
Kurdistanê şoresh rabin. Li dawiya wan civî-  
nan, van çareyên jêr danîn ber xwe:

- a) Rakirina jiyanê êl û eşîran. Belavkirina  
şenîyên wan li ser wîlayetên Tirkan.
- b) Bi civandina çek û debanan, bê hêz  
hiştina Kurdish.
- c) Nehîştina famîleyeka mazin. Belavkirina  
endamêñ famîlîn mazin li gundêñ dur  
gundêñ wan.
- d) Tirkirina Kurdish bi giştî û qedexekirina  
axaftin, nivîsîn û xwendina bi zimanê Kurdfî.

**Rojnameya -El Ehwal- ya Beyrudî  
13.08.1930**



Nayê jibîkirin, ku piştî şoreşa Şêx Seîdê  
Pîranî ñala 1925'an de, biryara tunekirina  
Kurdan derket û di mehêñ cileyê paşîn  
(rêbandan û reşemehê) de Kurd ji gundêñ  
xwe hatin cihhilkirin û ber bi Izmirê ve  
şandin, ku ji wan teviyan %10 ji serma,  
birçbûn û zordariya Tirkan negîhiştin cihêñ  
nuh. Ên ku gihan wan deran jî, axa û talanke-  
rîn Tirk ne mal, ne namûs û ne jî zar û zêç bo  
wan hiştin.

Li gundêñ ku şoreşê têde destpêki, Tirkan  
dora 2.000 gundî, ji afret (jin) û zaro-  
wan civandin û bi canî kirin gorê.

Mêr û xorîn 25 malan, ji Kurdêñ gun-  
dekî li bakurê gola Wanê reviya bûn nava-  
çıyan. Tirkan jin û zarowêñ wan girtin û  
seriyêñ wan û laşen û kerkerkirin  
û wan laş û seriyêñ birî di kolanêñ navçeyêñ  
Arçes (Ercis) û Adilcewazê û hinde bajarê-  
din de gerandin, ku gelê Kurd bi wî rengî  
bitirsînîn.

Di sala 1927'an de, Mustafa Beg, serekê  
"Birê 41'ê" ji leşkerê Tirk, gundêñ dora  
bajarê Daraxînê (Genç) çemberkir û wan  
gundêñ Kurdish dan ber gulleyêñ topan,  
hemû kesen têde bûn, kuştin û bê mirovî  
430 gund bi teviya mirovan ji binî ve wêran-  
kirin. Ew zaro û afretêñ ku direviyan, digitirin  
û zîken wan bi sungîyan diçîrandin. Ji teviya  
wan gundan 50 kesî karîn xwe ji hovîtiye  
rizgar bikin.

Bêgbaşî Heyder Beg, serekê komikeka  
siwaran hinde malmazinê bajarê Erxanî û  
Madenê girtin: Yusif Efendî, Ebdulrehman  
Efendî û Mustafa Efendî bi rojan dan me-  
şandin, di paş hespan de girêdan û bezan-  
din, bi lêdan û pehînan û bi qamçîyan, bê  
nan û xwarin, heyâ mehek derbasbû û li  
dawiyê dan ber tivingan û kuştin.

Di wan rojan de, roja 30.08.1930'an de  
Encumena Karbaz a Nivîsgeha Karkerêñ  
Sosyalist ê Navnetewî li Zürich dijî van  
kirinê sermîriya Tirkî ev dijxuyaniya jêr  
derxist:

"Encumena Karbaz a Nivîsgeha Karkerêñ  
Sosyalist ê Navnetewî, di roja 30.08. 1930'-  
an de, civiya serhev û ev biryar derxist:

Encumena Karbaza Nivîsgeha Karkerêñ  
Sosyalist ê Navnetewî bala cîhanê dikişîne  
ser kuşîkariyêñ ku sermîriya Tirkî dijî Kur-  
dêñ ku bo azadiya xwe dixebeitin dike. Ew li  
dijî gelê Kurd ê ku dinale û tevî serhîdanê  
bûye, bi rengekî, Tirk dixwazin ê ku anîne  
serê Ermenîyan bînîn serê Kurdish jî, bêyî ku  
raya giştî di netewêñ mazin de dij vê hovîtiye  
derkeve. Encumen dijwariyê dirist ên ku  
aşîtiyê diçîrinin, bi derbasbûna tiûbêñ Fari-  
sî, ji aliye leşkerê Tirk ve, berçav dike. Ev jî  
nişaneke diyare bo nehêjabûna karê komî-  
teya cîhanê ya navnetewî, ya ku rûmetâ  
hêzên leşkerî diçîrine, bi hêrisen xwe yên ku  
dij netewêñ jar. Encumen bang li cîhanê  
dike bo dijderketina van kirinêñ ku li Kurdistanê  
dihêñ kirin, ev bûyerên xwînî yên ku  
gelê Kurd têde dibe goriyek."

**Rojnameya -El Ehram- ya Misrî  
09.09.1930**

*Li jêr, em navêñ gundêñ Kurdan  
êñ ku di navberê salêñ 1925 û  
1928'an de ji aliyê lêşkerêñ  
faşist ên Tirkêñ mêtînger ve  
hatine arkirin û hejmarêñ malan  
û kuştîyan di wan gundan de,  
datînin pêşıya xwendevanan:*

(Jêder: El Qediye El Kurdiyye - Paşeroj û dema Kurdan a niha. Komela Xweybûn, Belavoka 5 ê, Dr. Bilec Şêrguh, Çapxana Dar, El Seade -Qahîre / Misir, 1930.)

**Herêma Daraxînê:**

Mirsohah	45	12
Erdîşad	15	4
Kildan	10	8
Sokix	12	12
Keşkodar	8	50
Kerlenoşî	30	18
Şenîsan	25	36
Mezekor	8	12
Şîvan	300	150
Şîdnan	20	7
Têwermîn	10	13
Qorînî	15	12
Meradan	30	17
Kîsbas	7	13
Tînaq	15	13
Boxan	15	37
Moskî	10	13
Qazona	80	13
Mezrî Mazin	33	22
Qolen	15	21
Xana Sohr	80	25
Hot	30	12
Sîzahîl	15	20
Tarbacor	200	85
Şîn	32	81
Aşkêr Sohr	18	2
Deyrî qorî	13	5
Yazam	16	2
Arakîl	18	3
Arakîlê Biçûk	30	20
Efî Caban	28	10
Arakîl Bosirdaq	50	18
Kermîk	16	12
Derşî Malan	21	14
Cîrkek	25	3
Ziyaret	19	20
Walîs	90	28
Moran	50	4
Rot Ça	100	75
Cihenî	80	45
Qoryat	150	12
Bormek	18	11
Yehde Bîr	19	22
Dîlkitan	16	15
Dirî Nalî	28	25
Aliyan	160	88
Elfiyan	50	80
Keydamor	16	33
Melle Ebdellah	30	16
Helalan	19	17
Gundê Kevin	16	11
Xirabe	26	9
Lîto Mîr	20	8
Qartax	5	12
Teviya gundan	2.207	1.326
Teviya gundan	1.294	6.419

**Herêma Erdoşînê:**

Kehat	25	5
Koçgîr	10	9
Qof	30	163
Sayer	15	75
Birûç	25	4
Kildar	5	12
Sifan	15	27
Teviya gundan	125	295

**Herêma Çewlikê (Bîngol):**

Azîzan	65	5
Şahnaz	45	22
Sîdan	25	120
Sîfi	40	15
İnfiyokî Sor	207	12
İnfiyokî Zer	37	18
Dik	50	29
Qos	25	13
Canî	47	95
Hîzaban	10	9
Fahizyan	20	12
Teviya gundan	571	350

**Herêma Mistbînê (Nisêbin):**

Kerhişî	35	40
Kertodîn	100	5
Arbed	45	50
Nêrgiz Lo	15	20
Til Yakup	10	52
Til Mercê	20	19
Şûşanî	50	72
Bakisyan	30	62
Xorîn	35	19
Keleh	100	35
Teviya gundan	440	374

**Herêma Hibabê:**

Marîn	50	50
Girê Mîra	40	70
Merbab	40	12
Gundik Şikro	45	50
Kanter	45	28
Til Hesen	38	40
Til Cîhan	102	50
Aznawur	30	28
Badib	50	15
Xirabê Nîşkan	15	19
Sêderî	20	15
Xirabê Alê	120	150
Xirabê Kefrê	35	86
Nîvê Hibab	20	12
Evşê	30	5
Baminmin	40	80
Kilsîwar	60	19
Kinik	25	60
Qulibkan	20	28
Şoşanî	50	25
Kîbwê	40	60
Teviya gundan	870	902

**Gundêñ Hejmara Hejmara  
Kurdan: malan: kuştîyan:**

**Herêma Licê:**

Pîstet	40	200
Herax	50	250
Fera	30	150
Baqîn	150	848
Matmor	15	15
Milîkan	50	249
Cofhîn	25	120
Barsam	23	64
Mazmaz	40	198
Sitî	60	299
Tipe	70	349
Cîlkenî	40	200
Sîrdî	50	249
Dêrqam	30	150
Camalas	40	200
Fisî	60	298
Fitetîs	52	260
Şeqlat	80	398
Horf	30	150
Reza	60	292
Ênkol	15	75
Dayla	30	147
Marqî	30	150
Sellî	120	585
Kollî	15	75
Ferhad	18	90
Dizdînî	16	87
Alek	15	74
Bermal	10	49
Tozle	30	148
Teviya gundan	1.294	6.419

**Herêma Kerboranê:**

Dêr Salîb	30	62
Hermês	20	82
Çêlik	22	28
Teviya gundan	72	172

**Herêma Hesenkîfê:**

Dîrhan	10	25
Hîsan	12	18
Qesir Zêrin	15	28
Teviya gundan	37	71

**Herêma Amedê (Diyarbekir):**

Koxnî	50	28
Bâşmemlo	40	50
Qamişlo	35	40
Korgicî	13	58
Teviya gundan	138	176

**Herêma Kincê:**

Milkan	80	122
Hizar Şaw	60	82
Biroc	25	68
Ifak	28	40
Solahan	100	150
Xîrbê Zo	30	84
Yekmal	18	56
Azad	32	64
Qas	17	40
Boklan	100	45
Xakbin	40	64
Mazgîft	8	19
Sitirbas	10	48
Milla Birman	25	64
Sirban	50	80
Inkak	20	64
Teviya gundan	643	1.090

**Herêma Eyfnotê:**

Eyfnot	25	80
Mîtsî Yazar	30	60
Qamikan	20	40
Qamî Reş	30	50
Tohla	150	180
Cirk	60	28
Boran	30	48
Cîban	30	60
Corîk Şîman	10	28
Baxçe	80	40
Şîrane	5	15
Qere Balcik	60	88
Şaxfîs	60	92
Teviya gundan	590	809

Gund bi tevayı:	Teviya malan:	Teviya kuştıyan:
211	8.780	15.283

**Herêma Alîkan:**

Til Şivan	35	71
Sitûran	40	80
Abdiakan	50	100
Dilawê Qesrê	60	107
Haci Kesan	30	90
Xirabê Mişkê	50	120
Serkanî	15	70
Hisab Sikoze	20	50
Xirabê Qesrê	25	60
Dîbek	100	64
Dîtron Axa	25	160
Kimkan	30	50
Şêx Xidir	25	59
Bawerd	20	60
Şabork	20	60
Kan Xirab	30	60
Banîh	15	45
Birinci	170	75
Alaqamiş	30	315
Teviya gundan	790	1.671

**Herêma Midyadê:**

Bacîn	80	40
Kemalab	20	18
Barbansî	30	20
Dalîn	150	220
Nibil	100	195
Mukrî	70	120
Teviya gundan	450	613

**Herêma Bacerînê:**

Dirşamî	15	52
Kîsfirb	75	160
Qertemîn	10	29
Nîvbacerîn	45	18
Tihrizî	30	19
Soran	40	55
Dâskan	30	67
Xakîwan	25	56
Mişde	20	60
Aynord	30	67
Mizîzex	120	220
Taqe	20	58
Kefrê	50	78
Habînkan	18	48
Kemî	25	28
Teviya gundan	553	1.015

## Bedirxan

Lê lê Meyro! Lê lê Meyro! Lê lê Meyro!  
Lê lê Meyro! Lê lê Meyro!

Milê Xanê xweş mile Xanê!  
Bejna Bedirxan Beg zirave mîna bina tila, bina rêhanê  
Şemo yê Dêrşewî kire gazî:

Osman Paşa kuçik bab,  
Destê babê Têlî mîrê Botan şêrê Kurda  
Bite nayê te girêdanê  
De lo lo... lo lo...  
Li me tê dengê topan û cibexan û li pey me tê  
Heyfe bo mixabina dilê me dimînê  
Koçkê koşterê romiya  
Ketne şarê Cizîra Botan.

Heylo babo! Li min xirap dikin ciyê axan û eşîretê  
Lê lê Meyro! Lê lê Meyro! Lê lê Meyro!  
Milê Xanê bilinda le dewrê rêyo  
Osman Paşa yawork kişande qoça mîsila  
Ez dikim û nakim qewata min naşêyo  
Bila qewateke giran hîja ji mi'ra bêyo  
Topê mezin bila ji mi'ra bêyo  
Hesenê Hewîrî, Tahîrê Meymo, Samiyê Lotî  
Şemoyê Dêrşewî kopikê mezin  
Iro serê heft sala li çiyayê Ewreqê  
Bîna asêyo  
De lo lo!... lo lo!...  
Li me tê dengê topan û cibexan û li pey me tê  
Heyfe bo mixabina dilê me dimînê  
Koçkê koşterê Romiya  
Bi ser welatê şarî Cizîra Botan da  
Heylo babo! Li min xirap dikin ciyê sanceqa eşîretê

Lê lê Meyro! Lê lê Meyro! Lê lê Meyro!  
Lê lê Meyro! Lê lê Meyro!

Milê Xanê daketim wa bilayloka  
Osman Paşa yawork kişand qoça mîsila  
De bila bît ji me ra topê tem biçîka  
Hesenê Hewîrî, Tahîrê Meymo, Samiyê Lotî  
Sê roja ser dikin li geliyê Ewreqê wekî keyfî zava û bûka

De lo lo!.. lo lo! lo...  
Li me tê dengê topan û cibexan û li pey me tê  
Heyfe bo mixabina dilê me dimînê  
Koçkê koşterê Romiya  
Ketne şarê Cizîra Botan  
Heylo babo! Li min xirap dikin ciyê mîran û eşîretê

Lê lê Meyro! Lê lê Meyro! Lê lê Meyro!  
Lê lê Meyro! Lê lê Meyro!

Milê Xanê xweş mile Xanê!  
Bedirxan Beg dike gazî.

Hesenê Hewîrî, Tahîrê Meymo, Samiyê Lotî  
Şemoyê Dêrşewî kire gazî:

Mîro!  
Emê çawa şerê nakeyn be aşiq û dila  
Evro şer bima herçar xweş mîra  
Mîna keyfî zawayan û xemla bûka  
Mîro!  
Ma te nezanî li me hate kuştin Tahîrê biçîka?

De lo lo!.. lo lo!..  
Li me tê dengê topan û cibexan û li pey me tê  
Heyfe bo mixabina dilê me dimînê  
Koçkê koşterê Romiya  
Ketne şarê Cizîra Botan

Heylo babo! Li min xirap dikin ciyê sanceqa eşîretê  
Lê lê Meyro! Lê lê Meyro! Lê lê Meyro!  
Lê lê Meyro! Lê lê Meyro!

Milê Xanê xweş mile Xanê!  
Mîr Bedirxan bi sê denga kire gazî  
Hesenê Hewîrî, Tahîrê Meymo, Samiyê Lotî  
Şemoyê Dêrşewî:

Osman Paşa sekinî li Cizîra Botan  
Bi rojê eskerê xwe kom dike  
Bi şevê berê li dikete ser rîza gunda  
Ev şev min divê bavêne ser ordiyê  
Wî kuçik babî...  
Bibirrin serê topcî û qumandara

De lo lo!.. lo lo! lo... lo...  
Li me tê dengê topan û cibexan û li pey me tê  
Heyfe bo mixabina dilê me dimînê  
Koçkê koşterê Romiya  
Ketne şarê Cizîra Botan  
Heylo babo! Li min xirap dikin ciyê sanceqa eşîretê

Lê lê Meyro! Lê lê Meyro! Lê lê Meyro!  
Lê lê Meyro! Lê lê Meyro!

Milê Xanê xweş mile Xanê!  
Mîr Bedirxan bi sê denga kire gazî  
Hesenê Hewîrî, Tahîrê Meymo, Samiyê Lotî  
Şemoyê Dêrşewî.

Osman Paşa sekinî li Cizîra Botan  
 Bi rojê eskerê xwe kom dike  
 Bi şevê berê li dikete ser rêza gunda  
 Ev şev min divê bavême ser ordiyê  
 Wî kuçik babî...  
 Bibirrin serê topcî û qumandara

De lo lo!.. lo lo! lo... lo...  
 Li me tê dengê topan û cibexan û li pey me tê  
 Heyfe bo mixabin dilê me dimînê  
 Koçkê koşterê Romiya  
 Ketne şarê Cizîra Botan

Heylo babo! Li min xirap dikin ciyê sanceqa eşîretê

Lê lê Meyro! Lê lê Meyro! Lê lê Meyro!  
 Lê lê Meyro! Lê lê Meyro!

Milê Xanê xweş mile Xanê!  
 Mîr Bedirxan bi sê denga kire gazî  
 Hesenê Hewîrî, Tahîrê Meymo, Samiyê Lotî  
 Şemoyê Dêrşewî.

Osman Paşa sekinî li Cizîra Botan  
 Bi rojê eskerê xwe kom dike  
 Bi şevê berê li dikete ser rêza gunda  
 Ev şev min divê bavême ser ordiyê  
 Wî kuçik babî...  
 Bibirrin serê topcî û qumandara

De lo lo!.. lo lo! lo... lo...  
 Li me tê dengê topan û cibexan û li pey me tê  
 Heyfe bo mixabin dilê me dimînê  
 Koçkê koşterê Romiya  
 Ketne şarê Cizîra Botan

Heylo babo! Li min xirap dikin ciyê sanceqa eşîretê

Lê lê Meyro! Lê lê Meyro! Lê lê Meyro!  
 Lê lê Meyro! Lê lê Meyro!

Milê Xanê xweş mile Xanê!  
 Mîr Bedirxan bi sê denga kire gazî  
 Hesenê Hewîrî, Tahîrê Meymo, Samiyê Lotî  
 Şemoyê Dêrşewî.

Osman Paşa sekinî li Cizîra Botan  
 Bi rojê eskerê xwe kom dike  
 Bi şevê berê li dikete ser rêza gunda  
 Ev şev min divê bavême ser ordiyê  
 Wî kuçik babî...  
 Bibirrin serê topcî û qumandara

De lo lo!.. lo lo! lo... lo...  
 Li me tê dengê topan û cibexan û li pey me tê  
 Heyfe bo mixabin dilê me dimînê  
 Koçkê koşterê Romiya  
 Ketne şarê Cizîra Botan

Heylo babo! Li min xirap dikin ciyê sanceqa eşîretê

Lê lê Meyro! Lê lê Meyro! Lê lê Meyro!  
 Lê lê Meyro! Lê lê Meyro!

Milê Xanê xweş mile Xanê!  
 Bi va bidara û bilalîka  
 Herine şarê Cizîra Botan  
 Xweş tê dengê zawayan û bûka

Lê lê Meyro! Lê lê Meyro!..

Zeyneb Xatûn kire gazî li Musil û Bexdayê  
 Topa radikêşîna Tapan Paşa  
 Topê Kelê reş ji me ra ïna  
 Osman paşa koma bendê te dane gazekê  
 Wan pîra û biçîka

De lo lo!.. lo lo! lo... lo...  
 Li me tê dengê topan û cibexan û li pey me tê  
 Heyfe bo mixabin dilê me dimînê  
 Koçkê koşterê Romiya  
 Ketne şarê Cizîra Botan

Heylo babo! Li min xirap dikin ciyê sanceqa eşîretê

Lê lê Meyro! Lê lê Meyro! Lê lê Meyro!  
 Lê lê Meyro! Lê lê Meyro!

Milê Xanê xweş mile Xanê!  
 Mîr Bedirxan çu seyrana serê  
 Meyt kîşane mîna kayê li coxîna  
 Leşê esker û top û cibexane mane li çolîna  
 Bang kir siwara serê betal ken hing razîna?  
 Şemoyê Dêrşewî kire gazî:

Meyro dane ba dêrgula rengîn ciyê meya  
 Destê me bê ser lê we naba

De lo lo!.. lo lo! lo... lo...  
 Li me tê dengê topan û cibexan û li pey me tê  
 Heyfe bo mixabin dilê me dimînê  
 Koçkê koşterê Romiya  
 Ketne şarê Cizîra Botan

Heylo babo! Li min xirap dikin ciyê sanceqa eşîretê

Lê lê Meyro! Lê lê Meyro! Lê lê Meyro!  
 Lê lê Meyro! Lê lê Meyro!

Milê Xanê xweş mile Xanê!  
 Zeyneb Xatûn pêş eskerê Osman Paşa ve cü  
 Celemê hespê Osman Paşa girt û berneda  
 Osman Paşa ketne tora te û babê te  
 Destê babê Tîlî Beg heta bajêrî Diyarbekrê  
 Li kelepçe mede

De lo lo!.. lo lo...

Li me tê dengê topan û cibexan û li pey me tê  
 Heyfe bo mixabina dilê me dimînê  
 Koçkê koşterê Romiya  
 Ketne welatê şarê Cizîra Botan

Heylo babo! Li min xirap dikin ciyê Mîran û eşîretê.

# Kurd kî ne, Kurdî û Kurdistan ci ne?

E. Xemgîn



Pirsa gelê Kurdistan niha pir aktuel û rojenin e. Hersê pirsên sernivîsê de ji, binyada vî gelê avadikin. Ev hersê tişt, di hebûna gelê Kurdistan de, bi hev wusa girêdayine, ku nekaribin ji hev bêñ dûrxistin. Lewma berî her tiştî pêwiste ev rind bêne têgi-hîstîn:

## Ji bo pirsa "Kurd kî ne"

a) Zana, lêger, vêkolîvan û nivîsevanêñ Tirkîyê, ku bireka ji Kurdistanê vegirtiye, dibêjin bin-yada Kurdan ji Tirkan dihê. Li ser vê baweriyê ji bangêşa (propaganda) xwe dikin. Weke dîtin û bawerîya wan, gelê Kurd, ji gelên Asya Navîn ên Tirk e. Ji Asya Navîn koçkiriye û hatiye li van herêmên çiyan xwe bicikirîye. Piştre ji zimanê dayika xwe yê Tirkî jibîrkiriye û zimanekî li gora rewşa xwe aniye serhev û navê vî zimanê têkîlîhev ji Kurdf daniye. Ji bo, bi gelê Kurd pejirandina vê dîtin û bawerîya derevkar ji, hinde bawirnameyêñ (dokumanêñ) sexte şanî gelê me dikin. Lê tu bawirnameyêñ nivîsi, nenivîsi, arkeoloji û dîrokî nikarin şanî bikin, ku gelê Kurd ji Asiya Navîn hatiye, berî ku xwe li Rojhilata Navîn bicih kiribe. Ev baweriyênerast, perçek ji polîtika Komara Tirk e, ku bi armancû mebestê ji xwe re dike hacetêñ destan. Tenha polîtkayêñ Komara Tirk, ên li ser kesêñ ji nijada Tirk, û li ser gelê Kurd ji bo bê bingeh kirina baweriyêwan bes in; ji ber ku polîtkayêñ li ser herdu gelan, ji bingeh ji hev cihê û cuda ne. Komara Tirk, dixwaze gelê Kurd seranser asîmle bike (bihelîne) û bike bin xizmet û fermaña Tirkan.

b) Lêger û nivîsevarêñ Erebani ji, ku ew ji bireka Kurdistanê vegirtine, dibêjin "Ekrad" bi nîjada xwe Ereb in, ji Samiyan dihêñ. Ew ji li gora vê baweriyê bangêşen xwe dikin. Lê tiştîkî ecep ji dibêjin, weke ku "Kurd ji nijadeka cinan dihêñ". Ereb, gelê Kurd ji dîrokê ve rind nas-dikin. Lewma ji dixwazin ji aliyan-

çandî, civakî, polîtikî û dîrokî ve Kurd bigîhînin Erebani. Pêwest dixwazin bikin birekî çanda polîtik û serpêhatina İslâmî ya Erebani. Bi vî avahî gelê Kurd bêafîgir (notûr) bikin. Belê ev dîtin û baweriyêñ Erebani, di xwe de armancêñ polîtik vedîşerîn û li çewta rastiyêñ dîrokî ne. Gelê Ereb, di navbera salêñ 3000 û 2800'an berî zayinê (b.z.) ji Afrika Bakur hatine Rojhilata navîn û xwe bicih kirine. Berî wan û bi gelek salan, Kurd niştecihêñ Rojhilata Navîn bûn. Ereb ji wek Tirkan dibêjin, ku pişî Kurd hatin van deran zimanê xwe yê Erebî jibîrkirin û ji xwe re zimanekînuh, bi navê "Kirdî" avakirin.

Pir eşkereye ku ev baweriyêñ Erebani, ji bona ku Kurd bibin perçek ji Erebani, derdi-kevin holê. Ev yek ji ji polîtika Erebani, ya li ser Kurdan rind derdikeve pêşîya çavan. Di sala 1963'an de "Hevgirêdana Erebani" di civîneka xwe de bîryarek welê girt: "Bi tu rengan em des-tur nadin ku dewletaka Kurdf di nav welatêñ Erebani de, ku ji herêma Basra heya Okyanusa Atlas xwe dirêjdikin, bê damezirandin. Dewletaka wusa wê ji bo Erebani, bibe Îsraileka duwemîn..." Ji roja ku îdeolojiya Baas, ku nûneriya nijadperestiya Erebani dike, derketî heya niha, dijmina-hiya gelê Kurd dihê kirin û tu guhartîn ji di vê warê de hîn nebûne. Pêwendî û têkiliyêñ Erebani, ên digel dijminêñ gelê Kurdistan û mêtîngaran, van baweriyêñ Erebani bê bingeh û rizî dikin. Bi vî avahî em dibînîn, ku armanca Erebani ji Erebkirina gelê Kurd e.

c) Welatê sêwemîn ku Kurdistan vegirtiye İran e. Lêger û nivîsevanêñ Farisî ji dibêjin Kurd bi binyada xwe Faris in. Çend eşîretêñ Farisîne. Kurdf ji zara-vveyeka Farisî ye. Ev dîtin ji li ser bingeha helandina gelê Kurd xwe avadike. Lê pişî ku di sala 1935'an de bin rêberiya şahînşahî İranê Şah Rêza Pehlewî tevgera "Panîranîzmê" (Pan Ar-yenî) hate birêvexistin pêde, ev baweriyêñ Farisan ji ji ber xwe belavbûn. Bi bawerîya "Panîranîzmê" dijminahî li diji gelê Ereb an ji li diji dewleta İraqê duxuyan kirin; di vir de xwestin gelê Kurd ji xwe re mîna hace-

tekê bikarbînin û bikaranîn. Herwusa pêwendiyêni di navbera û Iran-Tirkiyê de yên di sala 1930'an de û encamên pêwendiyêni di navbera û Iraqê yên di sala 1975'an de, tewrê û Iranê ji me re eşkere dike û diyar dibe ku, çuqas baweriyêni wan bê bin-geh û bi derew in.

Bilî van dîtin û baweriyêni jorîn, baweriyek din heye, dibêjin Kurd ji Bakura Almanya hatine Kurdistane. Lê ev bawerî ji neraste û bê bingehe. Tu remz û dokûmeneka arkeoloji ya dîrokînîne ku, şanî me bide, Kurd ji herêmeka Bakura Almanya hatine, berî ku li Rojhilata Navîn xweyîcih bibin. Hin reyên koçbûnê dihêن şanîkirin, lê di vir de dîsa tu şop nîne ku îspat bike, Kurd ji ser van reyan hatine Kurdistane. Lewma diyar dibe, ku ev bawerî ji derew e û bi mebeste.

Hin berhemên arkeoloji û vekolîn datîni holê, ku berî sala 150.000 b.z., mirov li Kurdistane jiyane. Ev mirov pişti salên 12.000 b.z. li Kurdistane bûne xweyîcih, ev ji dawiya kolînen arkeoloji û lêgerînan dihê îspat kirin. Ew kes û dorêni ku dibêjin Kurd ji herêmên din ên cihanê hatine Kurdistane û bûne niştecih, nikarin ji me re îspat bikin, ka berî Kurdan kîjan gel li van herêman dijîyan. Bersiva pirseka wusa nikarin bidin!

Li Kurdistane hinde lêgerîn û

zebatêni arkeoloji hatine kirin. Ji van dihê derxistin, ku ji qurnê kevnartîrin heya sala 2.800'ê b.z., tenha gelê Kurd li vira jiya ye. Pişti sala 2.800'ê b.z. de, êlêni Ereban (Samiyan) ji hêla rojava hatine û xwe li heremên Mopotamiya yên jêr û navenda Kurdistane bicihkirie. Ev rastî ji dokûmenêni Akkadan, Asuriyan û Sûmeran ên nivîsi û nenivîsi derdikeye holê. Lewma diyar dibe, ku gelê Kurd pêşemîni di navbera salên 3.000 û 2.800'ê b.z. de rastî gelê Ereb bûye.

Nexasim berî ku gelê Ereb (Samî) bêni Kurdistane bi gelek salan, Kurd xwe li Kurdistane bicih kiribûn û di salên 7.500'an b.z. de bajar û Gund avakiribûn. Di navbera salên 6 û 5.000'an b.z. de, di zêw û bexçeyan de şînahî û sebze çinandine, heywan ji xwe re kedî kirine. Digel kerî û garanêni heywanan dest bi jiyaneva civakî kirine. Herwusa dihê zanîn, ku di van salan de mirov derbasi dema bakirê bûne. Hatiye îspatkirin, ku mirovan di van salan de di nava xwe de bazarganiye (ticaretê) pêşvebirine û ji bo çêkirina seramîkan, etûnan (agirdan) bikaranîne. Ev işaret gişt û dokûmenêni arkeoloji yên paşê, datîni pêşîya çavan, ku di peyvajoya demê de gelê Kurd li gora jiyana xwe çand (kültûr) ji birêxistiye û ji wan deman gelê Kurd xwedîyiye gelek dewlemendiyêni çandî ne. Ji van dewlemendiyêni çandî, gelek ji

wan niha li Kurdistane hinek pir hatine guhartin, hinek ji bi binî nehatine guhartin û bi vî avayî hîn ji hene. Hînkar; di wê demê de xaniyêni mîna "konî" ku jêrêni wan girover bûn, dihatin çêkirin. Lê niha li Kurdistana Bakura Rojava em rastî xaniyêni bi vê nolê dibin.

Di pirtükêni dîrokî de dihê gotin ku di sala 2.400'ê b.z. de dewleta yekemîn li cihanê bi navê Akad hatiye damezirandin. Lê em dibînin ku berî wan bi 200 salan,ango di sala 2.600'ê b.z. de, bapirêni eşîren Kurdan ên ku niha bi navê Luriyan dihêni nas-kirin, bin rîberiya qîralêni xwe Kamassî dewleta yekemîn bi navê Gutî damezirandine. Navê Lur, wê demê Lulu hatîbû danîn. Gelê Kurd ê ku di herêmên Elam'an de dijiya, di destana bi navûdeng Gilgamiş de jî dihê bi navkirin û nimandin. Di wir de dihê gotin, ku Kurd di sala 3.000'ê b.z. de seranser bûne hakimîn êrdima mezopotamiya yên. Her di destana Gilgamiş de dihê gotin, ku berî tofana Nuh Piyambir û pişti tofana Nuh Piyambir, yên ku hatin mezopotamiya xwarê (jêr) û xwe bicih kirin, ji herêmên çiya yên li rojava û bâkur hatin jêra mezopotamiya yên.

Dîsa di destana Gilgamiş de û di encama kolandanîn de navê Piyambir Nuh bi vî awahiye: "Utnapiştim". "Nuh" ji di zimanê Kurdu de tê mana tiştekî teze, tiştekî heya hingê nebûyî. Keşteya Piyambir Nuh ji li ser Çiyayê Cudî daniye. Wekê tê gotin, di roja heftemîn ya tofanê de Piyambir Nuh kevokekê difirîne. Gava kevok diçe û venagerê, dibêje ku "cih dî" bi vî avahî navê çiya dibe "Cîdî" an ji weke dihê zanîn ji vê tofanê tenê 8 kes nemirine: Piyambir Nuh û jîna wî, 3 kurêni wî û 3 bûkêni wî. Ev 8 kes ji xwe re gundik avadikin, bi navê "Heyş". Ev gund niha li nézîkî İlohhî (Batman) ye bi navê gundê "Heştan" dihê navkirin. Ji vê bûyerê derdikeye holê, ku Piyambir Nuh ji Kurd e û di wan deman de li Kurdistane Kurdan jiyan dikir. Herweha dihê zanîn, ku hersê piyambirêni Zerdeşî li Kurdistane ji dayîka xwe bûne û jiyane û Zerdeşî dawî di sala 639'ê b.z. de ji dê bûye û ew bi xwe ji Kurd e. Pirtûka pîroz ya Zerdeşî "Avesta" ji bi Kurdu ha-

tiye nivîsin.

Di bawirnameyêni nivîsi yên Akad, Misr û Asuriyan de, Kurd bi gelek navan hatine nimandin. Di wêneyan û rolyefêni ji kevirî de taybetiyêni Kurdan gelek caran bi kûrî hatine zimên. Ji hêla din êl û eşîren gelê Kurd di dîrokê de gelek dewlet damezirandine. Weke; dewleta Elam; di sala 2600'ê b.z. de dewleta Lulu, di sala 2233'ê b.z. de Gutî, di sala 1595'ê b.z. de Kardunaj, di sala 636'ê b.z. de Babil, di navbera salên 2000 û 1595'ê b.z. de Hurî-Mitânî, di sala 1240'ê b.z. de Urartu, di sala 1900'ê b.z. de Mar, di sala 649'ê b.z. de Mediya (Med) û gelek dewletêni. Piraniya van dewletan di dema xwe de navendê çand, zanyarî, civakî (sosyoloji) û konevanî (po-lik) bûn bo cihanê. Bi xwe navend û metropolên cihanê bûn. Van dewletan di matematikê de, di xanemanî de (avakirina avahîyan) de, di warêni civakî de û di ticaretê de hinde pîv û pîvanê nirxî peydakiribûn, ku iro ji hîn dihêni bikaranîn. Weke cudatiya nirxan di nav zîv û zêr de, weka diravîyen di ticaretê de dihêni bikaranîn, weke bi faiz dayina tiştên bûha û pêwist ji, weke îcadêni di warêni matematik, konevanî û felekzanînê (astronome) de.

Di sala 334'ê b.z. de, Îskenderê Mezin yê Makedonyayî Kurdistan vegirt. Dure ji hinde êrdimêni li rojava ji hêla Româyiyan hatin vegirtin. Di vir de eşkere dibe ku di vê demê de civak hebekî berpaşve çuye. Lê gelê Kurdistan lêdana mezintir di dîroka xwe de ji Erebêni misilman girtiye. Ereban bi koteke welatê Kurdan vegirtiye û bi koteke ji misilmanî bi Kurdan dane pejirandin. Di vê demê de gelê Kurd, di warêni çandî, aborî, gelnasî, civakî û siyasi de afeteka mezin jiya ye. Rastûrast bi ferman û destura xalîfe İslâmî Omer, hemû dokumanêni nivîsi û nenivîsi yên Kurdan hatine sohîtin. Peyva bi zamanê Kurdu hatiye qedexe kirin. En ku bi Kurdu diaxifîn, zimanê wan bi meqesê hatiye birîn. Erebêni misilman, pişti hatin Kurdistanê û demêni paşê de, gelek caran gelê Kurd vebirandin û qir kirin. Pişti ku misilmanî bi zorê kete Kurdistane pêde, xebat nebû rakirina

şopêن wê afetê. Bêhtir jê re xebat hat kîrin, ku Kurd çêtir bi avahiya Erebî bên girêdan û gelê Kurd ji nêzîk ve bi çanda Erebî bê girêdan. Di vê demê de, gelek serîhilanîn Kurdan bi xwînê hatin şikandin. Bi vî awahî, bi zorê gelê Kurd xistin nav avahiya Ereban ya misilman. Gelê Kurd di demê de, hêdî hêdî xwe jibirkir û biyanî xwe bi xwe ket.

Bi vê şêweyê gelê kurd bi koteke kete bin xizmeta Erebêni misilman. Gelek xanedanîn Kurd karguzariya avahiya Ereban kîrin, weke ku Ebu Müslümê Horasanî yê Kurd ku di sala 750'an de saltanata Emevî rûxand û li şuna vê xanedaniya Abbasî ya Ereban damazrandî. Hemû rapirîn û serîhilanîn Kurdan, mîna dewletêni Kurdi yêni bi navê Ziyyar (di sala 930'an de), Alamud (1077), Hamdanî (929), Şeddadî (951), Padusaban (962), Hasanveyh (971), Büveyhzadan (934), Mervanî (985), Fadlavî (1156), Gor (1148) û di sala 1171'an de dewleta Eyyûbî ku ji hêla Salahaddînê Eyyûbî hatîbû dameziandin, nekarîn xwe ji avahiya Erebêni misilman qutbikin. Li kîleka xizmeta ji bo gelê Kurd, di xizmeta bo Erebêni misilman de, tu kîmasî şanî nekirin.

Diencama vê rewşê de, begên feodal û serekêni eşîran û derdorêni oldar ên Kurdi, daku mazinahiya xwe li ser gelê Kurd biparêzin û hirmeta bo xwe zînde bigirin, destpêkirin ku bejin, ji malbat û nijadêni komutanêni Ereban an ji ji malen bi nav û deng yêni Ereban dihênen. Ev birêni Kurdan, seranser biyanî xwe ketin û bûn heyranîn biyanîyan. Lî rastî tu pêvendiyêni xwînî bi Ereban re, yê wan kesan nebûn. Lî em dikarin xweş bibînin, ku çawa tovîn ji hêla Ereban di nav gelê Kurd de hatîbûn çinandin, fêkiyêni xwe dabûn. Nirx û dewlemendiyêni çandî yêni Kurdan, bilî hemû pîkolî û nîriyan hatîbûn parastin; lî rastî êrîşen wan biran bûn û hatin herifandin. Di rojêne me de ji, kesen vê nolê digel mêtîngoran êrîşî nirx û hebûnê netewî yêni zîmkâni dikin û dixwazin van tunebikin. Ev destekêni mêtîngoran ên li Kurdistanê ne û misyoneriya konevaniyêni mêtîngoran dikin.

Pêvendiyêni gelê Kurd bi Farisan re, cara pêsemîn di nivê

sedsala heftemîn de (berî zayînê) çêbûne. Di wê demê de dewleta Kurdan ya bi navê Međiya li dijî dewleta Asuriyan şerdiye. Faris jî, nola eşîrekê piştigiriya Medan dikin. Bi vî awahî navê Farisan di dîrokê de cara yekemîn dihê navdan û nimanîn. Dihê gotin, ku di vê demê de bapirê Kyros yê bi navê Aksamenîd, bi rengê serekê eşîren Farisi, alîkariya Medan dike û li dijî Asuriyan şer dike. Ji vê rûdanê derdikeve, ku cara pêşîn di vê demê de têkiliyêni Farisan digel gelê Kurd çêbûne. Lewma em dikarin bejin, ku gelê Kurd di êrdimê de li kîleka gelê Farisan dijiya û ev herdu gel merivêن

karîn hatina van gelan bira-westînin. Di sala 1041'an de, Oxuzan şerek li dijî Büveyhzadan yêni Kurd bilindkirin û biserketin. Dure jî Oxuzêni Tirk, ber bi rojava ve bêhtir hatin û xwe gihadîn Asiya Pêş. Bi vî awahî ew pêvendiyêni berê yêni cîranî, qulibîn pêvendiyêni kedxwariyê, pêvendiyêni bindest û serdetan. Berî ku herifandinê Oxuzan yêni li ser êrdimê Kurdistanê bêni rakirin, dirindeyêni Moxolî bi hovitiya xwe mîna afeteka mezin Kurdistan ji serî heya binî sohtin. Dure jî Harzamşahan û Tataran êrdimê Kurdistanê vegirtin, gelê Kurd vebirandin û hertiş hilweşandin. Di demeka

Herçuqasî di dema dewleta Osmanî de gelê Kurd xwestibe bi rengê mirikêni otonom yêni xwecîh jiyana xwe berdewam bike jî, ji ber hawîkanêni (reqabet) û nakokî û dubendiyêni olî di nav feodalêni Kurdi de û ji ber konevaniya Osmaniyan, avahiya Kurdan a bi rengê otonom di demê de ji holê hate rakirin û bi dewleta Osmanî ya navendî ve hatine girêdan. Ên ku nehatibûn girêdan jî, nekarîn tiştekî pir mezin bikin.

Damezirandkarê dewleta Safevi Şax İsmail bi xwe Kurd bû. Ji ber ku Şax İsmail Kurd bû, Kurdbûna wî sud û berjewend da gelê Kurd. Şax İsmail di wê demê de serokatiya olê Alevî (Şîî) kir. Ji ber ku xwest olê Alevî dorfireh bike û vê olê ji bo dewleta xwe bike bingeh, gelê Kurd yê Sûnî li dij rabû. Dewleta Osmanî jî, olê misilmanî yê Sûnî ji xwe re kiribû bingeh. Lewma Kurdistan Sûnî xwe gihadîn Osmaniyan. Ev dem ji bo gelê Kurd bû demeka tarî û vemirî. Herweha di şerî navbera Safaviyan û Osmaniyan de gelê Kurd hat bikaranîn û qirkirin. Kurdistan ji bû qada cengê. Ev doman ji bo gelê Kurd bû domaneka gelek bi xeter û nebaş. Di dawiya koteke Erebêni misilman de, debaşbûneka nexwerû di nav Kurdan de derket û gelê Kurd kérîkérî bû. Avahiya Kurdan bi dijwarî herifi. Evliya Çelebi ku di sedsala 17'an de jiyabû, dînivise ku 600 eşîren Kurd bi hêzeyeka ji 500 hezar kesen çekdar li dijî dewleta Eceman ji bo parastina dewleta Osmanî diwareka ji Şafîyan çêkiribûn.

Gelê Kurd, ku bi zorê bibû biyanê hebûna xwe, bi dijwarî kete bin fermana mêtîngoran. Serekêni feodal hîma xwe di parastin û bibûn misyonerîn ramyarî yêni Kurdistanê bo mêtîngoran. Bi vî awahî gelê Kurd şâşbû, tîrsîya, nedîzanî ci dibe û ji xwe dûr ket. Ji vê rewşa gelê Kurd mêtîngoran ji xwe re sûden mezin bidest anîn. Dewletêni mêtîngoran azînîn hevpare li ser gelê Kurd bikaranîn. Bi vî awahî gelê Kurd, di warêni aborî, civakî, çandî û konevani de, ji wan rojan xwe gihad van rojêni bin hoyen niha de.

**BERMA HEYE**



## Çîroka gelê me

Şilan

Hebû... nebû!..

Ji welatê Kurdan xweştir  
û şêrîntir nebû.

Ji bilî kuştin û birîn û zîndanan, zordarî û koteikî û kedixwariyê, dijminên gelê me û hemû mirovayetiyê, xwecihêñ Kurdistanê ji serax û welatê wan rakirin û derxistin. Gundêñ wan sotandin û bizavek tim bi gur kirin ku hebûna gelê me nehêlin.

Lew Kurd belav bûn, hinde ketin şerê serfiraziyê û jînê û hinde mişext bûne welatên biyani, bi hêviya hindê rojek bêtin, vegerin ser gund û warê xwe. Bab û dayîka Baranê, ji wan kesan bûn ên reviyane Ewropa û ketine bin darê mişextiyê û bê warî yê.

Wê çaxê hêsta Baran zayırek piçûk bû. Lê belê ji ber çîrok û serhatiyê babê xwe, yên li ser Kurdistanê û jîna Kurdan, Baranê têkelî û viyana xwe ji welatî neqetandibû.

Rojekê seydayê mektebê ji xwendekaran xwest ku her yek tiştekî li ser welat, an bajarê zarokîniya xwe bêjît û got:

— Sibe, vê çendê ji xwe re binivîsin û em wê li ser hevpeyvînekê çêkin. Baran zivirî mal û daxwaziya seyda gote babê xwe. Babê jî lê vegeeria û got:

— Keça min, nizanim ji ku derê bo te destpêbikim, di buyina gelê me de xweşî me ne dîtiye. Veca ez wê bêjîm û tu ji xwe re binivîse.

Bab kete vegerana çîroka Kurdan û digel her peyvekê xemek kûr dikete dilî û Baranê jî, ji xwe re çîrok nivîsi û roja paştîr di sibê de Baranê kaxezêñ xwe hilgirtin û çû mektebê.

Xwendekaran yek li dûv yekî kaxezêñ xwe xwendin ta dor gîhiştiye Baranê. Wê jî kaxezêñ xwe dan ber çavêñ xwe û bi dengekî zelal got:

— Ez Kurdim û welatê min di bêjinê Kurdistan. Kurd ji gelên rojhîlatî ne û dîroka mirovayetiyê diyar kiriye ku Kurd ji gelên dêrîn in li rojhîlatî. Me dîrok û zimanê xwe heye û Kurd bi zîrekî û mîra-nya xwe navdêrin, heval şêrîn in û mîhvân hewîn in.

Ji nişkê ve seyda gotina Baranê birî û got:

— Keça min Baran, em dixwazin li destpêkê tu sinor û tuxîbêñ welatê xwe bo me diyar bikî, ta zanîn û şehre-zaya hevalê te di welatê te de hebit.

Wê demê Baranê kaxezek mezin derxist û çû bi dîwarî ve kir û got:

— Ev e nexşeyê Kurdistanê ye. Kurdistan dikeve ba-kurê Rojhîlatâ Naverast. Rojhîlatê wê Iran û Yekîtiya Sowyet e û rojavayê wê Suriye û Deryayê Spiye û bakûrê wê Türkiye û başûrê wê Suriye û Iraq û Iran e.

Wê demê xwendekarek rabû ser piyêñ xwe, ji Baranê pîrsî:

— Ez nexşeyê cihanê baş dizanim û ev e li ber çavêñ me hemuyan e, lê ew welatê tu jê re dibêjî Kurdistan tune!

Baranê bersiva wî da û got:

— Raste Kurdistan li ser nexşeyê cihanê tune, lê se-dema wê parçekirina welatê me ye û nebûna sîstemek taybetî bo jîna me Kurdan e. Lê wek welat, kes nikare bêje Kurdistan tune.

Xwendekarek din rabû got:

Jaro gundo... gundo... gundo...  
Dilveker û kevî rindo...  
Kel dêrîn û serbilindo...  
Zerî xin û law huşmendo...  
Mixabin xweşî lê hindo...

Hey wax li min, hey wax li min  
Kehniyên çiyan co betal in  
Avahiyên gundan hemû divalin  
Lê dayê zaro ne li mal in  
Kerre... bêdengiye... dukêle...  
Agire... Kurd bo jînê dinalin.

— Wusan diyare xûşka Baran dixwazit nexşeyek nû bo cîhanê dirust ket. Hemû di ber de kenîn. Lê seyda ke-nen wan birî û got:

— Ez naxwazim kesek a-xiftina Baranê qetket taku dawiyê. Keremke Baran go-tina xwe bêje.

Baranê got:

— Me got kes nikare bêjî Kurdistan tune û ev û welatî kesên xwe hene ku Kurd in. Sedem û egera vê nexweşiyê ji Kurdan re çêbû, dilreşîya dijminên gelê me ne û ji ber qazanc û feydê xwe ev maf li me hatiye berzekirin. Lê ji bo hinde zanîna we hebit, li ser barê niha yê welatê me dibêjîm, her mafekê mirovayetiyê hebit, niha li gelê me hatiye girtin, ger ez bêjîm nahêlin Kurd bi dilê xwe zaroyêñ xwe nav bikin çêdibe hun bawer nekin, lê wusan e û hêştan bêhtir. Jîna me Kurdan jînek pir giran e, lawêñ me dikevin bin sêdarê, gundêñ me dihîn sotin, qîz di tarî û şevreşîya jînê de dijin, zaro çavêñ xwe li vê jîna xweş û şérîn vedikin û mejiyêñ wan tîjî dengê balefir û topan dîbit, yekem pêla ba diçite nav hinav û zikê zaroyêñ Kurd, bayê barutê û dûkêla sotina gundan e. Li cahî miyuzîk û awazên dilveker, li her der qêrin û naflîn, girî û zêmar, li her malekê dengek kûr derdikeve, lawê mino... keça minê... babo... dayê!..

Em tim weke we Ewro-piyan hevalê jînê ne, lê hemû stran û govendêñ me wusan destpêdikin:

## Yek-kirina nivîsa Kurdî

Şahînê B. Soreklî

Yek ji gavê, ku ê bikaribe rolek gewre bo yeketiya gelê Kurd bilîze, yek-kirina nivîsa zimanê Kurdî ye. Avêtina vê gavê li ber çavê hinan, bi taybelî li ber çavê hin hevwelatiyên me yên Soran, ji derketina ser hîvî dijwartîr bûye. Rastî ew e, ku bi pejirandina hêzên me yên siyasi, hebûna merovê

dilpak û xebatek jîr ji hêla rêxistin û kesên zana de ev mebest ê were bi cih kirin.

Ev gava ê bikaribe were avêtin, ger partiyê Kurdistan, bi taybelî yên rojhilat û başûrê Kurdistanê rê bidin rêxistinekê, ku bila komîteyek nemaze bona vê pîrsê were damezrandin û bixe-bite. Ev komîteyek kesên pîspor pêwîst e elîfbaya Hawarê bo elîfbayek gelempêr bike hîm û li ser wê elîfbayek nû bikemîfîne, elîfbayek ku ji vir û şûn ve bibe ya hemî endamên netewa Kurd. Dû gihiştina vê koçê, divêt ku pirtûkên elîfbaya nû bi yek tîp û program, lê di destpêkê de bi zaravên Zazakî (Dînbîl), Soranî û Kurmançî werin weşandin û belav kirin.

Dû avêtina her du gavêni li jor, divêt edî partî, rêxistinê çandî û kesên zana û niştimanperwer vê elîfbaya nû bigîhînin gel. Li vir pêwîst e, ku ji hêla komîteyek nemaze de demek were bi nav kirin, em bibêjin deh sal,ango ji vir ta deh salan elîfbaya nû ê şûna tî-

pên kevin bigire. Çawa? Di destpêkê de, ango di sala yekem de, hemî kovarek Kurdî ê bi aîkariya elîfbayen kevin ya nû di rûpelên xwe de pêşkêş kin; her weha hemî partî û rêxistinê çandî û di sala yekem de ji sedî 10 ji nivîsên xwe bi elîfbaya nû binivîsîn. Li milê din, nivîskarêk Kurd jî ê programekê bo xwe bidin ber çav, ku dû, em bibêjin, deh salan ê nema kesek edî bi elîfbayen kevin binivîsîne. Bo zaravên Kurmançî û Zazakî elîfbaya nû ê di demek kurt de were pêk anîn û ji lewra hejmarek gewre ji Kurdên başûr û rojhilat, ew yên dizanin bixwînîn, bi elîfbaya nivîsandina Inglîzî, yan Firensî, kêm zêde dizanin, pêk anîna elîfbaya nû ê bo Kurdên din jî ne weqa dijwar be.

Girîng e were gotin, ku bo pejirandinek mîrî li şûnên ku bona Kurdish nivîsandin ne qedexye, ango li Yekîtiya Sowyet û Iraqê, pejirandina van herdu hukumetan divêt, lê ne pejiran-

dina wan nedikare bibe dîwar, ger partî û rêxistinê Kurdistan avêtina van gavan bo xwe bikin mebest û amanc. Gelo wext û hîlleyê serokatiya partiyê me bona pîsek wisa girîng hene?

Birastî şermek mezin e, ku di dema firokê ezmanan û kompiyoteran de hê ji dest hêzên Kurd ne hatiye der, ku bikaribin, tew hindik, bona pîrsê netewi yên girîng, yên wek yeketî û pêşve birina zimên, koçkirina ji gundan û asîmîle kirina nîfşen nû pîsporan bişînîn civînên sal-wextî, yên ku bi aîkariya wan divabûn bihatana holê.

Mebesta min ne ew e, ku ez partiyê me li ber çavan piçük bikim, lê ew e, ku ez van pîrsê girîng li ber çavên berpîrsîyarên wan mezin bikim. Pêwîst e em bizanibin, ger em bibin xudan yek elîfba, emê sibe bikaribin bibin xudan Kurdiya bîlind (standard), ya ku bê guman, ê sûdek bê hempa bigîhîne netewa Kurd û têkoşîna wî têxe qonaxek nû.



## Mîhrebana Xatûna Berwarî

*Ez ci bêjim, ci beyankim?  
Kî bi halê min dizan  
Mexfiyeta eşkerakem  
Ax ji vê derdê giran  
Ax ji dest eşq û evîna  
Keftime tazî û şîna  
Kî dê saxket van birîna?  
Çû ji dil sed ax û jan  
Derkêkê zorê girane  
Eqil û hiş min çû nemane  
Mam pepûk û bêxudan  
Kê diye ev ci zeman?  
Min nema sebr û qerare  
Dil bi min bû pare pare  
Dojehê pir ar û mare  
Lew ji min çûn hest û jan  
Du dila yek dihebandin  
Zehmete bîne revandin  
Ayeta eşqê bixandin  
Nabête şerh û beyan  
Li dûmahiyê dibêje:  
Eşq nizanêtin gedahî  
Şuileke ji nûra îlahî  
Herweş û rûh û rewan*

Keçeka Kurd a gelek ciwan û xweşik bû, di warê tevinkirinê û wênê de bi nav û deng bû. Gelek destxwazên wê hatin, yek ji wan mîrê Amêdiyê bû. Lê Mîhrebana Berwarî ji pîsmamê xwe hezdikir. Dibêjin ku wê hozanek vehand û bo mîrê Amêdiyê hinart û mîrê ku bi hozan hikar bûye, dev ji destxwaziya wê berda. Hozana wê eve:

# Befr û Çiya

## Salimê Hacî

Bû kariyê kolanêd gundê nû yêd pir kirin ji mirova, spêdê heta nîveka şevê çayxana gund ji çeq req dengê pilêd dominê bê deng nabît... her destekê kar û axivtinê xwe yêd taybelî yêd heyn... hinek serve serve diçinê û ci ji nav narakê... hindek jî kûr û dûr berê xwe didene jiyanê, lê hemiye tek xwezi û armanc yêd heyn.

Premêrekê rûh sipî û bi nav sal ve çûy... çavêt wî yêd kûr bûy... pîşte laşê wî hemû yê çîrmisi, yê rûniştiye xwarê li bersîka mal û yê ketey di nav derya ya xem û hîzr û buhartinê kevin da... çend hizrekê diket yê qurmeke mezin li qelûna xwe didet û teji hinavêt xwe dûkêl diket... nahêlit qelûna wî ji tîtinê vala bibit...

Dergehê hîzr û bîrhatinê kevin yê li hemiya veboy, çunkî bêkariyê axivtin û hîzr û xem yêd zor kirin.

Berê xwe da xaniyê xwe, yê

bê ser û bere... di dilê xwe de got: "Divêt em karê xwe û zivistanê bikeyn, heke ev xaniye dê bi serê me da hête xwarê... ma xaniyên me ji van bûn... Bêla bûn ne ev xaniye bûn... raste rîkêd me di dûr bûn, belê bila me pê xweş bû, çunkî warê me ye, cihê ji deykbûna me ye û em yê li wêrê mezin bûy... me zevî, çem, rez, dargîz û avên tezî hebûn, lê vê gavê me ci heye... me ci nîne herwekî em ji nû hafine ser dînyayê, li ser erdekê rep û rîf, evca ji nû malekê û karekî û jiyaneka dî, ew xaniyê min bi destê xwe ava kirî û bi xuha eniya xwe danay, yan ew zeviya çol û beyar, min kiriye çem û rez... dargîzen bilind, avên tezî... van hemiya ji bîr bikem, ne... çewa ji bîr bikem, heku min ji bîrkirin, herwekî ji nû jiyanâ min dest pêdiket, ez yê mezinim û biçûk nabim... warê min û gundê min û gundê min ci cara ji bîra min naçin.

Ew dargîzen bilind yêd me çandîn û mezin kirin, ci cara hişk nabin û dê her li hêviya me mînin... noke gîzêne me gelek gîz dayne, belê ma bo çiye, hizreta zaroyen me gîzeke." Hûrik li go-

palê xwe nêri: "Ev gopalê ne yê êkê wekî mine, lê ci bikem bê xudaniya warê min ez pîr kirim û êxistim."

Di van hîzr û bîra da bû, hînek rondik bi ser rûhêne wîyên dirêj û sîpîda hatne xwarê, dengek hate guhêne wî... serê xwe bilind kir, berê xwe da yê neviyê wî yê biçîke.

— Babo, babo!

— Belê kurê min, te xêre?

— Babo! Eve çende ez digel te diaxivim, belê te ageh ji min nîne.

— Kurê min! Dilê min li vêrê nebû, ez di nav gîz û çem û reze da bûm, li gundê me, min hîzrât gundê me dikirin.

— Babo! Em dê kengê ji vêrî çin? Min nevêt ez li vêrê bîmînim... ev gunde yê ne xweş e... Min divêt em mala xwe ji vî gundî barkeyn û biçîne gundê xwe yê par, ewê gîz û sîv lê heyn, vêrê ya ne xweş e û ci tişt lê nîne... em xelkê vêrê hemiya nasnakeyin... hindek cara zaroyen wan li min dixen... em nikarîn ji mal derkevîn, belê li gundê me yê kevin em hemî dema diçûyne nav rez û çema, me gelek tist dixwarin.

— Raste kurê min! Vêrê ya ne xweş e, belê ma em ci bikeyn? Ci bi destê me nîne... divêt em bêhna xwe fireh bikeyn, hemî tişt bi bêhñfirehî çê dibin.

— Babo! ma çiye hema em dê mala xwe bi şevê barkeyn û dû çîne gundê xwe yê kevin û ci kes me nabînit?

— Kurê min tu xweş dibêjî, belê ma em ci bikeyn çê nabît.

— Ji ber ci çenabît babo?

— Kurê min! Bêhna xwe fireh ke, heku tu mezin dibî, tu dê hemî tiştazanî û dêzanî ka ji ber ci çenabît.

— Babo! Ma heta ez mezin dibim, em her dê li vî gundî bîn? Ma em ci cara naçîne gundê xwe yê kevin?

— Belê kurê min, tu dê her ciye gundê xwe, çukî ew warê te ye û gundê te ye, vêrê ne gundê te ye.

— Babo! Paşî tu ji dê digel me hîye gundê me, em hemî pêkve dê çin?

— Belê kurê min ez ji dê hêm, em pêkve dê çîne gundê xwe bi demekê nêzîk. Befir ger dê barîte ser çiya, em befrîn û warê me çiya ye.

## ZAROYÊN KURD

Mamosteyê xwendingehe go-te xwendevanê xwe:

— Min divê her yek ji we wêneyekê çeket.

Xwendevan hemî bêdeng bûn... çavê wan ma li Mamosteyê wan. Azadî destê xwe bilind kir û gote Mamosteyê xwe:

— Her wêneyekê em çêkeyn û me bivêt kes ci nabêjît me?

— Her ci wêneyekê hûn di-xwazin çêken... hûn bi keyfa xwe ne, kes nikarît deng biket we.

Hemî xwendevan dest havêtin pêñûsên xwe û her yekî perek spêhî berhevkir û dest bi wêneçêkirinê kirin.

Azadî piçek hîzrên xwe kirin... dîmenê dûhî êvarê dihîna ber çavê xwe, paşî pêñûsê xwe hilgirt û dest bi çêkirina wêne kir.

Mamoste yê li hindava serê Azadî rawestiyay û yê li wêne Azadî mîze diket, ka Azad ci

wêne çêdike. Hindek caran Azad dirawestiya û hûrik hûrik hîzrên xwe dikirin, paşî dest bi çêkirina wêne xwe dikir.

Pişî hemî xwendevana wê-nên xwe bi dûmâhî ïnayîn, Mamostey yek yeke li wênen xwendevana mîze kir.

— Serbest! Ji bo min bêje, kânê ev ci wêne ye te çêkir? Min divê tu bo min rave bikey.

— Mamoste, ev çiya ye, eve ji rûbare û eve ji gunde yê li ser lîva rûbarî.

— Dê başe, erê ev çine li es-manî?

— Ew ji balaferîn dijiminî ne, yên bomba dihavêne ser gundî.

— Dê başe, ev çine li erdi?

— Ew ji zarokin, yêd birîndar bûyin û hindek ji yêd hatin kuştinê. Mamoste wêne min yê ciwanne an ne?

— Her biji Serbest! Ev wêne te çêkirî gelegî ciwanel! Belê bêje min te ji ber ci ev wêne çêkirîye?

— Mamoste! Nê te ji me ra got: "Her wêneyekê hûn dixwazin, çêken... hûn bi keyfa xwe ne, kes nikarît deng biket we."

— Raste, kes ci nabêjît we, lê min divê ez bizanim, ji ber ci nabêjît we, lê min divê ez bizanim, ji ber ci û bo ci te ev wêne ye ji hemû wêna çêkir?

— Mamoste! Min ev wêne çêkir, ji ber hevalê xwe Kovanî. Çunkî balefirêne dijiminî ew yê kuştî... vêca min divê ez hemî dema vî wêneye çêkem, da ci cara hevalê xwe Kovanî ji bîr nekem.

— Gelek başe! Ev care demê ez diçime bajêrî, ezê bo te destek pêñûsên ciwan ji hemî ren-ga hînim.

— Gelek sipasiya te dikem.

Mamoste li wênen hemî xwendevana mîze kir, hemî wêne wek hev bûn... di hemiya da çiya, rûbar û gund hebûn... Di hînek wêna da tank û balefira gund û zarok bomba baran di-kin... hindeka ji da pêşmerge hebûn, hemû bi rext, fişek û tiveng bûn.

Mamoste gehîste hindav se-re Azadî û gotê:

— Azad! Te ci wêne çêkirîye, bo min rave bike.

— Mamoste! Eve çiyane, eve

jî rûbare, eve ji gundê me ye, evê li serê çiyay ji pêşmergene, evê ku li erdi dikuştî, ew dijminen me ne, pêşmerga ew yê kuştîn.

— Tu ji bo min bêje, ka te ji ber ci ev wêne çêkirîye?

— Ev wêne ye serê dûhî êvareyi, demê dijiminî diviyabihêt di nav gundi da û pêşmerga serê wan kirî, hindek jê kuştin û yêd di ji revîn.

— Desten te dixweş bin, te wêne xwe gelek ciwanî çêkirî.

Dişkurînek bi hîvî kete ser lîven Mamostey û demekê kurt hîzrên xwe kirin, paşî got:

— Ez dê pirsiyarekê ji hewe kem, min divê hûn hemî tevda bersiva min biden!


— Bêje Mamoste!

— Ew kîne xebatê diken û dê me ji bin destê dijiminî rizgarken, navê wan ciye û xelk ci dibêjîte wan?.. Min divê bes hûn navê wan bi tenê bêjin?

Hemî xwendevana tevda got:

— Pêşmerge!..

Zengila xwendingehe lêda, hemî xwendevan bi dilxwesî vegeryan mal.



## Xewna bê wexer

Dr. İbrahim Selman

Befre, şeve... tarîstane... mirov cilkêt di ber xweda nabînît... mijûlankêt çavêt wê çûne ser êk... nivîst û pirî sîngî tirse, sermaye... cilkêt wê dipatekirîne... didiryayne... giwînîke bi ser leşê xwe dada... li bin giwînîkî leşê wê ji serma befrê şevê dilerzî... li bin nîvînît xwe xewnek dît... didanê wê yê sîngî berek vêdket... dişkand... xwîn tê nedihat... ji xwe rabû... rûnişt... hêş tarîstane... sermayê xwe li hemî rexa ya belavkirî... şehdeda navê xwedê ïna û hera di dilê xwe da dibêjît.

— Ya rebî tu xérkey!

Sirê jî ci hal bo nehêlaye... wekî belgê darekê li ber reşbayî dilerzît ya dilerzît... giwînîkê xwe kêşa ve ser leşê xwe pişî giwînîkî ji tirsa germitiya xwe berzkarî û tezyeve... ma ya razay takuzanî bû wextê nivêja sipêdê... zengila bo rojê dihête lêdan da ji xew rabît... qesta mesînîkî kir bû dest rêvedanê da nivêja sipêdê biket... befrê ava mesînî girtibû çipik ji ber nedihat...

Li dara gerya, hindekêt peydakirin... agirek helkir... hêşta hinavêt wê tijî girkê... mesînêk dana hindavî...

Agirî... befir helbû... destrêve

da... got...

Agirî... befir helbû... destrêve  
da... got...

Nivêjkir... rûnişte pişt xankê namî da nanî bû sertêşte bipêjît... bûka wê rûnişte beramberî da nanî wergêrêt ji ser sêlê...

— Xwedê xérket min xewneka nexweş ya dît!

Kurê wê bi jor ket... kirâs derpê yêt li ber... dersûka xwe ya di hefka xwe werkirî bi ezmanekî tirtîrî gote deyka xwe...

— Dadê... min xweneka bi xalê xwe ve dîtî... cilfek vêket... di dilê xwe da got...

— Neku xewna min rast bît!

Rabû ve ji pişt xankî... pêlavêt xwe dane ser pêt xwe... dersûka xwe havête serê xwe û qesta dergehî kir...

— Dê ci key?

Bê hêvî bû... tirsa dilê wê zêde bû... li ber berze bû...

— Birayê min... birayê min!

Li ber derê xanî bakozîrkî xwe di ser û çavêt wê werkirî û çû di nav kirâs û pêlavêt wê da... dersûka xwe li bin gûhêt xwe aland... destêt xwe kirne di bin kevşet xwe û qesta gundê xwarê kir... bi rêve zelamek dît...

— Bira bextê te û yê xwedê...

bibêje min... ci qewmiye li gundê xwarê... ci heye?

— Xûşka min ci nîne... ci ne qewmiye...

Bê hêvî bû... tirsa dilê wê zêde bû... li ber berze bû... kîve biçit... di kîrêra biçit, di nizarêra yan bo berojî biçit... dê kî bibînît? Kî dê bêjîtê behsê birayê wê ket? Ser sehare... bakozîrkî fitka vedidet... darûbarêt ji serma dileyzin... hindek belg yê sipî diken li bin befrê... erd hemî xwîsare.. hindek ji dûrve dîtin qesta wan kir...

— Gelî bira... bextê hewe û yê xwedê... ci qewmiye li gundê xwarê, ci heye?

Rawestan hemiya destêt xwe kirne di palixêt xwe da... serêt xwe kirne di nav millêt xwe da... êkî ji wan got...

— Xûşkê... qerebalixe belê niza ci tişt heye em xelkê vî gundî nînin...

Heku diaixt helma devê wî di bû mij wekî dûkêla cigara bilind dibû... bijale dibû... hizrêt wê jî di bijale bûn... dinya li pêş çava zivirî... rêk berze kirin, ma bi tinê li ser rêkê...

— Ya xwedê ez dê ci kem?  
Hay ji sirê nema... serma bû

agir di nav hinava da, gol rewîna sa bû dengê dîkila ji nêzîk hate guha... di şîvêt nizarêra hate xwarê... du zelamêt berpêk girêdayî yet jêhel dihê... ïna rawestandin û gotê...

— Gelî bira bextê hewe û yê xwedê, hûn nizanîn ci qewmiye li gundê xwarê?

— Ék ji wan pîremêr bû... rihêt wî bi ser ketibûn... şelwalekê patekirî di ber bû... got...

— Xûşka min ci bo tê bêjîn... xwedê xwîndariyê nehêlît...

— Ék hatîye kuşîn?  
— Aşî ew pîremêrî nesax di gel kurê xwe li ser gopalî çûbû karwanî... xwîndarêt wî rêk lê girtibûn û ji pişte hindek tiveng tê werkirin... aştiyê kuşî... kurê wî sava jî termê wî yê helgirtî digel xwe bir!

Divya bikete hewar lê hewariya wê ma di sîngî da, neşîya derkevît... hewariya wê tijî hinavêt wê bû... dilê wê digel bû, nedîşîya ji devî derkevît... pêt wê neşîyan leşê wê bi helgirin kete ser çokêt xwe... pencêt xwe li erdê dan û erdê hişk û xwîsar girtî... rondik barandin û ax bi serê xwe werkir.

## METELOKÊN KURDÎ:

*Ji nivîsara*

*"Mıştaxa çiya ji gotinê pêşıya"*

- Mela Mehmudê Dêrşewî -



### (64) Bê himhim cênabit

Binyada vê gotinê dibêjin, carekê mirovîk got:

Rêncberek heye dibêjinê Nan û Zik -yanî êk karê êkê bikit li ser nanê zikê xwe-, got; "Çima ez naçim rêncberiyê ji xwedê re na-kim, hema bila ew jî nanê zikê min bidit min? Tiştek dî min jê navêt." Rabû çû paşıya şikeftekê da û dûr avahî û tarî û dest bi nivêja kir. Rojekê duwa ma, tiştek jê re nehat. Birsû bû, zik ma bi piştê ve, gav lê sist bûn, çav lê tarî bûn, li nîva rojê stêr lê bûn xelek, ket hîzr û mitala û got, "Ka ez çibkim? Ez ji nêza (birsa) mirim!" Li wa hizra de dengê karwanekê li derê şikeftê sehkir. Hema xwe li paşıya şikeftê mit kir. Karwan hatin li derê şikeftê danîn. Firavîna xwe xwarin. Ji bermayê xwe lêkdan. Êkê got; "De jê bigere em gihan mal." Belê serokê wan got; "Ne. Nanê xwe nehêlin, zad xweş hevale." Rêncberê me yê bi nan û zik, li paşıya şikeftê berê xwe dayê wê xwarina xwe bibin. Di dilê xwe de got; "Pa bi xwedê ew biçin û ez halo bimînim, ezê ji nêza bimîrim!" Rabû li paşıya şikeftê pejn ji xwe anî û got; "Ihim ihm!" Êkê ji karwaniyan got; "Kuro, ew kiye li paşıya vê şikeftê û tu çi dikî li wê dê?" Ewî got; "Ezbenî ez faqîrekim." Karwanî got; "De bila bi xêra hewe bit wê çend xwarinê bidinê." Zadê xwe xwar û da xwe rabû û ji xwe re got; "Bê himhim cênabit, 'cûnkî' nanê egera nîne" ...

### (65) Berê havînê bavêje kolînê

Bêgumane hîzkrîrina paş rojê tiştek bivê nevî ye. Nexasim ji aliyê embûriyê ve, cûnkî ew mirovê bê hîzrbît ew bê kêre û rojek wê bi ser da bêt ew xwe bi herdu dest û lingan qortal nekit. Diviya mirov ne wek wê gotina pêşıya bit çaxê dibêjin; "Hingî heye silk û milk, dema xîlas bû keser û kolk." Belkî divêt mirov wek vê gotina kevin be, çaxê tê gotin; "Diravê sipî bo roja reş baše."

### (66) Birayek dîn û êk hisyar dan müyekê neqetandin!

Binêre li gotina êkê.


### (67) Bû fita Hesenê Hewêrî

Hewêrî babekin ji Êzîdiyan. Binciha wan li qontara Çiyayê Sipî li Zaxoka Behdînan e. Mezinê wan di çaxekê de Hesen bû. Dibêjin, Hesen mirovîk dînyayî bû û têbir bû. Binyata vê gotinê, dibêjin carekê Hesenê Hewêrî li koçka xwe rûniştibû. Birek mirovîn wî wê li dorê rûniştine, şevbiwîrka xwe dikin. Dinya zivistane ba û bahoze. Müy ji mara vediket. Li ber tifka -koçka- agîrî lerzînok, gîrgîranîk mirova digirin û bernadin. Hesen ji tinaz ve -tirane ve- got; "Çi kesê îşev li derive bisekinit heta ez sê fita bidim, ezê keça xwe lê mehir bikim." Êk ji wan xorôt aqil-sivik û mejî-xîlxîlok û bê hêvî, ji jinanînê got; "Ezê bisekinim." Û rabû çû derive ber wê sir û seqemê. Birekê ma li derive, Hesen got; "fit" û fitek veda. Xorto got; "Eve êk." Demek dî pêve neçû, dîsa Hesen got; "fit." Xorto got; "Eve didu" û ma... Koçık feşkilî her kes çû mala xwe. Bû çaxê xewê. Hesen ji rabû da biçit, ser cihê xwe. Xorto got; "Heseno! Pa te fita sisê neda?" Hesen got; "Lawo! Fitâ mine û ez bi keyfa xwe me, niho ez didim yan deh sol dî yan jî qet û qet ez nadim!" Vêca ev bû pêşgotin. Ci gava êk sozekê yan gotinekê bi êkê re bidet û ber hêvî biket û paşî pişta xwe bidetê, ne bê hêvî biket û ne pêk bînit, wê bê gotin; "Bû fita Hesenê Hewêrî." Ev gotin ji weke gotina jê re.

### (68) Bû dîzka Behlûl!

Binyata vê gotinê jî dibêjin:

Carekê mirovîk got êkê; "Heke tu îşev di vê gola avê de bimînî heta seharê, ezê keça xwe bidim te. Belê bi şertê tu neçî li ber tu agira û tu agira jî neynî li ber xwe." Mêrik di gola avê de ma. Ji nîvê şevê û pêde av lê bû qeşa û qerisî. Roja paşî heta nêzîkî nîvro bi kotekî jê derket. Pişî hat der, got babê keçê, "De vêca keça xwe li min mehrike." Babê keçê got; "Başel! Belê tê sund bixwî, tu şevê dîneçuyî li ber tu agira û an tu agir te nanîne li ba xwe?" Mêrikê di golê de sund xwar; "Ez şevê dîji gola avê derneketime û min tu agir jî naniye li ber xwe û te bi xwe dî çawa ew av li min bibû qeşa, heta nêzîkî nîvro min nekarî ez jê derkevîm!" Babê keçê got; "De sundbîxwe ku te şevê dî agir bi çavê xwe nedîtiye?" Mêrik sundxwar; "Min şevê dî agir bi çavê xwe nedîtiye, ji bili agirê şivana li qontara çiyayê bi qonaxekê jî min dûr." Babê keçê got; "Ez qebûl nakim, tu bi wi agirî germ dibûyi." Mêrik got; "Emê rabin herin ba Behlûl û şerfetê." Çaxê cûn û doza xwe gotin, Behlûl got; "Ezê firavînê ji hewe re çêkim, firavîna xwe bixwun, paşê ezê hewe safi bikim." Behlûl rabû dîzîk danî li ser devê rojnê -rojin ew kuna li ser baniye li semta tifka agîrî, cûnkî berê şope û pirêmîz nebîn. Agir di tifkê de xweş kir û rûniştin xwarê. Paş çendekê babê keçê got; "Li me derenge, emê rabin." Behlûl got; "Bila firavîn çêbit paşê" û dîsa xwe kehrkirin. Bû nêzîkî nîvro, babê keçê got; "Emê rabin çaxê me nemal!" Behlûl got; "Heta hûn firavînê nexwun, hun ranabin." Babê keçê got; "Pa ne em tu nîşanê firavînê nabînin!" Behlûl got; "Belê... wa... he dîzîk li ser devê rojnê ye û eve ez agirî xweş dikim, hah... firavîn wê çêbit." Babê keçê got; "De malave! Xelk dibêjin Behlûl dîne, em dibêjin herê herê çîma hûn we dibêjin! De ka tu bi xwedê dînat ji vê mezintir heye? Dîzîk li ser devê rojnê û agir di tifkê de, wê ji me re firavînê çêkit!" Behlûl got; "Çîma têhnê lê nakit?" Babê keçê got; "Tire dîno dîzîk dûre, agir têhnê lê nakit." Behlûl got; "Başê pa ya bê wîjdan madem tu dizanî agir têhnê li dîzka li ser banî nakit û hemî dîzîk deh piya ji agirî ne dûre, pa çawa agirê şivana bi şevê têhn daye mirovê di gola avê de û bi qonaxekê jê dûr? De rabe here keça xwe bidê, hey ne ezê senî meniya bi serê te bînim."



## SALIXA REWŞENBİR Û DI PÊŞDEÇÜNA DÎROKÎ DE REWŞENBİR

A. DİCLE

**B**ingeha daringî ya avabûna kategoriya rewşenbîran, di pêşveçûna civakî ya xuya de, vekêşan û hilberîna-ziyade wekî zanistî, di pêşveçûna teknîkên huner û vekêşanê de, bi rade û serpîke ke feyizdar, xwe dispêre bi kar anîna hunerên hîzrî. Di qonax û serdemên pêşîn de, hîna ji vê demê hindek ji kesên ku bi kar û barêñ hîzrî ve mijûl dibûn, ji vekêşanê veqetiyane, lê belê bi xwe jî ketine nav xebatêkî, ku kîrî vekêşanê bi xwe hatiye û em bibînîn, ku ew di warê ol, filozofî, huner û teknîkî de, xwedî ciyeke aşkere bûne. Ev kesên ku jêhatîbûnê hunerî di şexsiyeta wan de hebûye û ew bi xwe jî xwedî zanîn û zanebûna civiyayî bûne, di civatê de fonksiyonên girîngirtine ser milêñ xwe û ew bûne peyamhênerên gehînekîn sosyal-ekonomîkî û peyamhîgirên pêşengên avahî û avabûnên politîki. Baş dihê zanîn ku, ev kesên hilgirên zanebûn û rîexistinî bûn, ku wekî di pêşveçûna qonaxa sistêma koledariyê de û her di qonaxa antîkî ya Yûnanî û Roma de, ev kesên ku hilgirên zanebûn û rîexistinî bûn, bi navêñ remildar dihatin navandin û rolêñ ku ew di dema pêşveçûna feodalîzmê de, di rojhilata dûr û navin de leyîstine diyar in. Bi taybetî jî bi şoreşekê ku kapîtalîzm, di qonaxêñ sedsalêñ 17'an û 18'an de, wekî sistemekê dest bi pêşveçûna xwe ya sosyo-ekonomîkî kiriye, di van sedsalan de behsa qonaxa rewşenbîran dihê kirin.

**R**ewşenbîr û ronakbîrênu mîna amadekarê şoreshen burjuwazî xuya bûne, di demekê de dihêñ meydanê, ku li ser feodalîzmê rexneyêñ gîran dibin. Ew rewşenbîr û ronakbîrênu li hember her babet bîr û baweriya dogmayêñ olî yêñ feodalîzmê, li hember bîr û baweriya filozofî û hunermendiyêñ feodalîzmê derdikevin, hîna di dema çêbûn û zayina xwe de, ji burjuwazî re bîr û baweriya xwe ya nû, ya li ser dînyayê, bîr û baweriya xwe yêñ hunerî, li serhev civîna agahdarî û zanebûnêñ zanistî û taybetiyetîn politîkaya civata nû, ji her alî ve gotûbêj dikin. Di geleki berheman de bi her awa û babet pêwistiyêñ avabûyina civatî dihêniñ zimêñ. Di warê, muzik, wêje, filozofî, xanemanî (mîmarî), endezîyarî (heykelterâşî) û hwd. mirov bi awayekê ronahî pêşkêşıya wan dibîne. Ev rewşenbîr ne tenê li neteweylekê bang kirine, her weha ne tenê peyamhîgirên berpirsiyaren sazûmana resmî ya burjuwazî bûne, lê li gor taybetiyêñ serdema xwe, bi hilgirtina karaktereke navneteweyî, li ser navê hemû mirovayetiñ peyivîne. Li hember her cih û hêlêñ berpirsiyariya sazûmana feodalîya paşverû hilhatine û hem jî bê nas kirina tixûban, daxwaziyêñ civakî anîne ser zimêñ, ku ev rewşenbîr bi xwe vê yekê kirine û berdevk û peykerê daxwaziyâ hemû kesen pêşverû bûne. Ew spartek û bawirnamêñ, li ser wekhevî, azadî û birayetî ku di dema şoreshen burjuwa de belav bûne û bi xwe beyannameya cîhanî ya mafêñ mirovî ye, ku ew dûrîşmêñ wisa girîng in û ew li ser qada cîhanî xwedî soz bûne.

**D**îvî em cihde bidin zanîn, ku ev tişt yekser bi kapîtalîzmê ve gi-redayînîne û rewşekê welê, di zayina filefî û İslamiyetê de jî dihê dîtin. Ne filefî û ne jî İslamiyetî rast û yekser tenê ji bo neteweleyî ye. Bang û awazîn Îsa û Mihemed ji bo hemû mirovayetiñ ye. Her wisa wekî Îsa û Mihemed, wec û sîmâyîn pêşeng yêñ civata nû, wekî J. Russeu, Dekart, Spînoza û rewşenbîrperesten Frensi yêñ wekî din, rewşenbîrê Ewrûpi yêñ sedsalêñ 17 û 18'an, ew mazina-hiya bangkirina mirovatiyê rî didin. Rexneyêñ wan yêñ li ser civatê, her astengêñ li ber gavekî pêş de cuyina mirovatiyê, ji ber xwe dide alî. Rexneyêñ wan yêñ civakî, ji his kirin heya hîzir kirinê, ji dewlet û dolîwgerî heya jiyana malbatîyê, li her der, ciyê xwe dadigire. Jiyana serbixwe û azadbûna neteweyan, azadiyêñ kesî û hwd., li hemû qadan program û livbazî (çalakî) peyda dikin. Ew şoreshen burjuwazî yêñ ku dawiyê çêbûne, ne ji biî bi xelkê pejirandina van qazanc û çeperan û ne jî, ji biî bi pêşengiyâ burjuwazî van tiştan zivrandina ser livbaziyeke mazin tiştekî dinê ne bûye.

**S**azûmana burjuwazî, ji kombûna kar û xebatêñ rewşenbîran, di destê burjuwazî de gihaştina ber gehîneka şoresha siyasi, li cem xelkê bi cih girtinê pêk dihê. Lê bi avabûna sazûmana burjuwazî ya fermî, rolêñ rewşenbîran dê her here biguhure. Sazûman (sazûmana burjuwazî-Kovara Rewşen) ê dî, dixwaze di şûna bang kirinêñ berfi-rehî de, di nav çarçîweyêñ neteweleyî û çînî de veşartî mayî, û di nav maf û berjewendiyêñ teng de, xwedî li ew rewşenbîrênu ku bi têkiliyêñ cihêreg bi burjuwazî ve girêdayî ne û peykerê û sîxurê berdestê burjuwazî bûne, xwedî li wan derê. Ü sazûmana burjuwazî di vî war de bi ser jî dikeve.



**B**i çiçek vekirina sazûmana burjuwazî, pêşengiya bi pêşdetir bi rîna şoreşê û demokratiyê zivirandina ser demokratiya gelêri, êdî erk û barê dîrokî yê proletaryayê ye. Her weha ew çîna ku xwedî li adetên rewşenbîrén pêşverû derdikeye û berpirsiyariya wê dike, ji bili çîna proletaryayê kesekî dî nine. Marks û Engels pêşengiya beşekî nû derxistine meydanê, ku bi navê rewşenbîrén proletaryayê dihê navandin, ji zanistî heya huner, berpirsiyariya serpêhatinê rewşenbîrén pêşverû û ci di tûrika adetên rewşenbîran de heye, hemû li ber dewlêmend kirina pêşengiya proletaryayê digerîne. Ev rewşenbîrén proletaryayê, ji rewşenbîrén burjuwazî cihêtir binavahî û seravahiya civatê, ji rexneyeke berfireh derbas dikin, hemû çavîkîn civata sermayedarî, herî pêşiyê kom bûna sermayeyê û hemû mêmokdariya di wê, zilma rê li ber çêkirina vê mêmokdariyê û riya rizgariyê radixe û ji vê dest pê dike û nîşan dide, ku ji bili rista hilgirtina zanebûn û rêxistin, hîç rolekî wan yêñ dîrokî nîne û vê yekê bi nimûne kirina li ser şexsêñ Marks û Engels rê didin û derdixin ber roye. Êdî mirovayefî şahîd e ku zanîna herî pêşde çuyî ya bajarvaniyê, berjewendiya herî berz ya civatê, bi awayê berjewendiya çîna proletaryayê û hêza derbas kirina politikaya wê ya li ser civatê, di partiya wê de ye. Proletarya ber bi berzbûna qada rewşenbîran û pêdiyîn bi rêxistin bûna wê ya partî ne tişteke tesadufî ye. Rewşenbîrén proletaryayê, ne tenê li hember pîkolî û zilma li ser proletaryayê û li hember dîl û hêşîr girtina hemû kesen di bin destê çend sermayedarîn talanker de derketine û mîna peyyker û berdevkî pêşde çûnê derketine meydanê û bûne şerbazên gernas û nebez yêñ vê doz û dawayê. Di vê gehînekê de, ku kad û behsa şoreşê xwedî soz e, her weki mîna zanebûniya rewşenbîran, hune-rêñ wan yêñ livbaziyê ji bi hindîk be ji ber bi pêş de çuye. Ew, mîna şerbazên ku li hember talankerîya sermayedarî rawestiyane û di wê bîr û baweriyê de ne ku divê ew xwe, di bin pêşengiya proletaryayê de bi lehengî û ji nû ve bi rê bixin. Di dema avabûna civata sosyalîst de, di serê hemû tiştan de, bi nimûneyeke berçavî û çav birî, berê van hemû rewşenbîran Lenîn heye. Îro em ji bo wê demê, ji huner haya çuyina ser filozofiyê û heya bi rêxistin kirina şerê parîzanî, di hemû waran de, ji bo rista pêşve birina şoreşê, hurmet û rêza wan digirin û bi pêşengiya wan diçin em. Bi pêkhatin û çebûna Şoreşa Çiriya Yekem û li ser riya ava bûna sosyalîzmê, li ser bingehêñ nû berz bûna ev kategoriya rewşenbîrén sosyalîst, divê ji bîran neçe, ku di rexneya rewşenbîrén roja me de ev tişt mîna pîvanek be. Cara yekemin di dîrokê de, di şoreşa Bolşevîk û ava kirina sosyalîzmê de, artêşike berfireh ji kedkarêñ huner û zanistî pêkhatî diyar buye.

**R**ewşenbîr, di rizgariya gelên dagîrgeh de jî xwedî roleke bê-hempa ye. Herçî di nas bûna civatan û herçî ji bo ji nav derketina ji nav rewş de ber bi zanebûnê û herçî jî di rîdana riyên çareser kirinê de rolêñ rewşenbîrén şoreşger pêwîst û hewcîyê gotûbêjê nîne. Ji Amerîkaya Latînî heya Afrîkayê û Asyayê, di gelek ciyên dînyayê de, ji Ho Chî Mîhn heta Cabral û Castro, gelek ji pêşengên rewşenbîran, di şiyarbûna gelên dagîrgeh de, bi kîfaretêñ di derecuya lehengî û qehremanî pêşengiya gel kirine û di warê bi rêxistin kirin û berfireh kirina qada şer de, xwedî roleke bêhempa û dîrokî bûne. Ev dane xuya kirin, ku yekser û tenê bi lêkôlin û hûrkolîna rewşa ronakbîrén şoreşger, vî tişî ji bo avabûn û damezrandina vê civata nû bi rêxistin buyinê ve girêdayî, metoda çareser kirina probleman û ger vê şerê şoreşgeriyê nehênin derecuya şerê gelêri, di wê bîr û baweriyê de ne, ku rolêñ xwe bi şêweyeye kêm bi kar bihênin. Yanê ew bi jiyana xwe ya pratîkî dane ber çavan, ku rewşenbîr û ronakbîr buyin, tenê vekêşer û hilberê zanebûnê nemîne lê bi rêxistin kirina zanetiyyê û bi rêxistin kirina livbaziyên maddî yêñ xelkê, dihê wê manayê. Rewşenbîr êdî ne tenê ew kes in ku tenê dînîvisin û dipeyîvin, rewşenbîr ew kes eku bi rê dixe û ber bi livbazi û çalakiyê xebat li dar dixe. Di serdema proletarya û tevgerên rizgariyên neteweyî de, qistas û pîvana rewşenbîr buyinê, ne tenê dîtin û derxistina neheqîyan ber meydanê ye, êdî ew xwedî bûna pîvana sosyalîst yêñ ber bi pêş ve birina civatê ye. Di roja me de ronakbîr buyin tam bi serxwebûnperest, demokrat û bi buyina sosyalîsteke müftan yan ji herî hindîk bi rastîji sosyalîzmê re sempaî rîdan dixwaze. Ev di serdema me de, bi nimûneyen bê hed û hîsab hatine îspat kirin û rîdan.



## Simbêlê lawik

Azad Bavê Şihîn



**\*Mûk:**

Riha "Şêx" dihat şehkirin. Tiliyên wî hêdîka di nav mûwan re dicûn. Gustîlka zîvî di tiliya wî ya qılıçkê de dicîrisand, di beriqand. Civat li dorê kehr bû, wek pûtan (seneman-hîman) nîv mirî rawesta bûn. Rûniştina wan hişk û bi tirs bû heçku ne mirov bin, ji keviran bin. Bê deng û bê lepit, sernimz li pêşîya xwe dinêrin. "Şêx" mûk ji nav riha xwe ya dirêj şêland, qetand bê ku kes pê agehdar bîbit. Bi rengekî hunerî li serê tiliya xwe pêça, aland, kir gilok. "Sofî" kî parçek kaxez anî, bi tirs û lez, bi lerzin danî ber şêx. Şêx jî hêdîka giloka pirçê danî ser kaxezê. Sofî zû û bi lez kaxez li mû pêça, pêçanek sê enîşk. Kire nivîşt, rabû bir cem sofîkî mihran. Hê civat kehr bû, lê pis pis ji nav mirîdan dihat û yê mêvan, nivîşt kir berîka xwe de û guh didêra arîkarêن şêx. "Bi serê kurik ve bike, an jî bi paşîlê ve daleqîne. Çend şevênen xwedê wê wî sax bikê..." Sofî yê reben çar lepka li ser kabokan pêşve çû. Sê caran destê şêx maçkir û danî ser eniya xwe ya qermiçî. Dîsa bi wî rengê kêvîjî şûn ve xatir xwestin. Bi keyf, bi dîlxwêşî nivîşt di berîka xwe de diguvaşt, diparast. Divê ku çeng pêve çêbin, zu biginê mal û nivîştê bi aşî bigîhînê, bi serê kurikê xwe yê nexweş ve bikê.

Şêx destê xwe li tizbihan peland. Lê gerand, bi nermî qûna xwe ji ser berikê bilind kir. Sofîyan tevdê dan xwe, bi yek carî rabûn şîpya. Destên wan li ser hev sekînî bûn, wek ji nimêjê re rawestayî bin. Tizbî ket nav lapê şêx de. Cihê xwe xwes kir. Sofîkî palgeh li ber palê rast kir. Kêlîkek derbas bû. Bi sisî ji nav berçavka zêrînî re ser xwe re meyzand. Li dora wî hê soffî req rawesta bûn. Mil dabûn hev, qerîs bûn, ne lepit û ne pevv, tenê bayê cil û terfîşen wan dihejandin, dilewliqandin. Şêx vê axavtinê, ji bin pozê xwe ve got:

— Rûnin! Xwedê xêra hewe mezîn bikê.

Rûniştingeşa şêx erzêlek mezîn bû. Li pişta mizgeftê çêkirî bû. Nîv bejnê bi ser rûwê zevînê diket. Behtiriya gundê Zengîlokê jê dixuya. Newal, dehl, kehnî jî tim li bin çavê wan de bû. Bû demê nimêjê, şêx misîn xwest. Çar pênc sofîyên sivik, bi hev re rabûn. Yekî av li lingê wî kir û yên din aman di bin piyê wî re girtibûn. Şêx pêkhat. Çend "sunnet" kirin. Li xwe zivîri, qelûnek ji titina rîsî pêxist. Lîvîn wî hêdîka lebitîn, pêre rih jî wek gêzingekî (melkes) heja, ber bi jêr ve û ber bi jor ve lewliqi. Şîtexîli li ser keramet û méraniya bav û bavpîrêن xwe, çawa nexweş sax dikirin, guhê kehran vedikirin, pora keçelan

di nav lepê wan de şin dibû, divezila dibû sîx. Di wê kêlekê de yek ji sofiyan çarlepka bezî li himbêzê li ser çokan rûnişt. Xwe çevand û bi lez xwe melisand. Bi dengekî vebirf û melûl, ji şêx xwestinek kir û di berê şâşik ji serê xwe kir, hiland:

— Ez kolê te û bavê te me. Tu destê xwe bi serê min ve bîne. Havînê mejiyê min dikelê, tête bihatîn, dîhelê. Dilî şêx ne çuyê destê xwe bi qogê û kilaxê sofi re bênit. Kîloxe wî şayîk bû, deqdeqî û bi gemar bû. “Ayetek” xwend û ji dûr ve pif kire serê wî. Çavê xwe gerand, kûr li dûr nêrî û keserek dijwar anî xwe. Di pey re sofi axavtin:

— Ho... ho... sofi! Kengê em dîbin wek wan “weliyan”, tucaran em nagîhin rêza bav û kalêñ xwe...

Çend sofiyan bi hev re lê vegerand.

— Înşallah tu jî wek wan i. Tu jî çêliyê wan dilêr û egîdan i... Em kolê hewe ne...

Careke dî bêdeng bûn, man vebirf. Şêx çavêñ xwe teng kirin, li dûr fekirf. Keçikêñ gund di rêka kaniyê de dixuyan. Cer û kûzêñ avê hilgirtibûn, bir û bir, tenê û tenê diliivin. Bi xemla xwe ve dihatin û dicûn. Henek û tinaz li hev dikirin. Zengilê kenê wan lêdida, biliñ dibû, dibû awazek ciwan û zelal dikete newalê, diherikî. Dar û kevir û kanî hişyar dikirin. Kirkirka guhê şêx ji wan dengan re dijenî. Pêlêñ sar di hinavan de dileqîn. Li sofiyan jî xweş dihat. Hergav deng ji yekî dihat:

— Estexfirullah...

Di wê çaxê teng de xortek, bi gavêñ nerm û bi rêveçünek wek ya efendiyan di ber wan re çû. Hêdîka silav kire şêx û civata sofiyan. Silavek sist bû lê dîsa çendekan lê vegerand:

— We eleykum selam!

Şêx çavikê ji ser pozê xwe hiland. Birhêñ xwe hilkişand jor. Enî lê qurmiçî. Kûr li “simbêlê” lawik nêrî. Çav bi bejna wî ya dirêj û alandî ket. Cilêñ wî bajarî bûn, paqîj bûn. Çavê wî hat dagirtin. Li hember wî dilê wî şikest. Piçûk bû. Hew xwe girt, pîrsî:

— Ev ci kese? Ci kure? Ci simbêl bi xwe ve kirine?

Her sofiî divî berf yê dî bersiva şêx bide. Ji berê ve şitexîlin:

— Çeto ye, kurê Evdileh...

— Ev du sale, li Sitembolê dixebeitê, rîncberiyê dikitin.

— Ez benî! Mebihist di bere dixwêñê jî.

— Nêxî! Ez benî! Te guh daye derewêñ wan, ji xwe hevqasî bi tifrene. Eve çend sale dev ji xwendinê berdaye...

— Dibêjin bûye “Kurdçî” û gihaye “Komünîstan”...

Şêx xwe piçekî kir gilok. Bi emir, tîrê çavan dîbarandin pişa Çeto, diavêtin şopa wî. Li ser rêka kaniyê Çeto gîhişt birek keçikêñ gund. Li nav wan rawesta, silav kir. Keçik li dorê bûn xelek. Firax û cerêñ avê hîstîn ser milê xwe. Kirasên wan yêñ rengîn gulek li dorê çêkirin. Dengê wan bilind bû. Peyv û ken tevîl hev dibûn. Ji dûr ve dihat bihîstîn:

— Me bihîst ku tu nema vedigerî Gund.

— Digotin, te jineka Türk ji xwe re anîye.

— Hey Çeto! Te di dîlanê de herdem strana “Ez keçika Kurdi me” digot, hey virker!

Çeto xwe kenand. Guhêñ xwe veşart. Piçekî ji nav wan derket. Bi dengekî stûr û germ axîfî:

— Guh nedîn kesî xûşkêñ min! Va ez vegerîm welêt. Dîsa ez dibêjîm welat ji herderî xweştire. Destê xwe bilind kir bi alî çiya ve nîhîrt û dîsa got:

— Çiqas sipehîne çiyayêñ me. Xweş e, gelekî xweş e gava ku mirov ji xew rabê û Çiyayê Cûdî raserî xwe bibînê û di nav nîvînê de dengê zarokan bi Kurdi bibîhîzê...

Keçik di cihêñ xwe de qerisin. Peyvîn Çeto dijwar bûn. Fihêtkar bûn ji tolazîyêñ xwe, lê qenc nizanîn ci got. Yekê ji wan gote Çeto, wek bivêt wî hesbikê:

— Xwedê te qayim bikê Çeto!

Jê dûr ketin. Çeto ji kundirka li ser kuçekî di nav ava kaniyê de rûnişt. Pencek ji ava sar vexwar. Rûwê xwe şuşt. Hilkişâ Gund. Di şopa xwe re vegeriya. Roj berava diçû û li pişt Girê Elîm dihat

veşartin. Berfa li serê çiya, li zozana rengê sor werdigirt. Gund hînik bû. Rez û daran dora wê dixemilandin. Her tiş, sıruş tevdî li ber ciwan bû, xweşik bû. Kûr bi welat agehdar bû. Xwînek germ û bi hêz di laşê wî de digeriya. Hêriznî tenik ew girt, ket mestîk sivik de. Rêveçûna xwe sist kir. Bi awakî nerm, bi dengekî ter û bi dilşewaşî ji xwe re distrand:

— Dayka min û te tev Kurdistan...

— Ez xilaskim wê ji bin destane...

Derbas bû nava gund. Hiş pê nema bû, sergeşt bibû. Li ser dengê sofiî hişyar bû:

— Çeto şêx te dixweze.

— Xwedê bike xêr bit, mamo!

Sofi lezand, şûrikand. Çeto kete dorê, ber temalê ve, li pişt rêve çû. Li hember şêx û civata sofiyan rawesta. Çeto hê ji dûr li keva civatê silav kire şêx. Sofi man hêbet girtî, çiku Çeto destê şêx maç nekir. Şêx bi ser xwe re li Çeto temaşekir. Dirêjtir û bi hêztir xuya. Simbêlê wî jî boq bûn, wek parçek werîsê reş, li hev hatibû badan. Li alîm rûwê wî rûnişt bûn. Çavê şêx ji mîranî û ciwanî ya wî teji bû. Tevizî, di xwe de qehirî, kelî, hinavê wî qîçîqî, destê xwe hejand, bi alîy simbêlan ve bir:

— Çeto ev ci simbêl in? Qey tu bûyî Ezidî? Kurke, bîqusîne.

— Ma simbêl ji Ezidîyan re tenê çêbûne? Dûv re Ezidî ji Kurd in. Ez jî birayêñ me ne.

Şêx ji cih veciniqî. Hilpeki. Eniya wî sor bû, tevzinokan girt. Hinavê wî li hev ketin, ji peyv û bersiva Çeto. Gewriya wî ziwa bû. Dengê xwe hilda û got:

— Çiye? Ci gotin in ehmêq! Ez dibêjîm heram e. Simbêl dikevê nav xwarinê. Nimêj pê nabê. Tu sibê ta êvarê li nava gund digerî. Çavê jînîkan pê dikevê. “Nezere”, nîrîna pîrekan lê agir e. Gunehekî mezîn e. Hûn roj bi roj pîstir dibin.

Çeto bi bêhn ferehî bersiv da. Di bin lêvî xwe de kenî û axavt:

— Kitêb dibêjin, “Elî yê şêr” ji simbêlê wî dirêj bûn. Me hê ji kesî nebihîstiye, ku dirêjkirina simbêlan heram e. Dûv re jînîk û keçikêñ hewe di mal de veşartîne, ne em wan dibînin û ne ew me û yêñ gundiyan jî wek xuşk û dayîkên me ne...

Gava şêx ev peyv bîhîstîn, ji cih hilpeki, rayê laşê wî jenîn, dilê wî hat guvaştin û kire qîr:

— Hey kuçik! Gawirê kurê gawiran! Komünîstê teres!

Sofi di kêlekê de lê hatin hev. Hêl hêl bi ser wan ket. Li dora mîzgeftê bû qîr û qerebelîx:

— Beraz! Kuçik! Tu behsa herema şêx dîki? Cîho! Zendiq! Çeto hew xwe dît, kopalek li nav milê wî ket. Şewat û pîtiyê da hinava. Zû xwe ji nav wan kişand, dûrket. Dengê şêx bilind bû. Sofi hemû rawestan , vebirîn:

— Wele... Wellehî ji niha ta sibê, tu van simbêlan kur nekî, ez dê bi destê xwe, bi müçîngê, mû bi mü hilkişînim. Edebsiz!

Çeto şun xwe ve lê nêrî. Eniya şêx wek sêla sor lê hatibû. Reş dibû, zer dibû, dilerzî. Çeto wek gulekî, wek lêdana qamçîkî lê vegerand:

— Bi xwedê ez kurnakim. Ma hûnê bibin cendirme?

Çend sofiyan xwe negirt. Hêris birin Çeto. Berf ku li hev bidin, şêx bang kir sofiyan û wan vegerand. Dîsa Çeto bi nermî, bi payedarî, bi gavêñ fireh, bi tundî, berê xwe da malê. Wek ku tu nehatibit serê wî. Ket hundîrê xêni, rûnişt, ji nû ve kîryar û bûyer hatin ber çavêñ wî. Hatina wî ya Gund, serdana welêt lê gerav bû. Diramiya û hin bi hin hişyar dibû.

\*Mûk

— Mûk ji simbêlê te nayê birîn... Ev hêncetin. Em hew xwe digirin, xwe kehr dikin. Bese koletî, em hew xwe dihêlin bin zikê van kevin-perestan de...

Hevalê Çeto bi germî diştexîlin. Nav li xwe didan. Kulm û pençen xwe li zeviye binê odê didan û digotin:

— Heger em nekarîbin paşveruyêñ xwe, em dê çawa welatê xwe

rizgarkin. Divêtin hê zû ne dereng em welat ji wan buşûn, pêdiviye ku em gundan ji wan paqîj bikin. Gemar in... Genî ne...

Bavê Çeto hersê xort dihebandin. Li ber dilê wan re diçû. Hêvî û gazind ji wan dikir:

— Kurê min! Eve herdu hevalên te ji, xwe şâş nekin li ber çavê gundiyan reş nekin. Ev şêxê me ne, rêberê me ne. Ji bay û bavpîran ve, tiştä gotin bi ya wan hatiye kirin.

Gurgîn gotin ji devê wî girtin û bi xeyd peyivî:

— Me ev rêk navêt. Me jê bese. Bela xwe ji me vezin, ji vir û pêde, em li pey wan naçin. Zordar in, axa ne, neyarê jîna me ne...

Bavê Çeto serê Gurgîn maçkir. Hêvî jê kir, li ber tenîstê rûnişt:

— Hema bidin xatirê min. Ez kal bûme... Çeto kurê min piçekî van simbêlan kurtke. Hinekî ji serê wan, ji serê müwan, dilê şêx nehêlin. Ocax in, ma barê wan nîne? Livê dînyayê û ne li ya dîjî evqas xelk, bi hezaran sofi li pey wan in... Ez li bextê hewe me.

Diya Çeto hêstir dibarandin. Dikalî, li çoka xwe dida, di ber re digazî û digot:

— Mala me wêran bû... Zarok hemû bûn komünist. Li ber şêx rabûn, bi ya kesînakin. Xanî wê bi ser me de hilweşin. Ciya wê bi ser gund de biherifin. Em dê kor bin... Li min xweli serê, bext neşê, xweyî kurê...

Dilê Çeto bi diya wî şewîfî. Ma heyîrî, çavêن xwe miçkir, di ber xwe de got:

— Ev ci bû hat serê me? Ci astenge? Yadê negirî... We çawa bivêt, bila wek we bit.

Roja dî Çeto zû ji xew rabû. Guliya xwe şehkir. Simbêl jî rastkir, hilükir, di neynikê re li sîmanê nêrî, ji xwe re got:

— Nizanim ci ji me dixwazin? Çire ez dê van simbêlan biqusnîm? Em li mala xwe û ew li ya xwe, naçim civata wî... Çend pirtükên nû bi xwe re ji bajêr anîbûn. Di nav pancikî de pêçan, di paşîlê xwe de veşartin. Dixwest digel hevalan bixwîne. Gelek salox li cem hebûn. Divî bû ku hevalan re behsê bikê.

Civata wan dirêj bû. Westan ji xwendinê, ji miqerisiyê. Bi hev re derketin ji derive. Li keva gund zilamekî pîr kîferat dikir. Toz bi ser diket. Tenê li serê ban solih diavêt jêr. Çeto pîrsî û dehna xwe kûr dida nav tozê:

— Ew kiye welî bi tena xwe dixebeitê?

Gurgîn lê vegerand:

— Mamê me Xelo ye... Banê xaniyê wî ev çend rojin tebiqî...

Xortan milikên xwe hildan, xwe çekandin, bi lez derketin serê banê. Bi melhêban qırş û solih tanîn xwar. Ji ser tîrek didan alîkî. Mirdiyaxê şikesti û rîzi guhartin. Yekî stûr û rast, kirin şûnê. Geleki keyfa Xelo ji hersê xortan re hat. Divî bîllînê. Spasiya wan dikir. Careke dî ew solih hilavêtin jor. Li serê ban dêz kirin, dewisandin, pişte destê xwe şüştin. Xelo hêvî wan kir, ku firavînê bixwun, lê hersê law bi lez derketin. Berî bigihin nêzîkî mala Çeto, qîrqîra zila-man hat. Lezandin, ji dûrve dîtin, ku du sofiyan bavê Çeto dane pêşîya xwe, wek çaxê polîs yan cendirme xelkê dajon û ji malê der-dixin. Birin mizgeftê. Xortan ji hev pîrsîn:

— Em herin an necîn...?

Çeto gote hevalên xwe:

— Ez xwe nîşanî şêx nakim. Tîrsa min ewe, ku em xwe negirin. Ditîsim ku em dîsa bi wan sofiyan re bi hev biçin.

Gurgîn gotê:

— Hûn li vir bin, ezê herim. Li enîşka xêni guhdariya wan bikim.

Bavê Çeto giha civata şêx. Li bin sefika mizgeftê rûniştibûn. Bêhtir û dijwartir ji her carê xwe ji şêx re çevand. Destê wî maçkir, ta mirçêna lîvîn wî kesêni li dûr jî bîhîstin.

Şêx axavt, bi ser de hilbû:

— Raste... Nexwe raste hê, Çeto simbêlê xwe kurnekiriye?

Bavê Çeto xwe kir piçek. Bû pêşî, lerizî, bi tîrs peyivî:

— Ez benî! Ji şevê dîve diya wî digirî. Bi ocaxa te kim, şevê dî xew neketiye çavê me. Soz daye biqusnînê. Înşeleh iro emê pê din kurkirin.

Şêx çavik ji ser difna xwe hiland. Çavên wîbeloq bûn, dinanên wî

sikan û bi kote gotin ji nav lêvan derketin:

— Ha... Nexwe iro bi simbêlan ve çuye nava gund. Li nav malan digerê.

— Ez benî! Ez kolê te me, bêhna xwe firehke. Ez dikevim bextê oçaxê te. Hema du rojan, rojekî xwe bigire. Ew jî xorte, nûka hatiye mal. Ev çend sale dûrî me bû...

Şêx gjî bû, riha wî heja, emir û hêrizan girt, dengê xwe bilind kir:

— Hey kuçik! Gawirê beraz! Ma kurê te tenê xort û lawe? Qey ez parsê ji hewe dikim... Dibêje çend rojan xwe bigire... Namûssiz!

Ü welê sixêb bi ser bavê Çeto de dibarandin. Germ bû, gelêza wî pekî, hin bi rihe ve ma. Rabû ser xwe, heyâ jê hat pêlav werkir li nav çavê bavê Çeto da. Sofiyan ew kâlê perîşan ji dest hev girtin. Ji ser erzêlê avêtin jêr. Di nav toz û axê de gevaztin. Bi pihînan, bi zileh û kulman pelixandin. Gurgîn bi xwingermî ji cih hêris kire koma sofiyan. Çeto û xortê dîdan pey wî. Li pey Gurgîn gihan cihê sofiyan. Şêx jî berê xwe guhart bû heçku tu li dorê çênebûbê. Li meydana pêşîya mizgeftê, ketin nav hev de. Bû qîr û hewar, toz bi ser wan ket. Sofiyan şêx ji alîkî ve û hersê xort ji aliye dî ve. Bavê Çeto navçiyeti dikir û bere jî digirî. Xwîn bi ser û guhêñ wî de dihat. Çepol li nav çavan diketin. Şaşikê sofiyan pekîn, ketin nav zilqê qaz û mirîşkan. Tizbihê sofiât qetiya, titina yekî dirîjiya, diket nav lapê sofiyan de. Di bîhîjin, dikuxîn. Hewar bi nava gund ket. Hevdu pelixandin. Sofiât laşmezin bivirek anî û ta jê hat bilind kir. Bi kîn û meyratî li serê Gurgîn hejand, lê jê negirt. Li milê Çeto ket. Parçek jê vekir. Xwînê di ber bistakê re avêt. Navçîvan ji nava gund hatin. Yekî bîvir avête serê banê mizgeftê. Pîrekan kire qîr, bû hewar, çendekan dîflîland, digotin:

— Iro roja mîran e...

Zarok digirîn, dengê gaziye wan dihat:

— Ax bavo! Heware birawo! Bavê min kuştin...

Ji hev vekirin, ser û sîket û sîmanê gişan werim bûn. Xwîn ji serê sofiyat keçel wek kaniyê dîza, diherikî. Cilê sofiyan yêñ kevin û rîzî ji ceng û kîferatê hatîbûn veçîrandin, bibûn terîş. Çend zilamên gun-diyan nobet û berevanî li wan girt, da carekê dî êrîşî hev nekin. Bû êvar. Cendirme gihan Gund. Axa yê deverê bi xwe re anîbûn. Pîrsîn, li egera cengê û ka kuşti hene an hê çênebûne. Axa, şêx nependî kir. Bi tenê pêre peyivî. Gotina xwe jêre da xuya kirin, ku amadeye hin tiving bidê sofiyan wî... Mezinê cendirman li mala şêx şîv xwar û ji gund derketin.

## \*Rîhek

Wê şevê kes li gund ji tîrsa nenîvişt. Xew neket çavê zaro-kan de jî. Digrîn, ji mezinan dipirsîn:

— Çire dirabin bavê min?

Hevalên Çeto jî rahîjtûn çekên xwe. Amadebûn ji cengek dî re. Roja din axayê wan gundan çend rihsipî dan dora xwe, xwestin biçin mehderê li cem şêx. Bavê Çeto bi xwe re birin. Dîsa bavê Çeto dest û lingê şêx maçkir. Axavtin û miqerisi dirêj bû. Şêx dixwest wan ji gund derxînê û xaniyê wan jî bişewitînê, da kesek careke dî destê xwe li oçaxê bilind nekê. Lî di dawiyê de axa şêx qayîl kir, ku ew ji gund bar bikin û bîhîlin tîş û palûta malê bi xwe re bibin. Li ser çend binyadan li hev hatin: Mala bavê Çeto ji gund barkin û careke dî venegerin. Ew û şêx ji hev vejetian û ji bin sîbe û perda oçaxê derketin. Nema "toba" wan û hevalên wan jî tête qebûl kirin û ji "Tarîqeta Neqşebendi" bi yekcarî derketin û ji refê mirîdan û tobedar-an vegetan.

Çûn ciheki dûr, li bajarekî biyanî, li rojavayî gund lîsikek ji xwe re dîtin. Mal barkirin. Zarok û mirîşk kirin paşıya qemyonê de. Çeto li nav xiradan li paş siwar bû. Riha wî dirêj bîbû, giha bû simbêlan. Madê wî gerav bîbû û tevî hev bîbûn müyên wî. Bi rîketin û hin bi hin di nav toza rîka axî ya dirêj de hunda bûn.



## Axavtina piçûkan

Ferhad xwe dirêj kir. Kitêb û pirtük li dora xwe raxistin. Yek hilbijart û bi ser xwe re girt. Wêneyên peyivan ketin hişê wî. Deng ji guhêne wî derbas bûn. Xwe zivirand ser temalê û li ser kîlekê dirêjkirî pirtûka xwe xwend. Destekî wî li ser guh bû, guhê din ji li ser balgih bû û dixwend. Dîsa dengê zarakan dihat wî. Bi lez li ser rezan re dicû. Ferhad, xwendinek sivik û ne berhev dikir. Dengê zarakan li piş xêni bilind dibû. Kelşen derî û pencerê re, kunikê dîwêr re darbasi odê dibû. Rim-rim ji bin piyêwan dihat. Ferhad, xwe berda ser zik û xwest hişê xwe berde ser ramanen di nav pîrtûkê de. Lî hêrisen dengê zarokê Gund dibûn rêz, dibûn şop. Den-

gê piçûkan bi hêz bû, zirav û aza bû. Ji her alî ve dihat. Ji nav tiliyên wî re, ji bin balgihê re, di şela de. Deng û qîr dibûn pêlpelik li ser perda guhêne Ferhad û dihatin hilavêtin. Pencere vekir, tê re fekir. Zarok li bin sihika xanî rêz bibûn. Bi şadî û kîfxweşî kab û xar dileyistin. Di wê kîlîkê de zarokatî hate bîrê. Enira wî xwe danî. Hêdîka zarok axavtin:

"Şero... Xelo!"

Zarok rawestan. Li ser xwe re ji pencerê li Ferhad meyîzin. Guh didêran peyivên mamhoste.

"Herin dûr. Li dereke din bileyizin.. Ez dixwînim."

Xelo, bi milikê kirasê xwe çilmê xwe paqîj kir û berî hemuyan lê vegerand:

"Ev... ev der ji hemû sihikan hîniktire û... û her gavê em li vir dileyizin."

Dilê Ferhad bi wan şewîfi. Zanî ku gelekî bi tolazan giran e, vebirîna leyîstokan. Heçkû li da-xwaza xwe poşman bibit, gote wan:

"Dê ka nexwe qirqirê nekin! Kerr û bê deng bileyizin."

Roj bi roj lept û dengê zarakan jê re bû têba, bû tirs û girêk. Berî rahêje kitêban sehwa qere-balixê digit. Hêviyên wî hin bi hin dihatin herifandin, di xwendineka serbest û zelal de.

Rabû cû nav zarakan. Li pişta xêni, li leyîstikgehê xwe li wî civandin. Bûn xelek. Ferhad, ji wan re peyivi. Wek hûnermen-dekî şîtexîf. Ser û çavên xwe bi gotinên xwe re dilepitandin. Tiliyên xwe dilerizandin.

"Hûn dizanin. Helbet we bi-hîstiye, yê ku neqencyê bikê, roja qiyametê xudê ci tênitin serê wan. Wê wan bavêjê nava dojehê, di nava agirê sor û bê dû de. Nava pêt û gurriyê de; yê ku cîra-nêñ xwe bîqehirînin, an jî li ser wan tozê bidêrin. Vêca hun dizanin. Ez havînê ji bajêr vedigerim gund, da li mal runim û bixwînim. Heger hun nehêlin ez bixwînim û min bi qîrên xwe gêj bikin, xudê wê ji we bixeyide û pişti hun

bimirin wê we ji ser pira selewatê bavêjîtin jêr. Di nav agirê dojehê de, ku agirekî mezîn e, boş û dijware. Biraziyêن hêja û jêhatî, herin li dereka din bileyizin, çêtire ji we re."

Zarokan bi çavekî bel û xurî, bi tirs li Ferhad dînihêrtin. Seriyêñ xwe yên kiçkok dihejandin. Midê wan di bin toz û gemarê de hate guhertin û diqurmiçin. Ji kerr ve pêleyistikên xwe dan hev. Li pey hev bûn terîş û hêdîka diştexîlin û dûr ketin. Şûnwarê wan bibû zevîk hilo, ku kësmê binê lingêñ wan di nav axê de çêbibû. Ferhad, bi pozbilindî vegeeria mal. Di bin lêvîn xwe de bi zarokan dikenî.

Piştî çendekê rîbarek kurt kete pêsiya Ferhad. Çend rojan ji Gund dûr ket. Zarokan pejn û pêndê wî jibirkirin. Dîsa vege-riyan û li piş oda wî ji xwe re leyîstin û bû çîz-wîza wan.

Lê piştî vegeeria Ferhad, tişta ku Ferhad enirandî û hiş di serî wî de nehiştî ew parçen pişiyê di binê pencerê de genî buyîn, bûn. Bêhn lê teng bû. Di odê de çû û hat. Destêñ xwe bi hev re birin û anîn. E din xema wî ne dengê zarokan bû. Divîbû zarokan qayil bike. Kitêban da hev, rêz kîrin, û ramandar bû. Ji xwe re dest bi axaftinê kir:

"Ez dikarim gelek tiştan bî-kim. Yek; girtin û dadana pencerê, lê bazdan û ode ji wê tarf bibin. Didu; çandina pişta xêni bi pişan û keleman, lê vêca ev nekarekî mirovayetiye. Sisê; cuyina li cem dayik û bavêñ wan, da nehêlin zarok vê yekê bînin serê min... Çawa ez wê mal û mal bigerim? Dûre ma kî dikare şivaniya zarokan bike. Zarokêñ me şûm bûne, bê perwerde û xweyîkirin in. Çare ciye? Dar! BiJJî darê zorê. Ez wê wan bitîrsinim û bizarê wan ji vir dûr bikim, der bixim."

Roja din Ferhad kîledizî li zarokan girt. Ma li benda ku bêhtiriya wan bigîhin hev. Ji nişkê ve karvekira wan û bezî. Ji ber êrîşa wî zarok pejiqîn, her yekî bi alîkî ve bazda. Gav kîrin werîs. Da pey yekî ji wan. Giha wî û ji piş şeqamek avête patikê. Bi lêdana wî re, di cih de kurik dev-devkî çû erdê. Kete nava axê. Kir qîr û hewar. Hêstir ji çavên xwe dibarandin. Çavê wî ji tirsa diçîrisin. Ferhad poşman bû. Rahijê ji erdê rakir. Devê wî gîfîz bibû. Toz

Ü çilm ketibûn nava hev. Bêvila wî tiji xwelf bûbû. Bi girîn kire gazi:

"Bi xudê ne ez bûm. Ew bûn, min deng nedikir..."

Ferhad ruyê wî bi dilovanî paqîj kir. Bi çepilê wî girt û bi tundî gotê:

"Meyzêne... Yek ji we li vir bileyizê û deng jê bê, ez wê lin-gê wî bişkînim, bilabitin çêtire."

Keser û îsk dihatin kurik. Hê-dîka digirî û ber bi malê ve diçû. Ferhad terşen poşmanîyê li pey xwe xirikandin û vegeriya malê. Dîsa ji xwe re axîf:

"Min şâştiyeke mezin kir. Heger destê wî bişikesta yan kelemek çavê wîre biçûwa! Pêdi-vîye ez bixwînim digel qir-qirêñ dengê zarokan."

Çend roj bîhurtin. Zarok man- ga (tesîr) tîrsê berdan. Vegeriyan û weke berê li pişt xêni, di bin sihê de leyistin. Kirin qîre-vîr. Disa Ferhad ber xwendinê re guhêñ xwe mixand û pancik li serê xwe pêçand. Dengê zarokan wek pîj û zixtikan di laşê wîre diçû.

"Bi xudê giha min... berde... berde hey min di... se bavo ne min ji te bir... Çavê xwe vêkin, em hatin, bûkê em hatin."

Ferhad ma sergêj. Nema karî bixwîne. Serê wî di nav lepan de, ket nav dûmana gêjîyê. Kerr hişdar dibû. Ji xwe re axîf:

"Gelo çîma nakekê serê van zarokan? Çîma navebirin? Çire bi ya min nakin? Bimasê min e yan ji sucê wan e? Piştî hevqas xwen-dinê nikarim çend zarokan qayil bikim. Ne duriste axavtine min. Perwende kirin, xweyi kirin. Na-me, kitêb, pirtûk..."

Li nav rêza kitêban geriya. Hêrekir, sehkir, dixwest yekê di seykoloriya axavtina piçûkan de bibîne. Careka din dan hev. Bûn kalî li ber çavêñ wî. Divî wan bişewtîne. Dîsa axîf:

"Xwendin, xwendin. Ev ci xwendine nikarim ramanê wê pê biparêzim. Ev jiyan ne tenê xwen-dine! Jiyan, jiyan... hunera axav-tinê ye, hunera qayil kirinê ye. Şâştiye me ew we, ku em hev rind nasnakin..."

Ferhad ji sergişî û xewnêñ xwe hişyar bû. Rêza kitêban hiş di odê de û derket. Dengê qîr-qîr û şabûna zarokan bi ser malan de diket. Dighişt dawiya tarê. Ferhad, rahişt singekî stûr û dirêj, serf zirav û qayim, mîkut jî pê re hilgirt. Dûr ji dora xêni, nava gund

re li paşıya zarokan zivirî. Ji wî ve mîkutê "Kawa" li ser mila ye. Bê deng û lept hat nav zarokan û li pişt wan sekînî. Çawa zarok dîtin, ku mîkut li milan, sing di dest de û Ferhad hêdîka ji şûn ve dihê, lal bûn, zîzîkîn û bi lez revîn. Lê Ferhad bi nermî axift û xwe kenand. Zarokan li dora xwe civand û bi wan re şitexîf:

"Keko... ka werin! Ez deng nakim we... Ez wê tiştekî xweş ji we re bêjîm."

Tirs ji zarokan revî. Li Ferhad kombûn, lê man şaxis. Guhêñ xwe yên kiçik û ji tavê şewîf pêl-kirin. Divîn zu bipeyivê. Ferhad runişt di nav wan de. Canmêrgî xwe veda, sing û mîkut danî ber xwe. Çavêñ zarokan ges bû û kûr lê nîrîn. Li benda lepta lêvên wî bûn. Ferhad dest bi gotinêñ xwe kir:

"Hun hemû hij diya xwe di-kin? Ma ne welê ye?"

Hemuyan got:

"Erê!"

"Heger yek xeberan û sixê-fan bikê dayikên we, esehî qîma we nayê û hun wê xwe kerr nakin ne welê?"

Zarokan her yekî ji aliyeikî got:

"Na, na em bê deng namî-nin."

Xelo çilmê xwe pagij kir û got:

"Em wê di diya wî..."

"Başe, gelekî xweše. Ez di-zanim hun xortnêñ mîrin û bi degelin."

Ferhad rabû şipya, sing bi-lindkir hilda jor û got:

"Hun wî singê dirêj û gij dibî-nin, ev bixwe sixêfek pîse, mezi-ne, ji... kerekî mezintire. Wê herê diya ... yê li vir qîr-qîrê bikê, yê li vir birî, binêrin! We dit çuqas dirêje. We qenc zanî, ev sixêf wê bigîhê ki? Bêjin zaroken ne li vir jî, vaye min gote we."

Dure Ferhad çend gav avêtin, zarok jî pê re lepitîn. Sing bilind kir danî ser dîwar û qenc û bi hêz têde kire xwar. Pê mîkut kuta û bi her lêdanekê digot:

"Iha.. ih.. de bila di... wan de be yê li vir bileyizê û bikê qîr-qîr."

Ji wê demê pêde zarok bûn bir û bir. Her çendek bi hev re dileyistin, lê bi dengekî nîzim û nerm. Bi tirs û fihêtkarî li singê di dîwar de kutayî dînihîrtin. Diman dûr û kesî nedîwêri biçe pêşiyê û li cem sing bileyizê.


## Şehîdim

İsmail Hacanî

Daykê namrim, dê her mînme sax  
Raste dê hestîk û leşê min zû bine ax  
Lê... baş bizane namrim,  
Wek derya û rastî û ax  
Navê min bilind wê bifrit... bifrit,  
Heta bigehîte banê gerdon,  
Bibîte heyveka çarde şevî,  
Ronahiyê dirêjîne hemî rexa  
Hêdi zorî û tarî nemînit  
Li vî welaftî  
Da millet bes bêjît  
Ayî û ax...

Bi axa giyanê min  
Dê şîn bin hizar mîrge û gul û bax  
Ew gul û bax dê bine derman,  
Bo hemî evîndarêt dilbirîn û dax...

Daykê!  
Serê te bilindtir bît jî çiyakê  
Pêrs û Metîn û Sîpan û Qeredax  
Û husa... dayîkê  
Li bîra te naçim  
Çend biborin sal û dem û çax  
Pêş çavê te dê her mînme sax, mînme sax...





### Mîrê kurda

**Stran**

**Eliyê Heyder**

ji

Çiyayê Kurdan-Rojavayê Kurdistanê

Ji bavê xwe Mislimê Elo wergirtiye, Mislimê Elo jî bi kilamên xwe û pir navdar bû. Min jî ji dev Elî Heyder sala 1987'ê nivísiye. Lê mixabin ev jî pareka pir biçûke ji va stranê.

## Milhim beg xudanê çiyayê Şengalê

Dilê min î li hane  
Sürega çiyayê Şengalê  
Çil û çar hezar malên Yezidiyane  
Milhim Beg li ser wan mîr û sultane  
Milhim Beg ê di ser re çû wext û zemane

Berê paşê de dibêjin:  
Hene başboxazê meriyane  
Vana kirin devê ewîl û maqûl, kal û pîrane  
Vana li hemû dera geriyane  
Werin nerindiyekê têxin nava çil û çar hezar malên Yazidiyane  
Got: balê xwe bidinê! Aliyekî eşîrê ketine kîfê û zewqê  
Li pêşê mala colêd miya ketine ururê û kalkalê,  
Qenteriyed deviya û naxirêd gane...

Aliyê eşîrê yê din, halê dinê li wane, xezane  
Aliyekî din dev dane çiya û zinarane  
Dibê em qebûl nakin hukmê Milhim Begê,  
Ma çima aliyekî ketiye kîfê û aliyekî xêzane?  
Bala xwe bide çan, berê daran peqiyane  
Qirikê destan di gul û çîçeken de xemiliyane  
Li nava malan û navê gundiyane  
Nabê gumirtiya devê meşkane  
Borborê zarokane...  
Wana bi hedret qeymax û mastê hilbana  
Vana serê hevdû hezandin  
Çend meriyê di ser re bilyane  
Gotin: Emê herin bi konê Milhim Begê,  
Va şorê jê re bikin xweyane  
Heger ku nikane bike xizmetê çil û çar malên Şengalane  
Bila ji ser milê xwe deyne kurg û hewrane  
Dema ku ji Milhim Begê re gotin  
Çav li serî bûn gulê topê  
Tamarêni serî rabûn  
Bostekê û çar tiliyane  
Got: "Hun berdin şorêni fesad û qumsiyane  
Nekin ji guhêni xwe,  
Di nava malên xwe de em nekin dewê û dogışen girane  
Hiro ez ji we re dikîim beyane  
Çil û çar hezar mal me hene  
Em sal bi sal dikin vêrg û salane  
Ewê ku bi dest de tuneye  
Cara min rokê daye bin ço û lêdane?  
Ü Mala wi ji xwe re kiriye xez û talane?  
Ê ku xebat û kar dike halê xwe xweşin  
Nahese bi seet û soliqane  
Wane bêkar, piştên xwe dane ber hewş û dîwarane  
Nehatine rokê li deriyê min nedane  
Negotine bo zarowêni me nîne nan û arvane"

Milhim Begê ji wan re şorkir  
Yekî got: Şora Begê raste  
Yekî got: Dunya derowane  
Dengê van di nava çil û çar hezar mal de rabû  
Kete guhane  
Gihaşt gelek derane  
Pir dirêj kir, ket hukmê çar salane  
Ji Milhim Begê standin kurg û hewrane  
Omer û bi Evdê û bi Kehrê ve  
Dibêni Kehr û bilyane  
Ü Kehr û pişthesp û pehlewane  
Lê pir şoran û gaziyan dikin  
Kehr tênaqîhîne şorêni wan e  
Çiqas bibe, ew û ji malêd zengîn û xanedane  
Her wextekê nabe sefil û xezane

Milhim Begê serê xwe da axa gorane  
Omer û Evdê û Kehrî ketin berdestê pîrê  
Li çiyayê Şengalê nakin xizmeta wan e  
Liwan dikin zoran e

Dayika wana, xanima gelek cariya  
Ji bil etbaî û xizmetkaran  
Xelk dibe meda û toxirmâne  
Pir pê zehmet hat, çetin û girane  
Royê heft caran mirina xwe dixwaze  
Dibê ez ji herim axa gorane  
Dibê bila çavên min nebînin  
Dibên hatin kirin serê Evdê û Omer  
Serî şikiyane  
Kinc ji pesîr û bedenê diriyane  
Ca destê min naqetê ji hersê lawane  
Bi min girane  
Dûre bu demane  
Nêzîke bi şorane

Dayika wan serê xwe da gora tarî  
Kurên Milhim Begê li Çiyayê Şengalê  
Sêwî û berder mane  
Çiqas medam û şoran û toxirman didin Kehrî  
Kehr guh nade wan e  
Salê Evdalê dikevin çardehane  
Çiyayê Şengalê tev ji Evdê acizin  
Roj bi roj lêxistina zarokane  
Kes na hewîne, li ser digrin deriyane  
Guvînta bayê Almamedê ji meha zemherîrê  
Bi ser Evdê tê berf û barane  
Rêk û dirb li pêşa Evdê nemane  
Evdê Milhim Begê derdikeye nava malane  
Berê xwe da çiyayê bi dûmane  
Dikeve şikevt û berqefane  
Dunya reşe, tarî zîndane  
Borbora gur û keftar  
Cinawerên çolane  
Xew naye çavane  
Kutkuta dilê Evdê di zikê wî de  
Xeşîme, rê û rêçan nizane  
Rojhilat, dûman hilkişî serî çiyane  
Rêk û dirb ji wî ve hatin xweyane  
Ji nava malan derdikeyin şivan û gavanane  
Evdê got:  
“Min di sî û sê gornê bavê van niyo  
Evan ketine nav nînîn û ciyane  
Dane wan agirê pixarane  
Ji hêvara mirina mîrê metin de  
Evdê ketiye bin şikeftane  
Ne av û ne nane...”  
Dema li Evdê nêzîk bûn şivan û gavanane  
Evdê rakir hîmekî zinarane  
Got: “Tür û nanê xwe deynin dera hane”  
Nanê germ, mehûjê Çiyayê Şengalê di nav de ne  
Evdê nanê xwe xwar:  
“Hele ez herim serê van sirtê hane”  
Evdê vedixwar ava curnane  
Rojekê dudiya, dixwar çayira Çiyayê Şengalê  
Dunya derewvane  
Got: “Evan xêrê bi min nakin  
Ditirsim ewan rojekê min bişînin axa gorane”  
Ji Evdê ve xweya tê berîka bê pîvane  
Evdê roja lêdixe li şevane  
Şevan lêdixe li rojane  
Rojkê bala xwe didiyê, ba rabûye, toz û kulkane  
Evdê nêzîk dike, dibîne

Di wir de dihere karwan û bazigane  
Hal û teqeta Evdê nemane  
Ne av û ne nane  
Lêvîn wî ziwanne  
Destêne xwe dane ser navane  
Bi roja û heftane  
Derketiye nava çolane  
Wana rabûn qelazê avê dane Evdê  
Li pêş Evdê nan deynane  
Gotin: “Kuro! Tu kuve derê?  
Ji kuve tê?  
Ma tu şivane?  
Torinêne te wendane?  
An jî malan barkirî, tu mayî li şûn wan e?”  
Got: “Apo! Xalo! Di bextê we de me  
Min ne dê û ne bave  
Ez mame li ber hewş û dîwarane  
Ji min re bikin beyane  
Ma hun kuve diherin?”  
Gotin: “Em diherin Ebra Milane”  
Evdê got: “Ez di bextê we de me  
Ez nizanim rê û dirbane”  
Karwanan bi xwe muhtacî meriyane  
Ewan siwarin, çoyek kirin destane  
Gotin Evdê: “Ji me re bajo qatirane”  
Bi dema nêzîke, kine bi şorane  
Evdê digihîne Ebra Milane  
Vana ajotin, çun mala Iskan Paşayê Milane  
Karwanan barêne xwe deynane  
Ü ketin şorane  
Wana ji mîvanan re çêkirin xwarin û nane  
Iskan Paşayê Milane xeba da yekî û duwane  
Tîstê wan jê re firot müsteriyane  
Yekî ji karwanan got:  
“Emê yadîgariyekê bidin te, beg her mihtacê lawane  
Tu dikarî bevîjî nav xulam û etbaane  
Yan ji xwe re bikî şivane  
Salên Evdê li çardehane  
Hêpekk û simbîl badane”  
Got: “Bawer dikim ev kurê we ye  
Hin bi min dikin henekane”  
Gotin: “Sêwiye, ne dê ye û ne bave  
Qetiye ji xwedîyane”  
Got: “Berê li deriyê min hene heşti, nod şivane  
Ma em sêla xwe bo zarokekî kuç dikin?  
Bila here bike xizmetê mîvanane  
Ji me re çêke qehweke tîr û girane”

Evdê kurê Milhim Begê ketiye deriyê Iskan Paşayê Milane  
Mîna xizmetkar û kolane  
Lê li xeyd û bîra Evdê tê şevêne reş û barane  
Evdê ji xwe re dibê:  
“Eger bidin min nîvînekê û kulavekî hêştirane  
Çêtire ji çol û beriya vê pîvane”

Wextê egid û mîr têne bin konê Paşê Milane  
Bal û baweriya Evdê tim li ser şûrane  
Yek dibîne, ku guhêni Evdê ne li ser fermanane  
Meraqa wî ne xwarin û nane  
Ji berê de hebûn adetêni erfat û idane  
Li meydanekê çekirin agirê sîngsîngê  
Li ber rabûn hev mîna pehlewanane.

(Mixabin! Elî yê Heyder ev strana nebir serî û hêviya me ewe, ku carekê ew ji me re vî karî biqedîne.)



## Hacı Mamo

*Hacı Mamo piştî li welatê wî xela peydabû:*

Dilê minî li yane  
Erdî hişke, ezman li bane  
Çar salin, rehma xwedê nebû barane  
Feqîr û hejar direvin ji malane  
Ji ber zarzar û barbara zariyane  
Di hindirêñ wan de nema za û nane  
Evqas îns û cane  
Hal û dema wan nemane  
Çend mirovîn biliyane  
Gotin: "Hacı Mamo! Tuyê herê ba dewleta Alî Osmane  
Tu yê ji me re bistînî perane  
Em tenzakin li nav esîr û malane  
Dewlet li bajarê Stanbolê ye  
Sandîqa wê heye li Diyarbekira xopane"  
Hacı Mamo berê xwe da wan e  
Sed û heşte hezar quruş stand ji Alî Osmane  
Li bajarê Diyarbekirê kîrî arvan û nane  
Sal bi sal xirabtir bû li wan e  
Eşîr helak bû, sozê wî bi du salane  
Li Diyarbekirê fermana Elî Osmêne  
Kutik û defteran li hev dixîne  
Heft salin Hacı Mamo vêrg û salyane nedane  
Tehsîldarê dewletê, karwan û bazarganê bi hev dixîne  
Berê xwe didin erdê Xiya, deftera li pêş Hacı Mamo datîne  
Sed û heşti quruş, deynê dewleta Alî Osmane  
Merivêñ Hacı Mamo gelek li dorê civîne  
Xezîne û defîna wî valane  
Quwweta wî nagîne...  
Di ber re hêstirêd xwînê dibarîne  
Demê çav li qantira dikevin  
Dizane, ku ji bo doşekêd bîrsê  
Kulavêd nav bi gul  
Astar û quşna wê bi qulbîne  
  
Birano! Ezê bikim û bileyzinim  
Panzdeh hezar malên Xiya ezê bicivînim  
Ez daraxacê van im, nikanim  
Berxûtekê ji wan bistînîm  
Werin ez sozekê di navbera me de dînim  
Ez deynê dewletê pişî du salan vegeñînim


Ew dibêñ: "Em tehsîldarêñ dewleta Alî Osmêñ in  
Mirovîn ferman quşnîn  
Em hatine doşeka, mal û melal  
Tenê canan jê derîne  
Li nav panzdeh malên Xiya  
Ji me re van peran bi kemîlinê"  
Tehsîldarêñ dewletê ferman dan leşkerê  
Ji gan, ji miyan û hespan  
Ji astar û quşna bistînî  
Heta van peran dikemîlinê  
Yek jî di defteran de dinivîsîne

Sadiq kurê Haci Mamo  
Bi çavê serê xwe dibîne  
Jinêd can, bükê salekê, şes mehakê  
Pîrekêñ ser darêñ tevra û cilêñ bi çehn  
Leşkerêñ Tirkan destêñ wan radikişîne  
Doşek û nivînê wan an ji bin dikişîne  
Dibe borbora keçan û lawan, giriye şîne  
Ekaliyê Xalê, Lokê Müsilê, besrekî gîrgîne  
Gava çav li tehsîldarân dikeve  
Dîn û iman li ser namîne  
Sadiq Ekâlî, yek biyek sîwarê Mendohê  
Yek sîwarê Meshîne  
Serê xwe li heyat û qetebê xwe dixîne  
Şoran û galigalan tênağıhîne  
Mirina şewîti li ber çavan nabîne  
Destê xwe avêt qevza şûre devdabanî, piş hişîne  
Ekâlî rakir şîlfê darê begêr  
Bi çarde nofirka, bi deh û du qîta  
Kirin serê leşkerê dewleta Alî Osmêne...

## Ferza Çolo Dota Hacı Mamo

Ji welatê Xiya  
Sereka rînda  
Çira şevreşîya  
Bînxweşka hewîla  
Li mehqûd meclîsa  
Temir Paşayê millî zengî zêrîne  
Qelengê Ferza Çolo tej dikirin  
Bi xerdelê bergîra  
Boşê loka  
Lokê tewla  
Telê njîda  
Colê miya  
Bi yozê hulika (miya)  
Qenterê devan û taliya  
Bi sed hezar quruş  
Qelengê Ferza dibirrîne  
Ji Teyar axa kurê Mûsê Şamî re  
Li deşta Sancarê  
Xudanê pênc êl male  
Û malpir û halxweş û gelek zengîne...

(Mixabin! Elî Heyder ev strana negîhand dawiyê)



M. Aleksander JABA, di sala 1860'an de li bajarê St. Petersburg (Lenîngrad) vê nameya jérin a li ser cih û hejmara malên êl, eşîr û bavikêñ Kurdan li Kurdistanâ Bakur, çap kiriye. Bi alîkariya vê çapê, hinde nav û hejmarêñ êl, eşîr û bavikêñ Kurdan ên di sedsala 19'an de, ji tariya dîrokê derdi kevin ronahiyê.

Aleksander JABA, di wê demê de li bajarê Erzeromê konsulê Rusî bû. Me vê nivîsê wergerand bo tipêñ nûjen û bê guhartinêñ di zimêñ de, em pêşkêşî xwendevanêñ REWŞEN dikin.

Hejmarêñ li pêşberê navên êl, eşîr û bavikan, hejmarêñ xaneyan şanî dikin.

## ÊL EŞÎR Û BAVIKÊN KURDAN

*"Rîsale (name) di behtha bédê  
éşayîr qebaîl û tayîfeyê  
di Kurdistanê de beyan dike:*

Éşayîr û qebaîl û tayîfeyê di Bazîdê beyan dike bi rûce texmîn mîkdara malê di wan beyan dike ji hemûyan Camêr û Reşîd, tayîfa Sipkanê û qedîmî axayê di wan mala Itî ye û topraxa Bazîdê de dibin ew jî çend qabîle beyan dibe:

Mankî	200
Mixayîlî (Yezîdî)	100
Sipkî	300
Kîlîrî (Yezîdî)	100
Birînî	70

Éşireta Zîlan ew jî nîzokî du hîzar malan dike di Bazîdê de û carnan diçine Iranê û Rewanê, axayê di wan qedîmî mala Cemaliddîn Begî ye, ew jî çend ta'yîfe ku îtîte beyan kirin:

Dilxêrî	80
Kilturî	100
Birokî	400
Siwêdî	100
Pîrê Xalî	100
Kurdkî	150
Zîrî	300
Ridkî	200
Cemaldînî	300
Dilkî	60
Mam Zidî	60

Éşireta Celaliyan ew jî çend tayîfene hemû li ser hev ji hizar malan jî zêde ye ew jî daîman li Bazîdê û li dora Agrîdaxî sakın dibin û axayê di wan jî qedîmî mala Xîdir axayê Lale, niha jî ji Celaliyan li terefê Iranê û Rewanê dicin û dimînin:

Xelkan	500
Cûnkân	500
Qizilbaş Oxliyan	500
Hisê Soran	300
Temê Xuran	200

Éşireta Heyderan ew jî çend tayîfene hemû li ser hev ji du hizar malê zêde ye, axayê di wan jî qedîmî ji mala Muhemed Şerîfe û niha jî dîsan axa ji wan e û éşirê Bazîdê ye, carnan li Iranê jî dimînin û carnan jî diçine topra-xê Wanê û Erdeşê:

Sade Heyderî	500
Hemdîkî	300
Mar Xuran	100
Millî	400
Ademî	350
Laçkî	200
Ezîzî	100

Tayîfeyê dinê muteferiqê, ku di Bazîd, Diyadîn, Nahiye, Xamur û Aleşgerdê rûniştî û sakın hene, biyan dibe û mîkdârî di wan dîte gotin.

Di nîv Bazîdê:

Horkî	60
Goran	40
Qere Cildîz	30
Direckî	30
Pinyanşî	30
Xile Sinî	30
Mankî	20
Mam Zidî	30

#### Tayîfeyê din ku li Nahiye û etrafê Bazîdê de ne:

Direckî	100
Mam Zidî	50
Goran	20
Hisnî (Yezîdî, niha Laros)	500
Mutî	100
Masekî (Yezîdî)	50
Xile Sinî	120
Bâsimî	40
Dilkî	50
Pîrê Xalî	80
Temê Xwerî	30
Salî	100
Kilturî	100
Dawudî	20

#### Tayîfeyê din ku li Diyadînê û gundê di wê ne:

Ademî	300
Birazî	50
Keskanî	200
Bâsimî	100
Sêçarikî	50

#### Tayîfeyê din ku li Xamurê û gundê di wê de ne:

Ademî	200
Banokî	100
Şêx Hesenî	50
Hemdkî	100
Bâsimî	100

#### Tayîfeyê din ku li Aleşgerdê û gundê di wê de ne:

Memtî	200
Bilîncanî	50
Millî	50
Mankî	50
Horkî	100
Mirdîsî	40
Banokî	50
Birazî	150
Dilkî	50
Şadî	100
Iwazlî	50
Siwêdî	70

Éşayîr û qebaîl û tayîfeyê di Ekradan, ku di topraxa Wanê de ne Mîkdara malê wan biyan dike éşiretê Şîkakî, ew jî axayê di qedîmî mala Hemze Begê ye, niha jî wane û çend qebile û tayîfe:

Şîkakî	800
Takorî	200
Şoyî	200
Ademî	500
Reşî (Yezîdî)	200
Beravî (Yezîdî)	150
Şimskî	300
Mukrî (Miqrî)	300
Lîwî	200
Sêçarikî	100
Mindî (Yezîdî)	200
Bilekortî (Yezîdî)	100

Ekrad ku di Mihmidane biyan dike.

Korkî	200
Kukîfî	200
Erebî	200
Minde Sorî	150
Xanî	500
Barejorî	500
Omerî	300
Kortî	100

#### Tayîfeyê din ku li cihê Hekkariyan de mewcûde biyan dibe:

Ertuşî (Hirtosî)	6000
Pinyanşî	3000
Bilîncanî	500
Cîlwî	500
Şevreşî	500
Musan	500
Xirwateyî	1000
Şevhilanî	1000
Kirawî	500
Koran Deşti	500
Sipayırtî	1000
Qere Çorî	1000
Xanî	2000
Şikeftî	2000
Bazî	1000
Çoxîşî	500
Kifrî	500
Birazî	300
Motkanî	500
Çîlxwerî	500
Memani	300
Çikonî (Yezîdî)	300

Éşayîr û qebayîl weko li Diyarbekirê etrafê di wê mewcûde biyan dibe:

Millî (Mala Temir Paşa)	4000
Siloyî	4000
Qere Çorî	3000
Badillî	2000
Reşwanî	6000
Orikî	8000

Éşayîr û tayîfeyê ku di Bohtan (Botan) de û di Cizîrê de heye tête biyan kiranê, mîrî de wan hemûyan jî (... dî) ne ji qedîmî de ye:

Dêrşevî	2000
Reşkotan	500
İtikan	1000
Tinorî	2000
Nemîrî	2000
Koveyî	1000
Kindalî	2000
Hacî Eliyan	2500
Miran	1000
Dudêran	1500
Birwazî	1500
Kiwînî	4000
Karsî	2000
Aqonsî (Yezîdî)	1000
Zaxoyî	2000
Şînkarî (Yezîdî)	5000

Éşayîr û tayîfeyê ku di sincaya Muşê û Bêtîlîsê de mewcûd heye biyan dibe û çiqas mal di bin tête gotin:

Hesenî	500
Belekî	500
Howedî	300
Bîndorî	300
Banokî	500
Xîwîtî	500
Memkî	200
Salarî	200
Owikî (Yezîdî)	300
Cibrî	500
Zerkî	500
Horî	200
Birazî	300
Motkanî	500
Çîlxwerî	500
Memani	300
Çikonî (Yezîdî)	300

Ji nivîsîna Hozanvanêt Kurd

Sadiq Behdînê Amêdî-1980

## Evdissemed Babek

Ji hozanvanêt nenas û kêmşûnewar belavkirî, Evdissemed Babek, kurê Babekî, Ebolqasim Evdissemed kurê Mensûrî, hozanvaneke ji hozanvanêt desthatî û ber û bîryar, kurê Hesenî, kurê Babekî.

Min dîwana Evdissemedî yasêpar (cild) dîtiye. Carek û awayekê sipehî û taze di vêhandina hozanê hebûye. Navbirî bi geşt û geryana sera hejmareka ne ya kêm ji xwendekar û sergêr û serokan dida û hozanêt şeng bi camêrî, balberî û xweşmiroviya wan digotin, dema çûye nik sahibê kurê Ebadî û çav pêkevtî, gotî:

"Erê tuyî Babekê hozanvan?"

Evdissemed bersiva wî daye, gotiyê:

"Ez kurê Babekî me."

Sahibê kurê Ebadî pesindiya gotina wî kiriye û bixêrhatina wî kiriye, gotiyê demekî li wîrê bimînt û xelat daynê. Kurê Xelkan dibêjît navbirî di sala 362'ê müşextî hevberî 972-973 zayînî ji dayê bûye û di sala 410'ê müşextî 1019-1020 zayînî dinya rohn lê tarî bûye, çûye ber dilovaniya xwedê.

Enwer Maî yê nemir dibêjît:

"Di sala 1932'ê li nav Golya li gundê Şêlan di keşkolê Feqe Mehmedê Dirêj de gelek hozanêt Melayê Cizîrî, Remezanê Cizîrî, Mir Amadînî, Feqê Teyran û Şah Pertoyê Hekarî têda bûn, digel hinde hozanêt vî hozanvanî, ku di bin vî navî û nîşanê: 'Evdissemed Babek firmayed' nivîsî bûn."

Mela Enwer li ser gotina xwe diçît dibêjît:

"Van roja xwedê jê razîyegî yê ku binyad Kurd li roja 26. 1. 61'ê kêşkolekê hozanan yêt jî hozanêt Farisî û Kurdi têkel bi nivîsîna kevin dan min da ez xwe pê ji bîr vekem. Dema min ew keşkol vekirî, min dît çend hozanêt vî helbestvan û hozanvanê Kurd, Evdissemed Babek, têda nivîsîne, hindek kêmîn, min di nav wan hozanada hozanêt Evdissemed Babekî, dîtin. Min vê carê jî gotî xwezî min ev hozanvane niyasî ba û daba niyasîne! Ev xwezî û daxwaza min bi cih hat, demê kitêba 'wefeyat el-eéyan', ya kurê Xelkan min dixand, ez ji nişkekêve bi ser navê Evdissemed Babekî di berperê 368 helbûm. Belê dîsa demê min dixwênd, min dît careka dî navê vî hozanvanî bi çav min kevt. Belê vê carê bo min rohn eşkera bû, ku eve ew bi xwe ye, ji ber ku ev çend gotine têda bûn, gotibû:

'Ew xwedê rehmeta xwe lêket, ji Kurdêñ Hekariya bû û hozanên wî bi zimanê Kurdi hene.'

Navbirî diyare desthayekê mezîn bûye di zimanê Erebî da, ev rastîye jî ji her sê dîwanêt wîye yêt haflîne dest nîşan kirin û ji van herdu hozanêt wîye yêt di kitêba 'wefeyat el-eéyan', birê duwemîn da haflîne belavkirin, kurê Xelkan dibêjît; '... bi erebî du sê helbestên Evdissemed ên ku bi zimanê erebî nivîsandine.'

Di sala 410'ê müşextî hevberî 1019-1020'ê zayînî, ku hatiye destnîşankirin, dinya rohn lê tarî bûye, çûye ber dilovaniya xwedê û Babek, bi ser riya herduya.

Herwekî diyare ji hozanêt wî yêt bi çav min ketîn, an ku Mela Enwerî kevtîn, ku Evdissemed Babek mirovekê desthatî, şehreza û pispor bûye di vêhandina hozanê bi zimanê Kurdi zimanê makê da, ji bili hindî jî bêjeyêt biyanî wekî Farisî û Erebî gelek kêm di hozanêt wî yêt bi çav kevtîn de hene. Evdissemed di pesnêt biharê da, dibêjît:



Dila şadbe! Xweş dem hat bihare  
Reşemeh çû, Terazin bûn diyare  
Nihal derbûn, xişa hat av û cobar  
Befr kerker bibû, kevtî nizare  
Kulîlk û gul bi ken derçün ji kajan  
Sivik hat nêrgiza mest, kovî xware  
Belalîz, lûleper çend kep bilindin  
Di şahenîşnê da wek Xisrew bi kare  
Binevş û gulşelêl û sunbilên ter  
Dilat û berbana bestin ciware  
Helz qewşen veda wek koçerê boş  
Silavkir çevr û kerkol û sinare  
Biken bû gelekoka filibaze  
Zinar û soy ji xwe ra kire sitare  
Li ser ta ê kevotê bû yê meste  
Kevok û xendelîs bade vexware  
Ji hemya bilbilê dîn dil bi xwîne  
Gula min kanê? Sed car li min heware  
Li min xweş têta deng berx û kara  
Li êvara dema dibt kare kare  
Were pêş bêriya sikûre di dest da  
Di hejinin parzûna li ber û ware  
Bi sema çûn distirin ev şox û şenge  
Hurmên û zimzima kevtî guhare  
Bimêze van çiya tev xemilîne  
Bi hizar renga xuya neqş û nigare  
Li Kurdistan binêre ey perîxan  
Li ser dil dê biçît jeng û temare  
Li min xweş hat nesîmê vê sibê zûy  
Hejandî şengetî, leyzî çinare  
Herro Newroze ey dil sed tibarek  
Were geştê semaye li çar nikare  
Peşîmanîm ji umrê çûn perîxan  
Bi satorê me bir bê dost û yare

Jêder:

— Ibin Xelkan, wefeyat el-eéyan, bir 2, rûpel 368

— Kovara ronahiyê, hêjmara 5-6'ê, Sibat û Adar 1961'ê berperê ,2-67'ê.



Eliyê Herîri



Melayê Cizirî

Perîzade tuwa hatî li ser çavêñ di min şala  
Melew zanî tuwa hatî ji dengê tewq û xirxala  
-Eli Herîri-

**Eli Termaxî**  
**Yekemîn rîzmannivîs û pexşannivîsê Kurde**

Ji nivîsa Reşîd Findî ya bi tîpêñ Erebî bo tîpêñ Lañînî hatiye wergerandin.

### Pêşeki

Her bêrperek ji mijoya edeb û rewşenbîriya me bête berçavkirin û rohinkirin, bê gumane xizmeteka binecîh bo neviyêd paşerojê pêşkeş diket.

Lewra desthelkirin, nexasime li torê me yê klasîkî, karekê fer û pêtiyiye, divê em bizaveka baş bikeyn, da bişin hindekê ji wî torîji berzebûnê û mirinê rizgar keyn.

Her yekê pişkdariyê di wî karî de biket, fermanekê niştimanî û millî bi kar diînît.

Demê karkirinê li vê meydanê, gelek rastî bo me diyar dibin, beri hingî li ser hîzre nebûn, û gelek rastiyêd bawer pêkirî yêd edebî me têne gîhorin û hindekêd di berî wan peyda dibin.

Ji ber hindê ye, û di vê rîkê de ye û sexmeratî vê egerê ye ev karê biçük hate pêşkêş kirin.

Aferin bo Bayezîdi, demê ev destnivise ji mirinê qortalkirî û gehandiye Jaba yi, aferin bo Dr. Xezneder î, demê gehandiye çapê û berî hemiyan aferin bo Termaxî demê nivîsi û xizmetek bo torê Kurdi Kirî...

**Reşîd Findî**

### Têbini

Pişka mezintir ji maddê vê pertükê wekî vekolinekê di kovara Rewşenbîrî Nû, hejmara 103-104 de hatiye belavkirin. Her wusa hindek ji, li korangeheki hatiye xwendin, bo Yekîtiya Nivisevanêd Kurd li Dihokê.

## YEKEMÎN RÊZMANNIVÎSÊ KURD



Feqê Teyran



Ehmedê Xanî

Li sala 1971, Dr. Marif Xeznedar desnvîseka zêde bi nîrx û pir biha, ya ku li kitêbxana Amûjgaya Rojhelatnasî li Akademiya zanistî ya Sovyêtî li Lenîngrad, li bin jimare 1958c bi şewê pertûkekê belavkî rû êxiste ber destê xwandevanê Kurdî çavereyî her nivîsareka mîna wê bişeng û zêde giran biha.

Ew pertûk li bin navê "Destûrî zimanî Erebî be kurdî - Elî Termaxî" hate belavkirin.(1)

Hejî gotinê ye ku netinê diktorî deqê desnvîsê belavkir, lê hinde zaniyariyêd nû û zêde bi nîrx derbarey Elî Termaxî, aşkera kîrin, ku Termaxî ji gelek gumana deranî, û peykerê ciwanê wî bi rengekê sipehî hate berçav ku berî hingî tîjî tem û mijî li rex û dora bû.

Di pêşekiyê de diktorî diyar kîriye, (ku hinde mîjonişî û nivîserêd Kurd mesela vî destûrî gelek mezin kîriye ku destûreke li babet serfa Erebî bi ezmanê Kurdî, ya kîriye destûrî zimanê Kurdî û daner yê kîriye yekemîn kes berê binaxey bo destûrê ezmanê Kurdî danabit) (2) û diktorî rexne ji wan nivîseran girtiye, cîma wan Termaxî kîriye rîzmannivîsê rîzmanî Kurdî!

Her wekî diyare zanayê Kurdê navdar Mela Mehmûdê Bayezidî ev desnvîse wekî gelekêd dîji tariyatîye û mirinê û fewtandinê rizgar kîriye û bo qonsilê Ürisî li Erzeromê Aleksander Jaba nivîsiye û hinartiye. Wî jî bo dewleta xwe hinartiye, wusa wekî hemî destnvîsê dî hatiye parastin û bûna gencîneyek ji samanê edebê Kurdî. (3)

Dr. Xeznedar derbara navê Elî Termaxî mesele yek ela kîriye û gotiye, "Pişti vekolînê û ïnana belga gehîştîne encamekê, ku Elî Termaxî nîne û Elî Termaxî ye." (4)

Derbarey vê zaniyariyê diktorî zincîrek ji serçawêd berî xwe êxistîne bin çekoçê rexnê û gotiye; "Li sala 1930, Bileç Şérko bo yekemîn car peyva Termokî bo wî Elî ya bi kar ïnay û yê nivîsî:

Elî Termokî li sala 1000 (koçî) hatiye ser dînyay û xundanê serf û nehwa Kurdiye." (5) Paşê seyda gingeşê li ser navê Termokî diket û her wesa li ser sala ji day bûna wî. Paşî diyardiket, ku li sala 1937 (z) Losî Pol Margrêt û Kamran Alî Bedirxan hinde şîr bo Termokî nivîsîne û wekî şairekî di pertûka xwe de ïnaye berçav. (6) Û her pişti hingî gelek nivîserêd dî yêd Kurd ew xelaş nivîsîne, mîna Muhammed Elî Ewnî di kitêba "Xulaset tarîx el Kurd û Kurdistan" (7) de, û Elî

Seydo Goranî di kitêba "Min Emman û Elemadiye" (8) de û Muhammed Mirdox Kurdistanî di "Kitab Mordox" (9) de û Kamil Hesen Beşîr di "Kamran şair min Kurdistan" (10) de û Dr. Izzidîn Resûl di "Elwaqîye fil edeb el Kurdî" (11) de.

Li dûmahiye Dr. Xeznedar dibêjît; "serçawa hemî xeletiya vî babetî kitêba Losî Pol Margrêt û Kamran Alî Bedirxane, ku li sala 1937 li Parîsê û bi ezmanê Firensî ya hatiye belavkirin, ku çerxê dehê koçî kîriye dehê zayînî, Termaxî kîriye Termokî, destûrê zimanê Erebî bi Kurdî, kîriye destûrê serf û nehwa ezmanê Kurdî, û çend parce şîrek digel wergîrana Firensî bo diristkirîne." (12)

Eve kurtiyeka kurt bû ji bîr û hîzrêd diktorî ku gelek ya diyare ew xelaş hemî wî yêd rastkirîn û zaniyariyêd paqî li cihê wan deynayne, lê demê me destek li hinde xelekêd vê zincîra bîr û raya dayî, me pêtvî û fer dî em çend peyveka bikeyn:

Derbarey navê Termokî ku bo cara yekê di kitêba "Elqediye el Kurdiye" ya bileç Şérkoyî (13) de hatî, wesa diyare her Termaxî ye, belê ji ber nêzîkiya herdu nava û ji ber şewê nivîsînê bi Firensî, pişti Jaba yî bi ezmanê Firensî li Ewrupay belavkirî, bûye Termokî bi ezmanê Firensî her di kitêba diktorî bi xwe da hatiye nivîsîn Ali Terekî (14) û bo nivîserekê Kurd dûr nîne Termaxî bibîte Termakî yan Termokî, her wekî diyare jî ku "kh" cihê tipa "x" dîgrît di ezmanê Ewrupî de, her wesa hinde şarezayêd nevça Hekariya dibêjin, gundek bi navê Termokî ji heye, ji bîlî Termaxî.

Her çnede em misoger dikeyn ku ev Elî ye, evê me mebest pê hey, xelkê Termaxe, (15) her wekî ji niho wêve dê bo me aşkera bît.

Derbarey sala bûna wî di "Elqediye el Kurdiye" de hatiye ku lala 1000 (koçî) bûye, eve jî nêzîki rastiyê ye herwekî bo me diyar dibît, ku wî kitêb li sala 1000 (k) danaye, ji bîlî van herdu çewtîyêd biçük, her wekî diktorî jî gotî zaniyariyêd dî yêd "Elqediye el Kurdiye" dirastin yan nêzîki rastiyêne, dê dabîzanîn Bileç Şérko yî çî gokiye, bêyî pişta kesbigirîm:

"Elî Termokî- ji zaniyariyêd bi qedr û seydayêd mezine. Sala 1000 (k) li gunde xwe li navbera Hekarî û Moks hatiye ser dinê. Destekê bala di zaniyari û hunera de hebû nemaze hunerêd ciwan dersgötin. Danerê serf û nehwa Kurdiye, û geryanêd baş bo gelek deverêd hevsoyî hene, û gorê wî li gundê wî ye..."(16)

Ez niho dûyî zaniyarekî Bileç Şérko yî naçim, û navekolin, çunkî dê her yek ji wan li cihê xwe diyar bît!

Derbarey zaniyariyêd kitêba "Dîrase fî elşîr el Kurdi" ya herdu nivîsera Losî Pol Margrêt û Kamran Alî Bedirxan ewa sala 1937 li Parîsê derkeftî û rehmetî Refiq Hilmi sala 1939 wergîraye ser ezmanê Erebî, (17) raste wan jî her Elî Termokî nivîsîye û hinde şîr bi nivîsiye, belê berî em behsê wan hîrsa bikeyn yêd Dr. Xeznedarî birîne ser herdu nivîseran, divê em behsê du çîrîskêd rohn bikeyn, ku dikevine ser wî babeti:

1- Dr. Izzidîn Resûl di kitêba "Elwaqîye fil edeb el Kurdi" de dibêjît; "Li demê çapkirina vê kitêbê 'mebest pê kitêba El-Waqiye ye...r...f...', kaxezek ji Dr. Xeznedarî gehîştê min. Dr. Xeznedar wî demî li yekîtiya Sovyête bû û li wê amojgaya navberî... r. f..."

Ü gotiye ku destnvîseka Elî Termokî heye û navê wî Termaxî ye û diktorî Xeznedar dibêjît ku nav û nîşanêd helbestêd Termokî ewêd di kitêba Losî Pol Margrêt û Kamran Alî Bedirxan de hatîn, wan jî rojhe-latnasî Aleksander Jaba yî wergîrtîne, belê bêyî hindê helbesta bi xwe binîşît, (18) û Dr. Izzidîn Resûl pişti axiftina Dr. Xeznedarî, dibêjît; "Bo mîjoyê min raya xwe û raya Dr. Xeznedarî li vêrê nivîsîne."

Ez jî bo mîjoyê dibêjîm:

Ku Dr. Izzidîn Resûl berî vê perawêzê li lapere 58'ê pertûka xwe binîşît, bi lapereyekê, wate li berperê 57'ê ji heman pertûkê şîk û gumanêd xwe diyarkirîne, li ser hindê ew şîrêd netewey yêd Termokî bin! Û heq nebû navê wî jê keftiba nav wan navê Dr. Xeznedarî birîn, bêyî hindê ku wê rastiyê diyarket!

Dê zivirîne ser babetê xwe û dê bêjîn:

Ji vê çîrîskê bo me diyar dibît, ku A. Jaba yî nav û nîşanêd helbes-

ta dayne wan herdu danera, wate pê hesandîne, ku Termokî şâîre, hejî gotinê yeko A. Jaba cihê bawerî pêkirinê bû, ji ber hindê ku yekemîn kese ew desnîvîs bi dest keftî û belavkirî, ú Dr. Xeznedarî di kitêba xwe de gotiye; "Sala 1860 Jaba yî pêşekiya vê destnîvîsê, bi ezmikanê Kurdî û Firensî belav kir." (19) Wate hindek ji wê xeletiyê, xeletiya hebûna şâîrekî bi navê Elî Termokî bo Aleksander Jaba yî dizivirîteve, herçende hemî xeletiya wî nîne, çunkî heta niho misûger nebûye, wî şîr belav kirbin yan herdu hivîseran ji wî wergirtîn.

2- Çîrîska duwê, di wan şîrêd belavkirî de ye, du cara navê Perîxan ï (20) di wan şîra de têt.

Her wekî me guh lê bûy Perîxan xwestiviyat şâîrê navdar Elî Herîrî ye, çewa Hebîbe xwestiviya Nalî ye û Selwa yara Cizîrî ye, her-wesa Herîrî jî xwestiviye xwe heye, ú parce şîrêd ter û ciwan pê vehandîne, her çende ger em li rastiyê bigerîn, di nav wan çend parce helbestêd belevkirî yêd Herîrî de ci cara bi dirustî navê Perîxan ê hehatîye, bi tenê carekê nebît û li berahiya hozaneka xwe navê Perîzadê atebe û gotiye:

*Perîzade tuwa hatî li ser çavêñ di min şala  
Me lew zanî tuwa hatî ji dengê tewq û xirxala*

Ev navê Perîzade jî belgeyeke, ku yara wî Perîxan e, çunkî şâîrîn navêd yarêd xwe hemîse rast û dirust negotîne, belku ji ber şîrîn û nazikî û şepaliya wan, nevêd wan wekî pirtêd şekroka bi gelek renga li ser ezmanê xwe qulpandîne.

Ji ber hindê ye hizra mim welo bo dicît, ku eve şîred Herîrî bin û wan bi xeletî li bin navê Termokî belav kirbin.

Lê ji ber hindê ku şîrêd Herîrî kêm belav bûne, li demê berwardkirina şîrêd li ba Kamran Ali Bedirxan û Losî Pol Margrêt, digel şîrêd Herîrî yêd di nav destêd me de, em bi ser hel nebûn, ku nêzîkî yek bin, nemaze hinde şîrêd Losî û K. A. Bedirxan zêde pir soza nîştimanî û neteweyî tê de heye.

Vêca her çewa bît, yan wan ew şîred Herîrî, bi xeletî ji Jaba yî wergirtîne, yan wan bi xeletî bo Terrmokî danayne, ú belkî şev û roj vê rastiyê diyarken, hizreka dî jî hebû em bi bal Herîrî ve paldayan, ew jî sala jiyana wî ye, çunkî her diwê kitêbê de ewa A. Jaba yî behsê Elî Termaxî tê de kirî, ku kitêba "Camîi risaleyan û hîkayetan bi zimanê Kurmancî" ye û sala 1860 belav kirî, her wekî me gotî, her di wê kitêbê de behsê Elî Herîrî hatîye û gotiye:

"Elî Herîrî, şîrî û edebiyatêd wî jî di nîv Kurdistanê qewî zêde meşhûr û meerofe. Texmîne kû di tarîxa çar sedê -400-'ê hicretê peyda bûye." (22)

Lê demê Bileç Şérko di "Elqedîye el Kurdiye" de li ser Herîrî diaixîvît, dibêjît; "Elî Herîrî sala 1009'ê zayıñî hevberî 400 müşextî ji dayê bûye." (23) Lewra ez dibêjîm ev mîjoya Herîrî dûr nîne, wan bi xeletî wergirtibît û bo Termaxî, Termokî danabit.

Ev gingeşe bi tinê bo derêxistina rastiyê ye û ço piştvanî nîne bo kesê, çunkî heta niho jî ew şîrêd Losî Pol Margrêt û K. A. Bedirxan belav kirin misûger nebûye yêd Termokî (Termaxî) ne, yan jî yêd Herîrî, yan yêd yekê dî, ú nîza çewa sala 1000 (k) bûye hizarî zayıñî li ba wan. Her çende ev şêlana salêd bûn û mirina şâîrîn ne bi tinê li ba van herdu nîşseran heye, belkû hemî şâîrêd me yêd kevin toşî wê şêl û bêlê bûne li ser destê nîşserêd edebê me yê kevin, ku hinde caran ew şêlan digehite çend çerxeke ne ku çend saleka, û ji ber hindê ye em hêş pêtvî dibînîn, edebê me yê kevin divê bête bêjing kirin û paqîj kirin.

Ji ber hindê pêtvî wan hêrşêd dijwar ne bo yêd diktorî birîne ser wan herdu nîşseran, nemaze piştî wî bi xwe gotî, ku Jaba yî nav û nişanêd helbesta dayne herdu nîşseran.

Hejî gotinê ye, bêjim ku mesela Elî Herîrî hîzr û bîrkirina min e û ço belgeyêd binecîh niho me nînin, lê boçûnaka taybetîye.

Ez wesa dibînim peyvtin li ser serçawêd dî yêd Dr. Xeznedarî navê wan birî hewce nîne, çunkî hemîyan wekî wî fermûyî ji wan herdu serçawa wrigirtîne "El qedîye el Kurdiye we dîrase fi elşîr el Kurdi" û ji ber hindê ketine xeletiyê.



Mela Bateyi

### Serçawe û perawêz:

- 1- Dr. Marif Xeznedar, Destûrî Zimanî Erebî be Kurdî, Elî Termaxî, Çapxana Dar Ezzeman, Bexdad 1971 z.
- 2- Serçawê berê, lapere 5.
- 3- Serçamê berê, lapere 7-8.
- 4- Serçawê berê, lapere 6.
- 5- Serçawê berê, lapere 16.
- 6- Losî Pol Margrêt û K. A. Bedirxan, Dîrase fi Elşîr el Kurdi, Paris 1937, wergîrana Refiq Hilmî bo ser ezmanî Erebî, Çapxana Eltefeyyud Elehîye, Bexdad 1939, lapere 14-27. Hejî gotinê ye, ku K. A. Bedirxan kurtkirina navê zanay Kurd K. Ali Bedirxan e.
- 7- Muhammed Emin Zekî, Xulaset Tarîx el Kurd û Kurdisan, wergerandin Muhammed Elî Ewnî, Qahire.
- 8- Elî Sido Goranî, Mîn Emman ïla El İmmadiye ew cewle fi Kurdistan el Cenobi, Qahire 1939.
- 9- Şêx Muhammed Mirdox Kurdistani, kitab tarîx Mirdox - Cild 1, Tehran.
- 10- Kamil Hesen Elbesîr, Karîran Şâîr mîn Kurdistan, Suleymaniye, 1961.
- 11- Dr. Izzidîn Resûl, Elwaqâfiye fi el Edeb el Kurdi, Beyrût 1966.
- 12- Dr. Marif Xeznedar, Destûrî Zimanî Erebî be Kurdî, Elî Termaxî, 1. 20-21.
- 13- Dr. Bileç Şérko, Elqedîye el Kurdiye, Madî el Kurd we Hadîruhum, Qahire 1930, rûpel 23-24.
- 14- Dr. Xeznedar, serçawî navbirî, 1. 8,9,9,13.
- 15- Termax: Seyad Ebdiireqîb Yûsif, di pertûka xwe de Dîwana Kurmancî, ewa sala 1971 z. li Necefa çapkîrî, dibêjît; "Termax gundeke 200 mal dibî, dikevî rojavayê bajarê Moksê bi çar seetan, li ser heddê Hîzane, belê ji cihe Moksê ye." Binêre kitêba navbirî, perawêza 1. 115.
- 16- Bileç Şérko (serçawî navbirî). Hevsî: Hevsî, Dirawsî, Ciran.
- 17- Navê wî serçawey boriye.
- 18- Dr. Izzidîn Resûl, Elwaqâfiye fi el Edeb el Kurdi, 1. 58.
- 19- Dr. Xeznedar, 1. 10.
- 20- Dîrase fi el Şîr el Kurdi, serçawî borî, 1. 20.
- 21- Sadiq Behaiddîn, Hozanvanet Kurd "Şuerai el Kurd", Bexdad 1980, 1. 234. Helbesta Herîrî.
- 22- Serçawê berê (Sadiq Behaiddîn) 1. 222.
- 23- Bileç Şérko - Elqedîye el Kurdiye, 1. 22.



## Rêdar û dara gûzê

Rojekê Rêdar saqoyê xwe çekir ser milên xwe, telikê xwe da ser seriyê xwe, florek sor kir pê, şewlerê xwe yê reş jor ve hilda, tizbî xistin berîkê û ji mala xwe derket, bi mebesta ku biçe gundê Maseka.

Berî nîvro bû û dinya germ bû. Rêdar jî bi rojî bû. Di nava gundê wî û Maseka de xêleka (navbira-medeya) pênc kilometran hebû. Hêdî hêdî ji Gundaket, di nav werzan re ber bi newalê ve çû.

Rêdar di van cil saliyên xwe de mirovekî bi hemana (nefsa) xwe serbilind bû, ji ber ku ji zartiya xwe de, bê bav û dê mezin bû, apê wî jî dixwest, ku Rêdar mîna mîrekî bite gihandin. Hîn nebûbû deh salî apê wî ew veredîkir ber pêz û gelek caran bitenê xwe li guher (ciyê şevîna pezî) û gûnîgeha sewalan şev derbaz dikirin. Teviya rojê bi şerbikek av û naneka garisî an cehî diqedand. Wilo bi terzekî xudan xweyî û hişkarî terlanîya (ciwanîya) xwe borand. Bi şivantiyê û gavaniyiê hestiyên wî yên tehr û nerm hişk bûn û bi şewq û tava rojê çermê wî hat birajtin. Lê her tim mirovekî nependî (xav) dihat xweyakirin. Bi kîmanî di çavên hevser û gundiyyên dora wî de. Di rê de jîna wî di ber çavan re derbaz dibû, çawa destê xwe da ser doçika qimeya (qameya) xwe û keça ku jê hezdîkir bi zorê revand, çawa di kişmîşan (ci-renîxan-destlîdanan) de a xwe dîbir serî û nedihêst kesek pişta wî bi ax bike û çawa li şîlan û çolana gur ji sewêl û colê xwe qorî dikir. Bihora jîna wî hat û çû lê rî hin maye û tîna rojê daye ser çavêd wî.

Di nava gundê wî û gundê Maseka de, newalekî kûr hebû. Têde kaniyeka ava sar hebû, lê ji ber ku bi rojî bû, ci caran nehat bala wî ku biçe ser kaniyê û cîmek avê vexut. Di newalê re hêdî hêdî borî. Di ser coyê avê re gavkir. Beq ji ber pêyêd wî direvin, hildipekîn û xwe di nav pûş û çawîrê de vedîşartin. Li bin siya dareka gûzê cîmekî mîna mexmelê nerm hebû. Dilê wî hilda, ku li wir wecenekê (vehesekê) bide xwe. Filorê xwe deynan û xwe li ser cîmen dirêj kir. Bi çavên rehî û ji tava rojê kûrik bûne, li ezmanê şîn, di nav çiqîlên dara gûzê re nêriya û bi rewşa xwe hizirî.

Bayekî hênik di gelî re dihat û pîkinîn dara gûzê dihejandin û pelên darê ceprast dicûn û dihatin. Ji nişkava du gûz di serê darê de, di nav pelan re diyar bûn, cohtekî mezin ji gûzên ku nehatine çinîn û kesekî dest navêtinê an jî nikânî bûn destan bavêjinê. Wilo ew cohtê gûzan bi serê xwe mabû û mîna tiştekî bi gan (giyan) dileqiya. Rêdar xwe ji piştê ve hilda, rûnişt, destê xwe da jorî çavan û li gûzan nêriya.

Gote xwe:

— Ez dê van gûzan jêkim û bibim bo kurê Hîto.

Li dora xwe nêriya, kevirek dît, rakir û avêt gûzan. Lê kevir dûr çû, çû kevirekî dî anî û xwe bada û avêt. Dîsa badilhewa çû. Gûz hîn dililiyan û qezer ji wî dixwestin. Rêdarê pêxwas di ser çîmenê re çû nav kevir û histiryan. Du-sê kevirên gîlok û bijarte anîn û ciyê xwe xweş kir û yek ji wan avêt, lêneket. È dî avêt, ew ji lêneket, è dîtir ew ji... è dî piyê wî êşyan û milê wî yê rastê sist bû. Bû hilkişa Rêdar û xwîdan li ser rû û li bin cilan ket. Bû hilkişa sîngê wî. Filor xistin piyan, çû ber hembeza xwe tijî kevirên ku bi tewat hilbijartine dagirt û hat. Saqoyê xwe danî. Telikê xwe avêt û xwe xwasî kir. Ciye kî baş bo westana xwe dît. Koma keviran danî rex xwe û bîsmîllah kir û kevirek avêt:

— Wey jêmahîb! Dûr ket.

Yekî dî avêt. Firfir bi kevirî ket, çû li ciqîlîn darê ket, wek çawa kotirek (teyrek) bikeve nav darê, wilo pirpir bi pelêñ darê ket. Ji xwe re got:

— Çima min rast avêt? De başe, an ji min tê an ji we!

Careka dî kevirek bi dest xwe re girt. Tufê kir û xwe bada. Bi tijîya hêrsa dilî û zora ku milê wî de heye kevirek avêt. Çawa tu bi kevirkeniyê bavêji, kevir wilo çû û di nav darê re çû li ser zinaren newalê ket. Çerq-perq jê hat. Ji dûr ve dengê pîremerekî hat:

— Kiye ew? Ma tu kor? Tu nabîñ ez li ser destavê me?

Rêdar bêdeng ma, di ber xwe de kir kum-kum û careka dî kevirek rakir. Bi çavekî li gûzan nêriya. Çep û rast çû û hat paş û pêşde û avêt:

— Tûh!..

Seriye xwe hejand û bi xwe keniya, piştre got:

— Welleh ez narim, an ez van gûzan tînim xwarê, an ji li vir dimirim.

Rêdar gelek caran ciyê xwe guhart. Pir kevir avêtin. Gelek caran gotinêne nebaş bo xwe û bo gûzan gotin. Gûzên ku li ber bayê hênik dihejiyan, di çavêñ wî de bûn dijmînekî bavkuj. Ew tî bû, lêvîn wî qermîçîn û şîn bûn. Bi ser avê de çû, bi ava sar dest û çavêñ xwe hênik kir, lê ji ber ku bi rojî bû, ji ser avê vekişî û li darê temşa kir. Cohtê gûzan bû mîna xanimeka di mîrnişînê (ciyê

rabûn û rûniştina mîr) de. Rêdarê girbiz û bi hêz xwe mîna paşevaneke (natirvanekî) ber dergahê kelê dît. Piçûk û jar û destgirêdayî, nîzanî çawa xwe bigihîne xanimê û viyana dilê xwe bi cî bîne. Hemû kevirên li nig bûn xîlasbûn û çavêñ xwe li nav rijale û şijikan gerandin, heyânî çende kevir din dîtin. Ewan jî civandin û yek li pey yekî avêtin, tev bê posîde di nav darê re firiyâ. Yek yek jî li pîkinêñ darê diketin û vedigerîn xwarê. Kevirekî mezîn û reş bi ser wî de hat û hindik ma, ku li eniya wîbiketa. Birçû tî, reht û kezebşewitîli keviran digerî. Te digot hostayekî xanemaniyê ye. Çi şehf û tîş nehêştin. Èdî destê xwe çend caran bi şâşî avêt pişkulêñ hespan û keran. Dinya carna li ber çavêñ wî reş û tarî dibû û tiştin mîna mîşan di ber çavêñ wî re vir de wê de dilivîn. Lê hêrsa dilî wî nedimir û hercar vedigerî û kevir davêtin gûzan û gotinêne nebaş digotinê. È dî milê wî giran bû û piyêñ wî westiyan û nikanîbû kevirên xwe bilind bavêtina, lê dîsa ji a xwe nema û dev ji doza xwe bernedâ:

— An gûzan tînim xarê, an ji li vir dimirim.

Careka dî çû ser avê. Ji tîbûna nema xwe digira. Li dora xwe nêriya, ku kesek wî nebîne. Bi dîzî daket ber kaniya xulxulî û destêñ xwe da ber avê û rojîya xwe şikand. Têr av vexwar. Zikê xwe dagirt. Dest û çavêñ xwe şuştin û çû xwe li ser çîmen dirêjî kir. Te digot ji qatirê ketiye. Xulmej bû û razâ.

Demek derbaz bû. Çavêñ xwe vekirin. Dît ku gûzên wî hîna dilîvin û bi wî dikenin. Kenîna wan mîna yê serbirekî bende-xanê bû. Xweş tê bîra wî gava ew girtibûn û ji boyî ku agirê Newrozê bi belanêñ çolê xistibûn, Lîgêñ wî xistibûn loqekî lestîkî û bi şivikeka xêzeranê li bin piyêñ wî dabûn. Yek, du-sê û heyânî deng ji wî hatibû birîn û èdî nîzanî bû çend şivik di lêdana bin piyêñ wî de şikandibûn. Kenîna cendirmân û kotiyêñ bê wîjdan heya niha tê bîra wî. Ev gûzên darê ji mîna wan kotiyân dikenin û di keloxê (cimcîma) wî de dengvedidin. Ji birçûbûna, ku mîna marekî bi hindirê wî vedida, çû li nav daran geriya. Çend hejirêñ hişk û kufîkî bi darekê ve ma bûn. Jêkirin û xistin destê xwe. Ci tehl

û bê zar bûn! Sêlma miyan (gihan) hat bîra wî û çawa berê devê xwe dixist wan sêlman û jî tibûn û birçûbûnê şîr jê dimêt.

“Rêdar ji bîryara xwe venagere. Pirs ne pirsa du gûzan e, pirsa mîraniyê û viyanê ye. Çawa ewê pişî vê rehtbûnê, westanê û rîberdanê dest vala û bê gûz biçe? Kesek vê napecirîne û ci caran ev nakeve hişê mirovîkî xwedî rûmet.” Wilo ji xwe re mijûl dibû û xwe bo perdeya duwemîn ji şanoya dara gûz re amade dikir.

— Em Kurd serhişkin. Lî serhişkî ji mîraniyâ mîran tê. Eger ez dev ji vê dozê berdim, ezê xwe biçûk bibînim û wê heya mirinê posîdeyê li hemana min bike. Na na... ez dê van gûzan jêkim, ez dê jêkim.

Li dora xwe nêriya, ku çareyek bîbîne. Lê ji keviran pêve tiştek tune bû. Te digot ew berxwedaneka bi keviran dijî zordaran, dijî û tang û leşkeran nîşan dide. Bîr û baweriya xwe pişekî guhart. Filor ji pê kir. Tuflî kefa destêñ xwe kir û koka dârê mîna aşiqekî hembêz kir û di darê re hilkişya. Gelek caran ciqîlîn hişk û ên tehr li ser çavêñ wî ketin. Pişta wî çende caran li pîkinêñ hişk ket. Pelêñ darê ketin çavêñ wî. Lê dîsa ji ber bi gûzên bilind ve hilkişya. Li jêr filorêñ wî èdî pir piçûk bûn û ji wî ve gelek mirov ên ku dûr diçûn diyar bûn. Dar li ber bayê dihejiya û ciqîlîn darê diçelqiyan. Gûz nîzîk dibûn. Lê di nava wî û gûzân de ji ezmîn pêve tiştek tune bû. Carekê vehes da xwe. Pişî xwe dirêjî, ku rahije gûzân. Dûr bûn. Xwe livlivand. Dîsa xwe dirêjî. Negihayê. Xwîdan bi ser çavêñ wî de hat. Bi destekî maliş û xaziya xwe daqurtand. Bihna xwe berda û xwe dişanî dirêjî. Gelek dûr bûn. Mîna Leylê û Mecnun li hevdu dinêrîn. Di nava wan de tenê ezman hebû. Armancê nîzîk bû, lê gelek kar û xebat jêre divê. Ne kevir hilkirin, ne cotajotin, ne dankutan û ne jî paleyi mîna wî karf bû. Destê xwe vedikir û pença xwe bo girtina gûzân amade dikir, lê heywax! Çiqas dûr in. Tu dibêjî belkî li Hindistanê ne! Di ber xwe digot:

— Hêdî ez tînim...

Destê xwe avêt ciqilekî û ji darê şikand. Bi çûqîlê bizava

xwe kir, ku gûzân ber xwe ve bîne. Lî nebû. Di xwe de got:

— Eger ez gûzê nestînim, ez ji darê danakevim.

“Mirovîkî mîna Rêdar, ji a xwe namîne û ji doza xwe venagere. Bi cî anîna armancê, tiştekî mirovî ye û siroşî ye. Eger mirov tengiya û çetinahiya nebîne, jîn bi wî xweş nabe. Jîna bê tengahî û xebat û kefteleft jî, mîna mirinê ye.” Ev bîr û baweriya di seriye Rêdar de ji zarotiyê de hatibû çandin û di hişyariya wî de damarêñ xwe berdabûn, çawa ku dara gûzê damarêñ xwe berdabûn binê newalê û bin axê.

Roj giha ber rojavayê. Zengilîn pezan dikirin zinge-zing. Sîvan vedigerîyan gund. Lê Rêdar ji dara gûzê daneket erdê. Dilê wî cixareyek xwest, lê ji ber ku wî nîzanîbû ewê rojîya xwe bişkîne, cixare bi xwe re ne anî bû. Zikê wî dikir qur-qur û nîzanîbû bi ci sohtina hinavêñ xwe rawestîne. Destê xwe avêt pelekî darê. Xiste devê xwe û cüt. Tehl û tûj bû, lê mîna dermanekî baş bû. Hinekî ew vehesand û got:

— Eger ez xwe bavêjim ser gûzan, ezê wan bigirîm û biçim li pîkinê hanî bikevim. Hinekî parsiyêñ min wê bişîşin, lê ezê ji vê rewşê derkevîm. Eger ez tim wilo bimînim, ezê biwestim û èdî nîkanibîm ji darê jêrkevîm.

Çavêd xwe damirandin û xwe bi hemû hêza mayîn avête ser gûzên ku li hember wî dilivîn. Lê mixabin! Lingê wî yê çepê tevizî bû û zu ji ci nelîv. Ew û ciqîlîn darê bi hevre hatin xwarê. Li gelek pîkin û ciqîlan ket. Mîna kortanekî ji jor ve hate xwarê û rump li erdê ket. Dinya li dora wî geriya. Daweta wî û ya jinika ku bo xwe revandî hate ber çavan, lê belê hişê wî ji serî çû. Kef bi devê wî ket û mîna miriyekî li ser çîmen dirêj bû. Bi gelek ciyan çermê wî kilişî (birîn) bû. Parsiyê wî şikestitbûn û cilêñ wî çiriyabûn. Du gûzên mîna hêgêñ misiran di pença wî da bûn. Erê herdu gûzên ku ji berî nîvro de qezer ji wî dixwestin û bi wî dikeñîyan, di pença wî da bûn. Bê liv mabûn û mîraniyâ Rêdar pejîrandibûn. Mîraniyâ ku heya fedekariyê û xwebihortinê. Mîraniyâ heya standina armancê li ser rûyê Rêdarê raketî û piş şikestî rîç û şopêñ xwe hêştibûn.



# LI SER TAYBETIYEKA ÇANDÎ LI NAVÇA ŞIRNEXÊ

Mesut Botî

## Jiyana gelê Şirnexê

Jiyana gelê Şirnexê, bi piranî li ser xwedîkirina pez e. Dema mehîn buharê tê, gundî hemû ji gundan derdikevin û diçin zoza-nêni li çiyayê bilind. Hinek li zoza-nan dimînin, hinek jî vedi-gerin malen xwe. Hemû di zoza-nan de, di konê reş de dimînin. Kon gişt ji tuyê bizanan tê çêkirin, tev karê dest in. Jin konan çedîkin. Heya dawiya payizê pêzên xwe li zoza-nan xwedî dîkin. Mirov dikare bêje ku, di demen zoza-nan de nivê malbatan ne li gundan in. Ên li gundan dimînin jî, kedê bo mehîn zivistanê amade dîkin. Xebat gişt bi hevre tê kirin. Tu kes mihana li yên din nake. Ji ber ku yên diçin zoza-nan, pîncar û hemû pêxwarinê ji bo zivistanê komdîkin. Ên li gundan dimînin, qotêna xwe û pezên xwe komdîkin. Dema zivistan destpêdike, gundî tev dîsa digihin hevdû û jiyana xwe didomînin.

Lê gelê Şirnexê hin tişten din jî dike. Cotyarî tê kirin. Hinek ji xwedî bax û baxçe ne. Lê em dixwazin di vê nîvîsına xwe de pêşemîn li ser dawetê li navça Şirnexê binivisînin.

## Ji çande navça Şirnexê DAWET

Keç û xort li Şirnexê çawa dizewicin? Pêşî divê em biza-nibin, ku keç û xorten navça Şirnexê bi piranî dawetan de hevdû dibînin, û şêwra xwe datînin. Sund bo hevdû didin.

Piştîku xortek keçek ji xwe re dibîne, dibêje maşvanen xwe, "ez dixwazim hun herin vê keçê ji min re bixwazin." Bavê xortî diçê mala bavê keçê, bo xwes-tina keçê. Dema bavê keçê dibêje, "bila", bavê xortî gustûlek an zêrekê bi keçê ve dike. Wê gavê ew keç dibe destlisera mala xortî. Ji ber ku nişanek bi keçê ve hatiye xistin, ê din tukes nayin wê keçê naxwazin.

Mala bavê xortî, dure dest bi karûbara nextê xwe dike. Nas û merivê xwe dicivîn. Gişt tevde diçin mala bavê keçê. Gelek tişten xwarinê, nola şîra-niyê bi xwe re dibin. Bavê keçê jî nas û merivê xwe komdike. Hemû bi hevre di xanîkî de rudinin. Bavê keçê û bavê xortî, herkesek zilamekî dike nûner û pêşaxafdarê xwe. Lê bavê keçê, pêşaxafdarê xwe vedi-şêre; nabêje kiye. Bavê keçê dibêje pêşaxafdarê xwe, "tu wê hevqas mal û xelat bo min ji wan bistîni." Gava axaf destpêdike, herdû bav hêdî-hêdî dengê xwe

dibîrin; hew diaxîfin. Herdû pêş-axafdar dest bi bazara next û xelatan dikin. Civat jî guhdariya wan dike. Weke rewşa aborî ya bavê xortî, next tê xwestin. Lê ji bilî nextê, gelek xelat jî dixwazin. Metik û xalitiyê keçê re kiras tê xwestin. Ji bo xalê keçê re jî, xalaniyê distînin. Kin bê gotin, gelek tişt ji bavê xortî tê xwestin. Gava lihevhatin çêdibe, herdû pêşaxafdar diçin destê hevdû. Hingê melayê wan jî, dest bi xwendina xwe dike. Gava xwendin jî dawî bibe, hingê şerîniya mala bavê xortî, bi hev re tê xwarin. Ev tişten ku ji hêla civatê tê xwarin, ji wan re dibêjin, şerîniya next birînê. Ji bo civatê jî, dibêjin, civata next birînê.

Piştî next birînê, bavê xortî dest bi amadekirina nexta xwe dike. Ji niha û pêde, ê din keç dibe bûk. Navê nextî jî dibe, nexta bûkê. Bavê xortî, next û xelatên bûka xwe, dide bavê bûke. Dure jî karûbarê dawetê destpêdikin.

**Dawet çawa çedîbin?** Dema dawet nêzîk dibe, bavê zavê agahî dide hemû nas û merivê xwe, yên li gundêndorê jî. Roja daweta kurê xwe ji wan re dibêje. Ji wan hatinê dixwaze. Herweha agahî digihîne mala bavê bûkê jî, û dibêje, "filan rojê em tê bûka xwe dibin, bila tu jê agahdarbî." Bavê bûkê jî **ceyizê** bûkê amade dîke. Bavê zavê daholvan û zir-nevanê xwe tîne, dest bi dawetê dîkin. Gundî tev têne dawetê. Gava şenî komdibe, pêşî daholvan û zir-nevan kilamên xwe dibêjin. Li nava qada gund de dahol û zirna xwe lêdixin. Hêdî-hêdî ciwan, keç û xort bi go-vendê digirin. Dema govend xweş û germdibe, hemû mîr û jin radibin govendê. Tev dikevin govendê.

**Xemî û rewşê dawetê çawa ye?** Gava mirov diçin dawetê xwe dixemîlin. Xemla zilaman şal û şapîkên Kurdi ne. Şal û şapîk ji keja pezên çorin, bi dest tê çêkirin. Zilam, pêşî derpiyên sipî li xwe dîkin, serkirasekî sipî li xwe dîkin û paşê jî şal û şapîkên Botanî li ser wan cilêni sipî de dikişînin, û li xwe dîkin. Gorêni sipî dixin piyêni xwe û gorêni rengîn jî dikişînin ser yên sipî. Pişta xwe bi kefiyêni Kurdi girê-

didin û dişidînin. Kefiyêñ hemavî yên reş û sorbelek davêjin serên xwe û girêdidin. Serzendikêñ şapkêñ xwe, li ser zendêñ xwe vajîdikin û badidin. Dawî yê de, gava mirov li wan binêre, mér-xasî û lehengiya merêñ Kurdan têñ biran!

Cilêñ jinêñ Şîrnexê, kirâsêñ wan kitanêñ sipîne. Serzendê kirâsêñ wan levendî ne. Levendî nîv-metre dirêj in. Li ser zendêñ xwe dipêçin. Dure kirasekî rengîn li ser ê sipî li xwe dikin. Ev kirâs ji, sor-zer û kes in. Rengêñ ala rengîn li ser bejna xwe dikin. Lê seriyeñ wan de şuna kefiyan, xavikêñ tenik hene. Heçî jin in xavika ji 5 meran didin serê xwe. Dor û lîvîn xavikêñ xwe tev morî dikin, lê morî ji hemû rengan in. Heçî keç in kirâsêñ wan rengaren in. Kirâsêñ sipî, ew ji li bin li xwe dikin, dema ku xwe amadê dawetê dikin. Por, dest û neynukêñ xwe ji bi hinê sohr dikin. Çavêñ xwe kildidin. Biskêñ xwe badidin û tujdikin. Çîçekêñ zêr û zîv dixin nav porêñ xwe. Sê koçkêñ zêr ji dixin ber çîçekêñ xwe. Xezêma zêrîn dixin difinêñ xwe. Gerden ji bi ristikêñ zêrî tijî dabin. Bazinêñ zêr û zîv dikan zendêñ xwe. Guharêñ tirêjî û qemer dixin guhêñ xwe. Û bera xwe didin govendê.

**Serpêhatinêñ govendê ciñe?** Xort û keç, tev bi hevre dikevin destê hevdû. Kêliya mirov li govenda wan binêre, mirov dibene ku, ci jin û ci mér, ji serê heyâ binê govendê direqisin, lê herwusa hevdû radikin govendê ji. Destpêka govendê daweta girane. Navê vê govendê, **gustîl zêrê ye**. Gava refêñ govendê amade dabin, dest bi digavyê tê kirin. Pişti digavyê, reqs destpêdike. Pişti reqsa **Bablekan**, govendêñ **Bablekan**, **Şêxanî** û hw. têñ leyistin. Ev şêweyêñ govend û reqsê li derdore bi navûdeng in. Lê gelek leyistokêñ xortan ên din ji hene. Di dema govendê de, yekî dikin **natiyan**. Kê di governdê de xeletiyan bike, yê natirvan cih de diçê wî ji govendê derdice, ji bona ku govend xweş û rast bimîne. Ji 100 heyâ 200 mér û jin, keç û xort bi hevre dikevin govendê. Mil û piyêñ wan bi hevre radibin û dikevin. Gava mirov berê xwe bide xemla govendê, tu-caran mirov naxwazê berê xwe,

çavêñ xwe ji xemla û rewşa go-vendê bizivirîne. Tirêjêñ rojê didin govendê û çavêñ mirov jê bêl dibe, ji şewqa zêr û zîvîn jin û keçan. Li ber şewqa xelekêñ seetêñ mér û xortan, kirâsêñ jin û keçan ên kesk, sohr û zer diberiçin. An ji xemla şal û şapkêñ Botanî û girêdana kum û kefiyan hemawî (cemedanî) dilê mirovan şâ dikin. Rastî wê demê, xemla û rûdana netewê Kurdistan ji ber çavêñ mirovan derbas dibe.

Berî ku dawet destpêbice, mirov eşîr bi eşîr, bavik bi bavik, malbat bi malbattêñ. Heryekê li ser cihekî bilind rudine. Her bavikê, li miqabilê govendê diraweste. Meznê wan, li ser kursiyan rudinin û gazî mitirban dikin. Pere (dirav) didin mitirban, mitirb jî diçin ser refêñ govendê **şabaşê** dikin. Serokêñ eşîr û bavikan, dikevin hemberê hevdû, û her diravan didin mitirban. Govendê re dikan şabaş. Dawet sê rojan didomin. Pişti hingê, dema anîna bûkê tê.

**Bûk çawa têñ anîn?** Ji bo çuyin û anîna bûkê xêlî tê gotin. Pêşî jineka kal, keçeka xweslaw û 2 zilam diçin mala bavê bûkê. Navê jina kal **pîra sar** e. Navê xweslawê ji, keç e, anga **keçka pîra sar** e. Ev herdû diçin, dest û porêñ bûkê hine dikin. Cilêñ bûkaniyê dixin ber. Dixemilîn û amade dikin, heyâ ku xêlî bêne.

Roja paşê, herkesek hesp û mehnîn xwe zîndike, baş dixemilîne. Xort li hesp û mehnîn siwar dabin û keçekê ji li paşıya xwe siwar dikan. Bi 100 heyâ 200 siwaran, xêlî dikeve rê. Dikevin paş hevdû. Tevlî keçen li paş siwarbûne, dest bi sitran, kilam û lawjenan dikin. Xêlî dikeve rê, kilam têñ gotin û wusa xort hesp û mehnîn xwe dilezînin. Dikevin payhev, hesp û mehnîn xwe li qadan dibazînin. Gava mirov dêhna xwe bide rewşa siwaran, lehengêñ Kurd ên berê, ên mîna Şêrgo, Rûstemê Zal, Disem û hw. têñ bîra mirov.

Gava xêlî nêzîkî gundê bûkê, an mala bûkê dibe, çuqas xort, keç û zarokêñ wî gundî hebin, tev têñ pêşîya xêlîvanan. Reya wan digirin. Ji xwe re diyarî ji wan distînin, û siwaran berdidin. Gava digihin ber deriyê mala bavê bûkê, ew ji deriyê xwe

digirin. Dîsa hinde diyarî ji wan distînin. Ji bo derî girtinê dibêjin, **pişta derî**. Gava mirov û bûkê diyariyê xwe digirin, deriyê xêni li xêlîvanan vedikin. Diçin destê hevdû û bi hevdû re dîlxwes û şâ dabin. Hemû nas û merivêñ bavê bûkê xwe kom dikin û karguzariya xêlîvanan dikin. Xêlîvan ji, li pêşîya deriyê bavê bûkê govendê dikişînin. Govend, heyâ xwarin ji wan re bê amadekirin, didome. Govend dîsekinînin û nan û xwarinêñ xwe dixwun. Keç û jin diçin bûkê dixemilînin. Kilama, **lêle bûkê** li ser bûkê dibêjin. Bûkê amade dikin, mehnîneke civan têñ ber derî. Zilamek, ku gelek nêzîkî zavê ye, diçê destê bûkê digire û têne li mehnîn siwar dike û keçka pire sare ji li pişt bûkê, li mehnîn siwar dibe. Siwarê din ji, hemû li hesp û mehnîn xwe siwar dabin û dikevine rê. 2 zilam ji merivêñ zavê, heryekê çengeki bûkê, li pişta mehnîn, digirin. Heyâ ku ji gund derbixin. Zilamek ji, herdemê hevsarê mehnîn bûkê digire. Heyâ ku bûk bênin ber deriyê bavê zavê, hevsar di destê xwe de digire. Xêlîvan bi vî awahî bûkê tînin.

**Di vê navberê de zava û vexwendîci dîkin?** Kêliya xêlîvan û bûk, hatina xwe nêzîk dikin, xorten mayin ji zava dabin şuştînê. Serê wî dişun û cilêñ zavatyê lêdikin. Şal û şapkêñ Botanî li ber dikin, bi serpêhatinêñ derdorî wî dixemilînin. Wî dabin nava govendê. Xuşk û birayêñ wî, û gelek merivêñ wî li pêşîya wî digirin govendê. Du zilamên biyanî, heryek ji bavikê, ango ne mirov û zavê, dîbin **bîra zava**. Heryekê şivikeka ji dar digirin destê xwe. Xort li zavê têñ hevdû û dest bi leyistokan dikin. Tiştên zavê jê didizin. Herdû bira zava ji bi şivikêñ xwe didin pay wan. Heke serê 10 zilaman bê şikandin ji, tukes naxeyide an aciz nabe. Ji ber ku ev roj, roja xweşî, şahî û dîlanê ye. Jê re dibêjin, **roja xêr û şer**. Herkes bi kirina xwe, wê rojê azad e. Dema bûk nêzîkî gund û govendê dibe, bira zava, zavê dabin ser banekî xaniyan. Dayika zavê ji, heskuwa dar dixe destê xwe. Diçê pêşîya bûkê. Li wir direqise. Gava bûkê tînin ber deriyê xaniyê zavê, hinek pere, hinek fêkiyan hişk, ser serê bûkê

de dirijin. Lê dîsa jî bûkê ji mehnîn peya nakin, heyâ ku bavê zavê tiştekî ji malê xwe nedê bûkê; an zêrekê, an zîvêkê an ji çêlekekê diditê. Giringe tiştekî bide bûkê. Dema tiştek dayê, hingê wê bûkê ji peya bikin, û derbasî mezelê bikin.

Keç û xort dîsa dest bi govendê dikin. Ew mîhvanêñ ku ji gundêñ din hatine, herçendek diçin malekê, malekî merivêñ zavê. Malekî ji merivêñ zavê ji, zava û herdû bira zavan dibe malê xwe. Dema şev dadikeve, civat xwe li rex zavê komdike. Çend mal di wî gundî de hebin, her malek tiştek ji zavê tînin evin: Mirîşk, dîkîl, şêrînayî, cixare û hw. Ev tiş têñ ber destê bira zavan. Ew ji wan tiştan, li mîhvan û vexwendîyan belav dikin. Ew bi xwe ji, heyâ dibe beyan dileyizin. Ew mala ku zava birin ba xwe, giringe ew xwarin û xerçkirina bo dawetiyan giş, bigirin ser xwe. Dema dibe beyan, ew mal taştê ji amade dike. Natirvanê dawetê ji, gazî hemû gundî û dawetkaran dike. Hemû rudinêñ ser taştê. Pişti ku taştiya xwe xwarin pêde, bira zava kefiyeka mezin datînin nava qadê. Pêşî herdû bira zava, çuqas ji destê wan bêtin, hevqas dirav datînin ser kefiyê. Lê herdû bira zava, divê weke hevdû û biqasî hevdû û eyen. Yek ji yê din zêdetir an kêmter, nabe. Belê mîhvan azad in. Ci ji kî bê, ew hevqas datînin. Gelek pere ji bo bavê zavê komdikin. Peran didin bavê zavê. Bavê zavê ji, xelatan dide herdu zava biran û wê mala ku, zava biribûn malê xwe. Dure zava radikin govendê û bûkê ji di xanî de radikin govendê. Heya nava rojê (nîrojê) govend berdewam dike. Dure zava, herdû bira zava, gelek keç û xort, bi hevre diçin mezela bûkê. Dayka zavê, gelek tiştên xweş, mîna fêkiyan û şêrînayîyan, têne ji wan re. Tiştên xwe dixwun. Xatîrên xwe ji hev dixwazin, û ji mala zavê derdikevin, herkesek ê din belav dibe, diçin malen xwe. Dema herkesek ji wir çû, vêca wê mela bînin. Bûkê li zavê **mahr** dikin. Û bûkê û zavê tenê dihêlin.

Li navça Botanê, derdorêñ Şîrnexê, dawetêñ gundêñ Kurdan bi kinî wusa çedibin...

# QUMRÎ

Ev hozana hozanvanekî Kurd  
ê nenase, bi zarava Behdînî ni-  
vîsandiye. Çîrokeka Drama ya  
êlén Kurdaye û mîrxasê wanê  
ku bi pîlan û xinîzî hatîye kuş-  
tin.

Piştî mirina Muhemmed Te-  
yar Paşa du axa rabûn û destêd  
xwe dane ser malêd wî, yek ji  
wan Smayîl Axa yê bi nav û deng  
bû û yê dî jî Xal Ehmed bû û  
herdu li gund û hêla Barzan  
bûn.

Smayîl Axa çûbû nav Yez-  
diya ku li şayîna mîrekî wan. Li  
vegerê xeber gihayê ku Berwarî  
rabûne û nema serîyêd xwe ji  
Zîbariya re dadixin.

Smayîl Axa bi şev hate Bar-  
zan, Xal Ehmed jê re dibêje,  
Smayîl Axa mezinêd Hostan,  
Hesnî û Serîşme dicivîne bo  
axavtinê li ser rewşa nû.

Smayîl Axa sêsed û pêncî  
şervanî bi xwe re dibe, û li gel wî  
Hesne Sor û rîberê wî Zîndê  
Zer diherin.

Gava Berwarî xebera hêrişâ  
Smayîl Axa dibihsin, mezinê  
wan Evdilrehîm Beg ê Berwarî  
nameyekê bo Smayîl Axa dişîne,  
têde dilxweziya xwe ji hatîne wî  
re xweya dike û dibêje ku ew  
aştiyê dixwaze û sozdide ku  
pacê bide: zerekî Osmanî ji ber  
her malekê ve.

Smayîl Axa ji nameya wî  
bawerfîyê digire, leşkerê xwe  
dike du par, sêsedê wan vedige-  
rîne malan û yêd din jî bi xwe re  
dibe, tenê pêncî kes bi wî re  
dimînin.

Ji aliye dî ve Evdilrehîm Beg  
ê Berwarî xeberê dide Tiyariya  
(êleka Kurd a fileye) û gotina xwe  
bi wî re dike yek, ku li hember  
Smayîl Axa rawestin û berxwe  
bidin.

Tev bi hevre dadikevin gel-  
yekî û li benda Smayîl Axa di-  
mînin, û şayîna xwe bi hatîne wî  
xweya dikin.

Pîlana wan ew bû; ku li ko-  
lana Qumrî her du kes Tiyarî li  
hember yekî Zîbarî cîyêd xwe  
bigirin.

Smayîl Axa di pêsiya meri-  
vêd xwe de diçû û bi wî re Mam  
Psiyo yekî gelek bi zor bû, ji sere-  
kên Tiyariya. Gava digihin kola-  
na Qumriyê Hesne Sor guman  
dike ku wê tiştek bibe, ew ji  
Smayîl Axa re gumanêd xwe  
dibêje, lê hîngê dem pir derbaz  
bibû.

Di kolana Qumrî de Mam  
Psiyo xwe dajo ser axa yê Zîbarî  
û ji wî dixwaze ku tivinga xwe ji  
dest xwe bavêje, gava ew ney  
dike bi xenceran radîbin hev.  
Zîbarî hindik bûn û Tiyarî sê  
caran ji wan pirtir bûn. Zîbarî tev  
di kolanê de piştî şerekî xwînî têne  
kuştin.

Hozana serpêhatiyê ya mîr-  
xasiya Smayîl Axa û Hesne Sor  
xweya dike û pesna berxwe-  
dana Zîbariyan dide, bi rengekî  
hozanî yê gelek baş, têde hinde  
aliyêن civaka Kurdêñ Kurdistana  
Başûr, di wê demê hatîne nasîn.  
Qumrî bi xwe gundeke li herêma  
Berwarî bala li qeza Amêdiyê  
ye.

Ev hozana pêşmergeyekî bi  
navê İbrahim Reşaveyi daye ni-  
vîskarê nas Pêreş. Wî jî bi tîpêñ  
Erebî û bi wergerandineka Erebî  
jî li gel wê di kitêba xwe de, ya bi  
Erebî (Tevgera Hîşyariya Netewî  
li Barzan) belavkiriye.

Me xwastî ku ev hozan ji aliye  
gelek Kurdêñ me ve bite xwen-  
din, loma me wergerandîye tîpêñ  
Kurdî yêñ nûjen. Û hêviya me  
ewe, ku di nava bakur û başûrê  
Kurdistanê de, di nava zaravê  
Kurdî de damarêd xwînê xurt û  
bi hêz bilivin û çanda Kurdî li  
hemû Kurdistanê û gelê wê be-  
lav bikin.

Herçî roja Muhemmed Teyar mird  
Du axa rabûn wet xurd  
Deşta Nav Gir lê helgirtd

Her Qubad Beg û gurgê har  
Wan talan kir xezîndar  
Her weko carfîar

Smayîl Axa tuyî kurî  
Siwarê canê dêbirî  
Çexmaxê lê diçît gurî

Ciwanê qote yêt nirî  
Smayîlo lawê leşkerî  
Serkeft serê Şemderî

Çexmaxa tavê peşka  
Şevê ma li Xan a Heşka

Smayîl bazê ser lîsê  
Çexmaxê diçît prisê  
Serkeft serê Pêrsê  
Hespê qote reqsê

Hate kifr a Sîdanê  
Sîr li piştê diket colanê  
Firavîn ïna ser derava Dilanê

Got: Yane dîlim Dîlanî  
Bêjît Xal Ehmed kanî?  
Şevê hate Barzanî

Got: Cabê ben bo Hostane  
Da şer bêñ li pêşane  
Dê çîne Berwariyane  
Dê ïnin xercê û salyane

Cabê ben bo Serîşmê  
Da piling derkevin li konê  
Nav Berwariya da çimê

Cabê ben bo Hesniyane  
Da bêñ qewmê merdane  
Dê çîne nav Berwariyane  
Dê ïnin xercê û salyane

Li Barzanî kom vebîne  
Paş tekbi्रa pêkhatînê  
Berwarî asê bîne

Spîde ye hîşta zûye  
Smayîl Axa siwar biye  
Hesne Sor digel wî ye  
Zîndê Zer de bire ciye  
Yêla avê derbaz biye

Ho diî mino! Îl Hingora  
Siwar bî Smayîl Axa yê Sora  
Şevê hate Hilora

Ho diî mino! Îl Xorîkê  
Zirna deket çîkê  
Ser tişt bire Harîkê

Ho diî mino! Îl vê Neharê  
Roj helat îl Zîbarê  
Firavîn bire Berê Garê

Ho diî mino! Îl Xemêda  
Roj helat tavê lêda  
Serav çûne destêda  
Şêr serkevtine kelêda

Ho diî mino! Îl Hêviyê  
Zirna diket çîkeciyê  
Şîv bire Amêdiyê

Evdilrehîm Beg ê Berwarî  
Herdu çav le serî bin tarî  
Kaxez bo Smayîl hinarî

Smayîl Axa gerden zer  
Bila bîtin le ser ser  
Dê deyn mal û zêrê zer

Smayîl Axa kaxez xwendîye  
Zor baş tê geştiye  
Sê sed mîr zivirandiye

Evdilrahîm Beg ê Berwarî  
Herdu çav lê bin tarî  
Cab bo fela hinarî  
Hate xercê Zîbarî

Tiyarî hatne xware  
Qutandin dol û nîqare  
Ne du û ne sê û ne çare  
Got me û Zîbariya ev care

Spîde ye hîşta zûye  
Hesne Sor di gel wî ye  
Smayîl Axa siwariye  
Zîndê Zer li du wî ye

Amêdî xwar kevtîne  
Nîzîk bûn li Qumrî ye  
File hatîne berahiye

Fila tekbi्रa kiriye  
Zîbarî rîz kirîne  
her yekî yek le diye  
Smayîl Axa le berahiye  
Mam Psiyo li du wî ye

Hesn mîrekî bi hesîbe  
Sûndxwarî bi kitêbe  
Van fila li gel me lîve

Psiyo nisranê dêrê  
Geste Mam Smayîl li wêrê  
Gotê: Tu bo çi hatîye vêrê?

Psiyo berazê xîse  
Smîl temet werîse  
Got: Mam Smayîlo! Bibrise

Got: Mam Psiyo we nîne  
Kuştin nîk meço nîne  
Ros kirin nik me xîne

Le wî vehat Zîndê Zer  
Destê li ser kemaxa xencer  
Heçî gestê da ber

girgirê: Roja bi herçûne - Aqar: Deş -  
Dewam çexmax diswarin: Hertim  
tiving li barin. - Daxsiya xwarê: Daket  
xwarê - Zîmarê: Bêtina dîlokan û  
stranê ser - Asinê Kermanî: Hesinê  
bajarê Kermanê - Bêt weşînê debanê:  
Bi xencerê lê dide - Asinê Birîfî:  
Hesinê tûj - Xwe havête beramber:

Got: Bi Încîlê, bi Quranê  
Tu şeşxanê nabeye Barzanê  
Dê beme Şîva Lézanê  
Dê bêkem armancanê

Melk Xeyo kir hewar  
Li hemî layekî hatine xwar  
Weko gurgêt birîndar  
Hobe geltebûn gittebûn  
Li bin gîzê be gitte bûn  
Sê û cot file bûn  
Ew zor dizêde bûn

Xwe pêşve avêt - Kefte ber: Bi ber  
destê wî ket - Li bin erzîngê: Di bin  
riya re - Destê debanê bû ker: Des-  
tikê xencerê şikest - Zîlana xencerê:  
Destikê xencerê - Gerê: Toz û kul-  
xana ciyê şer - Li ber kîşa derê: Ji ber  
kişand - Gasin: Hesinê hevcarê -  
Hecî gestê hincin: Li her yekê ku  
gîhîşiyê xist - Le wê ve: Ji wir ve -  
Kemaxa xencerê: Destikê xencerê -  
Li hemî layekî: Ji her aliye kî - Hobe  
gilte bûn: Bi ber zikêd hev ketin - Li  
bin gîzê bi gitte bûn: Li bin dara gûzê  
hatin çêwîrandin - Sê û cot file bûn:  
Bi sê cotan file pirtir bûn - Hesne Sor  
li nav de ber bûn: Hesne Sor di nava  
xwe de girtin - Ho xulamit bim debanê:  
Bi gorî xencerê bim - Vadîmînê: Ji  
nişkave tê pêş - Milêt Smayîl wertînê:  
Bi xencerê li wî da - Milaka lê dibiz-  
dînê: Beriyên sîngê wî re derdixînê -  
Xwînê lê dibengînê: Xwînê jê dipiji-  
qînê - Paxilê: Paşîlê tijî xwîn dikê -  
Navê xwedê digel tînê: Navê xwedê  
vêre lêvdike - Horgê filet wertînê: Ür ê  
wî diçînê - Savar: Bulgur - Dipijînê:  
Dipijîqînê - Rawestave: Rawestiye -  
Hilkişave: Radikişand (Hilkişand) -  
Înave: Anîlêvîkirinê - Havîn vedanê: Li  
paş xwe nihêrî - Tu lîre dest hilîn: Tu  
li vir destan hilînî - Dê tu vê me qelîn:  
Tu me didî kuştinê - Bînyadî: Aqîbet  
wê - Eve xeta min nîne: ev ne gunehê  
mine - Bergîzê min hilîn: Ser sîngê  
min veda - Hazir: Amede - Li gel me  
liv: Pîlanê li gel me - Le wêrê: Li wir -  
Vêrê: Vir - Berazê xîze: Xenzîrê (don-  
gizê) qelewe - Tewet: Wekî - Biberise:  
Tivinga wî bavêje - We nîne: Wilo  
nabe - Nik me: Li bal me - Çonîne: Ne  
tişte - Roskirin: Ji tivinga rût kîrin -  
Şeşxane: Tivinga ku şeşmalik - Dê  
beme: Ez dê bêm - Bikem arman-  
canê: Bo aranca xwe bibim - Ko-  
lan: Gedük - Kuştin girtiye: Kuştin  
diyiye - Dê deyn: Dê bidin - Geyşîye:  
Ferbûye - Zivirandîye: Vegerandîye -  
Qotandin: Kutandin - Dohl: Def -  
Nîqare: Haceteke saze - Le dîwîye: Li  
pey wî ye - Xwar keftîne: Daketîne  
xwarê - Hatine berahîyê: Hatine pêş  
wan - Tedbir: Pîlan - Bi hesibe:  
Hişdare - De ber çiye: Di delavê re  
çüye - Yêla avê: Aliyê avê yê dî -  
Hingora: Pişti nîro - Axê Sora: Axê  
Soran - Zirna: Navê kom, ji zirne -  
Deket çikê: Deng dûr - Sertiş: Taş-  
tiya sibê - Neharê: Rojê - Tavê:  
Şewqa rojê - Serav: Pêşengân leşker  
- Serkeftine: Hilkişine - Hinarî: Şand -  
Gerdan zer: Mirovê çîl - Bila bîtin li  
ser ser: Hatina wan li ser seran be -  
Serg: Jor - Zibare: Koma ku li ser  
civiye - Dubare: Pîlan.

Got: Bi Încîlê, bi Quranê  
Şeşxanê nabe ye Leyzanê  
Pê nakey armancanê  
Dê beme ve axa Barzanê

Ho xulamit bim debanê  
Terma bavê kolanê  
Evro roja lêkdanê  
Kuştö Melkê Lîzanê  
Ku heta roja axrê zemanê  
Navê min bigire le Barzanê

Kolana Qumriyê tengê  
Psiyo lê girtî tivenge

Xulamit bim sîr xorê  
Terma bavê nav korê  
Evro roja girgirê

Got: Mêra kuştin girtiye  
Roskirin nedîtiye

Hay barî barî barî  
Spidê heta îvarî  
Roj kire şeva tarî  
Xwîn ser Zîndê Zer barî  
Ser kevte nav aqarî  
Barekellaho Tiyarî  
Barekellaho Zîbarî

File dimînê radimînê  
Xencerê helkişinê  
Milêt Smayîl wertînê  
Mîlaka lê dibizdînê  
Xînê li paxlê debengînê

Barzanî gurgêt harin  
Dewam çexmax diswarin  
Xasma file neyarin

Smayîl dimînê radimînê  
Xencerê helkişinê  
Navê xwedê digel tînê  
Horgê filet wertînê  
Savara germ dibjînê

Leşker dixisa xwarê  
Hesnî diket Zîmarê  
Xencer asnê Kirmanê  
Bît wesînî debanê

Mam Smayîl rawestave  
Xencer helkişave  
Navê xwedê ïnave  
Horgê filet wernave  
Savara germ bijyave  
Hesne Sorî havrî vedave

Kolana Qumrî tengê  
Şeşxana denge denge  
Fila û Zîbarya cenge

Got: Mam Smayîl! Tu dînî!  
Tu lîre dest helînî  
Dê tu vê me qelînî  
Tu çô tê binyadê nabînî?

Xencer asnê Birîfî  
Kuştö Melkê Aşîtî

Got: Mam Hesno wer nîne  
Eve xeta min nîne  
Bergîzê min helînê  
Paxila min tejjî xwînê  
Mêr bi dest helînê  
Min kes hazir nîne

Kolana Qumrî raste  
Xwîn ser herdê bî maste  
Barzanî yêt may pazde

Mam Hesnî yek xeber  
Xwe havête beramber  
Xencer dayna por ta ser  
Xinaniso kefte ber  
Li bin erzîngê kire der  
Destê debanî bo ker

Xulamit bim sîr Xorî  
Kelex kefte nav kirî  
Hesnî nemane corf


Got: Şikest zîlana xencerê  
Ez mihtel bîm vê gerê  
Ço xencera file li ber kîşa derê

Kolana Qumrî bi dare  
Xwîn ser herdê çû xware  
Weko co û rûbare  
Barzanî yêt may care

Mam Hesnî hesnî  
Xencer weko gasnî  
Heçî gestê hinçinî  
Nav serda xwe dipesnî

Serga gundî bi dare  
Li Hesnî kire zibare  
Bê wer hatin dubare  
Hesnî di xwînê gevizi,  
Kevte xware.

## ŞANO



# Nazdar û hicra Mirinê

Cankurd

(Perdeya dawiyê ji jîna nivîsevanekî Kurd)

DEM:  
Cî:

Hêvareka zivistanê, ya bi baran û xumxuma ewirane. Maxeka nûjen a ji maxên Swêdî, li gundeki nêzika Stockholm.

(Li ser diwârê hinde wêneyên rengin ên bajarên Ewrupî hene, maseyeka ku ser wê tiji nivîsar û têniyîs hene. Sazekî Beethoven tê bihistin, nermî û nazikiyê tîne dilan, ruhnî li maxê kême. **Nazdar** li ber masê destê xwe daye bin guhê xwe û cigarekê dikêşe, dinivise û dixwine.)

**Nazdar:** (Bi dengekî hozanî yê xweşik û ner mik.)  
Gundê ku ez niha lê dijim mîna bihuştê ye.  
(Cigarê dikêşe.)

Nebû... Gundê ku ez têde dijim bihuşt bi xwe ye. Ez nema ava bîrê, cobarê an jî a kenalê vedixum. Ava şor, şîr an jî avjonga sêvê hertim di saringa mala min de hene.

(Cigarê dikêşe.)  
Kes li vî gundî bi kerê an bi qatirê naçe karê xwe. Min bo xwe yek Volvo standiye, hinekî buhayê, lê jî ber ku başê û nûjene bala min kêşaye ser xwe û nema bê wê diçim derekê. Ma tu bawerdikî, ku ker li vî gundî tune ne, min tew ji bîrkiriye ker çawa dizirrin.

(Cigarê dikêşe.)  
Min du sê dostêñ Swêdî hene, keçikin mîna periyen bihuştê ne. Em bi hevre diçin avceniyyê dikin û roja şemiyê diçin dans û semayê. Û ci bêjim!  
(Bandê Beethoven bi yekê Mozart diguhêre. Radibe, di

*hindir re diçe û ditê, rûdine.)*

Rewşa minî aborî gelek başe û her pêşve dihere, ji ber ku ez di rojnameyeka Kurdî-Tirkî de dinivîsim. Dibe tu bipirsî, ma Kurdi li wir neqedexeye, ez dibêm: Bi Xwedê Swêdî ji dê û bavê me çêtirin. Bo pirsa Kurdan weke wan kesek pê nizane û xwe jêre mijûl nake. Zana û ram-yarên Swêdî ji me teva baştır pirsa Kurdan dizanin û xwe jêre vala dikin, ku bo me jî carekê li dinyayê mafek hebe. Ez vê bo te dibêm, lê ji bîr meke, ku hinde Kurd hene rewşa me li vir xirap dikin. Evana li Kurdistana Bakur hêrişê dibin ser her gaveka, ku boyî demokratîyê, nahêlin gelê Kurd û yê Tirk bigihîn hevdû û sazma-neka mîna yê Swêdî pêkbînîn. Evana karekî nebaş dikin, ku va kêfa em têde li me bîherimînin. Tabî em dij wan kesan derdikevin û dij wan dinivîsin, ji ber ku evana hîç ji siyasetê fêmnakin û tênağıhîn şaristanî çiye. Demaçek û tivingan çûye û niha mirov bi hişê xwe dixe-bitin. Binêr li Swêdî ci pêşketî! Lê heywax! Te hîn Swêd nedîtlî!

*(Xumxuma ewiran bilind dibe, di nav perdeyekê re mirovekî qanat û girs derdikeve, cilên reş li wîne û werisekî darvekirê li dor gerdenê wîye. Ew mirov hêdî hêdî berwe wî tê û li nêzika wî radiweste.)*

**Nazdar:** *(Bi tirs û lerzin.)*

**Mêvan:** Kiyî tu? Tu çawa hatî hindir mala min? Kê tu aniyî vir?

Ez kuştiyê zîndana Diyarbekirê me.

*(Dengê wî bi ber maxê dikeve.)*

Ez kuştiyê hicra mirinê me.

**Nazdar:** Navê te çiye? Tu kiyî?

**Mêvan:** Navê te Nazdere. Çima navê te Nazdere? Çima ne Zinar an Xencere?

**Nazdar:** Erê navê min Nazdere, ji ber ku hozanên min gelek nazikin, gotinê min xweşikin.

**Mêvan:** Navê min negiringe. Gelek navê min hene. Navê mîna Agir, mîna Bahoz û Bager...

**Nazdar:** Tu çawa hatî vir? Kê tu aniyî?

**Mêvan:** Hicra min, dosta min a wek tabût, herro min li aliyekevî cihanê digerîne, li ser basikên ewiran, li ser pêlên derya û avan, bi ba û baranê re, bi brûsk û tavê re min digihîne her dereka ku ez divêm.

**Nazdar:** Tu ci ji min dixwazi? Daxwaza te çiye?

**Mêvan:** Daxwaza min di vê hatinê de, di vê rê de, rîcîka ku narize û naye hilkişandin, na xerife û xwar nabe, bi vê serkeftina şoreşê re li her Derekê biçînim, bi bi xwîna xwe carekâ dî avdim, dîsa ji bo gel bêm kuştin, perçiqandin an birjîtin. Lê bi xwe re ên weke te bidim bersückirin, berguneh kirin.

**Nazdar:** Min ci kir? Gunehê min çiye?

**Mêvan:** Ma hîn guneh ji ê te mazintir heye? Te ci nekirî û ci negotî? Çima tu wer diki? Ma tu ne Kurdi? Ci bi seriyê te hatî? Ma ev welat, welatê te ye? Ma tuyê venegerî welatê xwe? Tuyê bi ci ruyî vegerî nav deşt û çiyayên dor gundê xwe?

**Nazdar:** Ez nizanim min ci kir. Hergaveka ku ez davêjim bo pêşketa gelê mine.

**Mêvan:** Navê te mîna navê hozanên ber dergahê sultan in. Li ser diwarê mala te wêneyên keyf û seyran in. Sazên ku tu dibîhsî yê eywanên xwedîyê hebûn û malan in. Ma li ciyê Beethoven û Mozart sazên me Kurdan nînin? Eyşâ Ibâ, Memê Alan û sazên Meryem Xan û Arifê Cizravî ne buhane û ne giranin. Rûniştina te, nîvîsına te, xwarina te, ger û liva te û her rengekî dan û standina te, mal, cî, gotin, kenîn û cilên te, tev hatine guhartin, ji Kurdîniyê derhatine.

**Nazdar:** Tu dizanî ku ez ne li Kurdistanim. Ez li Swêdim û mirovekî

nîvîskarim û bîrdozim, gava Swêdî bêñ ba min, li sazên Kurdî guh bidêrin, wêneyên birçîbûnê bibînin û gotinê tiji derd û kul û xwîn bibîhsin, wê ji min û ji gelê Kurdistanê birevin, wê ji mala min derkevin û bibêjin: Ev gela çi caran pêşnakeve, jîna wî tev li heve, ev sernakeve.

**Mêvan:** Ma kes dikare ji siya xwe bireve? Ma emê çawa xwe ji bîr bikin, derd û kulan derman bikin, xwe bi carekê wenda bikin?

**Nazdar:** Ji van guhartinê şaristanî ci guneh min nînin.

**Mêvan:** Tu ci dinivîşî şâş û çewte, bo me terse. Welatê me yê bindest, gelê me yê serşikest û xorêt me yên zincir û dest bi hêstiran azad nabin, bi civîn û hêlehélan, bi hozanên li ser kihêlan û bi çîrokêñ keç û cihêlan welat rizgar nabe û mirî ji gorê ranabe. Çima tu li ser Kurdistanê wilo derewan dinivîşî û dibêjî, ku li welatê me gel dijminê pêşmergane, neqencî û pîşî karê Kurdane û hukumeta Tirk bo demokratîyê gaveka mazin avetiye, lê Kurdan ci caran aşîflî nexwestiye. Ma te çend rêzik li ser zîndanan, li ser leşwêrankirina lawan û keçan, li ser birçîkirina zarakan di binê hebsan û li ser namûssîkînîna bûk û dayikan nîvîsine?

**Nazdar:** Başel Ez ci bikim?

**Mêvan:** Divê berî her tiştekî, tu delha dilê xwe, tu mejî yê xwe û hemû jîna xwe bo xebat û têkoşînê, bo serxwebûnê, bo gelê me rojekêjîneka bi rûmet bibînê, biguhêrî an jîtu yê bi tenê xwe bîmînî.

**Nazdar:** Ez dikim. Bi şerefa xwe sund dixum, ku ez dikkim. Edî ezê li ser Kurdistanê û serxwebûnê binivîsim, li ser yekbûnê, li ser welathezkirin û pêşveçûnê.

**Mêvan:** Ev tenê nebese. Divê tu bi min re carekê herî Kurdistanê.

**Nazdar:** Kurdistanê? Çawa herim Kurdistanê? Ma ez wek te me? Min xwîna xwe mîna te nekirî kevçiyê. Ez nîvîskarim, ne şoreşgerim, ez xebata xwe bi mejî dikim, ne bi tivingê.

**Mêvan:** Tu dikarî li Kurdistanê jî xebata xwe bi mejî bikî, wê pêşmerge yê te biparêzin.

**Nazdar:** Ez naçım Kurdistanê. Ez hemû jîna xwe mîna mûm û findan hatime sohtin, min bi dehan defter tiji hozan û janên dilîni kirine, ma ev ne bese?

**Mêvan:** Hemî defterên te, hemî şevêñ ku te bi pêñûsê xwe re derbas kirine, ne mîna şeveka zîndanê ne, ne mîna dilopeka xwîna ber lêdanê ne û ne jî mîna birîneka pişî hêrişekê ne. Mazintirin hozan ew in, ên ku di bin zorê de hatine kuştin, ên ku di birçîbûnê de mirine û namûsa me bilind hêstin, ên ku ala berxwedanê li çiyayên berfanî bala hilanî û ji bo serxwebûna Kurdistan xwîna xwe erzan danîn. Were bi min re em herin Kurdistanê, ku tu xwe carekê paqîj bikî, bi ava kaniyêñ sar xewa qerêj ji ser çavan vemalî û xwe ji tirsê rizgar bikî.

**Nazdar:** Ez naçım... Ez naçım... Ez naçım!..

**Mêvan:** *(Destê xwe davêje cébîlika masê, debançeyekê dertîne, dide ber guhê xwe û xwe dikuje. Bi ser nîvî û têniyîsên xwe de dikeve.)*

**Nazdar:** Roja me, canê me, xwîna me, zanîna me, bi van re hewesa dilên me, a ku di hisdariya milyonan de hatîye histran, bo tişte me yê hêjatire, bo serxwebûna we ye.

**Mêvan:** Bo we hemû mirovan, di sala nû de, canê me li ba we ye, bi ba û bahozê re em silavêñ xwe bo we dişînîn, canê me tev va bayî hatîye birajtin, em her li dora we ne, li ba we ne, tev xebata we ne, rêhevalêñ berxwedana we ne.

*(Perde tê girtin)*



**Hayranok:**

## •Qulingo

Qulingo qulingê Sêrtê  
Eve sê şevan û sê rojane  
Mîrata rê tê  
Li welatê xerîbiya tê!

Herê qulingo tu xeletî  
Berê te li zozana, pişta te li milleti  
Heçî kesê li zozanê jorî hat û...  
Wa li min evdala xwedê bê xefletî

Qulingo tu ne koçerî, tu ne êsirî  
Xûsara malik xirab li ser  
Çengê te qersî  
Heçî keskê ji zozanê jorî  
Hat û min evdala xwedê jê pirsî

Îvarîye, roj nema  
Boşiyê te ka mîra li derê xanîkê  
Mala babê min girlî qozel û  
Çema min gotê wêt hekîne got  
Xwazgîniyêt bejna bilindin, rohka  
Şîrîn ser qalîbî nema

Ser me re befrekê mişte û  
Ji herama baranê çende kehre  
Girîkê min evdala xwedê têt  
Ji kûl û kovanê dilê me re

Nûriddîn Seîd  
Zaxo

## Efsana Cimcimê Sultan

Cotkar

Li gundê Xezêwiyê, ba şêx Hemîdê Qadî —Hec Alî—, şêx Birîm, birayê Xusxel, di vê civate de li hev rûniştin, çêroka Cimcimê Sultan hat gotin.

Şêx Hemîdê Qadî dest bi çêroka xwe kir û got:

"Di demeka dûr da, li ser rûyê va dînyayê goçerin hebûn, van goçeran tim li ser lingan bûn, yanê kijan wara bi wan xweş bû, konêñ xwe didan hev û berê xwe didan wa heremê. Hinek ji van goçeran li erdê Qudsê bûn, ji bo wan dînya bi qerase bû (cemiidî bû). Wan konêñ xwe danîn, li hev pêçan, firaqên xwe kom kirin, tiştên xwe li ser pişta ker û qantiran şîdandin, berê xwe dan bo erdê Hîcazê ê germtir bû.

Mîrê goçeran ferman da gelê xwe û goçer bi rîkirin, dema ew gîştin erdê Hîcazê ji obeka wan oban jinek li dû goçeran ma, ev jinka di wê gavê de bi zarok bû û dema zayînê li wê hatibû, va êksi-

ka bi tena xwe li wê çolê ma, sançî hatinê û bû hint-hinta wê, ber xwe da, hema berî zarokê wê bibe, xwedê ferman da ezraîl û got:

-Ya êmekdarê min... Goçerin ji welatê Qudsê derketine û di rîya xwe de ne, diherin erdê Hîcazê, pîrekek giran heye, li dû goçeran maye û zarokê wê dibe, tuyê li ber balgiyê seriyê wê pîrekê rawestî, gava ku zarokê wê hat ser rûyê dinê, tuyê canê wê bistinî, yanê rihe wê pîrekê bigî, bîne ji min re.

Dema Ezraîl patşahê mirinê rihe jînikê girt, zarokê wê li ber sîngê wê bû, wehjinî bi zarok ket. Di wê gavê de dilê patşahê mirinê ezraîl bi wî zarokî hat sohtin û êşî û li wir bi xwe re mijûl bû, got:

-Ya xwedal! Min rihe wê jînikê girt, li va çol û çolistana, ne kesî dîf û ne kesîbihist, tu kes li van deran bi xwe nîne, ma wê çawa be?

Pîrê Ezraîl bi sergermî, rihe jînikê bir, kir qendîlê rihan. Li vegerê xwedê deng lê kir, got:

-Ya êmekdarê min! Çîma min ferman da te, ku tu rihe wê êksîkê bistinî, gava te can kişand, lawik kete erdê û girî, kire behjîbehj, dilî te pê şewitî? Te got; ya yezdan! Li vê çolê, li vê ber û borê, kesî nedîf û kesî nebihist, ma te va bîra kiriye, xwedê nizane û nedîye?

Dibêñ xwedê bi çavekî xeydê li Ezraîl nihêrî û kire mij û dûman, bi perî ezmanan xist û dû re bi çavekî rehmê lê sekir, wekî berê li hember xwe rawestand û gotê:

-Pêwîste dilî te bi mirov neşewîte, ê ku wan tîne ser rûyê erdê, girînge bextê wan jî ronik bike.

Va zaroka li wir ma, xwedê patşahê erd û ezmanan, va dinê û wa dinê, xwedayê dan û stanдинê, ê mezin û bi hêz ewe, kane bike çawa ew dixwaze, roja dî berek xezal bi ser wî zarokî de şand, xezaleka bi şîr hate ser zarok û çîçkîn xwe kirin devê wî zarokî û ew têr şîr kir.

Dem bi dem ev xezala tê ser lîwik û wî bi şîrê xwe têr dike, bû sedemek ji dirêjbûna jîna wî lawkî re. Bi şoran nêzîke, lê bi dema xwe dûr û dirêje. Lawikê çolê êdî destpêkir di şes mehekê de, bi çalepan xuşî, lawik kanî bû li dor laşê dayka xwe bigeriya, dayka lîwik bi hêza xwedê li ser acî rastê bû, bi laşê dêka xwe

girt, xuşî hat ser sînga diya xwe, dev kire memkê wê, di wê demê da can bi memkê dêkê hat û şîr girt, va lawikî şeş mehan şîrê diya xwe mêt û bi ser lingan ket, li wê çolê bi xezalan re jiya.

Wek ku gotin dibêñ, li welatê Hîcâzê Karwan pir bûn, li ortê welatêñ rojhilat û rojava dan û standin dikirin. Yek ji van karwanan li wî warî konêñ xwe danîñ, şevekê li wir razan. Sibedîrabûn, firaqêñ xwe dan hev, li wa derê borîn û gerîn. Gavanekî dewêr, dewarê xwe bir çêrê, bi rê de perek asik (xezal) ji pêsiya wî rabû, lê gavan seyr ma, gava dît, ku lawek di nav lingêñ asikan de dibore. Gavanî devserna, nikanî bigihêsta wî lawikî, lawik ket nav pûş pelêş, li wir hinda bû, gavanî dewarê xwe çêrand ta hévarê, li ber rojava dewarê xwe komhev kir, vegerî ciyê karwan lê.

Dû xwarina şîvan re, gavan wek, ku em Kurd zanin hemû dañışvan diherin ba serok, şewêrkiya xwe li bin konê wî dîkin, çayê an qehwê tehl vedixwun, de ma razanê vedigerin malêñ xwe. Gavan cûnê konê serkarwanî, silav da wan kesêñ ku li wir û li ciye-kî xwe berda erdê, rûnişt. Serkarwanî zanîku dêmê gavanî hatiye guhartin, li wî temaşa kir û got:

-Ha gavano! Çima tu wilo bi ser xwe de bi bîr ve çûyî?

Gavanî li serkarwan nêri, got:

-Bi xwedê! Hîro ji pêsiya min kerîk asik rabû, di nav wî kerî de, min zarokek dît, ew zarok pir bezo bû. Min devser wî na, ez negîhestimê û lawik kete nav pûş û pelaşan, hinda bû.

Serok gotê:

-Ma tu wa ciyî zanî?

-Erê ez zanim.

Mezinê karwanê ferman da gelê xwe, jin û mîr, ewîl û xort, kalmîr û pîrejin gişt bi hevре herin wa ciyê ku gavan gotî. Bi vî rengî serok got:

-Ger ew kuda here, emê wî bigrin.

Gişt bi hevре çûn û çavên xwe li wî warî rind vekirin û gerandin, bi peyafî û siwarî, gel ji bin konan derket û bi wê çolê ketin, kerî asikan ji ber wan rabû, bi rastî zarokek li şun keriyê asikan ma, devserê wî kirin, lawik bezî, kete nav pûş, li ser sînga diya xwe, xwe komhev kir, vana lawik girtin, dîtin ku wa êksika ku li nêzîkê mirî, aciyê

rastê tixiye û yê çepê hîn can têdaye, li wir ew êksika veşartin û lawik bi xwe re anîn mal.

Wek em zanin, lawik bi cine-wiran re mezin bûye û şîrê wan vexwariye, ziman di devî wî de nîne, serok ev zaroka li cem xwe hîşt û ew perwerde kir, debîr (mamosta) jêra girt, ku wî hoyî xwendin û nivîsandinê kir. Ev lawik bi xwe hat, xort bû û serê wî pir zelel bû, tengdarêñ ketin bin şorêñ wî, hurmeteka pak jêra xuyakirin.

Jîna serok dawî bû, gava mîrina wî hat, ezraîl lê bû mîhvân, canê wî girt, bire jor, ciyê qendîlê rihan, şenî li mala serok civiyan, wek xûka (adeta) me Kurdan, laşê wî çekirin ser darbestan, birin gornan.

Rok du se... Ev êla ku bê serêl mayî, hêdî hêdî jîna wan berve hevdiyo bû (xirab bû), kalmîrêñ wê êlê li mala serêlê mirî civiyan, bi serêliya xwe mijûl bûn, şor ji şorê, hatin ser serokatiyê, giyan li wir peymanêñ xwe dan, di wê şevê de, ew zaroka hilbijartin, ji xwe re kirin pêşeng.

Dibêñ ku di serdema wî de, aşîfî, dadmendî, rastîbûn herdemî bû, kêf û şahî, ken û henek li ser lîvîn wan mirovan bûn, di du sê salan de, welatêñ dorhêla xwe, tev kirin bin destê xwe, des-telata wî gîhêste qulbe û bakur û pir bi deng û nav bû.

Rojekê ev Sultanâ li dervey burca xwe radiweste û li çolê temaşa dike, li wa çolê çelek tê ga û gayêñ din li dû çêlê têñ, çêl ji ber wan gayan direve, lê gayekê xort zora gayêñ din dibe û çêlê dide ber sîngê xwe, dema va ga-ya di ber çavêñ Sultan re derbas bû, çavêñ Sultan lêketin, dît ku çavêkî bi ronik di orta herdu çavêñ wî daye û laşê gê mezin û tij goşte, Sultan bi xwe re got:

-Bi xwedê! Ger heye ev gaya xwedê ye! Ferman da şagirtêñ xwe, hew gaya girtin, anîn ji Sultan re.

Cimcimê Sultan hewliyek ji burcê xwe xweşik û rindiktir avakir, xalî û mehfûr lê rêexistin, ew gaya ji xwe re kir xwedîyê xwe û perestiya ga kir.

Li wa derê û li wa gavê xwe-dê ferman da melekê mirinê, jê re got:

-Ey emekdarê min! Here we-latê han, bi çavêñ xwe bibîne, wa zarokê ku dilê te li ser hatiye

sohtin, min ew kiriye patşahê rojhilat û rojava, başûr û bakur ketiye bin destê wî, bûye sultanek bi nav û deng, lê ew Sultanâ bûye gaperest. Perestiya wî gayî dike, hêz û xweşiyê jê hêvî dike.

Ezraîl xwe kire rengê kotirekî (teyrekî) û xwe berda jêr, rast çû qonaxa Cimcimê Sultan, bi çavêñ xwe dît ku Cimcimê Sultan qonaxek ji camê avakiriye, mehfûr têde rêxistine, çend şagirt dane bo wa qonaxê, ku berdestiyya gê hergav bikin û bi xwe jî li jêr rûniştiye, hêz û xweşiyê ji gê hêvî dike. Cimcimê Sultan ji binî xwedê nasnake. Wê gavê melek ezraîl firî çû li hember xwedê ra-westî, dest danî ser destâ û got:

-Ez kêmim tu temamî ey xwe-da! Ji te va tê xweyakirin, çi dîbin heftezmanan de dibe, tu gunehê me berat kî, ya xweda!

Va Sultanâ gava diçû mezela xwe yan civata pîremêran, ew ge-la bi tevî û bi serfirazî ji ber wî ra-dibû û gişt disekinîn li hêviya fer-maneka wî, wek zanyarêñ ola zer-deşti dibêñ, va Sultanî hezar salî ji li ser rûyê dînyayê, gava ku de-ma wî li vê dunyayê dawî bû, bi vî rengî canê wî hat kişandin.

Pênc melek ên mirinê li ser wî kombûn, ta kanîn canê wî ji laşê wî bikin, ev jî ji ber qencî û dadmendîya wî bû, gava ku van pênc melekên mirinê li dor Cimcimê Sultan kombûn, nikanîn ca-nê wî bikşandana, bi xwe serger-dan man û rawestîn, yekî xîzan hat cem Cimcimê Sultan jê re got:

-Ey Cimcimê Sultan! Li şîra-nê (mutfaxê).

Cimcimê Sultan lê vegerî û pîrsî:

-Nan nema?

Li vir delîve (firset) kete mele-kên mirinê, dest avêtin canê Cimcimê Sultan û bi xwe re birin.

Wek ku em dizanîn, gel li hev kombû, sohtin û reşayî ketin nav wa êlê, bi erf û xukêñ (adetêñ) xwe laşê wî birin mezela, kirin bin axê de.

Va çêroka bi va rengî ma û gorâ Cimcimê Sultan hate wenda kirin, hêdî gelên hewes lê ji xwe re kirin çêroka şevan, civata ma-lan û gundiyan pê xweş dikirin. Lê bi rastî wek zanyarêñ ola Ezdî tînin ber çavan, ku ev karî pêk-halî ketiye gotinêñ tawos melek û ji ola Ezdiyan re bûye pêrew ji jîna wan Kurdan re.

Rokê Isa û şagirtêñ xwe ve,

ketine ser rêkekê diherin wela-tekî dî. Bi rê va çavêñ şagirtî li serîkî mezin ketin, ne wek serê mirova ye. Li Isa vegerî û bi destê Isa girt û got:

-Ey Isa! Hele li va serî ha me-zin binêre, ci seyreka ji seyrêñ xwedê ye! Isa û şagirtî çûn ser wî serî, ji xwe re li wî nêrîn, demek dirêj xwe pê mijûl kirin, lê bi demê nehesiyan. Isa li ber xwe-da yê xwe gerî, got:

-Ey xweda yê min! Tu va serî bi ziman bikî, da kanibe bersiva pirsêñ min bide. Xwedê niyaza (meraqâ) Isa anî cî û Isa deng li wa serî kir, de hêdî li vir dibe gotin (qewl):

**Dibê Isa pêximberekî çeye  
Bê bav, Meryem dêye  
Dibê ci subehka hûne (zûye)  
Ser serîkî va hilbûne**

Şamon va sera dît, serî mezi-ne, diran xweya dikin, bang li Isa kir, got:

—Isa, hele were, li vî serî se-ke, ma ev ci reng sere?

Isa hat û xwe pêşve da û lê kir silave. Serî ji keremê va aña ve-dave. Got:

-Ey Isa! Tu halî ser serî min û herdu çave.

Isa we da xebere:

-Tu çawa dizanî ez Isa yê pê-ximberim?

Serî we da xebere:

-Ez dizanim tu Isa yê pêximberî. Tu rojekê li binê vê çolê bibî zahirî.

Isa ji serî pîrsî:

-Tu bi xwedêkî! Tu mîrî an mîyî?

Serî we dibêje:

-Ey Isa yê pêximber! Dema ez bûm ji dê, zanya ez dizanim mîr bûm ne mî.

Isa we dibêjê:

-Xatirê wekî rehmane, tu ji min ra wilo rastiyê bidî, tu kafirî, cihoyî an xweda zanî.

Serî got Isa:

-Ez ney kafirim, ney ciho me û ney diyanîm. Ez xwendekarekî ji binê vê çolê me, ezi giranim.

Isa ji serî pîrsî got:

-Tu bi xwedêkî ilahiye, mele-kê bêrê ye (xeyrê ye), tu yê ji min re hilo bidî rastiyê, te ci mezinahî li ser vê erdê kirîye?

Serî got Isa:

-Ey Isa! Her ku ez diçüm niv-cîrê, min hezar dikir zincîrê, hezar dida seydayê mîrê, hezarî

bi seydê (nêcîrê) bû, hezarî bi qersê zêrîn bû û hezar bi min re ê bengê bû. Dîsa serî got:

-Ey Isa! Ku roj hilat ji hewest, hezar min hebû disekeinî pêşdest, min hezar hebû kefi serdest û hezra min hebû sekînî simbêl pişt guh ve bi dest.

Herroj ku bi xêr roj hate dere, min hezar kursî hebû zêrî zere, min li dîwana xwe dida li sere.

Herroj ku roj dihat di ser rê re, min hezar kursî hebû ji zêre, min li axa û begler li dîwana xwe digihêra.

Ey Isa her roj min ho dikir, min hezar bor ji axtexanê dikêşa dere, zêr zêre li xabî li sere, zêr zêr bû, li xabe pêda xelqekî zor zehf mabûn li wêda, ev der tevda, lê kombûn di malekê de.

Ü got:

-Isa! Min hebû hezar jine, xewlekê nav diçime û bedîla Cimcimê Sultan kes bi kesî re nebû dijmîne.

Serî her got:

-Ey Isa! Min hebû hezar xasiye, xewlekê nav diçime kes bi kesî re nekir dijminahiye.

Ey Isa! Rojhilat ji gel, min hezar kenîşk (keç) hebûn rewim xewlekî nav diçûme bedîla Cimcimê Sultan, kes bi kesî ra nekir xeyde.

Isa ji serî pirsiye:

-Tu bi xwedêkî llahiye, melekê bêriye, tuyê ji min re bêjî rastiye, ev aleliya zor û zehf te kiriye, te ci xêr bi rihê xwe re kiriye?

Serî got:

-Ey Isa! Ku rojhilat ji asas, min hezar tazî dikir bi kiras, min hezar pêxas, min dikire nas, hezar ji zîndana min dikire xelas.

Herroj ku rojhilat, min hezar mitqal zêr, min dikir mêtzinê (taydanê) dida sêflî û sergerdanê, dikir xêre.

Herroj ku min dîwan dibest, hezar mak û xuh dihatine şîrana (şîrangeha) min, ta hévarê çengê (qazika bi çembil) jê nedima.

Herroj ku min dîwan dibest, hezarî bi min re, bi tütûn bûn, hezarî bi qelûn bûn û hezar ji civata Cimcimê Sultan û mehrûm bûn.

Herroj ku min dîwan dibest bi serf, hezarî digot bi dev û hezarî lê dixist bi kêf, hezarî digot bi saz û mixlîr, tembûr axler, deng, dîwana Cimcimê Sultan pê dibû reng.

Isa ji serî pirsiye, got:

-Tu bi xwedêkî llahiye, melekê bêriye, tuyê ji min re bêjî rastiye, ev aleliya zor û zehf, te ev leşkerên xwe bi ci naskiriye?

Serî got:

-Ey Isa! Hezar bi xeftanî sipî bû, hezar bi sûrî misrî bû, hezar bi min ra ê bengê bû, hezarî bi xeftanî sor bû, hezar misriyê mor bû, hezar bi min re i li jor bû, hezarî bi xeftanî zer bû, hezar i dilô! Zer bû, hezar bi min ra i heves bû, hezarî bi xeftanî reş bû, hezar i bi tîr û tîrkeş bû, hezar siwarî hespînî belek bû, hezarî bi hithit bû, hezarî mîrkut bû, hezar siwarî hespî mîyî qut bû, hezarî kose bû, hezarî bi zêrî mirûse bû, hezar bi min re xewle bû, hezarî kehrî lal bû, hezarî gîncî rewâl bû, hezar siwarî hespî nîrîçal bû, hezar bi min re i heval bû, bendî wana hewane, leşkerekî girane, derkete binê vê beriyê qasî estêrkê ezmane.

Min got! Ev ci leşkerê girane?

Rojekê Cimcimê Sultan derkete binê beriyê, serbazek dît, jê pîrskir, got:

-Ev ci serbaze? Got ev serbaza perek ji perên Cimcimê Sultane.

Isa ji serî pirsiye:

-Tu bi xwedêkî llahiye, melekê bêriye, tuyê ji min re bêjî rastiye, ev leşkerên zor û zehf, te bi ci têr kiriye?

Serî got Isa:

-Ey Isa! Ku roj hilat ji Şimbêz, min sîtil dikirin rêz, hemû têr dikirin ji goşte pêz, heçî ji destaweria, heçî ji heskê rijiya, avête dîl bîjiya, çiqas mexloqê binî beriya, ew jê diçêriya.

Isa ji serî pirsiye:

-Tu bi xwedêkî llahiye, melekê bêriye, ji min re bêjî rastiye, xwedê yê ku te diparêze kî ye?

-Min çel li gayî nedikir, xare û dîle rast dikir, herroj wî gayî rêx dikir, min herdu destê xwe dan bere, min li dîwana xwe digere, min dida mîr sere.

Herroj ku rojhilat ji heweste, min pê danî serpê, min dest danî ser dest, min rizqê xwe ji wî gayî dixwest.

Isa ji serî pirsiye:

-Tu bi xwedêkî llahiye, melekê bêriye, ji min re bêjî rastiye, mehnîya te û mirinê çiye?

Serî got:

-Ey Isa! Herroj çûme ravê, ez ketim zû xenîm rihê min bû didu, du melekên mirinê hatin, ti çare

bi rihê min nebû.

Ez ketim rêye, xenîm rihê min bûn sêye, ti çare li rihê min nebûye.

Ez ketim hênce, xenîm rihê min bûn pêncê 'hîngâ rihê min birin', qalib li wê derê mabûn sênce.

Ji perî noranî ji durrê, xêr û hesenet wî van periyan (melaîkan) nikanîn rih bigirtan.

Serî got:

-Ey Isa! Gava ez mirim, laşê min bi avega germ pak dikin, serî min di nav kefenekî cawî wer dikin, serî min nav kefenekî cawî neyîne, zibînî hatin rihê min re digîne.

'Hîngâ zibûnê dojehê hatine ser gotina Cimcimê Sultan':

-Bangîna xwe bike gê ye, bila ga were te azake.

Serî bi xwe re got:

-Ne ez bim û ne ev karê min girî be.

Zibûnê dûjehê bi çepîn Cimcimê Sultan girtin, avêtîne nav êr û alavê, laşê Cimcimê Sultan li wir hêştin.

Rihê Cimcimê Sultan kete nav êgir, rihê wî sed salî di dozexê de ma, hat sohtin.

Ew gayê ku Cimcimê Sultan jêre seriyê xwe xwar dikir û diparist, ev gaya hat kete orta bihişt û dûjehê, serê xwe kir erdê bû bore-bora wî, kir ku heru mezelea li hev xîne, bi rûyê erdê re bi yek ke.

Xwedê ferman da Emîn Cibraîl, got:

-Emînê mino! Here seke va gaya ci dixweze, bi rawestandin bide.

Emîn Cibraîl hat deng li gê kir, got:

-Dewarol Raweste, te xêre, ci daxwaza teye?

Ga lê vejerî û got:

-Emînê xwedêwo! Min ci xêre! Cimcimê Sultan ew mirov bû, ez dewarim, wî ez diparistim, kêfî û xweşî ji min hêvî dikir, min jî ji xwedê hêvî dikir, ez jî emînekî xwedê me, pêwîste ji bo xatirê min Cimcimê Sultan ji dûjehê derxîne û têke bihiştê.

Cibraîl çu dîwana xwedê, got:

-Ey xweda! Ga bi min re got. Xwedê ferman da melek Cibraîl, gotê:

-Here Cimcimê Sultan ji dûjehê derxe û bavê bihiştê.

Melek Cibraîl hat li ber deriyê dûjehê rawesta, bang kir, got:

-Cimcimê Sultan!

Heştê hezarî bi hev ra gotin: -Ha!

Emîn Cibraîl li xwe sergerdan ma, nema zanî, kî Cimcimê gapereste.

Cibraîl vejerî cem xwedê, xwedê jê re got:

-Ey Emînê mino! Tuyê herî wi-lo bangê lê bikî; ey Cimcimê gaperest! Ewê bêje; ha! Hîngâ tuyê wî ji dûjehê derxînî, bi aveka kewdel û hewdel û bibî berdî nav bihiştê.

Emîn Cibraîl hat li ber deriyê dûjehê rawestî û bangkir, got:

-Ey Cimcimê gaperest!

Cimcim bersiv da:

-Ha!

Cibraîl got:

-Were! Xwedê tu rizgar kiriye, ez te bîbim bihiştê.

Cimcim bi Cibraîl re got:

-Ey Emîn! Min birakî xwe i axretê girtiye, birayê min, min bernade.

Emîn Cibraîl vejerî dîwana xwedê, got:

-Ji te va aşkereye ezbenî, Cimcimê Sultan ci bersiv da.

Xwedê gote Emîn Cibraîl:

-Here Cimcimê Sultan û bîrâyîd wî yên axretê hemîya derîne.

Emîn Cibraîl hat û bi Cimcimê Sultan re got:

-Xwedê tu û birayê te yêñ axretê hemî ji dûjehê rizgar kirin.

Cimcimê Sultan bi destê birayê xwe girt, wî bi destê birayê xwe yê din girt, wek zincîrekê gelê dûjehê gişt ji dûjehê derket.

Emîn Cibraîl bi lez zivirî çû xwe li ber kursiya erşê serî danî, got:

-Ey xwedê! Gelê dûjehê gişt derket, tev bi hevre bûne birayê hev en axretê.

Xwedê bi Cibraîl re got:

-Rinde! Xweda jî hevalê yekbûnê ye! Ma ji yekîtiyê tiştek dî rindtir heye, Emînê min!

Ez dixwazim tu herî, gişa ji dûjehê rizgar bikî, li wir tenê sê keisan bihêli, gunehêwan netê bexşandin:

Heryekê ku bavê xwe bikujî.

Heryekê ku jina birayê xwe bîbît.

Heryekê ku dînê xwedê berde, bi dînekê dî bigirtî.

Ev hersê karan gunehê van ci caran netê bexşîn."

*Rehme li dê û bavê guhdara  
Mezela em têde xwedê avake*

## Cimcima Sultan<sup>(1)</sup>

Eugen Prim û Albert Socin-1887

Rojekî bi rojêda,  
Sîmon û Isa çûn bi rîvada,  
Keloxeya(2) dîd(3) bi rîda,  
Sîmonî pehna xwewa lîda.

Isa rabî bi wê gavê,  
Li keloxey kir silavê.

Go ya Isa tu çitkî(4) li vê navê?

Go ya keloxî li rîye,  
Tu bi vî kî yê xwedêye?  
Roja tu bû ji dêye  
Tuyî mîr bû anê mîye?  
Ya keloxê li erdana  
Tu bi wî kî ê rehmana?  
Bêje min tu Ciho bû(5) anê musulmane?

Ney filleh bûm ney gorana,  
Kafîrî mirted(6) bûm,  
Gayekî çarçav hebû,  
Ew diheband(7) imana.

Go ya keloxê li erdana  
Tu bi wî kî ê rehmana?  
Bêje min tu dewlemend bû anê xizana?

Go ya Isa bi wî dikim ê rehmana  
Xalîqê erdan û esmana  
Elhemdilla ezî dewlemend bûm, ne ji xelqê xizana.

Go ya keloxê li erdana  
Tu bi wî kî ê sebûra(8)  
Bîrê xweva bîne bihora(9)  
Tuyî dewlemend bû,  
Bêje min! Tu şahî bû anê ji xelqê bexîla(10)?

Go ya Isa bi wûyî dikim ê sebûra  
Bîrê min têne bibîra  
Elhemdilla ez şahî bûm new ji xelqê bexîla.

Go ya keloxê li erdana  
Tu bi wûy kî ê rehmana  
Bêje min tu maqûl(11) bû anê ji xelqê xulama?

Go ya Isa bi wî dikim ê rehmana  
Bi xalîqê li erdan û esmana,  
Ez bûm Cimcimê Sultana,  
Herro heftê berx wî çûne şîlana(12),  
Herro heftîh min dikirin ji gana(13),  
Hefsed min diberdan ji qeyd û zîndana,

Hefsed min libas kirin(14) bi van destana  
Hefsed min dikirin ji gana,  
Hey denîk! Hey dînyayê!  
Bêbextê kes tê nemayê!  
Axir bûm keloxek, ketim li ser dînyayê,  
Ya Isa bi vî dikim ya rehmana  
Bi xalîqê li erdan û esmana  
Ez bûm Cimcimê Sultana  
Hercar qurnatê(15) dînyayê, li nig bîn(16) girta dîwana,  
Min hukmatê dikir heta li binê behrana(17),  
Keseg (18) nebû bêy îzna dilê min li ser êg hilînid ezmana.

Ya Isa bi vî dikim ê rehmana,  
Bi xalîqê li erdan û esmana  
Ez bûm Cimcimê Sultana.  
Min hebûn hefsed jînî digoriya,  
Min hebûn hefsed jînî di şafiyya(19)  
Min hebûn hefsed jînî henefiya(20)  
Wekî ez diçûm menzilê, elhemdilla digel min dilekî keyfiya.

Ya Isa bi vî dikim ê rehmana,  
Bi xalîqê li erdan û esmana,  
Ez bûm Cimcimê Sultana.  
Min hebûn hefsed kurê asmîna(21)  
Her êg li piştê kemberê zêrîna  
Ew ew bûn bike ser û dêwa bîhatîn ker, bîhatîn siwar bû.  
Biyan li hesp û zîna.  
Hey denîkî dînyayê!  
Bê bextê, kes tê nemayê!  
Ji hinda zêr û mala dînyayê,  
Tijd(22) bo kesî û kes tê nemayê(23)!  
Axir bûm keloxeyek hatim li ser dînyayê.  
Ya Isa... ûhd... hd...  
Min hebûn hefsed sêd û sîna(24)  
Min hebûn hefsed sêdî zara,  
Her êg zencorekî zerî dabû li sere  
Wekî em diçûne birêvêda,  
Min dida li destê wezîr û paşa, hakim û beglera.  
Ya Isa... ûhd... hd.  
Min hukmat hercar qurnatê dînyayê, min girta dîwana  
Keseg bêy îzna dilê min li ser êg zîmâna,  
Ya Isa... ûhd... hd.

Hefsed paşa min hebûn,  
Hefsed begler min hebûn,  
Hefsed wezîr min hebûn,  
Hefsed siwar min hebûn, siwarê diqemara(25),  
Hefsed siwar min hebûn, siwarê disimboza(26),  
Hefsed siwar min hebûn, xwari di suxra(27),  
Hefsed siwar min hebûn, xwari di reşa.  
Min hefsed xulam hebûn ji bo dara kişandinê,  
Hefsed xulam min hebûn ji bo avê ïnandinê,  
Hefsed xulam min hebûn ji bo agira û kirinê,  
Hefsed xulam min hebûn ji bo nanî pextinê(28),  
Hefsed xulam min hebûn ji bo medbexê(29) û gerandinê,  
Hefsed xulam min hebûn ji bo sufra(30) û hilgirtinê  
Hefsed xulam min hebûn ji bo avê û gerandinê,  
Hefsed xulam min hebûn ji bo qehwê û kelandinê,  
Hefsed xulam min hebûn ji bo fincanê û gerandinê,  
Hefsed xulam min hebûn ji bo qalûna û dagirtinê,  
Hefsed xulam min hebûn ji bo pala û ïnandinê,  
Hefsed xulam min hebûn ji bo celawê girtinê,  
Hefsed xulam min hebûn ji bo rikêba û girtinê,  
Hefsed xulam min hebûn ji bo zîna û lêkirinê,  
Hefsed xulam min hebûn ji bo rabûn û rûniştinê.

Hey dinyikê(31)! Hey dinyayê!  
 Bébextê qed(32) kes tê nemayê,  
 Ji hinda zér û malê dinyayê,  
 Tijd(33) bo kesê û kes nemayê!  
 Axir ez bûm keloxeyek ketim li ser dinyayê,  
 Çi rojekî bi rojêda,  
 Em rabûne çûne birêvêda,  
 Heta nîvro em mane birêva.  
 Li wî heta hîşka pertava.  
 Rawesta roja êka,  
 Lê hîşg(34) bû dest û pêka,  
 Rawesta roja duwa,  
 Lê hîşg bûn dest û pêya.  
 Rawesta roja çara,  
 Xelkê bajêrî bû galegalâ,  
 Dibêjin îcar paşayê me bê hale.  
 Rawesta roja pêncâ,  
 Bi laşê wî girte rînca(35),  
 Rawesta roja şesa,  
 Li bajêrî bû gûja(36),  
 Xelkê dibajêrî dibezin, îcar paşayê me nexweše.  
 Rawesta roja hefta,  
 Qarapênik bi bajêr kefta(37),  
 Xelkê dibajêrî dibezin, îcar paşayê me wê kefte.  
 Rawesta roja heştane,  
 Hatin ser min du milyakatê girane,  
 Pê wan li erdê serê wan li ber esmane,  
 Gurzê wan li erdê bi qasê çiyane,  
 Wî da li ber gurzane,  
 Ne qalib(38) hêla, ne gane(39),  
 Ruha wî hilkêşa ji bin neynûkê piyane,  
 Xelkê dibajêrî çûn sûkê bo wî kirrîn heftîh gaz kitane.  
 Wî birî li qebrane(40),  
 Kirî li bin erdane,  
 Ew vegestan hatin bê miltane(41),  
 Hatin ser wî du milyakatê(42) girane,  
 Wî da li ber gurzane,  
 Ne qalib hêla, ne gane,  
 Wî kirî mor(43) û morane.  
 Existî li bin heft tebaqê erdane,  
 Go ya Isa heftîh sala bo wî ezabî werbûm(44),  
 Ya Isa bo wî... ühd... hd.

Paşî(45) heftîh sala bo wî ezabî werbûm,  
 Paşê herdu milyakatê di qehhara(46)  
 Berê xwe da bi mala,  
 Got, ezaba me hunda wêja dora hewa her çar dîwara,  
 Go ya Isa... ühd... hd.  
 Herçar dîwara givaştin,  
 Ne qalib hêla, ne gana,  
 Ne heştî hêla, ne xwana,  
 Wî kirî mor û morana,  
 Existî bin heft(47) tebaqê erdane,  
 Ya Isa heftîh sala bi wî ezabî werbûm,  
 Ji nû be ïzna şahê cebbare(48),  
 Baran ji banî hate xware,  
 Rabûn com(49) û cobare,  
 Lehiya li ber xwe dana,  
 Ez avêtîm binê behrana,  
 Ya Isa sê sala li binê behra bû,  
 Goştê laşê wî xwarin(50) masiya bû,  
 Ya Isa paşê sê sala avê ez avêtîm giwandana(51).  
 Hecî rahê mayî, ew jig(52) teyr û tewâlî(53) xwara,  
 Hestiyê wî hîşg bûn, bûne weke dara,  
 Xelkê dibajêrî tînan heştê wî dihêrana,

Tevlî axê dikir, dikir avsarbekana(54),  
 Hec kesê bi ava wî sarbekê(55) vedixwara,  
 Digot babo ava va sarbeka qewî(56) sare?!  
 Ya Isa bi wî... ühd... hd.  
 Sê sala hestê min sarbûg(57) bûn,  
 Paşê sarbig şikestin,  
 Hostekar hatin li binê dîwara vebestin(58),  
 Heftîh sala hestê min li dîwara bûn,  
 Ji nû bi ïzna şahê cebbare dîwar heraftin(59),  
 Laşê min cama bûn(60).  
 Hey dinyekê! Hey dinyayê!  
 Bébextê qed kes tê nemayê!  
 Ji hindî zér û malê dinyayê,  
 Carag(61) dî bi qudra ta xwedê keloxê min seg bû,  
 Ketî li ser dinyayê.

Got, ya keloxê li erdana,  
 Tu bowî kî ê rehmana,  
 Tu bîrê xwe bîne bibîrana(62),  
 Te cehennem dîd(63) piçavane(64),  
 Bêje min wesjeta(65) cehennemê çawane,

Go ya Isa bi wî dikim yê rehmana,  
 Bi xaliqê li erdan û esmana,  
 Ez zanim wesjeta cehennemê çawane,  
 Hindî ava behra bûbit hubir(66),  
 Hindî bilcîmlê(67) darana bûbin tabaq û kaxez,  
 Ez bêjim tu binivîsî qed nîv sêka cehennemî nayête wesayed dana.

Ya Isa bo wî dikim yê sebûra,  
 Dûpişk û mara bi xelkê gunehkara mijûla,  
 Paşê rehma li dey babê diguhdara.

#### Têbîni:

- 1- Hestiyê seriyê Sultan, 2- Hestiyê Serî, Kelox, 3- Dît, 4- Çi dikî, 5- Cuhu, Yahudi, Musayı, 6- Yê ji olê xwe vegekiye, 7- Hesdikir, 8- Aram, Hedar, Sabir, 9- Derbasbûyî, 10- Xesîs, Cimrî, Destgîrî, 11- Xwedîkar û dewlemed, 12- Çere, Cihê giya, Merg, 13- Ên bi can, 14- Bicil kirin, 15- Felek, 16- Licem bûn, 17- Derya, Behr, 18- Kesek, Yek kes, 19- Rêyekî İslâmî-Şafîî, 20- Rêyekî İslâmî-Heneffî, 21- Esîl, Xwedî binyad, 22- Tiş, 23- Nemaye, 24- Çol, Sehra, Berî, 25- Hespê qemer, 26- Hespê simboz, 27- Bicihanîna qewîtiyan, 28- Pehtin, Pijandin, 29- Mutfak, Cihê xwarin çekirinê, 30- Sêni, Sofra, 31- Dinyayê, 32- Qet, 33- Tiş, 34- Hişk, 35- Gemarî, Qirêjî, 36- Qîrnû-qîr, Qelebalix, 37- Ket, Lêket, 38- Cism, Laş, 39- Giyan, Rih, Can, 40- Tirb, Gor, Çal, 41- Mîntan, Şapik, 42- Melayket, Perî, 43- Rengê mor, 44- Tê werbûn, 45- Paşê, Piştre, 46- Serkevî, 47- Heft tebeqên erdê, 48- Zordar, 49- Co, Ark, 50- Xwarina, 51- Berav, Pilaj, Kevişen, 52- Ew jî, 53- Teyr, 54- Cer, Saring, 55- Şerbik, 56- Xurt, Pir, 57- Şerba avê, 58- Avakirin, Bingeh danîn, 59- Hilweşandîn, Xirabkirin, 60- Komkirin, Civandin, 61- Carekê, 62- Bîranîn, 63- Dît, 64- Bi çavan e, 65- Wasiyet, 66- Avreşk, Hibîr, Mürekkep, 67- Tev, Giş.

# Çanda netewî, bingehek ji bingehêن rizgariya netewayî ye

Hemû nirxên diravî û giyanî, ku civakek, an gelek, an çinek an jî komek di dîrokê de jî xwe re anîye serhev, bi çand (kültür) dihêñimandin. Çand bingehêk ji wan bigehêñ pêwiste, ku netewek dîkin netew. Çand, ku li ser bingehêñ diravî yên jiyanê xwe bilind dike, rastiya ku di dîrokê de jiyanbûye dihêne zimêñ. Anglo tundebûna rastiya jiyanê ya dîrokî ye. Lewma çand, agahiya pêşveçûna dinamikêñ zîkmakî ye û van rastiyan dihilimîne jiyanê. Herweha rewşa civakekê, an gelekê, an çin an jî komeka mirovan li pêşîya serdemiyê datîne holê. Naverok û kapasîta çandê wusa xwe berçav dike.

Niha ji me re giringiyeke pir mezine ku em ji hêla çandî ve Kurdistan bînin pêşîya çavêñ xwe û sernêriyeke di vê warê de ji xwe re bikin karûbarê pêwist.

Li Kurdistanê, ji bo afirandina civakeka serdemî şerekî dijwar dihê bilindkirin. Xebat ji bo afirandina nirxên dirawî û giyanî dihê kirin. Li ser vê bingehê, ji bo pêşvebirina çanda gelê Kurd, gelek pirs û giftegrift li ber me hene, ku giringe em bîlez destêñ xwe bavêjin wan; bersiva wan bidin û wan biverisînin.

Kêliya em gotinêñ jor bînin ber çavêñ xwe, çiye rastiya ku li Kurdistanê jiyan dike? Kîjan nirx û dewlemendiyêñ diravî û giyanî di destêñ me de hene? Ger em bersiva van pirsan bidin, hingê em wê karibin kêş û pirsgirekan jî ronahî bikin. Nexwe, di domana dîrokê de çiye ew rastiya ku bûye serdestê Kurdistanê? Bersiva vê pirsê ji, li ber ronahiya materyalîzma dîrokî û bi xetêñ xwe yên bingehî, ji hêla pêşen-gîn gelê me, di dîroka Kurdistanê de bi şêweyeka şot hatiye

dayin.

Niha em dixwazin hinde tiştîn ku bi gelempêrî dihêñ zanîn, bi şêweyeka kin dîsa berziman bikin. Ji sala 550'an heyâ niha rastiya Kurdistanê hertim bûye doliwgerî, vegirtin, û talan; kin bê gotin rastiya Kurdistanê rastiya şer û cengê ye. Ev rastî ji, di hêmbêza xwe de 2 rastiyeñ ji hev cuda hildigire. Rastiya pêşemîn: Dijmin bi rengê doliwgerî û vegirtinê şerek palandiye ser Kurdistanê. Di vî şerî de serhîdannêñ gelê Kurd hatine şikandin. Doliwgeriya biyanî xwe damezi-randiye. Li gora vê rewşê jî rastiye derketiye holê ku navê wê, **îxanet û hevxebatkarî** ye. Afi-randkarêñ vê rastiye, dijminê zeftkar û mêtînger e û digel dijmin, çinêñ serdest yên Kurdîne. Rastiya duwemîn: Li dijî rastiya yekemîn şerek hatiye ajotin. Di vî şerî de jî rastiya bi navê, **rapirîn**

û berxwedanê derketiye holê. Rapirîn û berxwedan rastiye wusa ye, ku ji 2548'an vir de, tucaran li Kurdistanê venemirîye. Bi avahî pir rind derdikeye pêşîya çavan, ku teviya nirxên diravî û giyanî li Kurdistanê ci ne.

Ji hêlekê avahîyek li Kurdistanê derketiye holê, ku ji bo gelê Kurd biyane û biyankirina gelê Kurd ji xwe re bingeh digire. Ji nêzîk an dur, tu pêvendiyêñ vê avahîyê bi Kurdistanê re nîne. Ji aboriyê heyâ konevaniyê û çandî, kesen bêbext û xayîn yên nola Şêx İdrîsi Bêtfîsi, Ziya Gökalp, M. Emîn Sekban, M. Şerif Fîrat, Kamran Înan, Süleyman Nazîf, Hîkmet Çelîn ühw. nûneriya vê avahîyê kirine û dîkin. Ev avahîya ku van sîxuran damezi-randiye, hebûna me dike xeterê. Roj bi roj, kêlî bi kêlî hebûna me ya netewayî û civakî dikirînê. Rûxandin û hilwesandina vê avahîya binî li Kurdistanê, karekî pêwist e ji bo me.

Avahîya berxwedanê, ku di dîrokê de lehengêñ netewayî yên mîna Kawayê Hêsingî, Şêrguh, Dîsem û Rûstemê Zal nûneriya wê kirine, hogiriya gelê Kurd, welatparêzî û merdiya netewî dihêne zimêñ. Kin bê gotin, di rastiya dîrokî de ku Kurdistan heyâ niha jiyyate, ev encam derdikeye holê: Avahîya bêbext û bişerrîn hertim êrîşî Kurdistanê kiriye û nûneriya dijmin kiriye; avahîya berxwedanê jî ku bingehêke hebûna me ye, nûneriya şêweya giyanî ya gelê Kurd kiriye û hoyêñ bi vê nolê bi xwe re anîye.

Di vir de, giringe em bala xwe rind bidin çend xelean. Weke dihê zanîn di êrdîma Rojhîlata-Navîn de heyâ niha gelek gel di dîrokê de hundabûne. Lî gelê Kurd heyâ niha jî hebûna xwe parastiye, di vir de rastî em deyn-darê berxwedana xwe ya dîrokîne. Ev berxwedan di dîrokê de biserneketiye, lê ji bo Têkoşîna Rizgariya Netewayî Kurdistan re, risteka herî bingehîn leyistiye. Ji ber sedemîn ku ji bo me giştan nasin, berxwdana me serfi-



raz nebûye, serxwebûn û azadi-ya gelê Kurdistanê pêknehatiye. Lê heke em gişt vê berxwedana xwe niha rind nasnekin, wê ev berxwedan dakeve derveyî ar-mancêñ xwe, ji ber ku dolig-eriya biyanî û avahiya vê doli-ge-riyê ranaze, hertim dest bi kar û xebate. Gelên cihanê yên din, li diji kevnarî û doliwgeriya biyanî yekîtiyen xwe çêkirin, rêkxi-nêñ xwe çêkirin, ramyarî û kone-vaniyêñ xwe afirandin û bi vî awahî xwe gihandin rizgariya netewayî û civakî. Lê me Kurdan, heyâ niha me nekariye bi vê nolê xweş bikevin ser vê riya serbilin-diye. Li dijî hêzên biyanî gelê me serê xwe hildaye, li dijî xwerustê xwe ragirtiye û ger êrdimî ji be gelê me carnâñ xwe nêzîkî riz-gariyê ji kiriye, lê ji ber sedemêñ babetî dîsa hatiye şikandin. Bişî şaristaniya Mediya, berxwedana gelê me tim sist û bi kêmâsi maye. Lê dîsa ji ev berxwedan gelê me parastiye, hîştiye ku Kurdî ser piyêñ xwe rabin. Heke em vê berxwedanê niha baş bigihînin pîvekîn serdemî, pir roniye ku gelê me wê biserkeve û ew rizgariya ku hêviya dilê me ye wê pêkbêtin. Ji ber ku ev berxwedana gelê Kurd ya dîrokî, cewhereka zikmakî û giyanî ya gelek bi nirx û bûha ye.

Berxwedaneka wusa teng, ku hebûna gelê me bi vî an bi wî rengî domandiye, niha di vê koç-bera mirovahî de, ê din nikare bê domandin. Giringe bi şêweyêñ nûjen bê domandin. Ji ber ku tenha parastina hebûna me, ê din di vê sedsalê de nikare jiyan bimîne. Rêç û azînêñ rizgariyê

yên nûh giringe bêñ peyda ki-rin.

Ev ji bo gelê Kurd, xalek û koçbereka dîrokî ye. Ma gelo taybetiyêñ vê gihanekê yên cu-da ci ne? Di rewşekê de ku tune-bûna netewayî û hebûna nete-wayî li kéléka hevûdu dijin de, pêwiste ku bingehêñ ji nuhve jînbûnê, bi giyana berxwedanê, bi ramyariya sedsala me ya şo-reşvan û konevaniyeka rizgarî-mend, bi dîlerî û zanañî û bi rexne kirina civakê, bêñ avetiñ. Bersiva pîsê wusa ronahî ye. Ger li ser vê bingehê mirov destê xwe bavêje dîrokê, û bi canekî şoresh-ger û zanîşî xwe bilivîne, hingê wê bibîne ku dîroka jîn û zînde-bûna gelê Kurd ji birê ketiye. Niha jiyana ku armanca me ye, ew jiyane, ku jiyanek bê damezi-randin, ku tevayî gelê Kurd xis-tibe bin siha xwe. Ev rastiyeka berxwedanî ye, ku bi lez xwe digihîne serdema me.

Jiyanbûyin û serxwerabûna gelan an çinan, bi berxwedana hîzr û karvaniyê, bi lerzîna ji kur dibe. Kesêñ domana nuh, di warêñ ramyarî, konevanî, aborî û çandî de, wusa dihîn afirandin. Weke em dizanîn, Quran ji bo Ereban ne tenha filozofî ye, her-weha berhermeke wêje û toreyî ye ji. Ji ber vê yekê ji binyada zimanê Erebi ye. Wêjeya Fransiyân, nîvîsevaniya Sowyetî ji bi vî awahî derketine holê. Tewrat û Încîl ji berhemên dîrokî yên berî niha û 20-25 babelîskan in. Her-weha şaristaniya Mezopotamîya, Misr û Grekan ya ji bo şaristaniya domana dîlîtiyê, û berhemên derketin, naşî me ne.

Ji ber vê yekê em dibêjin, ku berxwedana nuh ya li Kurdistanê, reya hatina me ronahî dike, ji roja destpêkê heyâ niha di kar-vaniyê de pêkdihê û berhemên ramyarî û konevanî ji me re diafi-rîne. Anglo ji bo dîroka me ya ji nuhve jînbûnê, ev berxwedan, berhemê pêşemîn yên nîvîşî û nenivîşî ye. Ji ber ku her mirovî li Kurdistanê, kêm an zêde, di bin posideyên vê berxwedanê de dije, û hertiş li gora vê yekê xwe pêşve dibe.

Ji hêla din ji dijimin ketiye nav tirs û xofê. Baweriya wî bûye ew, ku wê her tiştîn xwe hunda bike. Lewma ji mîna çavşoran êrif dike. Nûnerên xwe yên har û dirinde derdixe. Dixwaze jiyan tev, weke daxwazên mîtingerî-ya faşîst bidamezirîne. Şoreşa me ji, di bin hoyen şer ên giran de, û bişî hemû şâşî û kêmâsiyan, bingehê şoreshger ji xwe re dike armancêñ jiyanê. Li gora rewşê, bîr û hîzrên mezîn diafirîne. Çalakî û livbaziyêñ rizgariyê bi-kardihîne. Mirovînuh za dike. Herçuqasî heyâ niha di warân wêne, xanemanî û endiziyarî ûhw. de hîn berhem û vekêşan derneketibin ji, bingeha çanda me bi vê rastiya nûh hatiye avetiñ. Ji xwe, heyâ ev tiştîn bingehîn bidestê me ve nekevin, ne derfete ku ew tiştîn em daxwaz din, bi destê xwe ve bînîn.

Mîtingerîn hov, heyâ niha qirkirîn sor û sipî digel hev bikaranîn. Xwestin netewatiya me tunebîkin. Ji bona em xwe ji encameka wusa rizgar bikin, giringe em di hîzr û karvaniyâ xwe de, em xwe bigihînin jiyaneka rast. Daku em di karvaniyê de berjewendêñ xwe biparêzin, jiyanâ xwe ya netewî berdewam bikin û bigihin armancêñ xwe, divê pêşemîn di mîjîyê xwe de em şoreshkerî bikin, û xwe serbi-xwe bikin. Kin bê gotin, şuna çanda qîşlê ya mîtingeran, divê em çanda netewayî ya gelê xwe pêşve bîbin. Ev ji problema xwe naskirinê û Kurdbûnê ye. Yanî divê em xwe bikin Kurd û vê navê li xwe kin. Herweha ev Kurdbûn ji, pêwiste bi rengê şoreshgerî û netewayî be.


Di welatekî mîna Kurdistanê de, ku hertiş biyanî xwe ketiye, şerî ji bo serxwebûnê, azadiyê, demokrasîyê, serdemîyê û ava-kirina civakeka sosyalist, giringe

di hemû war û hêlîn jiyanê de bê ajotin. Ger ev xwe biqilibîne rastiyekê, hingê ev şer ji wê xwe bigihîne serfirâziyê. Em dikarin bêjin, ku bingeh û rîknê civakeka serbixwe, afirandina kesbûn û şexsiyeteka serbixwe ye. Ev ji ji bo me, pirseka çandî ye û pîrsa afirandina reya pêşengî ye. Ne-xasim çuqas kesen wusa zede bîbin, hevqas ji em wê xwe nê-zîkî serxwebûnê bikin.

Nexwe, tiştî ku em ji xwe re bingeh bigirin ev in: Divê di bîr û baweriyê de serbixwe bin, di karvaniyê de xwedî însiyatîf bin, welatparêz û perwer bin, merd û dîler bin, hogir û canxweş bin, gelê xwe nas bikin, bi gelê xwe em xwe şev û roj mijûl bikin, pîsîn gelê xwe çareser bikin, rastiya welatê xwe nas bikin, serdemê biverisîn, xwediyê bîr û baweriyê pêşveçuyî û şoresh-ger bin û van giştan li ser gelê xwe ava bikin.

Piştî ku mirov çand şîrove bike pêde, giringe em bersiva pîsîn nola; "çiye kesaniya bi çand, çiye xebata çand?" bidin. Keseñî ku gelek xwendibe, ke-sekî ku çend diplom sitandibe, keseñî ku çend zimanîn rînd bi-zanibe an ji keseñî ku xwe gelek "sosyal" kiribe, nayê wê manê ku ew keseñî bi çand û kultûre. Heke mirov rastiyê li welat û navnetewan baş bizanibe, van rastiyen di mîjîyê xwe de bije, li gora van rastiyen xwe bitevgî-rîne, jiyanâ xwe ya civakî li ber siha van rastiyen avabike, karvaniyâ xwe li ser vê reyê pêşve bîbe û rastiyen bi gel bidezanîn û tegihîstîn, hingê mirov xwedî çand e. Ji bo mîltanîn cengê ji ev rastî bi vê nolê ye. Mîltanîn şer, giringe xwe di nav gel de bihînîn, lê taybetiyê xwe ji hunda nekin. Ev tişt ji bo rewşenbîran ji wusa ye. Heya ku rewşenbîr, mîna me li jor goşî, xwe di nav gel de nehînîn û nebin birekî gelê xwe, nikarin xwe bi rengê rewşenbîrekî bidin naskirin.

Têgihiştina çandê, ji nişti-manparêzî yê derbas dibe. Rewşenbîr, divê merd be, mîrxas û hogir be, ji bîlindahiyê li keseñî meyeze neke; hingê pisboriya wî ji pîroz û bûha ye. Ji ber ku rewşenbîrek wusa, sembolîn netewayî yên mîna zimanê Kurdfî, govenda Kurdfî, müzîka Kurdfî,





çirokên Kurdî, lawjen û axînê Kurdî, gotin û metelokên Kurdî, destanên Kurdî, cil û temtilên Kurdî,ango hemû hebûn û dewlemendiyêner serpêhatinê, bi şeveyeka şoreşgerî fahmdike. Bi vî avahî van hebûnî pîroz dinase û dixwaze van pêşve bibe. Dixwaze giştan bike taybetiyê civakeka hemdemî û serdemî. Giringe tu bûhatî nede hêl û kélékên nebaş. Lê ji ber ku hinde tişt di civakê de nebaş in ne hewcye ku bi serhişki êrşan jî bike, en wan piçûk bibîne, an jî nevalek di nav xwe û gelê xwe de avabike. Ji ber ku divê rastiya welatê xwe gelek baş fahmbike û pîrsê nola pirseka şoreş bixe destê xwe. Divê bizanibe, ku heya civak azad nebe û neyê guhartîn, heya demokrasî neyê damezirandin û çinê bindest ji bo berjwendêne xwe birêve nekevin, ew tiştê nebaş jî bi hesanî nikarin bêne rakirin.

Tiştê din jî heye. Em gişt dizanîn, ger Kurdistan rizgar bibe û pîrsa netewayî biverise jî, şerê di nav çin û birêne civakê de dawî nabin. Şerê çin û biran wê bidome. Di domana vî şerî de, pîrs wê jî ra bêne çareserkirin. Ev jî divêtiyeke xwerustiyê ye û divê em jîbîr nekin. Lewma divê em bizanibin pîrs niha ne ev e: Pîrs pîrsa şerê li dijî mêtîngiriyê ye û ji bo rizgariya netewayî ye. Heke şerekî li dijî mêtîngiriyê û çinê serdest bê bilindkirin, hingê çin û birêne civaka me yên bindest jî,

bi dînamîkên xwe yên hundurî wê pêşve herin. Nexwe karguzariya me ev e: Şerekî bi erk û raman li dijî dijminên welatê me!

Di vî şerî de, rewşenbîr an kesen pêşeng tevayî taybetiyê civakê di kesbûna xwe de komdikin. Di kesbûna xwe de nûneviya hatinê dikin. Berpirsiyârên civakeka îdeal in. Û li her deverê merkezaka komkirin û kişan-dinê ne.

Naveroka vê şirovekîrinê ji bo gelê Kurd çiye? Bi kîmasî rastiya niha bi şeweya eniyekê û xeta têkoşîna rizgariya netewayî bi gel bê nasdan. Li dora vê saziyê yekîtiyek bê çêkirin. Piçûk an mezin, her kar û xebat bê kirin. Anglo bi aktîfî şer bê kirin, ji bona ku di jiyanê de hatin û hebûn bêne afirandin. Ev kar dikare hertiş be: Weke karê ramyarî, konevanî, artêşî, aborî û çandî...

Ger ev rast bêne kirin, dîroka gelê me di karvaniyê de wê pêkbêtin. Daku gelê me yê bindest û zehmetkêş bê rizgarkirin, divê pêşemîn kesen pêşeng tarîyan bicirînin û li ser reya ronak xwe bidin pêş. Lişuna berjwendêne kesanî, malbaşî, eşîrî û êr-dimî, berjwendêne netewayî bêndanîn. Hêrs û gira li dijî mêtîngiran xwe biqilibêne tolehdîdana li dijî dijminan. Welatperwerî bibe karvaniyeka zanistî. Xebata yekîtiya netewî bibe ala pêşve-çûnê. Heya zarok jî li ser vê

bingehê û bi lez, giringe bêne fêr û perwende kirin. Ji ber ku afirandina mirovîn nuh, ku bi daxwaza rizgariya netewayî hatine his-tirandin, gavekî herî dîrokî û pêwiste. Lewma zarokên me divê bibin ew kes, ku doza me berde-wam dikin û bibin pêşmergên hogir yên doza netewayî.

Kin bê gotin, ew girêdana bo dehl û dewiyan, ew evîna bo namusa şexsî, ew mîrxiya kesanî, ew merdiya kesanî, ew dîldariya bo rez û werzan, ew daxwaza parastina dot û jinan, ew dijminahiya bêbingeh di nav mirovîn me de, giringe tev berêne xwe bidin dijminen me yên netewayî û çinî. Gişt bixin şer, bikin bingehêne têkoşîna rizgariya netewayî.

Bi dîtin û sernîrîneka rexnekarî ya dîrokî, naskirina nirxîn Kurdistanê yên berê, komkirina wan, verîstina wan, bikaranîna wan, pêşverbîna wan û afirandina kes û şexsîyeten nola me gotî, afirandina jiyaneka pîroz û rîkxistinkirina vê jiyanê di warêne diravî û giyanî de, çarciva xebatê çandî ye. Ji ber vê yekî, biserketin û pêkanîma van tiştan, pirsekî rîkxistinîye ye. Lê ne hema damezrandina saziyêne bo xebata çandîtenê. Ji ber ku xebatê çand û hunerê, birekî ji xebatê soreşgerîne. Pîrsen li pêşîya me, divê nola pîrsen şoreş bêne fahmkirin. Ji bona vê xebata rîkxistinî, xebata pêşrevanî, xebata perwendekirina xwe, heva-

lan û gel dive. Dîsa herkesek ji me, divê xwe, malbata xwe, jîna xwe, mîrê xwe, zarokên xwe, dora xwe, çîranê xwe, gundi-yê xwe, hevalê xwe, taxa xwe, bajare û navça xwe ji bo jiyaneka nuh amade bike. Heke em vê berpirsiyariyê bicih bînî û nirxîn di vê warê de kombikin serhev, binîn serhev û pêşve bibin, hingê em wê karibin bêjin em rewşenbîrê welatê xwe, pêşrevanê gelê xwe ne. Ji ber ku, weke me gotî, xebatê çand û hunerê, xebatê pîrsa rîkxistinê ne. Lê ev xebatê çandî giringe bi pîsborî û sazî pêşve herin. Ji ber ku pîrs pîrsa avakirina eniya gel û xurtkirina eniya şoressê ye.

Saziyeka çandî, an rewşbîr û pîsboran, ku li ser bingehêka vê nolê hatibe damezirandin, daxwaza xebatê me ye. Çuqas şerê rizgariya netewayî pêşve here, hevqas jî divê ev xebat bi lez pêşve herin. Bigihine formasyoneka wusa, ku doz û matfîn xwe nasdikin.

Niha ger em li derveyî welat jî bin, me dest bi xebateka wusa kiriye. Lê em mirovîn Kurdistanê, giringe em ci bikin daku em bi xêr û ber bin. Divê em tiştê jîbîr nekin: Di xebata afirandana çanda netewayî ya serdemî de, karin û derfetên me ne bes in. Serhişkiya di vê warê de, tiştê gelek negatîf e. Ji ber ku vatiniya me, afirandina mirovîn nuh e. Di navenda xebatê me de, ev bila cihê xwe bigire.

Mêtînger, ji bo tunekirina me û civata me, mirov û civata me kirine hacetêne sînema, müzik, çirok, roman, hozan û govendêne xwe. Weke ev gişt ên wan bin, ji me didizin û difiroşin me. Lê em wê çawa debar bikin û vê yekî bipejîrinin. Vaye hevqas berxwedana gelê Kurdistan, hevqas şehîd û ronakrewan, hevqas xwîn û axîn, hevqas zîndan û kuştîn!..

Nexwe! Rastiya gelê me di vê rind bê dîtin. Divê çandekâne ne puç û vala, ne teng û melisi, ne têkilîhev û serberde, ne erzan û sist; divê çandekâne bi naverok û têda, berçav û şahnaz, dewle-mend û ronak, hêja û pîroz, serfiraz û çalak bê afirandin. Çandekâne bo serxwebûna Kurdistan û azadiya Kurdan! Ji bo pêkanîna vî karê pîroz pêşde!..

## Rewşenbîrêñ Kurdistan ên nîştimanperwer!

Têkoşîna Rizgariya Netewiya Kurdistan a ku bi lez pêş ve dihere, ji hemû birêñ civaka Kurdistanê bêhtir, vatinî û delamet datîne pêşîya me rewşenbîrêñ Kurd. Lewma rewşenbîr ew kes in, ku civakê ronahî dîkin, riya rast û mafdar şanî dîkin û di refêن pêşemîn de şer dîkin. Ji ber ku em rewşenbîrêñ welatekî mîna Kurdistanê ne, ku ji sedsalan vir ve ev welat di tariyan de hatîye hîştin, berpirsiyariyêñ mezintir û jidiltir li pêşîya me hene.

Têkoşîna Rizgariya Netewiya Kurdistan a ku roj bi roj, kêlî bi kêlî pêşve diçe û bi lez berzdibe, berî hertiştî riya me rewşenbîrêñ jî, ji bo xebateka çalak û xurt vedike. Her bi vê nolê pêwistî û salixa rewşenbîriya serdemî, ji me re ronaktir dike. Em gişt dizanin, ew rewşenbîriya ku li ser bingeheka derî daxwazên gel bilind bibe, di xwe de jiyaneka herî nîzm û tarî vedişêre. Gelên bindest jiyaneka wusa erzan tucaran nepejirandine û napejirînin.

Di baweriya me rewşenbîrêñ Kurd de, tenê yekîtiyeka xwerêkxistî dikare ber bi armancêñ xwe ve here. Niha li ser vê dîtinê, me xwe gihandiye hev û em dixwazin xebatekê bikin. Li pêşîya welatê me û gelê me berpirsiyariyeka me heye, ji vê jî, ev tevger û liva me ya yekîtiyekê derkete holê û ji me re bû pêwistiyeka bi nirx û xwedî naverok.

Îro li Kurdistanê têkoşîneka hebûnê ya dîrokî bilind dibe. Li hemû der û deverên Kurdistanê gelê Kurd xweradigere. Raste ku gelek kovan û tivancêñ di vî şerî de dilê me disojînin, lê beyî van zehmetiyan jî ne hesaniye ku xebatêñ yekîtiyê û yekbûnê biserkevin. Em di wê baweriye de ne, ku rewşenbîrêñ Kurd di vir de roleka pir hêja wê bileyizin. Guman nîne ku rewşenbîr wê guhêñ xwe li ber qêrîn û hewarêñ gelê Kurd ê bindest negirin, ji ber ku rewşenbîrêñ hişyar, dilêr û dilsoz dijminêñ liveka wusa ne.

Ji sedsalan heya niha, Kurdistan di bin statuyeka dagîrkar û mêtîngeh hatîye girtin. Pir diyare ku kêliya tevgera serxwebûn û azadiyê li Kurdistanê bigihe serfiraziyê, wê ji bo mirovayetiya pêşveçuyî û gelêne hêjar jî bibe serkeftineka hêviyan. Paşveruyêñ cîhanê, mêtîngerên dirinde û hêzên emperyalîst jî, wê zîrarên mezin bigirin û wê bikevine nava tirseka kûr. Di vir de gîrînge em jibîr nekin, ku ev herdu alî, heya dawiyê wê karûbarêñ xwe pêş ve bibin. Dijmin û dost çêtir wê xwe bidin naskirin. Zor pêwiste ku rewşenbîrêñ Kurd, di vir de bibin ronakdar û pêşengêñ rastiya heyî.

Gelê me jar e, belengaz û hejar e. Dil tijî kovan û derd in. Lê dîsa jî em dibînin ev gel ranawestê, şer dikê û xwe diparêzê. Sud û berjewendêñ xwe dibîne. Datîne holê, ku çawa, wê xwe rizgar bike. Em gelek ji gelê xwe hînbûn. Niha ew roj hatîye, ku em jî riya gelê xwe hindekî ronî bikin û barêñ gelê xwe hilgirin ser milêñ xwe.

Kar û delametênu ku şerê rizgariya netewayî dixe ser milêñ me rewşenbîran, ji bo her rewşenbîrekî bi şeref, kar û delametênu welatperwerî û mirovayetiyê ne. Li beramberê gelê xwe û mirovayetiyê em dixwazin bêjin, ku em wê vê xebata xwe bicih bînîn. **Yekîtiya Rewşenbîrêñ Welatparêzêñ Kurdistan-YRWK**, ji hêla rewşenbîrêñ Kurd, ên ku bi vê berpirsiyariyê xwe gihandin hev, hate damezirandin. Yekîtiya me dixwaze van delametêñ jérîn pêk bîne: Ji hêla ramyarî nasdana Têkoşîna Rizgariya Netewiya Kurdistan, peydakirina kes û hêzên dost, agahdariya bo dezgeha ragihandinê, pêkanîna livbaziyêñ hevkariyê, derxistina kovareka bi navê "REWŞEN", lêgerîn û vekolîna li ser ziman-dîrok û toreya Kurdî, parastina çand û govenda (folklor) netewayî û bi vê riyê xurtkirina têkoşîna rizgariya netewayî, çareserkirina pirsên tenduristî û bijikîyê yên gel û pêşmergan, protestokirina bikaranînêñ derî-mirovayetî yên li ser gelê me û şerê li diji wan, nasdana hingavtin û bikaranînêñ hov bi gelên cîhanê re, xebata ji bona ku mafêñ mirovan li welatê me jî bêñ bikaranîn, piştgirtina bo girtian û malbatêñ wan, perwendekirina gel ühw.

**YRWK**, di wê baweriye de ye, ku her kesê ji Kurdistanê, her rewşenbîrek û mirovekî dilsoz wê van xebatan pîroz bibîne û rewşenbîrêñ Kurd wê vê xebatê rakin ser milêñ xwe û pêş ve bibin.

Divê em bizanibin, ku ev di vê warê de gava pêşemîn e. Tiştên ku em ji bo gelê xwe bikin gelek in.

### Rewşenbîrêñ Kurdistan yên welatparêz!

Em wezifeyêñ xwe bicih bînîn! Ji bona vê platformeka me ya xebatê heye. Ev platform YRWK ye. Em, xwe di nav refêñ YRWK de bikin yek û yekîtiya xwe biparêzin! Xwedî li vê saziya xwe derkevin!

**Yekîtiya Rewşenbîrêñ Welatparêzêñ Kurdistan**, yekîtiya wan kesan e, ku xwedî li kesbûna netewayî derdikevin û rûmetiya gelê me diparêzin.

**Yekîtiya Rewşenbîrêñ Welatparêzêñ Kurdistan**, yekîtiya wan kesan e, ku pênuşen xwe, firçeyên xwe, tembûrên xwe, sitranên xwe, dilê xwe, ango hemû berhemên xwe yên hunerî û xebatî pêşkeşî rizgariya gelê Kurdistanê dîkin e.

Em, hemû rewşenbîrêñ Kurd ên welatparêz vexwandiya **Yekîtiya Rewşenbîrêñ Welatparêzêñ Kurdistan** dîkin.

— **Bijî Yekîtiya Rewşenbîrêñ Welatparêzêñ Kurdistan!**

— **Bijî Têkoşîna Rizgariya Netewiya Kurdistan!**

---

# DUXUYANÎ

## (Deklarasyon)

---

*Em, rewşenbirêñ KURDISTAN,*

---

- *Bang li rewşenbirêñ Tirk ên dilsoz dikan, ku rûmetiya xwe biparêzin!*
- *Liva hinde rewşenbirêñ Tirk a bê rûmet, ku bi faşîzmê re li hev dihêñ û xwesipariyê birê ve diban, red dikan!*

Partiya Komunîsta Tirkîyê (TKP), seriyê îxanetê li dijî gelê kedmiz û proletaryayê Tirkîyê dikêşe û karê misyona dîrokî di îxanetê de bicih dihêne. Hinde kesên, ku navê rewşenbirîyê li xwe dikan jî, têkilî vê kerwanê diban. Di rojêñ me de ev kes û hêz, hêviya mafdariya xwe ji rejîma 12'ê Êlûnê dixwazin û seriyên xwe li pêşıya faşîzmê dicemînin. Ev komên bêbext ên tarî, liveka derî taybetiyêñ rewşenbirîyê, ya çewt û vajî, datînin pêşıya çavan. Em vê livê, bi şêweya qirêj û gemarkirina şan û şerefa rewşenbirîyê fahm dikan.

Em bang li rewşenbirêñ Tirkîyê dikan, ku li dijî rejîma mêtînger û faşîst a Tirkan, ku dixwaze hebûn û hatina gelên Tirkîyê û Kurdistanê tarî bike, têkoşîna xwe ji bo demokrasiya rast bilind bikin. Xebat ji bo yekîtiya azad ya herdû gelan pêş ve bibin. Berî her tiştî jî, li dijî îxanetê û xwesipariyê rabin û rûmetiya rewşenbirîya xwe biparêzin.

---

YRWK

01.07.1988

Yekîtiya Rewşenbirêñ Welatparêzêñ Kurdistan

Maxstr. 50

5300 Bonn 1

Tel: 0228-630990

**YRWK**  
*Yekîtiya Rewşenbirêñ Welatparêzêñ Kurdistan*  
**Maxstr. 50**  
**5300 Bonn 1**